roman

IBRAHÎM SEYDO AYDOGAN



# Reş û spî

NEFEL

www.nefel.com
info@nefel.com

# Reş û spî

# Reş û spî

**IBRAHÎM SEYDO AYDOGAN**

NEFEL
Stockholm
2002

**www.nefel.com**
**info@nefel.com**

**Ibrahîm Seydo Aydogan:** Reş û spî

Weşanxane: Nefel
Sandfjärdsgatan 10, 11 tr.
120 57 Årsta / Sweden

www.nefel.com
info@nefel.com

© Ibrahîm Seydo Aydogan û Nefel

Çapa dîjîtal: 2002
ISBN: 91-973195-3-8

Çapa kevin: Doz

Grafîka pirtûkê: Arif Zêrevan
Fotoyê nivîskarî: Arif Zêrevan

Bêyî destûreka nivîskî ti kes nikare vê pirtûkê ji nû ve
bi ti awayî çap bike, kopî bike yan li ber wê zêde bike.

Çênabe ko ti kes fayla vê pirtûkê kopî bike
û di Internetê de bêxe malpera xwe.

# Nêverok


**Beş I, Ba . . . . . 7**

1. Carinan mirov welatê xwe jî terk dike… . . . . . 7
2. Bajarekî nû, jiyaneke cida... . . . . . 9
3. Şevbihêrk... . . . . . 14
4. Xewnên derketîyan naşibin yên tu kesî . . . . . 17
5. Hertiştî bi kuştinekê dest pê kir... . . . . . 22
6. Xewn giş dibin kabûs... . . . . . 27
7. Têkçûyin li navê mirov napirse… . . . . . 40
8. Kabûs û xewn tev li hev dibin... . . . . . 45
9. Leyla Xanim, Binevş, Mîtanî, Serdar, Meryem, Mehabad... . . . . . 48
10. Mirov dixwaze hezkiriyeke wî hebe... . . . . . 52
11. Her evînek bi janekê ye... . . . . . 56
12. Gava yek têk diçe, jiyan lê diherime... . . . . . 60
13. Jiyana hemû kesên têkçûyî dişibe hevdu... . . . . . 63
14. Ez tu me, tu jî ez… . . . . . 65
15. Bûkên nû û yên berê... . . . . . 70
16. Û jan jî kedî dibin... . . . . . 74
17. Ez ji te hez dikim, Gulcan… . . . . . 81
18. Zayin… . . . . . 85

**Beş II, Ez ne ez im êdî . . . . . 91**

1. Hespê har… . . . . . 91
2. Di xelasbûna her evînê de, dîroknivîs pênûsên xwe dişikînin... . . . . . 100
3. Nefîkiriyê dinyaya xwe... . . . . . 105
4. Kîjan...? . . . . . 110
5. Tifaq… . . . . . 115
6. Bes tu bixwazî… . . . . . 122

**Beş III, û şeytan vegeriya . . . . . . . . . . 131**
1. Bajarê bêşeytan . . . . . . . . . . 131
2. Ev lawik kî ye...? . . . . . . . . . . 133
3. Dilo rebeno, lo dilo... . . . . . . . . . . 141
4. Şop... . . . . . . . . . . 148
5. Sond... heta mirinê... çi bibe jî... . . . . . . . . . . 152
6. Here ji vira... . . . . . . . . . . 160
7. Piştî ewqas salan dîsa... . . . . . . . . . . 168
8. Bes şopek an jî işaretek... . . . . . . . . . . 175
9. Min ji vira bibe Gulcan, min bernede... . . . . . . . . . . 179



E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

# Beş I, Ba...

## 1. Carinan mirov welatê xwe jî terk dike…

Belê, min ew dîtin; diçûn...

Biryar ji berê de hatibû dayin. Wan ê çavên xwe bigirtana û bidaya ser rê. Ew ê biçûna... Ji cîran û hin nasên wan pê ve, tu kesî pê nizanîbû, bê ka ew ê bi kû de biçûna. Ji xwe, ev tişt ji bo wan ewqasî ne girîng bû jî. Piştî ko mirov nema dikare li warê xwe bisitire… Piştî ko mirov berê xwe dide hin warên xerîb û diçe… Wek dara ko mirov bixwaze rehê wê ji erdê qut bike. Êdî veşêrin, ji çi re dibû; eşkere bikin, ji çi re dibû... Lê tevî vê jî ew ê bi dizî biçûna. Wan nedixwast kes bi wan bihise û bibêje »biniherin, va ew jî çûn...«

Wan berî wê bi çend rojan, ji bo çûyinê dest bi amadekirina xwe kiribû. Lawikê malê yê mezin, ji bo peydakirina xaniyekî, hefteyeke berê di pêşiya wan de çûbû. Û niha ji bo ew jî bi rê ve bikevin û werin, xeber şandibû.

Alavên xwe ji êvar de dabûn ser hevdu. Ji derveyî alavên ferz, zêde tişt bi xwe re nedibirin: Du sê bedil livîn, hin firax û hin kinc mincên xwe... Alavên xwe yên mayî jî li dost û cîranên xwe belav kiribûn. Ne bi dilê cîranên wan bû. Bi mirina wan bû belkî. Lê ew jî neçar bûn. Wan nikarîbû ew alav negirtana. Ji ber ko wan jî dixwast qet nebe, bi vî awayî alîkariyê bi wan bikin. Ji ber vê yekê jî ji bo ko zû bi zû wan bi rê ve bikin, niha serên xwe bi tiştên weha nediêşandin. Ew ê bi dû re lê hay bibûna û her gava ko çav li wan alavan biketana, ew ê di ber xwe de, bi dizîka bigiriyana.

Her tiştên xwe yên ko dê li wan bibûna bargiranî, yek bi yek ji dest

derxistibûn. Lê her ko tiştek dida hinan, weke zarokekî xwe têxin gorê, li ber ketibûn. Bi tenê, bavê wî ji nav alavan rahiştibû teyba xwe û çend kasetan... Heta ko bi xwe kevin nebûya û xera nebûya jî wî ê ew teyb û ew kaset ji xwe bi dûr nexistana. Wî ê ew ji xwe re bikirana heval û hogir. Heval û hogirên xwe yên xerîbiyê. Li wan deveran, ji wan pê ve, ji xwe re ne tu dost peyda dikir, ne jî tu heval. Her ko bêriya warê xwe bikiraya, dê têketaya odeka xwe, derî li ser xwe bigirtaya, kasetek jî daniya ser û serê xwe li ber bihejanda û têra xwe bigiriya.

Çûyin ne bi dilê yekî jî ji wan bû. Ji qehran tu nemabû bifetisiyana. Lê difikirîn û nedifikirîn, tu rêyên din peyda nedikirin. Roj li cihekî teng li wan çûbû ava. Tu tişt ji destê wan nedihat. Tam sal û nîvekê di ber xwe de dabû. Êdî tu kesî ji wan nema karîbû debar bikiraya. Ne taqet û ne jî îmkanên ko bikaribe wan li welêt bigire, mabûn. Ji bo ko kes wan nebîne û ji bo ko kes nebêje »belê min ew dîtin... diçûn...« neçûbûn termînalê jî. Li ber xwe diketin, fedî dikirin.

Mekîne di berbangê de li ber derî sekinîbû. Çend cîranên wan yên nêzîk jî hatibûn ber mekîneyê, da ko wan bi rê ve bikin. Lê diya wî Leyla Xanim nehiştibû ko ew li benda saeta çûyinê bimînin. Ji bo ko di pey wan re neniherin, hema zû bi zû, ji bo ko li çavên wan nenere û hêsirên wê neyên dîtin serê wê di ber de, xatir ji wan xwastibû û ew şandibûn malên wan. Lê pîrekên ko bi zora diya wî çûbûn malên xwe, dîsa jî xwe xistibû paş perdeyan û heta ko mekîne ji çavan bi dûr ketibû jî bi dizî di pey wan re niherîbû. Gava mekîne êdî hew xuya bûbû, hêsirên xwe yên ko li dû hev diherikîn, bi qiraxên leçekên xwe paqij kiribûn. Wan jî dizanîbû, her cara ko ew di ber deriyê wan re derbas bibin, Leyla Xanima weke her car li ser kevirekî rûniştî dê bihata bîra wan.

Gava mekîne bi rê ve ketibû, herkê li cihê xwe melisîbû. Serên xwe bera ber xwe dabûn, destên xwe dabûn ber ruyên xwe û ponijîbûn. Kesî ji wan newêrîbû li dû xwe biniheriya. Hew carekê bi tenê, ew jî piştî ko ji malê bi dûr ketin, Robîn bi zorê li dû xwe zivirîbû û bi hêrseke gelekî mezin ko mirov digot qey hindik maye biteqe, bi çavên xwe yên ko zor didan sînorên xwe careke din jî li wê kuçeya ko zarokatiya wî lê bihurîbû niherîbû. Wê kuçeya ko ew ê tu carî ji bîra wî neçûya.

Bi niherîna xwe re diranên xwe hişk jidandibûn, bi herdu destan bi serê xwe girtibû û di cihê xwe de rûniştibû. Diya wî ew ber bi xwe ve kişandibû û xistibû himbêza xwe. Wî jî serê xwe danîbû ser sînga diya xwe û têra xwe giriyabû.

## 2. Bajarekî nû, jiyaneke cida...

»Tu ê welatên nû nebînî,
wekî din deryayan tu ê nebînî
dev ji te bernade ev bajar
li eynî kuçeyan tu ê bigerî...«
*Konstantînos Kawafîs*

Şeş sal. Şeş salên dûrî welatê xwe. Dûrî nas û dostên xwe. Niha, gava ko li ser wî zinarî rûniştibû û li behrê temaşe dikir, ew hemû tişt weke xeyalekê dihatin ber çavên wî. Weke wêneyekî kevin... Wê roja ko li mekîneyekê siwar bûbûn û her tiştên ko heta wê gavê jiyabûn li dû xwe hiştibûn, yek bi yek dihatin ber çavên wî û dikir ko çavên wî ji xwe ber sor bibin.

Ruyên kesên ji bo wan bi rê bikin li wê derê civiyabûn... Ruyên heval û hogirên wî, hezkiriyên wî yên kevin û hin dîmenên ko ji zarokatiya wî de di bîra wî de mabûn... Giş bi pêlên deryayê re dihatin xwe li zinarên bin lingên wî dixist û diçûn. Hesreta dilê wî jî bi pêlan re dibû yek û geh bilind dibû û geh dadiket.

Roj hêdî hêdî diçû ava. Deryaya kûr û bê sînor, di bin şewqa roja ko diçû ava de, weke ko ji binî ve hêdîka bête diqdiqandin, bi kubarî diliviya. Pêlên zirav, weke çarşefa ko bi ber bayekî sivik ketibe, xwe bi hunerî dihejand û dihatin li perê deryayê diketin. Herçî roj e, tîrêjên xwe yên herî qels li ser deryayê belav dikirin. Bi dû re jî, xwe bi ser kêlekê de xwar kiribû û li tîrêjên xwe yên li ser ruyê deryayê direqisîn, temaşe dikir. Çend keştiyên ji dûr ve xuya dibûn û kelekên ko weke hercar li nêzîkî peravê, hêdî hêdî diçûn û dihatin jî wê dîmena deryayê ya rojane temam dikir.

Di pirtûkekê de xwendibû; gava dilê mirov teng dibe, ji berdêla ko mirov were li kêleka deryayeke bêdawî rûne, ya çêtir ew e ko ji wê bireve. Ji ber ko her bêdawîbûn, xwasteka mirinê bi xwe re dianî, an jî xwesteka di nava wê bêdawîtiyê de wendabûnê...

Ev bajarê mezin, ev bajarê ko şev û êvarên wî ji rojên wî xedartir, xwe dixist paş perda xwe ya tarî û lempeyên xwe pêdixistin. Deng hêdî hêdî ji bajêr dibiliya.

Ji bo Robîn, dem ji vêya bikerbtir nedibû. Çavên xwe berdabûn şewqa wê roja ko tîrêjên wê li ser ruyê deryayê direqisîn û bi dû re jî di neynika

mezin a li biniya wê re li xwe temaşe dikir. Lingekî xwe bera ser zinarên jêrê dabû. Lingê xwe yê din jî kişandibû ber xwe û sînga xwe dabû ser. Bayekî hênik û xweş, weke pêleke dilovan dihat û xwe li wî dixist, porê wî bi nazikî bi paş ve diavêt. Her ko wî ew hênikahî di canê xwe de his dikir, guhê xwe dida xişxişa pelên wan darên mezin ko li gora mesafeyekê bi rêkûpêk hatibûn rêzkirin û dixwast şahîdiyê li wê lihevkirina xwezayî bike.

Di bin daran de, hêşînahiya parkê ya xweş û fireh, mirov bi dilovanî dawetî himbêza xwe dikir. Herçî park e, hema li gora deryayê diçû û dawiya wê xuya nedibû. Di parkê de ji bo zarokan çend hêlan û du heb zernezîq jî hatibûn çêkirin. Li hebekî dûranê, meydaneke futbolê hebû ko bîstika din çend xortan tê de bi hengameyeke mezin bi topê dilîst, lê niha vala bû. Di nav hêşînahiyê û behrê de, peyarêyeke hebekî fireh hebû. Gelek kes sirf ji bo ko di vê riyê de bimeşin û ji xwe re li behrê temaşe bikin dihatin vira. Hinek kes jî hebûn ko kincên sportîf li xwe dikirin û dihatin li wê derê, di wê hewaya xweş de, ji xwe re baz dida.

Ew kesên ko bi malbatî ji bo seyranê hatibûn ber behrê, radibûn û diçûn malên xwe. Bala Robîn hê jî li ser behrê bû. Li milê wî yê rastê, du evîndaran hevdu himbêz kiribû. Keçikê serê xwe danîbû ser milê lêwik û herduyan jî bi hevdu re berên xwe dabûn deryayê. Lêwik bi dengekî nizm tiştin ji keçikê re digotin, lê baş nedihatin fahmkirin. Li paş wî, çend keçên bedew û du-sê xortên din, li nav gîhê rûniştibûn û li ber dengê gîtarê, bi melodiyeke giran, stranên evîndariyê digotin.

Dîsa di nav xewn û xeyalan re çûbû. Êdî tu deng nedibihîst. Çi gava ko li ber wî behsa evînê bibûya an jî li straneke evîndarî guhdarî bikiraya, tavilê deng ji doraliyê dibiliya û ruyê hezkiriyên wî yên kevn dihatin ber çavên wî. Nemaze jî yê Nûşînê.

Nûşîn... Niha ew li kû bû gelo, çi dikir, di çi rewşê de bû?

Hezar tişt anîn bîra xwe. Hema çi rewşên ko karîbûya Nûşîn tê de bûya, yek bi yek anîn ber çavên xwe. Wê gavê li ber xwe ket. Tasûwasek ket dilê wî. Tirseke derengmayinê... Bi dû re kesereke kûr kişand. Serê xwe bi kerb hejand û dîsa danî ser çonga xwe.

Dilê wî mişt kerb bû. Hew mabû ko biteqiya. Êşeke giran li serê wî peyda bû. Kela girî ket qirikê. Çavên xwe girtin û vekirin, diranên xwe hişk şidandin. Lahnet li dinyayê, li jiyanê û hemû neheqiyan anî. Xeberên xerab ji hin kesan re dan. Hilma xwe bi lez stend û berda. Heta ko bîhna wî hebekî hat ber wî, hisa kîneke berlênayêgirtin di dilê wî de serî hildabû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Gava li xwe hay bû, roj çûbû ava. Dinya tarî bûbû. Hêyv li ezmên, mîna quloçekî zêrîn xuya dibû. Ji ber ko ji nişka ve çav li tariyê ketibû, serê wî çenekî gêj bûbû. Ji ber wê, hê nehatibû ser hişê xwe. Li dora xwe niherî. Lempeyên parqê û yên li peravê hatibûn rêzkirin, pêketibûn û heta ko ji wan dihat şewqa xwe di ser deryayê re diavêt dûranê, digihand wêneyê hêyvê yê li ser pêlên ko xof bera dilê mirov dida. Wê şewqa hanê, li ser ruyê wê behra ko ketibû rengê êvarê, dîmeneke bêhempa pêk dianî. Dengê pêlan, di bin wê ronahiyê de, mîna melodiyeke xweş li dorhêlê dihate bihîstin. Xişxişa pelan, ew melodiya ko bi dengê pêlan dest pê dikir, temam dikir. Mirov hema dixwast bi hezkiriya xwe re li cihekî weha, heta sibehê bi tena serê xwe di himbêza hevdu de raketa.

Hingî bayê sivik xwe lê xist, eniya wî cemidandibû. Hema bi lerzînekê bi xwe hisiya. Lingê xwe yê din jî bera jêrê, cem lingê din da û bi herdu destên xwe milên xwe mist dan. Dema ko di ser milê xwe re zivirî û li dora xwe niherî, tu kes nemabû. Hew ji dûranê, keçikekê û lawikekî bi destê hev girtibû û ber bi wî de dihatin. Ji derveyî wê jî dengê radyoya bufeya ko hebekî ji wî bi dûr bû, dihat bihîstin.

Beyî dilê xwe li saeta xwe niherî. Dereng bûbû. Destên xwe danîn erdê, lingên xwe kişandin jorê û bi aciziyekê rabû ser xwe. Bi dû re destên xwe ji gemara erdê dawişandin û meşiya. Piştî du-sê gavan, destên xwe avêtin bêrîkên xwe û li pakêta xwe ya çixareyê geriya. Pakêta xwe dît û çixareyek jê derxist. Dîsa destê xwe avêt bêrîka xwe û niftik jê derxist. Devê qutîka niftikê vekir û li hindurê wê niherî. Du darik bi tenê tê de mabûn. Li wî bayê hênik niherî. Herçî ba bû, her ko diçû xurttir dibû. Lêva xwe hebekî bi hêrs xwar kir û di dilê xwe de got:

»Hema, Xwedê bike ko ez bikaribim bi van darikan çixareya xwe pêbixim, yan na ez hew dikarim êgir jî li tu deveran peyda bikim.«

Rahişt darikekî û ji qutîkê kişand. Dîsa serê xwe rakir, wek ko bayê ew di destpêkê de hêdîka mist dida, lê niha xurttir dihat, kontrol bike, sekinî. Bi dû re, berê xwe ji aliyê ko ba jê dihat da alî û ew darikê niftikê di nava kefa destê xwe de bi lez vêxist. Tu nemabû ko bibe ber devê xwe û çixareya xwe pêbixe, darik vemirî. Darik bi hêrs avêt erdê û rahişt yê din. Hêrs bû. Dîsa berê xwe ji bayê ko li wî qulipîbû guhert û bi eynî awayî hewil da. Lê, tew berî ko pêkeve, darikê dawiyê jî vemirî û çû. Wî darikê xwe yê taliyê jî avêt erdê û bi hêrs pehînek lê xist.

Çixareya wî ya ko nikarîbû pêxistaya, di devê wî de bû. Çavên xwe bi hêviya ko hinan bibîne û agir ji wan bixwaze, li dora xwe gerandin. Lê, tu

kes tune bû. Bufe jî ji wî gelekî bi dûr mabû. Di xwe re nedît ko ji bo pêxistina çixareyekê vegere heta wê derê.

Ser dilê wî dişewitî. Dilê wî bêtir dibijiya çixareyê. Kurmên wî tev rabûbûn. Çixare ji devê xwe kişand û di destê xwe de girt.

Bîstikekê meşiya. Bi dû re çav li lawikekî piçûk ket. Sêniyek li ser serê lêwik bû. Lawik ber bi wî de dihat û digel dûrbûnê jî çixareya di devê wî de, sor dikir. Kêfa Robîn bi vê yekê hat cih. Wî jî lezand û gihişt ba lêwik.

Herçî lawik e, umrê wî pir pir sêzdeh-çardeh sal bû. Zarokekî qamkinik û zehîfokî bû. Eyn wek darikekî bû. Serê wî piçûk, porê wî kin û çavên wî yên reş li gora serê wî pir gir xuya bûn. Tîşortekî gemarî bera ser pantorekî qont î riziyayî dabû. Rengê pantorê wî jê çûbû û çongekî wî jî qetiyayî bû. Bi awayekî bixwebawer dimeşiya û carê jî hilmeke dirêj ji çixareya xwe dikişand û berdida.

Gava Robîn nêzîkî lêwik bû, gavên xwe sist kirin û bi dengekî nizm, lê mîna ko emir bidiyê, bangî wî kir:

— Hişt hişt!

Lawik li deng zivirî. Robîn bi destê xwe bangî wî kir û got:

— Hela were vê derê.

Lêwik berê li Robîn niherî û bi dû re jî ber bi wî de hat. Sêniya ser serê xwe daxist û li ber wî sekinî. Robîn li wê sêniya ko çend heb mîdye tê de bûn niherî, destê xwe dirêjî wî kir û got:

— Hela ka agirê xwe, lo.

Lêwik, beyî ko bala xwe bide wî, çixareya xwe ji devê xwe derixist û dayê. Robîn berê li çixareya ko di destê lêwik î gemarî de bû, niherî. Zikê wî bi lêwik şewitî. Bi dû re jî rahiştê û çixareya xwe pêxist. Hilmeke dirêj kişand heta nava dilê xwe û bi kêfxweşiyekê li dixana wê niherî.

Piştî ko çixareya lêwik dayê, pê re mizicî û jê pirsî:

— Tu ji kû yî, lo?

Lêwik ziq li çavên wî niherî û bi serbilindiyekê got:

— Ez ji Nisêbînê me.

Kenekî tenik li ruyê Robîn belav bû, pê re jî gunehê wî bi lêwik hat. Lê, nehişt ko lawik vê yekê fahm bike.

Hilmek ji çixareya xwe kişand. Vê carê bi kurmancî pirsî:

— Tu bi kurmancî dizanî, ne weha?

Lêwik serê xwe hebekî din rakir û xwe nepixand:

— Erê, weh!

Robîn destê xwe di serê wî de da, keniya û got:


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Tu çavê min î, lo…

Lawik jî di ber xwe de keniya û bêtir pesinî. Lê, ket ber fediyê jî. Ruyê wî sorbû. Gava Robîn li vê rewşa wî hay bû, ji bo ko wî zêde nexe ber fediyê, destê xwe li pişta wî xist û bi ken got:

— De biçe, oxir be ji te re.

Lêwik çixareya xwe dîsa xist devê xwe, sêniya xwe danî ser serê xwe û meşiya. Robîn hilmeke din jî li çixareya xwe xist û bîstikekê di pey wî re niherî. Li malbata lêwik fikirî. Dê û bavê wî ko nas nedikirin anîn ber çavên xwe. Serê xwe bi kerb kil kir. Bi dû re dîsa berê xwe da rêya xwe û çû.

Dengên li doraliyê, aramiyeke bêsînor bera nav dilê wî yê aciz dida. Bayê hênik, di wê êvara havînê de, nedihişt ko mirov ji germê of bibe. Dengê pêlên ko dihatin, mîna ko bixwazin xurtbûna avê nîşanî der û dorê bidin, bi şerpîniyeke xurt li zinarên jêra peravê diketin û peşkên wan heta bi pênc-şeş mitroyan bilind dibûn. Pêlan di nav wê reşahiyê de dibiriqand û dikir ko çavên mirov ji deryayê bitirsin. Mirov digot qey tiştin esrarengîz di binê vê deryayê de hebûn. Gava roj diçû ava û tarî diket erdê, xusûsiyeteke tirsandinê dida behrê. Dibe ko behr ji vêya diêşiya jî; dibe ko ji ber wê ye ko êvaran har dibû û pêlên xwe bi şerpîniyên dijwar li zinarên peravê dixistin. Û belkî ew tirsa ko li dora xwe belav dikir jî ji ber wê bû.

Robîn, dûrî van bîr û baweriyan, diponijî û bi gavên giran, beyî xwe dimeşiya. Ji nişka ve, bi dengê kenê pîrekekê li dû xwe zivirî. Dengê wî kenê hanê, bi carekê hatibû bihîstin û li der û dorê belav bûbû. Wî dengî, wî kenê ji dil ko mirov digot qey hatiye diqdiqandin, heyecanek xist dilê wî. Li şûna xwe lê heyirî û ma.

Deng ji deverin dûr hatibûyê. Xwediya vî dengî, mîna ko xwe di paş dîwarekî de veşartibû û ji ber ko wê jî bi xwe dizanîbû, bê ew ê bikaribe tesîreke çawa li ser yê ko dengê wê dibihîse bihêle, an ew ê bikaribe çi bîne serê wî kesî, ji qazî weha dikir. Mîna ko dixwast encama biserketina xwe bibîne, hereket dikir.

Belkî dîtina vî tiştî heyecan jî dixist dilê wê. Di kenê wê de, hebekî dek jî hebû. Lê, ji ber ko bi carekê hatibû bihîstin û qut bûbû, Robîn li vêya hay nebûbû. Çavên xwe bi awayekî ecêbmayî, mîna serxweşekî li dora xwe digerandin. Kes xuya nedibû. Di ber xwe de got; »belkî xewn be jî,« û dîsa di rêya xwe de meşiya. Lê vê carê, ne weke cara din di nav ramanin kûr de û ji ber xwe ve. Ji ber ko vê carê, bi hêviya ko dîsa wî dengî bibi-

hîse, carê guhên xwe bel dikirin û guhdarî dikir. Lê, ji dengê bayê ko dar bi vir de û wê de dihejandin û dengê şerpîniyên pêlan pê ve, tu dengê din tune bû. Ji wî pê ve, kesekî din jî nexuyabû. Bi tena serê xwe bû. Mejiyê wî, mîna ko ji hemû ramanên din hatibe şuştin vala bû.

Ji derveyî dengê wî kenî, di hişê wî de, tiştek nemabû. Ew deng, hey ruyek jî bi xwe re dianî bîra wî. Lê wî ew rû nedişiband yê tu kesan. Pîrekeke esmer a xweşik û lihevhatî, dengnermeke çavmelûl, zane, bixebawer û esrarengîz... Ne mimkun bû ko Robîn aşiqî pîrekeke weha nebûya.

Di nav wê fikra îhtîmala xewnbûna wî kenî de vegevizî. Gelo kesî din jî ew deng bihîstibû an bi rastî jî xewn bû? Bi çavên şermokî hêdîka li dora xwe niherî, kes tune bû. Dilê wî hebekî rehet bûbû, bes hê jî li rewşa xwe diheyirî û tu mahne nedida wê. Ji wê rewşa xwe fahm kir ko nema dikare li hember tenêtî û bêpîrekiyê bisekine. Mîna ko bi taya evîneke platonîk ketibe, dilê wî bi wî şewitî û di ber re jî îmana wî ji wî çû.

Bi awayekî dilşikestî, di nav hestên tevlihev de, carê bi hêviya ko xwediya wî dengî bibîne li dû xwe jî diniherî û ji peravê bi dûr ket.

## 3. Şevbihêrk...

»Min navê xwe kola li bircên Diyarbekirê...«, *Rojen Barnas*

Şev nîvê şevê gihîşt malê. Mala wan li taxeke Nuhavabûyî bû. Herçî tax bû, ji sîteyan pêk dihat û dûrî navenda bajêr û sûkên wê bû. Ji bo ko mirov xwe ji navenda bajêr bigihanda wê taxê, diviyabû ko du mekîne biguhertana.

Di nav kolanin nîvtarî re derbas bû û hat ber sîteya ko mala wan tê de bû. Li gora sîteyên der û dorê, ev sîte, sîteyeke piçûk bû. Ji heyş biloqên apartmanên şeşqatî pêk dihat. Hewşa wê, ne gelekî mezin û fireh bû. Di hindurê wê de, ji bo zarokan du hêlan hebûn û ji bo ko xwe tê de biçerixînin jî tuneleke naylonî hatibû çêkirin. Ji bilî heyşt deriyên li hember devê apartmanan ko li riyê diniherin, deriyekî wê yê mezin jî hebû.

Ji ber ko piştî saet dehan hemû deriyê din dihatin girtin, mirov diviyabû di wî deriyê hewşê yî mezin re derbas bibûya. Gava Robîn di derî re derbas bû, ji qazî lingê xwe li derî xist û deng jê derxist. Bi dengê lingên wî re, nobedarê kal yê ko hertim di xew de bû, serê xwe di pencereya qulûbeya xwe re dirêj kir û li aliyê derî niherî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Herçî nobedarê kal bû, bi roj şiveke dirêj, bi şev jî çifteyeke kevin di dest de bû û ji zarokan pê ve jî tu kes ji wî neditirsiya. Êvaran, piştî ko derî kilît dikirin û xelk diketin malên xwe, ew jî diket qulûbeya piçûk a li ber deriyê mezin û vediket. Ji ber ko Robîn bi vî tebîetê wî dizanîbû, her ko van saetan di deriyê mezin re derbas bibûya, ji bo ew ji xewa wî şiyar bikiraya, wî dê ji qazî, lingê xwe li qutîk û tenekeyên li der û dorê bixista û deng mengin derxistana.

Gava serê mêrik li ber camê xuya bû, Robîn ew dît, lê weke ko hercar dikir, dîsa silav nedayê û weke ko hayê wî jê çênebûbe meşiya û ket hewşê. Nobedarê kal, dîsa weke hercar serê xwe bi hêrs hejand û xeber jê re dan.

Lempeyên malan, ji derveyî du-sê heban, giş vemirîbûn. Çend lempeyên ko bi tenê dikarîbû dora xwe rohnî bikin, wêneyê derengbûna şevê temam dikir. Zilamekî ji navê û ber bi jor de tazî û serrût li balqona xwe rûniştibû û çixareya xwe sor dikir.

Gava asansor li qatê sisiyan sekinî û Robîn deriyê wê bi dehfekê vekir û hat ber deriyê mala xwe, ewilî çav li ronahiya ko di bin derî re xuya dibû ket. Lempeya wan jî vêketî bû. Li wê îhtimalê fikirî ko yên malê ketibin meraqa wî û li benda wî mabin. Ji xwe re li bersivan geriya, hin bersiv peyda kirin. Bi dû re bi gazinî ji xwe re got:

— Dev jê berde, lo!

Kilît ji bêrîka xwe derxist û derî vekir. Bi dengê derî re, deng ji tembûra hindur jî biliya. Robîn bi dengê tembûrê re veciniqî û serê xwe rakir. Wê gavê têgihîşt ko ew roj roja şemiyê bû û Bedirxanê hevalê birayê wî dîsa hatibû ba wan.

Hêwan tije bû. Hemû kesên malê hê şiyar bûn û şevbihêrka wan xweş digeriya. Robîn bi ken ket hindur û silav da. Ew û Bedirxan çûn ruyê hevdu û rûniştin. Bedirxên tembûra di destê xwe de danî kêleka xwe. Herduyan jî li halên hevdu pirsî û bi dû re ketin nav sohbetê.

Hêwana wan mezin bû. Mêvan li ser dîwanê rûniştibû. Li ber wî sehpeyek hebû. Li ser sehpeyê jî xwelîdankeke cam û pakêta çixareyê hebû. Li kêleka Bedirxên, bavê Robîn, Resûl Begê heftêsalî rûniştibû. Birayê Robîn î mezin, Mîtanî jî li qenepeya kêleka wan ya dirêj, li cem jina xwe û xweha xwe rûniştibû. Diya wan weke hercar li erdê, li ser balgîfekê rûniştibû û destekî xwe danîbû erdê û yê din jî danîbû ser çonga xwe.

Lawikê malê yê piçûk Serdar û xweha wî ya ji wî piçûktir Meryem, li erdê li kêleka diya xwe rûniştibûn. Robîn jî xwe dabû kêleka Meryemê û

ew xistibû bin çengê xwe.

Bedirxan dostekî malbata wan bû. Wan piştî hatina vî bajarê mezin hevdu nas kiribû. Ji xwe, zû bi zû xwe li kesî nedigirt û ji ber vê yekê jî hejmara dostên wan ên mîna Bedirxên, ne ewqasî zêde bû. Yên ko hebûn jî bi piranî ew kes bûn ko mîna wan mecbûr mabûn ji welêt derkevin. Herçî yên mîna wan bûn, li vî bajarî, mîna kesên ko ji ber mirinê xelas bûne xwe li hev digirt. Ji xwe rewşa wan jî ne ji wê rewşê cida bû. Dîsa jî wan baweriya xwe bi herkesî nedianî.

Bedirxan zilamekî zeîf û dirêj bû. Simbêlên wî yê sor û ruyê wî yê boz, pir li hevdu dikir. Ji ber ko porê wî ji pêşiyê piçekî weşiyabû, eniya wî fireh bûbû. Çavin wî yên gir û şîn hebûn ko mirov dikirin heyranê xwe. Gava dikeniya, çavên wî wenda dibûn û diranên wî yên ji çixareyê nîvzerbûyî di bin simbêlên sor re xuya dibûn. Pir xweş li tembûrê dixist. Gava wî radihişt tembûrê, deng ji yên li dora wî gişan dibiliya. Zilamekî têgihiştî û xweşsohbet bû. Carinan, welê dihat şevbihêrka wan û şevder li cem wan dima.

Robîn di nav kesên din yên ko diçûn û dihatin mala wan de, cihekî taybetî dida Bedirxên. Gava wan hevdu didît, li ser derdên xwe dipeyivîn û li tembûra wî guhdarî dikir, hêviyên dilê Robîn geş dibûn. Ji ber wê, kêfa wî hatibû cih û ew hestên tevlihev û bêmahne yên li peravê pê re peyda bûbûn, giş ji bîr kiribûn. Niha, ji bo şevekê bûya jî derdên hesretê û xerîbiyê dê xwe bidaya alî.

Bedirxan û dengê wî… Dîsa rahiştibû tembûrê û li nava dilê hemû evînên nîvcomayî dixist.

Robîn carinan ji xwe re digot:

— Mirov hema ji mehê carekê be jî li wî û tembûra wî guhdarî bike, bes e. Wê gavê, ne derd dimîne û ne jî kul.

Bedirxan piştî ko qedeha çayê ya di destê xwe de danî ser sehpeyê, bi Robîn re bişirî û dest bi stranekê kir. Wî jî êdî dizanîbû ko Robîn ji dengê wî û ji stranên wî hez dike. Bivê nevê jî yên li ser Diyarbekirê…

Kenekî tenik li devê wî peyda bû û ruyê wî bi nazdarî neqişand. Robin carê serê xwe bi ken ji wî re dihejand û hevaltiya dengê wî dikir.

Piştî çayê, fêkî hat xwarin û piştî fêkî jî dîsa di pey bêdengîyeke kurt re dengê tembûrê bilind bû. Bedirxên ji wan re lê dixist, gişan bi hev re digot. Radibûn direqisîn, kulên dilê xwe derman dikirin. Herçî Robîn e, gava li ber tembûra Bedirxên direqisî, te digot qey tê guhertin û dibe yekî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

din. Carnan gava li vê rewşê hay dibû, ew jî bi xwe şaş dibû.

Heta ko Bedirxên strana xwe temam kir, gişan xwê dabû. Westiyabûn. Rûniştin. Wan demeke din jî li kilamên Bedirxên guhdar kir. Gava xwêdana canê wan zuha bû jî canên gişan giran bûbûn û vê yekê xwe di çavên wan re dida der. Çavên gişan sist bûbûn. Êdî xewê zora wan dibir. Yên çûn raketin, yên di şûna xwe de çavên wan diçûn ser hev… Civat hêdî hêdî belav bû. Bedirxan, Robîn û Mîtanî jî di nav wê bêdengiya êvarê de man. Piştî kêf û şahiyê, cihên xwe xweş kirin û ketin nav sohbetê.

## 4. Xewnên derketîyan naşibin yên tu kesî

Piştî ko Bedirxan û Mîtanî jî çûn raketin, li hêwanê Robîn bi tenê mabû. Lempeya hêwanê vemirand û derket, li balqonê rûnişt. Çixareyek pêxist, bêhneke dirêj lê xist û sekinî. Westiyabû. Çavên xwe di cihekî de cit kiribûn, lê ne ji bo ko li tiştekî binere. Di wî cihî de, xwe bera dinyayeke din dida û gelek tişt didîtin. Dinyayeke din, dîmenên ko ji demeke kevin di bîra wî de mabûn û niha yek bi yek dihatin ber çavên wî…

Nûşîn di himbêza wî de bû. Serê xwe danîbû ser sînga wî. Robîn ji aliyekî ve bi wê re dipeyivî, ji aliyekî ve jî tiliyên xwe di nav porê wê de digerandin. Pişt re, destê xwe ber bi situyê wê de bir û bi tevgerên giran derket jorê. Destê xwe hêdî hêdî di ruyê wê de da û li lêvên wê geriya. Tiliyên xwe li ser lêvên teze û nermik gerandin. Herdu jî ji heyecanê dilerizîn. Lê Robîn bêhtir ji ser hişê xwe ve çûbû.

Nûşînê bi destê wî girt, ber bi devê xwe de bir û ramûsand. Hinavên Robîn mîna ko ketibin nav qeşayê, lerizîn. Nûşînê mijangên xwe ber bi jorê ve rakirin û di bin mijangên dirêj re, li çavên wî niherî. Gava li çavên hev diniherî, lerzîna canê wê xurttir dibû. Çavên wê yên reş û girs xwe bi temamî bi destê heyecana dilê wê ve berdabû. Dûmana agirekî xurt ji wan difûriya. Lêvên wê hê jî diricifîn. Nikarîbû bipeyiviya. Mirov digot qey ji sermayê diqefile û li cihekî ko xwe lê germ bike, digere.

Robîn destê xwe dîsa avêt ruyê wê û ew hêdîka ber bi xwe ve kişand. Serê xwe ber bi wê de bir û lêvên xwe dan ser yên wê. Lêvên hevdu mêtin û her mêtin. Ji hev têr nedibûn. Wan hevdu bi awayekî weha maçî dikir ko mirov digot qey hindik maye hevdu bixwin. Bi dû re jî wan destên xwe li nava hev gerandin û hevdu himbêz kir. Robîn ji aliyekî ve ew dimêt û ji aliyê din ve jî destê xwe ber bi paxila wê ve dibir. Gava paxila wê vekir, herdu cotên memikên girover ên belbûyî û sincirî derketin or-

tê û hişê mabû jî bi xwe re bir. Robîn jî êdî nema dizanîbû bê çi dikir. Serê xwe xist nav pêsîran û bêhna canê wê kişand heta nava dilê xwe. Pêlên heyecana ko bi daxwazeke bêsînor û bêrîkirineke xurt a nedîtî û hezkirina du dilên pak û mişt evîn her ko diçû, bilindtir dibûn û ew bi yekcarî dabûn ber xwe.

… Nûşîn, ax Nûşîn. Delaliya min... Tu li kû yî?…

Serê wî mîna pelekî darên payizê hêdîka ket aliyekî milên wî. Çavên wî çûn ser hev û carekê jî di xwe re nedît ko xwe bide ser hev û rabe ser xwe. Laşê wî bi temamî sist bûbû. Destên wî, enîşkên wî, milên wî, çong, ling û çîpên wî… Robîn bi temamî mest bûbû. Mîna yekî ko serê xwe danîbe ser sînga hezkiriya xwe. Mîna mirîdekî ko di terîqetê de bi dizbê ketibe. Mîna serxweşekî ko heta sibehê araqa safî vexwaribe û di cihê xwe de di xewê re çûbe. Mîna eroînmanekî ko hê nû eroîn kişandibe. Wî jî şeraba evînê bi ser xwe de dakiribû û di cihê xwe de mest bûbû. Niha ji ser hişê xwe çûbû û di nav evînê de vedigevizî.

Wî digot qey, ne xwîn, lê tiştekî din di damarên wî de digeriya û ew bi temamî hogirî xwe dikir û dihişt. Vê yekê, Robîn ewqasî bi xwe ve girê dida ko êdî wî xwe tam mîna hêsîrekî didît

Herkes di xeweke şêrîn de bû. Robîn li balqonê, li ser kursiyeke piçûk rûniştibû û pişta xwe dabû dîwêr. Serê wî bi zorê li ser laşê wî disekinî. Destekî wî li ser çonga wî bû, yê din jî ketibû kêleka wî. Çavên wî jî westiyabûn û carê ji ber xwe ve dihatin girtin. Gava vedibûn jî di wê tariyê de dibiriqîn. Hê nû çavên wî çûbûn ser hev, bi dengê azana sibehê bi xwe hisiya. Berê dengê melayekî ji devereke dûr hat. Dengekî xweş, dengekî bi şevê re lihevkirî… Piştî wê xewnê, dengê vî meleyî bi Robîn xweş hatibû û aramiyek bera dilê wî dabû.

Deng her ko çû pirtir bûn. Melayekî din jî dest bi azanê kir. Bi dû re dengên hemû melayên mizgeftên der û dorê mîna koroyekê tev li hev bûn. Yekî xelas dikir, yekî din dest pê dikir. Mirov digot qey di ber hevdu de dibetilîn. Piştî ko azan qediya, Robîn guhê xwe da dengên lingên du zilamên ko ber bi riyê ve dimeşiyan. Bi dû re mekineyekê ji dûranê kir giregir. Li apartmanên der û dorê, lempeyên çend malan vêketin. Ji xaniyê jora wan, dengê giriyê zarokan dihat. Ji nav wê reşahiya şeva ko haziriya çûnê dikir, bîhna rojeke nû difûriya.

Robîn hilma xwe berada û rabû ket hindur. Çû odekê û xwe li ser nivînên ko ji bo wî, li kêleka yên Bedirxên, hatibûn danîn dirêj kir. Janekê xwe li serê wî girtibû. Çavên wî bêtir sist bûbûn. Çer ko serê xwe



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

danî, di xewê re çû.

Di nava valahiyeke tarî de bû. Heta ko ji destê wî dihat, çavên xwe vedikirin û li dora xwe digerandin da ko têbigihêje bê li kû bû. Ji tariyê pê ve, tu tişt nexuya bû. Bêhna wî teng bû. Dizanîbû ko di xewnekê de bû û xwast ko ji wê xewnê şiyar bibe. Lê, kir û nekir nikarîbû. Destên xwe li dora xwe dipelandin. Destên wî di valahiyê de diçûn û dihatin. Wî xwast gava xwe biavêje, lê belê lingên wî ji cihên xwe nediliviyan. Dîsa li dora xwe niherî. Her dever tarî bû. Ji dûranê, hin tişt ber bi çavên wî ketin ko di tariyê de diçûrisîn û ronahiyeke gelekî qels didan dora xwe. Hê Robîn li wê ronahiya qels diniherî, gomeyekî ecêb ko agir jê dibariya bi ser wî de hat û di ber serê wî re derbas bû. Xwe bi zorê ji ber da alî. Hema hindik mabû ko ew gome li serê wî biketa û ew perçe perçe bikira. Ji tirsan, dilê wî dikir gupegup. Sînga wî bi lez radibû û dadiket. Robîn fikirî ko ew li fezayê be. Piştî ko feza anî bîra xwe, tiştên ko di nav tariyê de veşartî bûn, hêdî hêdî kifş bûn. Bi dû re têgihişt ko ew tiştên bîstika din diçûrisîn, stêrk bûn. Serê xwe rakir û li dora xwe niherî. Çend stêrk di nav wê reşahiyê de, li vî alî û wî alî belav bûbûn.

Çawa hatibû vira? Ew ê çawa vegeriya malê? Dê û bavê wî hatin bîra wî. Gelo wî dê ew dîsa bidîtana? Le yên din? Xwişk û birayên wî? Hevalên wî? Ma gelo wî dê bikarîbûya xwe ji vira xelas bikira? Ma qey miribû? Ma qey mirî giş dihatin vira? An jî bi tenê yên ko baweriya xwe bi Xwedê nedianîn dihatin vira?

Ev pirsên ko tirs dixist dilê wî, di serê wî de diçûn û dihatin. Robîn tu bersiv ji wan re peyda nedikir. Hê li pirsên bêbersiv difikirî ko ji cihekî nediyar dengê azanekê hatê. Veciniqî. Hey li dora xwe diniherî. Nizanîbû, bê dengê vê azanê ji kû dihat.

Êdî baweriya xwe baş bi wê anîbû ko hatibû dinyaya din. Li xêr û gunehên xwe fikirî. Bihuşt û dojeh anîn bîra xwe. Ka gelo kîjan ji wan cihê wî bû? Ji navê dojehê tirsiya. Qêrînek bi dilê wî ket; lê, hê xwe negihandibû devê wî, ji nav wan stêrkên ko diçûrisîn yek ber bi wî ve hat. Gava li vî tiştî hay bû, di cihê xwe de mat ma. Çavên wî bi tirs vebûn. Stêrk hat û li ber wî sekinî. Hey li dora xwe diziviri û diçûrisî. Robîn destê xwe hebekî jî bi tirs dirêjî wê kir. Gava destê wî gihaşt stêrkê, stêrk ji nişka ve bi paş de vekişiya û mezin bû. Her ko mezin bû, xweşiktir bû. Her ko xweşiktir bû, bala Robîn bêtir kişand ser xwe. Meraqa Robîn bêtir bû.

Ev çi bû? Ji nişka ve perdeyeke reş hat û xwe li çavên Robîn pêça. Robîn bi destê xwe, ew perdeya reş ji ser çavên xwe da alî. Perdeya reş bû ke-

vokeke spî û bi firê ket. Çû xwe li bin guhê stêrka mezin xist. Bi lihevketina stêrkê û kevokê re, li doraliyê dengê bayekî xurt belav bû. Stêrk bi carekê bû ewrekî ji berfê. Dengê azanê jî hêdî hêdî kêm bû.

Kevoka ko xwe li stêrkê xist û ew guhert, çû û xwe li ser wê danî. Kevok jî hêdî hêdî hat guhertin. Kevok mezin bû, mezin bû û bû zilamek. Lê belê, ka ruyê vî zilamî? Mijê xwe li ruyê zilêm girtibû. Robîn destê xwe hejand û mij belav bû.

Robîn mîna ko mirov kûzeke ava sar bi ser wî de dake, di şûna xwe de mat ma. Ew zilamê ko ruyê wî zelal dibû, her ko diçû dişibiya birayê wî. Aha, bejna wî ya dirêj. Aha, simbêlên wî yên reş î gir ko lêva jorê heta ya jêrê dinixumand. Aha, ew ruyê spî û gurover î xweşik. Aha, ew temberiya wî ya ji kêlekê ve hatibû vekirin. Aha, ew çavên wî yên reş. Aha, ew kenê wî yê bêhempa. Belê, belê ew bû.

Dengê Robîn ji xweber derket:

— Seydo!

Yê hember wî, serê xwe bi kêf bi kêlekê ve xwar kir û bişirî. Robîn kincên li wî bûn, nas kirin. Wî cara dawîn, ew di nava wan kincan de dîtibû. Qutikekî pîqut î spî û şalekî reş. Ruyê wî jî hê mîna berê dibiriqand.

— Robîn!

Çavên Robîn melûl diniherî. Mat bûbû. Heyirîbû. Herdu destên wî ketibûn jêrê. Situyê wî xwar bûbû.

Hemû hezkirina wî ya li hember Seydo, xwe di çavên wî re dida der. Çavên tije bûn. Xwe negirt; hêsirên germ hêdîka xwe bera xwarê da û herikîn. Dengê wî yê lerzokî bû axîneke kûr û di sînga wî re derket jorê:

— Seydo…

Destên xwe yên sistbûyî hêdîka ber bi wî ve dirêj kirin. Destên wî nedigihîştin Seydo.

Seydo bi destên xwe ve, di nav tariyê de cihek nîşan da û li wî aliyî niherî.

— Tu wê derê dibînî, Robîn?

Robîn li cihê ko wî nîşan dida niherî, lê ji tariyê pê ve tu tişt nedît. Çi qasî hewil da jî tiştekî din xuya nebû.

Seydo dîsa li wî cihê ko Robîn dikir û nedikir nikarîbû bidîtaya, niherî û dewam kir:

— Di nava bexçeyekî fireh re çemekî dirêj û xweşik diherike, Robîn. Ez herroj heta êvarî, li ber wî çemî me. Dengê avê û yê çivîkan tev li hev dibe.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Li wira, hertim bayê hênik tê. Tu kîjan celebê dar, nebat, giha û kulîlkan bixwazî, tu dikarî li wira peyda bikî. Tu kîjan celebê teyran bixwazî, tu dikarî bibînî. Çivîk, reşêle, quling, hechecîk, başoke, hudhud… Her celeb xweşî heye, lê ez bi hesreta dengê însanekî me, Robîn.

Serê xwe bi kerb kil kir û bera ber xwe da, dengê wî ji nişka ve hat guhertin:

— Ez pir bi tenê me, Robîn...

Robîn bi awayekî ko ew ê jî bi dû re lê ecêbmayî bimîne, jê pirsî:

— Ma qey tu hevalên te li vira tune ye?

Mîna ko li tiştekî bigere, herdu destên xwe rakirin û sekinî. Bi dû re hat bîra wî.

— Mesela, yên ko mîna te hatibin kuştin...

Seydo bêhnekê fikirî. Keserek kişand û dîsa bi eynî dengê xwe yê bikerb, got:

— Carinan…

Peyva xwe temam nekir. Kela girî ket qirikê. Xweziya xwe bi zorê daqurtand. Li çavên Robîn niherî û bîstikekê bi vî awayî ma. Lêva xwe gez kiribû. Bi dû re, berê xwe guhert û domand.

— Carinan dengê hin kesan tê min. Wê gavê, ez bi heyecan radibim û li dora xwe digerim, lê… lê…

Dîsa serê xwe bi kerb hejand û ji bo ko bikaribe bipeyive hebekî hewl da xwe û dewam kir:

— Lê tu kes nayên, Robîn...

Robîn dengê wî bi zorê bihîst. Ji ber ko li hember vê rewşa xedar, tu tişt ji destê wî nedihat, bêtir dev li lêva xwe dikir. Ji hêrsa dikira biteqiya. Di ber re, hêsirên wî hê jî bi giranî diherikîn.

Herduyan jî serên xwe bera ber xwe dan. Bi dû re, Seydo serê xwe rakir, ji serî heta binî li wî niherî, dilê wî bi halê wî şewitî.

Got:

— Ez pir aciz dibim, Robîn. Çima tu carinan bi ser min de nayî?

Robîn bersiv nedayê. Serê wî hê di ber wî de bû. Herdu jî bîstikekê bê deng sekinîn. Robîn di bin mijangên xwe re ziq li wî diniherî. Şûna mîrata guleyê nexuya bû. Serê xwe rakir û bala xwe da eniya wî. Li şûna guleya mirinê geriya. Divê li ser çavê wî yê rastê dewsa derbê hebûya. Ji ber ko wê roja reş, wê roja ko bajarek di şînê de vegevizandibû, guleya xezebê ji xafil de li paş stuyê wî ketibû û di wira re derketibû. Lê a niha, dewsa wê hatibû girtin.

Seydo dîsa serê xwe rakir û got:

— Robîn!

Destê xwe dirêjî wî kir. Dengê bayê bîstika din, xurttir bûbû. Ewrê ko Seydo li ser bû, her ko diçû bi dûrtir diket. Tarî dîsa diket navbêra wan. Xumamê xwe bera ser çavên Robîn dida. Êdî hema hema bi zorê hevdu didît. Dengê bayê ko êdî tam xurt bûbû, bi ser yê wî diket. Seydo ji bo ko dengê xwe bigihîne wî, bang dikir û dipeyivî.

— Robîn! Tu çi dikî, bikî û were. Min bi tenê nehêle.

Dengê Seydo di nava wê tariyê de olan dida û wenda dibû. Robîn xwast bide dû wî. Lê lingên wî hê jî nediliviyan. Destê xwe dipeland, sînga xwe bi pêş de diavêt. Nedibû. Kula dilê wî bû qêrîneke xurt û derket:

— Seydoooo!...

Seydo çû û di nava tariyê de wenda bû. Lê Robîn hê jî bang dikir:

— Seydoooo!..

Dengên wan hew gihîştin hevdu. Robîn dev ji hewildanên xwe berda û sekinî. Giriya. Bi dengê hêl giriya.

Diqîriya û digiriya. Qêrîn û giriyê wî agir bi dilan dixist. Her ko peyva Seydo ya dawiyê dihat bîra wî, orînek pê diket ko sawa wê bi ser wî bi xwe jî diket. Peyva herî taliyê, mîna kelemekê di dilê wî de rabûbû. Pir li ber xwe ketibû. Hey digiriya. Ji bo sekinandina vî giriyê hanê, tu hewil neda xwe. Bi dû re kûr kûra wî hêdî hêdî kêm bû. Deng jê biliya. Dengê Seydo yê ko jê re digot »were« hey di mejiyê wî de olan dida.

## 5. Hertiştî bi kuştinekê dest pê kir...

»Mirin ne ji bo yê ko miriye, ji bo yên ko li dû mane felaket e.«, *Epicure*

Gava çavên xwe vekirin, ji ber girî hê jî niqrîsk vedidan. Hêrsekê ew dabû ber xwe. Ruyê Seydo hê li ber çavên wî bû. Tişt miştên wê xewnê dîsa anîn bîra xwe. Ew tariya bêsînor, dengê azanê, tirsa wî ya ji Xwedê… Heta, cennet û cehennem jî. Bi dû re, li wî bexçeyê ko av tê re diherikî, fikirî. Wê xweşiya ko Seydo ji wî re behs kiribû… Ji vê dinyayê cida, dinyayeke din...

Wî jî nizanîbû, bê çawa dîsa di xew re çûbû. Bi dengê derî re, çavên xwe vekirin. Xuya bû, Bedirxan berî wî şiyar bûbû. Niha derdiket derve. Bêcemeyê Robîn li xwe kiribû. Piştî ko ji nav nivînan derketibû, hema milên xwe di qutikê xwe re rakiribûn. Gava di derî re derdiket, hê jî

bişkokên wî digirtin. Piştî ko ew derket, Robîn jî ji nav nivînên xwe rabû.

Bi dû re, diya wî Leyla Xanimê derî vekir û ket hindur. Robîn bala xwe da wê. Leyla Xanim pîrekeke dirêj û qelew bû. Fîstanekî gewr û gulgulî li wê bû. Leçekeke spî li serê xwe gerandibû. Di bin fîstanê wê re, delingekî di rengê fîstên de xuya dibû. Robîn xwe li xewê danî. Leyla Xanim çû nivînên Bedirxên pêçan û rakirin. Robîn jî bêyî ko deng bike, her li wê niherî. Leyla Xanim derket û çû.

Robîn diya xwe di rojên xerab de nas kiribû. Dizanîbû, bê ew çi qas xurt e. Heke ne ji bayê ko di çongên wê de bûya, niha dikarîbû qayiş bi ciwanan re jî bikişanda. Di zarokatiya wî de, giş li dora xwe dicivandin û ji wan re çîrokên dûdirêj û xweş ko tu carî ne ew, ne jî zarokên wê ji wan aciz dibûn, digotin. Rojên ko zarokên wê meraq dikir, bê diya wan çawa dikarîbû van çîrokan gişan bibêje û çawa giş dihatin bîra wê, bi kuştina Seydo re bi yekcarî qediyabûn.

Rojek ji rojên herî germ yên havînê bû. Kuçeya ko mala wan tê de bû, ji serî heta binî bi mirovên ko bi bûyerê hisiyabûn ve hatibû dagirtin. Wê şevê, ew û hin hevalên xwe, li mala dostekî xwe raketibûn. Serê sibehê, dengê zîla telefonê hatibû bihîstin. Mahzûbên xwe beriya herkesî gihandibû ahîzeyê. Bi dengê telefonê re, Robîn jî ji nav nivînan pengizîbû. Û gava mahdê mahzûbanê wî bi temamî qulipîbû û ahîze bi zorê dirêjî wî kiribû, ji tirsan bûbû wek sipiya firkandî.

Dengê di telefonê de, yê xwişka wî bû. Digiriya. Diqîriya. Li xwe dixist, dikir haho. Pepûk pepûka wê bû. Dengê pepûk û hahoya wê di felekan re derdiket.

— Pepûk pepûk! Haho, Robîno! Mala bavê min şewitî. Agir bi mala me ket. Haho, ji bo Xwedê, zû were.

Robînê ko hê xew ji ser çavên xwe neavêtibû û berê wec lê zer bûbû, êdî bi temamî ketibû tev. Lêvên wî lerizîbû û bi zorê gotibû:

— Keçê, te xêr e? Çi qewimiye?

Gava xwehê gotibû:

— Seydo!.. Seydo!

Bi peyva »Seydo« re veciniqîbû. Beyî hişê xwe peyivîbû.

— Tu dibêjî çi keçê? Çi bi Seydo hatiye?

Heyecan ketibû dilê wî jî. Tirsa tiştê herî xerab ew hêsîr girtibû. Hew dizanîbû, bê divê çi bigota. Gava xwehê gotibû; »Devê min bişikê, Seydo birîndar e«, wî gotibû qey tiştek ji dilê wî qetiyabû. Ya ko jê ditirsiya qewimîbû. Dest û lingên wî pê re sist bûbûn. Devê wî êdî bi zorê

geriyabû. Wecê wî weha zer bûbû, weha zer bûbû ko mirov digot qey xwînê xwe bi temamî ji damaran kişandibû û mirov çil xencer lê bixistana jî piça xwînê jê nedihat.

Wî jî nizanîbû, bê çawa pirsîbû:

— Kê berdayê? Haho!

— Em nizanin. Zû were! Belkî hûn negihêjin ser jî.

Robîn dê bi dû re têbigihîşta ko çi qasî bilezanda jî ew ê nikarîbûya bigihişta ser Seydo. Xwişka wî ji bo ko ew zû bihata û devê wê negeriyabû ko di telefonê de bigota »Seydo ji zû ve miriye,« rastî jê veşartibû. Belkî jî ji bêhişî weha gotibû.

Destê wî li ahîzeyê sist bûbû. Ew û ahîze bi hevdu re li erdê ketibûn. Dengê şingîniya ahîzeyê û yê gurmîniya wî tev li hevdu bûbûn. Gava hişê Robîn hatibû serê wî, dîtibû ko hevalên wî û mahzûbanê wan lewento dida ber bêvila wî. Hevalê wî Şêxo bi meraqeke mezin li wî niherîbû. Geh li mahzûbên niherîbû û geh jî li Robîn niherîbû. Wî texmîn kiribû ko hey tiştekî xerab qewimîbû, lê çi bû, pê nizanîbû. Şêxo ji niherînên wî tirsiyabû. Hew mabû ko ji meraqan ew jî biketa û bimira.

Her pirsîbû:

— Kî bû, lawo? Çi qewimiye?

Robîn nizanîbû, bê dê bi çi awayî jê re bigota. Ji xwe devê wî tev nedigeriya. Piştî ko bêhna wî hebekî hatibû ber wî, bi zorê gotibû:

— Mehabad bû.

Şêxoyê ko ew û Robîn bi hev re mezin bûbûn û wek birayê xwe ji wî hez dikir, bêtir ketibû meraqê. Tirsa wî mezintir bûbû; »Xêr bû, gelo? Mehabad çima vê şeveqê geriyabû?« Bes ji rewşa wî têgihîştibû ko tiştekî xerab bûye. Pirsên di hindurê wî de, ji nişka ve ji devê wî derketibûn:

— Xêr bû? Digot çi? Çi qewîmiye?

Pêlekê Robîn dabû ber xwe. Pêla heyecan û tirsê, pêla bêhêvîtiyê… Wek pelê çilo lerizîbû. Canê wî sist û giran bûbû. Nema dikarîbû li tiştekî din bifikiriya. Herdu destên wî yên sist bûbûn ketibûn ber wî û stuyê wî xwar bûbû. Devê wî bi dîsa zorê geriyabû û sê gotinên di jahra xemgîniyê de dakirî, bi dengekî lerzokî ji devê wî derketibûn û bûbû kûrkûra wî:

— Bera Seydo dane...

Şêxo di cihê xwe de sar mabû. Peyv jê çênebûbû. Destê xwe dabû ber eniya xwe û beyî ko li xemgîniya ko ji nişka ve xwe li wan girt hay bûbe, hema hêdîka çongên wî sist bûbûn û xwe bi dîwêr girtibû û xwarî erdê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bûbû. Çavên wî ji xwe berê tije bûbûn û hêsirên bêkontrol barandibûn.

Robîn, diranên xwe hişk şidandibûn. Qet tev neliviyabû. Mirov digot qey çi qêrînên ko hebûn, di hindurê xwe de dabûn ser hevdu û hindik mabû ko giş di devê xwe de biteqandana. Ne li ser hişê xwe bû. Çavên xwe di dîwarê hember de cit kiribûn û sekinîbû.

Şêxo jî ji hal de ketibû û dest bi niqrîska kiribû. Diviyabû tiştek bikira. Dilê wî ewqasî êşiyabû ko tu nemabû bisekiniya. Hevalên wî yên din jî hema di cihê xwe de mîna wan, weke ko di wêneyekî de bin, mat mabûn. Nema dizanîbû, bê dê çi bikira. Ger ne ji mahzûbên bûya, kî dizanîbû, bê ev rewşa hanê dê heta kengî dewam kiriba. Mahzûbanê wan ê ko di quncikekê de mat mabû û li wan temaşe dikir, ji nişka ve lê hay bûbû ko divê bilezanda. Ji ber vê yekê, bi dengekî biberger ji Robîn û Şêxo re gotibû:

— Ji bo Xwedê, rabin ser xwe! Divê em bilezînin.

Wê gavê, giş bi hevdu re rabûbûn, kincên xwe bi lez û bezê li xwe kiribûn, Şêxo ketibû milê Robîn, ew rakiribû ser piyan û bi bazdan berên xwe dabûn taxa mala wan. Gava di sûkê re derbas bûbûn, xelkê gişî li wan niherîbû. Heta ko ew ketibûn kuçeya mala Robîn jî wan nexwastibû bawer bikin. Lê, gava ko çav li wan însanên ko li herdu aliyên kuçeyê rêz bûbûn ketibûn, tirsa wan mezintir bûbû. Giş bi hevdu re rawestiyabûn û li xulxuleya mirovan niherîbû.

Rewşa qelebalixiyê, Robîn bêtir tirsandibû. Ji ber vê yekê, di nav qelebalixiyê re, dîsa dest bi bazdanê kiribû. Hevalên wî jî dabû dû wî. Mirovên xemgîn ên ko li ber dîwêr rûniştibûn, gava Robîn di ber wan re derbas bûbû, kiribû niçe niç û serên xwe bi kerb bera ber xwe dabûn.

Divê heta ko mirov bi çavên xwe nebîne bawer nake. Êdî ew jî baş têgihîştibûn ko tiştekî pir xerab hatibû serê mala wan. Deriyê hewşê vekirî bû, lê yê xênî girtî bû. Ne tiştekî xerab bûya, ev derî tu carî nedihat girtin. Robîn bi kulman, li derî xistibû û qêriyabû, da ko hin kes derî lê vekin.

Derî dereng vebûbû. Niha, nedihat bîra Robîn, lê kesê ko derî li wan vekiribû, ne ji mala wan bû. Hindurê xênî tarî bû. Pîrekan her li xwe dixist. Robîn li kesekî jimalê geriyabû. Li hindurê vî xaniyê ko tê de mezin bûbû, berê xwe şaş kiribû. Hema berê xwe dabû odeyekê. Ji wê odeyê jî xwişka wî Mehabad derketibû û çer ko çav li wî ketibû, mîna ko çav li Seydo ketibe, xwe avêtibû stuyê wî û giriyabû. Lê Robîn hey li cihê Seydo pirsîbû. Gava Mehabadê cihê ko pîrek li ser digiriyan nîşan dabû, Robîn tavilê berê xwe dabû wira. Pîrekan xwe ji ber wî dabû alî. Bi vî awayî xwe

gihandibû meytê birayê xwe. Qeweta Mehabadê têrê nekiribû ko wî zeft bike û rawestîne.

Meytê Seydo li ser textê yanê hatibû dirêjkirin. Ser wî jî bi betaniyekê hatibû nixumandin. Pîrekan hey li xwe dixist, diqîriyan û dûrik diavêtin ser wî. Gava Robîn çav lê ketibû, di nav wê qelebalixiyê de, mîna ko mirov ew dabe cereyanê, lerizîbû û şûşî erdê bûbû.

Çavên xwe li hewşa dawiyê vekiribûn. Mîtanî û Mehabadê av li serê wî dikir. Mîtanî hê teva atlêt û bêceme bû. Ji cerga ko meyt anîbû malê, derfet nedîtibû ko tiştekî li xwe bike. Ew jî bi dengên silehan beziyabû derve. Seydo hê nû ji malê derketibû. Tirs ketibû dilê wî. Çongên wî sist bûbûn. Heta ko xwe gihandibû cihê bûyerê, ji meytê birayê xwe pê ve tu tişt nedîtibû.

Yên ko deng bihîstibû, ji malên xwe derketibûn û hatibûn wira. Hişê Mîtanî ji serê wî çûbû. Çavên wî hew mabûn ko ji serê wî baz bidana. Ji xwe, piştî dîtina wî ya Seydo ya di wê rewşê de, heta ko Robîn hatibû jî ne peyivîbû, ne jî giriyabû. Bi çavên vala her li dora xwe niherîbû.

Niha jî Robîn ketibû şûna wî. Birayekî wî hatibû kuştin û meytê wî li hindur bû, yê din jî di destê wî de bû û bêhiş ketibû. Gotibû qey ew ê jî bimire û hindik maye di nav lepên wî de can bide. Ji ber wê, him av li ser û çavên Robîn kiribû, him jî giriyabû. Gava Robîn çavên xwe vekiribûn, giriyê Mîtanî hê jî dewam kiribû. Wan Robîn rakiribû û li ser kursiyekê dabû rûniştandin. Mîtanî Robîn himbêz kiribû û hêsir bi ser de barandibûn.

Di hewşê de, zilamekî birîh hebû ko li ser tifikê, di sîtilekê de av dikeland. Heta ko textek li hewşê dananî û bi dû re meytê Seydo li ser venexist jî Robîn û Mîtanî li sedema kelandina wê avê hay nebûbûn. Zilamên ko meyt anî û li ser text vexist jî li hebûna wan hay nebûbûn. Gava betanî ji ser meyt rakiribû û laşê wî yê spîboz derketibû ortê, bi qêrîna Robîn, li wan hay bûbûn. Wan wê gavê, ser meyt bi lez dîsa nixumandibû û ketibûn bin çengên herdu birayan û ew derxistibûn derve. Qêrînên Robîn yên ko ew ê bibûna sedema ketina dengê wî, dilên hemû kesên li wira bûn, lerizandibûn. Herdu jî mîna zarokan, belkî jî ji zarokan xerabtir, giriyabûn.

Li ber deriyê hewşê, diya wan Leyla Xanimê porê xwe kişandibû, ruyê xwe bi neynûkan çirandibû, herdu destên xwe ber bi jorê ve rakiribû û qêriyabû. Herçî Robîn û Mîtanî bû, gava ko çav li wê rewşa diya xwe ketibûn, weke ko şerm kiribûn, serên xwe bera ber xwe dabûn û bi ser


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hevdu de giriyabûn.

Leyla Xanima ko ruyê wê tije qeremûşk bûbû û ji ber kuştina Seydo ji ser hişê xwe ve çûbû, gava çav li wan ketibû, li wan zivirîbû û qêriyabû:

— Divê hûn agir bi vî bajarî bixin! Divê hûn agir bi Diyarbekirê bixin! Divê hûn heyfa Seydo hilînin! Hûn ê serên xwe rakin û bibêjin ko em kurê Leyla Xanima diya Seydo ne, em ê agir bi vî bajarî bixin, yan na ez şîrê li we helal nakim! Hema Seydo miriye, hûn jî bimirin!

Hey digot »haho!« û li xwe dixist. Mirov digot qey yên ko li hember wê bûn, ne zarokên wê bûn. Gava bi wan re peyivîbû, hê jî dev ji qeremûşkavêtina ruyê xwe bernedabû. Porê xwe jî bi hêrs ji kokê rakiribû. Leyla Xanim di xwînê de mabû. Xwîna wê û ya Seydo tev li hev bûbû û li kirasê wê belav bûbû. Xelkê gişî li wê niherîbû. Dilên wan jî bi wê û zarokên wê şewitîbûn û gelek ji wan di ber xwe de, bi dizî giriyabûn. Ew roj û ew rewşa diya wî ya wê rojê, dê tu carî ji bîra Robîn derneketa.

## 6. Xewn giş dibin kabûs...

Robîn rabû çû ber lawaboyê, da ko ser û çavên xwe bişo. Di neynikê re li xwe niherî. Porê wî tev li hev bûbû. Weke ko ne li xwe binere, lê li yekî xerîb binere, bala xwe baş da wî kesê di neynikê de. Li çavên wî niherî. Giriyê wî û psîkolojiya wî ya roja kuştina birayê wî, anî ber çavên xwe. Bi herdu destên xwe ve, hişk bi lawaboyê girt û diranên xwe pê re şidandin. Kîna dilê wî dîsa hestên wî li bin guhê hev xistin. Weke ko ji hinekan xeyidîbe û hêrs bûbe, serê xwe bera jêrê da.

Bîstikekê sekinî. Kanî vekir, destên xwe dan ber avê. Hinek av li ruyê xwe kir û şuşt. Bi dû re, destên xwe dîsa şil kirin û di porê xwe de dan, porê xwe bi paş de rast kir. Dîsa li neynikê niherî. Bala xwe da rîha xwe ya sêrokî. Destê xwe li ser ruyê xwe gerand û bala xwe da çavên kesê di neynikê de li hember wî sekinîbû. Di çavên wî de, li xwe niherî. Dilê xwe bi xwe şewitand.

Rahişt destmalê û çû hêwanê. Ji aliyekî ve jî dest û ruyê xwe zuha dikirin. Rahişt berçavka xwe û got:

— Roj baş.

Herkesî li dora sifrê, ji xwe re cihek zeft kiribû. Ji ber ko roja yekşemê bû, Mîtanî û Mehabad jî îroj neçûbûn kar. Mêvan jî hebû. Ji ber wê, ser sifrê qelebalix bû. Robîn jî hema xwe di cihekî de rakir û rûnişt. Hê ji tesîra wê xewnê û fikrên ko di pey wê re hatibûn û ew di nav xwe de veg-

evizandibû xelas nebûbû. Êdî li kû derê biniheriya, li kê biniheriya, ew roj dihat bîra wî. Ji ber wê jî hew dikarîbû li nên bifikiriya. Tiştek nedixwar. Vê yekê bala yên dora wî jî kişandibû.

Piştî taştê, sifre hat hilanîn û herkes ber bi cihekî ve vekişiya. Serdar û Meryemê di televîzyonê de li filîmekî temaşe dikir. Herçî filîm bû, li ser lawikekî deh-duwanzdeh salî û kûçikê wî yê biaqil bû. Resûl Begê bavê wan jî xwe dabû kêleka wan û bi wan re li filîm temaşe dikir.

Leyla Xanim jî çû fêkî anî û hat li cem yên din rûnişt. Mehabadê li medbexê firax dişuştin. Jina Mîtanî jî ketibû odeka xwe, li ber neynika xwe rûniştibû û meqyaja xwe dikir. Mehabad ji van tevgerên wê, ne razî bû. Ji lewre, gava ko sênik datanîn ser hev, dikir ko deng ji wan derkeve û biçe wê, da ko bûk li ber xwe bikeve. Karê wan ê herroj ev bû.

Qîzên malê û bûkê li hev nedikir. Gava yekê ji wan, xwe bi tiştekî bişitexilandaya, ya din tavilê gir ji wê digirt û wê jî tu kar nedikir. Heke dikir jî beyî dilê xwe dikir û pir deng derdixist. Wan bi vî awayî, hêrsa xwe nîşan dida û dilê wan rehet dibû.

Robîn çixareyek pêxist û yek jî da Bedirxên. Mîtanî weke hercar, çixareya xwe berî herkesî pêxistibû. Wan ji hev re behsa karên xwe dikir. Robîn jî di ser situyê xwe re zivirîbû û di pencereyê re li derve diniherî.

Ji kolanê dengê mekîneyan dihat. Keçikek û xortek, destên wan di hev de dimeşiyan. Li nav hêşinahiya ko li wî aliyê riyê bû, du-sê zarokan ji xwe re bi navê dilîst. Rojê tîrêjên ko çavên mirov jê biêşin li der û dorê belav dikirin.

Çivîkek hat û xwe li perpaza pencereyê danî. Robîn bala xwe da wê. Çivîkeke xweşik û piçûk bû. Çavên xwe yên mîna deqekê li dora xwe digerandin. Kêfa Robîn ji wê re hat. Xwast pencereyê veke, wê bigire û bîne hindur. Lê belê, hê ew li ser vê fikrê bû, çivîk firiya û çû. Çivîkeke din jî hat û herduyan xwe gihand hevdu. Li hewa, xwe teqil kir û li dora hev çûn û hatin. Bi dû re jî li pey hev bi dûr ketin û wenda bûn. Hişê wî jî bi wan çivîkan re çû.

Li hêwanê, bi hatina Mîtanî re li xwe zivirî. Wî nedîtibû ko Mîtanî ji cem wî rabûbû jî. Mîtanî kincên xwe li xwe kiribûn û ji bo çûyinê xwe amade dikir. Bedirxan jî rabû ser xwe û li wî niherî. Robîn nedixwast derkeve derve. Nedixwast li malê jî bimîne. Nema dizanîbû bê çi dixwaze. Lê divê biryarek bidaya. Li ser herdu alternatîfan jî biryareke li gora dilê xwe neda. Dît ko Bedirxan jî israr dike, ew neşikenand û çû kincên xwe bi awayekî bêdilî xwe li xwe kirin û bi wan re derket.

Dinya germ bû. Roja yekşemê, ji bo kesên ko li bajarekî mezin dijîn, ne roja kar bû. Piraniya kesan, wê roja xweş a betlanê, yan bi serîlêdana heval û hogiran, yan jî mîna wan bi seyranê derbas dikir. Tew heke bajarê ko ew lê dijîn, bajarekî dîrokî, xwedî kolan û avahiyên egzotîk û sûkên mezin be ko mirov tê de dikare wenda bibe... Bi ser de jî li kêleka behrê be… Mirov rojê li kolanekê, li sûkekê, li taxekê bigeriya jî nikarîbû ji vî bajarî têr bibûya. Li vî bajarê kevnare, di binê her kevirekî de, tiştekî esrarengîz hebû. Dîrok û nûjenî bi lihevkirineke ecêb di hindurê wî de dijîn ko hişê mirov nagihêjê û meraqa mirov pirtir dike.

Vî bajarê ko di dema xwe de, gelek siltan û împaratorên mezin, gelek alim û edîb, gelek leheng û mêrxas dîtine… Vê devera ko bi efsaneyên xwe yên ko hê jî nehatine jibîrkirin, bi şerên xwe yên li ser desthilatdariyê, bi dek û dolab û fesadî û bêbextiyên xwe yên ko bûne sedema kuştina gelek kesên bêguneh û bêsûc, bi entrîqayên xwe yên ko li serayên siltanên Osmaniyan û qesr û qonaxên ko nêzîkî wan hatine gerandin û bûne sedema perçebûyin û jiholêrabûna împaratoriyeke ko li çar aliyên dinyayê xof bera dilê gelek hikumdarên din dabû… Vî cih û warê fermanan, fermanên ko bûne sedemên talankirin, sirgûnkirin û tunekirina mirov û medeniyetên cida… Bajarê ko piştî ewqas sal û ewqas guhertinan, hê jî bi qasî ko mirov li xwe ecêbmayî bihêle, mezin û xwediyê bedewiyeke efsûnî... Ew bi her avahiyeke xwe ya dîrokî, ji hemû bajarên din cidatir e. Her niherînek meraqeke nû dixe dilê mirovan. Ev deverên weha ne ko xweziya mirov bi zemanên berê tîne.

Rojên betlanê, rojên gerê û kêfê bûn. Niha perav, park, qafeterya, sûk û sînemayên bajêr tije bûne. Kolan û kuçeyên wî bûne cihên gerê. Li ser pireyên wî yên dîrokî, masîgirên ko şewk di destên wan de, bi destê sîbehê re şûna xwe zeft kiriye... Keç û xortan ji rojên din bêtir xwe xemilandiye û derketine derve.

Mîtanî, Bedirxan û Robîn ji bo ko mîna herkesî xwe bigihîne cihekî gerê, li otobusa belediyeyê siwar dibûn. Mîtanî sê bilêt avêtin qutîka li ber şifêr. Çavên şifêr heta ko wî bilet avêtinê, li qutîkê bûn. Bi dû re, pê li bişkoka derî kir û derî bi gurmîniyeke mezin hatin girtin û otobus meşiya. Şifêr carê di neynika hember xwe re li rêwiyan diniherî. Çavên wî carê diçûn ser neynikê û diçûn ser riyê.

Ji ber ko cihên din giş tije bûn, hersê çûn û li ser paldankên dawiyê rûniştin. Ji xwe, paldankên dawiyê, bi dilê Robîn jî bûn. Ew kengî li mekîneyekê siwar bibûya, berê bala xwe dida paldankên dawiyê. Ji ber ko

gava mirov li pêşiyê rûdinişt tu tişt nedidît, wî tu carî dil tune bû ko li wira rûne.

Mîtanî û Bedirxan dîsa ketibûn peyvê. Di nav re carinan li Robîn diniherî. Robîn jî ji xwe re li rêwiyan diniherî. Ji her celebî însan hebûn. Herkê tiştek dikir. Yên di xew re diçûn, yên behsa maçên fûtbolê dikir, yên pirtûk dixwendin, yên di camê re li derve temaşe dikir, yên bi derdên xwe biliyabûn û diponijîn û yên mîna Robîn li dora xwe temaşe dikir…

Xortekî serê xwe bera ber xwe dabû û pirtûka ko danîbû ser çongên xwe dixwend. Robîn ew lawikê ko porê wî tim bela wela bû, nas dikir. Ji ber ko gelek caran di otobusê de, ew bi vî awayî didît. Ji wî bi wê de, yekî din rojnameyeke sporê dixwend. Dengê kesên ko bi hev re dipeyivîn tev li hev dibûn û di hindur otobusê de belav dibû.

Xortê ko pirtûk dixwend, pelek ji pirtûka xwe zivirand, serê xwe rakir û weke ko bixwaze têbigihêje, bê hatine kî derê, li dora xwe niherî. Bi dû re, dîsa berê xwe da pirtûka xwe. Keçikek li paş wî rûniştibû. Robîn ev keçik jî gelek caran dîtibû. Mala keçikê nêzîkî ya wan bû. Carinan, gava Serdar ne li malê bûya û bi xwe diçû ji xwe re rojnameyê bikire, wî ew keçik li der û dora sîteya xwe didît.

Ji bo ko balê bikişîne ser xwe, keçikê carê porê xwe girê dida û vedikir. Çi hunerên wê hebûna, giş pêşkêş dikirin. Çavên hemû xortên li dora wê, dageriyabûn ser wê. Xortekî bîst- bîst û pênc salî, li ser serê wê sekinîbû û ziq li wê diniherî. Keçikê qutikekî belek li xwe kiribû. Herdu aliyên qutikê xwe li ser nava xwe bi hev ve girê dabûn. Pêsîrdankê wê yê reş û serên çiçikên wê di bin qutikî re xuya dibûn. Bi xêra etegê wê yê kin û fireh, çîpên wê yên xweşik li derve diman. Ev taybetiyên wê, ji bo ko bala xortan bikişîne, bes bûn.

Lêwik niherînên xwe yên mestbûyî ji sînga wê daxistin ser çîpên wê. Hişê wî ji serê wî çûbû. Niherîneke wî ya ecêb hebû, mirov digot qey dike xwe bi ser keçikê de biavêje. Piştî ko keçikê dît, du-sê xortikên din jî bala xwe daye wê, ji qazî, mîna ko aciz bûbe, kir ufe uf û bi awirên tûj li dora xwe belav kirin. Her ko keçikê weha dikir, xortên ko li wê diniherîn, diketin ber fediyê, mîna ko sûcekî veşêrin ruyê wan sor dibû û berên xwe diguhertin.

Di hindurê otobusê de, bêhna parfumên cida cida û xwêdanê tev li hev bûbûn. Germeke weha hebû ko mirov difetisand. Digel ko hemû pencereyên otobusê vekirîbûn jî ji bayekî qels pê ve hewa nedihat hindurê wê.

Otobusê xwe bera ser riya jêrê da. Lawikê ko pirtûk dixwend, serê xwe dîsa rakir, li dora xwe niherî, pirtûka xwe bi lez girt û rabû ser xwe. Çû li ber deriyê ortê sekinî û pê li bişkoka derî kir. Lempeya piçûk ya li ser derî vêket, otobus li rawestgehê sekinî û deriyên wê vebûn. Gava ko lawik daket, çend kesên din di deriyê pêşiyê re siwar bûn. Bi dû re, derî dîsa hatin girtin û otobus meşiya.

Robîn bala xwe bîstikekê da Mîtanî û Bedirxên jî. Herdu hey li ser karên xwe dipeyivîn. Tew gava Mîtanî dipeyivî, mirov digot qey ji wî pê ve, tu kes nikare wî karî mîna wî bimeşîne. Herçî Mîtanî bû, gava diket peyvê, tew ko mijar li ser karê wî bûya, kesî hew dikaribû ew bisekinanda.

Mîtanî mîna hercar, rîha xwe kur kiribû û ruyê wî spîboz dibiriqand. Bi simbêlên wî yên reş û ziravik û porê wî yê kin ko temberiya wî hertim di kêlekê de vekirî bû, Robîn ew her dişiband şoreşgerên salên heftêyî. Wî ew dem hew ji pirtûkan û vegotinên ko ji wî re hatibûn kirin, dizanîbû û ew kes jî ji wêneyan nas dikirin. Ji tiştê ko ji wan di bîra wî de mabû, yê herî balkêş ew bû ko hemû şoreşgerên wê demê dişibiyan hevdu. Mirov digot qey gişan bi hevdu re biryar dabû ko kincên mîna hevdu li xwe bikin û rîha xwe û porê xwe mîna hevdu şeh bikin, simbêlên xwe jî heta ser lêva jêrê berdin.

Keçik rabû ser xwe û ber bi deriyê dawiyê ve hat. Robîn ji qazî, berê xwe da aliyê din. Keçikê heta ko Robîn li wê niherî, li wî niherî û ji bo ko bala wî bikişîne, hêdî hêdî bi porê xwe lîst û bi delalî bişirî.

Carekê, Robîn jî serê xwe rakir û li ruyê wê yê esmer î xweşik niherî. Niherîna wî bala keçikê jî kişandibû. Keçik jî ji bo ko hebekî din bala wî bikişîne ser xwe, daqûl bû û toza li ser sola xwe bi tiliyên xwe yên nazik paqij kir. Gava daqûl bû, bala Robîn beyî îradeya wî, çû ser memikên wê yên nermik ko zor didan pêsîrdankan û her ko diliviyan xweşiktir dibûn û tevzînok bi dilê yê ko bala xwe dida wan dixistin. Robîn jî gava li wan memikên xwêdayî yên li ser sîngeke gewr û nerm niherî, hema tu nemabû ko xwe biavêjê himbêza wê. Tevzînokên germ xwe li wî girtin û xwedanê di canê wî re avêt. Gava ko keçikê serê xwe rakir, wî bi lez berê xwe guhert. Ji ber ko hayê keçikê ji wî çêbûbû, ket ber fediyê.

Keçika ko porê xwe bi hereketeke nazik ko ew ê bi dû re ji Robîn re bibûya derdekî bêderman û her di bîra wî de bimaya, avêt paş situyê xwe, ji kêlekê de di bin mijangên xwe yên dirêj re li wî niherî. Bişirandineke ko di bedewbûna wê de roleke mezin dilîst, di bin wê bêvila zirav û piçekî

ber bi jorê de rakirî de, ji nav lêvên wê yên xweşik ên ko mirov hema dixwast têxe devê xwe û bimêje, xwe li ruyê wê belav kir. Wê gavê, Robîn beyî bizanibe ko ev niherîn dê wî bike hêsîrê xwe, berê xwe da wê û weke ko tê de wenda bibe, li wan çavên efsûnker niherî. Keçikê jî berê xwe ji wî nedida alî. Heta ko otobus sekinî, weha ma. Bi sekinandina otobusê re deriyên wê bi gurmîneyekê vebûn û keçik daket.

Derî dîsa bi eynî gurmîniyê hatin girtin û otobus meşiya. Robîn di camê re li meşa keçikê niherî. Bala xwe da bejina wê ya zirav. Bi dû re keserek kişand û di dilê xwe de got:

— Xwezî yarê, tu ya min ba…

Ji rawestgeha ko keçika xweşik daket, keçikeke din siwar bû. Lê li gora ya din, pir cida bû. Serê wê nixumandî û canê wê heta zendê girtî bû. Meşeke wê ya bi bixwebawer hebû. Robîn her ko yeka weha didît, li vê dinyaya dualî ecêbmayî dima.

Piştî bîstikekê, mekîneyê xwe da kêleka riyê û hemû deriyên wê vebûn. Piraniya kesên ko ji mekîneyê dadiketin, xwe ji mekîneyên din bi zorê xelas dikir û derbasî aliyê din î riyê dibûn. Ji aliyê riyê yî din, dengê qelebalixiya kolana Îstiklalê dihat. Ev kolan yek ji wan kolanên kevintirîn ên vî bajarê mezin bû û tim û daîm tije bû. Di orta wê re tramwayeke nostaljîk derbas dibû û dikir ko dîrokîbûna vî bajarî baştir were bîra mirov.

Gava bi gelek kesên din re derbasî aliyê kolana Istiklalê bûn, berê, Meydana Taksîmê ya fireh ko bûye cihê gelek çalakiyên hêzên mixalif xuya bû û bi dû re jî di nav şênkahiya dorpêçkirî de li ser abîdeyeke gewr, peykerekî reş û bilind hat pêşiya wan. Di wî pêykerî de, li pêşiyê sê-çar zilam diyar bûn. Li dû wan jî çend pîrek hebûn ko ruyên wan zelal nedihatin dîtin. Gişan dabû pey zilamekî ko gava xwe diavêt û ji kincên wî diyar dibû ko fermandarekî leşkerî bû. Li herçar aliyê vê abîdeyê, peykerin leşkeran mîna yê pêşiyê hatibûn danîn. Li aliyekî wî jî di nav du leşkeran de, mîtralyozek xuya dibû ko ji bo nîşandana dîroka vî welatî hatibû çêkirin.

Robîn bala xwe dabû vê abîdeya ko gelek caran di televîzyonê de derdiket. Bîstikekê lê temaşe kir û ji bo ko têbigihîje, bê ka ev abîde dixwaze çi bibêje, fikirî. Digel ko heta niha gelek carî di ber vê abîdeyê re bihurîbû, tu carî li tiştekî weha nefikirîbû. Ew jî li vê yekê hay bû û dev ji vê fikra xwe berda. Bi dû re li dora xwe zivirî û çavên xwe li Mîtanî û Bedirxên gerandin. Lê belê, tu kes li dora wî tune bûn.

Li aliyê kolanê niherî. Ew kolana ko bîstika din cihê meşê tê de tune bû,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

vala xuya dibû. Ne tu kes diçû û ne jî dihat. Ji der û dorê, tu deng jî nedihat. Wê gavê, Robîn valahiyek di dilê xwe de his kir. Tirsiya. Weke ko kabûsek dîtibe, çavên xwe bi tirs girtin û vekirin. Bayekî tenik hat û xwe li wî xist. Dîsa li dora xwe niherî. Kolan, rê û park- markên der û dorê, hindurê bufeyan, ber qulubeyên telefonê, meydan, kevirên dora meydanê ko kesên diwestiyan li ser rûdiniştin û li dora xwe diniherîn, kuçeyên ko derdiketin kolanê… Giş vala bûbûn. Û li wê derê pêjina însanekî jî nedihat.

Robîn bêtir tirsiya. Valahiya dilê wî mezintir bû. Meraq û tirs û heyecan di dilê wî de tev li hev bûn. Ecêbmayî mabû. Bêhna wî dikira biçikiya. Serê wî gêj bû. Tu nema bû ko ji tirsa biketa û bimira.

Beyî hişê xwe meşiya û hat ber kaniya piçûk ko şênkahiya li dora abîdeyê av dida. Destên xwe dan ber û tije kirin. Bi dû re jî ava di kefa destê xwe de girtibû, bi hêviya ko ji vî kabûsî şiyar bibe, bi şerpîniyekê li ruyê xwe kir. Careke din weha kir. Serê xwe da ber kaniyê û li ava ko li ber çavên wî diherikî erdê temaşe kir. Bi dû re, serê xwe yê ko av jê diniqutî rakir û ew tirs dîsa di dilê xwe de his kir. Wê gavê, mîna ko tiştin ji hindurê wî ji hev biqetin û jana xwe bidin der, rengê ruyê wî hat guhertin û çavên xwe bi kerb bi awayekî acizbûyî birin ser hev.

Her der mîna ko di tabloyeke bêînsan be, vala bû. Tu deng jî tune bû. Çû destê xwe li cama dikanekê xist. Serê xwe bir ber camê. Ji ber ko şewqa rojê dida camê, destê xwe ji xwe re kir sî û bala xwe da hindurê dikanê. Hindurê wê tarî bû û tu kes jî tê de tune bû. Zivirî, berê xwe da kolana Istiklalê û beyî ko bizanibe, bê ew ê çi were serê wî, meşiya.

Kolan bi rastî jî vala bû. Digot qey aniha ew ê hinek ji kuçeyekê derkevin û ji wî re bibêjin »henek bû« û bi wî bikenin, yan jî wî bitirsînin. Ew dikana ko hertim dengê muzîkê jê dihat jî girtî bû. Heta ber Lîseya Galatasarayê, hey çavên xwe digerandin û di her kuçeya ko dihat ber wî re serê xwe dirêj dikir û diniherî. Her gava didît ko her dever vala ye, bêhtir ditirsiya û bêhna wî diçikiya.

Bayek hat û porê wî li nav hev xist. Di pey wî re, şerqîniyek ji ezmên hat û baranê dest pê kir. Robîn di cihê xwe de sar mabû. Weke ko dixwast mahneyekê bide vê rewşê, bi çavên tijî meraq, li bûyerên ko diqewimîn diniherî.

Heyirîbû. Xwe ji ber baranê neda alî. Baran weke ko ji wî re bibêje »xwe ji ber min bide alî, bicehime biçe!« her ko çû, xurttir bû û der û dor di nav avê de hişt.

Kincên wî giş şil bûbûn. Berê, milên wî, bi dû re jî hemû laşê wî di nav avê de ma. Ser û çavê wî şil û pil bûbû. Ji ber ko berçavka wî jî di nav avê de mabû, hew dikarîbû tiştek bidîta. Berçavka xwe derixist û xist bêrîka xwe.

Kolan di nav avê de mabû. Av di bin lingên wî re diherikî. Dengê xuşiniya avê, ji bo ko mirov hêza vê tofanê fahm bike, bes bû.

Ji nişka ve, dengê şerpe şerpa lingekî din ji paş wî hat wî. Gava deng seh kir, veciniqî û bi tirs li xwe zivirî. Yek di bin baranê de, ber bi wî ve direviya.

Xortekî dirêj bû. Ji bo ko xwe ji peşkên avê biparêze, gavên xwe fireh diavêtin û bi serê tiliyan pê li erdê dikir û dihat. Ew jî di nav avê de mabû. Pirtûka di destê xwe de li ser serê xwe digirt û direviya. Gava ko Robîn çav li pirtûka wî ket, tiştên di derheqa lêwik de, di serê wî de zelal bûn. Robîn ew nas dikir. Ev lawik, ew xort bû ko di otobusê de pirtûk dixwend.

Lawik ji nişka ve çav li Robîn ket û ew jî mîna wî veciniqî. Bîstikekê li şûna xwe sekinî û bala xwe da wî. Bi dû re hat û li ber wî rawestiya. Weke ko hevdu nas dikin, dest bi peyvê kir:

— Ji bo Xwedê, ev çi ye?

Robîn jî beyî ko bersivekê bidiyê, li wî diniherî. Bi dû re, têgihişt ko herdu jî eynî tiştî meraq dikin. Lêwik vê carê, bi awayekî hêrsbûyî pirsî:

— Ma çima tu bi min re napeyivî?

Di bin wê barana xurt de, ji bo ko dengê xwe bigihîne Robîn, bi dengekî pir bilind dipeyivî. Hê nû hat bîra Robîn ko diviyabû bersivek bidaya wî. Wî jî weke ko ji berê de wî nas dike bersiva wî da:

— Ez jî nizanim. Birayê min û hevalekî me bi min re bûn. Ez niha nizanim bê bi kû de wenda bûne.

Mîna ko şerekî mezin li dora wan çêbûbû, lê ew nuh lê hay dibûn, li hevdu diniherî. Herduyan jî nizanîbû ko ew ê bi dû re hevdu gelek caran di rewşên weha de bibînin û ew ê bibin hevalên hev. Robîn dikarîbû texmîn bikira ko belaya li ser serê wan, yek e, lê nikarîbû nav lê bikira.

Nepeyivîn. Lêwik berê xwe bi jorê ve kir û li ezmên niherî. Baran. Hêrs. Lê piştî çend saniye derbas bûn, herduyan ji nişka ve li pey hev baz da û xwe ji ber baranê da alî. Hatin ber dikanekê. Lêwik lingê xwe rakir û pihînek li camê xist.

— Xwe bide alî!

Bi pihîna wî re, şerqînî ji camê hatibû û perçeyên cama şikestî li erdê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

belav bûbûn. Li pey hev ketin hindurê dikanê. Herçî dikan bû, bi qasî supermarketekê mezin bû û li ser refikên wê, hertişt hebû. Hindur tarî bû. Ji alavên wê bêhneke xweş dihat. Di gel ko wan dizanîbû, ew ê nikaribin tiştekî bibînin jî di hindurê dikanê de li xwediyê wê geriyan. Dîsa vegeriyan ber cama şikestî. Lêwik serê xwe derixist û li derve niherî.

Baran hê jî dibariya. Tiştekî nû tune bû. Kolan hê vala bû. Bîstikekê li valahiya wê niherî, bi dû re dîsa serê xwe kişand hindur.

Hêrsa wî xwe ji ruyê wî dida der. Awirên wî tûjtir bûbûn. Destên xwe dan kulêmekên xwe û mîna ko hinekan ew kêr kiribe, serê xwe bi kerb kil kir. Robîn digel ko lêwik ji wî re tiştek negot jî bi awayekî ko ew ê bi dû re, bi xwe lê ecêbmayî bimaya, ji niherînên wî tê derxist bê li derve çi dîtibû. Herduyan jî serên xwe bera ber xwe dan û li hember hev rûniştin.

Robîn pakêta xwe ya çixareyê ji bêrîka xwe derixist û lê niherî. Pakêta wî jî ji baranê qismetê xwe stendibû. Hêvî tê de nemabû, şil û pil bûbû. Ji neçarî, çavên xwe li refikên dîwêr gerandin. Çû û pakêtek ji ser refika çixareyan anî. Gavekê, rewşa xwe ji bîr kir û destê xwe ji adetî avêt bêrîka xwe, da ko pereyan derxîne. Ji nişka ve, li xwe hay bû û bi halê xwe keniya. Bi dû re, dîsa ji kerban, lêva xwe gez kir.

Lêwik careke din li derve niherî. Kes tune bû. Vê carê jî tiştek ji Robîn re negotibû û Robîn weke cara din ji niherînên wî fahm kiribû. Lawik hat û li şûna xwe rûnişt. Li Robîn niherî. Çavên wî sor bûbûn. Ji hêrsa xwe, dikira biteqiya.

— Hela ka çixareyakê bide min jî.

Wî jî çixareyek pêxist. Herduyan jî dîsa serên xwe bera ber xwe dan. Lêwik bê deng dest bi girî kir. Milên wî diricifîn û carê bêvila xwe dikişand. Robîn ranebû û neçû ba wî. Lê hey li wî temaşe kir. Dizanîbû ko ev jî mîna yên din xewnek e û gava dema wê bihataya, ew ê jî biqediya.

Lawik têra xwe giriya. Lê ji ber ko ji Robîn şerm dikir, pir hewil dida xwe ko dengê giriyê wî neçe Robîn. Lê belê, çi qasî hewil dida xwe jî Robîn dîsa bi giriyê wî dihisiya. Bi dû re, wî ê ji Robîn re bigotaya:

— Heke ez negiriyama, ez ê biteqiyama.

Gavekê, çavên wî yên sorbûyî, ber bi cama şikestî ve dageriyan. Dengê baranê hew dihat. Lê hay bû ko gava ew digiriya, baran sekinîbû. Wê gavê, herdu rabûn ser xwe û derketin derve. Kolan dîsa vala bû. Vê carê, Robîn jî kelogirî bûbû. Çavên wî hêdî hêdî tije dibûn. Dilên wan careke din şikestibûn. Mirov digot qey, herkes li keştiyekê siwar bûye û keştiyê daye nava behreke dadayî û çûye, an jî gava gihîştiye okyanûsekê, ser-

obinî bûye û ketiye binê avê û wenda bûye. Û bi tenê ew herdu ne di wê keştiyê de bûn.

Çavên herduyan jî werimîbûn. Bi tenê bûn. Wan hevdu baş nas nedikir, lê herduyan jî weke ko ev ji hevdu vedişart hereket dikir. Rabûn û ji bo ko li deverin din jî li hinekan bigerin, meşiyan. Kolan mîna ko hatibe şuştin, paqij bûbû. Bayekî hênik dihat. Ji ser banên avahiyan av diherikî. Ezman mîna ko xwe bi barana xwe şuştibe û xwe ji gemarê daweşandibe, dibiriqand. Kincên Robîn û lawikê ko ew ê Robîn bi dû re hîn bibûya ko navê wî Bişar e, hê zuha nebûbûn.

Bi şev jî nesekinîn. Bê serî li pey şopa însanên din geriyan. Di nav tariyê de û li bajarekî ko mirov digot qey navendên wî yên elektirîkê giş teqiyane û îflas kirine, ji kuçeyekê diketin kuçeyeke din, ji malekê diketin maleke din û diwestiyan. Nedixwastin rûnin. Mirov digot qey herkes ji ber wan direve. Li her deverê geriyan. Li her devera ko wan dikarîbû xwe bigihandayê...

Her ko ji maleke vala derdiketin, situyên wan xwartir dibûn. Pişta wan xûztir, qermîçokên dora çavên wan û eniya wan kûrtir dibûn. Gavên wan jî sisttir dibûn. Ji taqetê diketin. Hêviya dilê wan a ji bo dîtina hin kesên din, qelstir dibû û bitenêtî û aciziya wan jî pirtir dibûn. Êdî wan fahm kiribû. Ne bi dilê wan bûya jî li vî bajarî ji wan pê ve tu kes tune bû...

Robîn ê bi dû re ji xwe re bigotaya:

— Min tu carî kabûsekî weha nedîtibû ko wexteke ewqasî dirêj ajotibe. Min digot qey ew ê bêhna min biçike, ez ê tê de bigevizim û bifetisim. Lê piştî wê xewnê, ez têgihiştim ko di kabûsekî de, ji derveyî mirov tu kes nikare alîkariya mirov bike. Ji ber ko ji derveyî mirov, tu kesekî din di wî kabûsî de tune ye. Yên hebin jî bi tenê dikarin tirsa wî kabûsî hebekî din mezintir bikin.

Wî ê bigotaya:

— Mirov dizane ko ev xewn e, lê mirov nizane, bê çawa dibe.

Û wî ê bigotaya:

— Herkes xewnên xweş dibînin, xewnê herkesî li gora dilên wan in; lê ez her kabûsan dibînim.

Herduyan Stenbol li bin guhê hevdu xist, dîsa tu tişt nedît. Yan jî gelek tişt dîtin. Pireyên teng û rêyên dirêj ên vala, kuçeyên bêzarok, xaniyên ko hatine terkkirin, wêneyên bêxwedî; nameyên ko hê nehatine xwendin û ew ê tu carî jî neyên xwendin, roman û helbestên nîvcomayî; pêsîrdankeke ko ji ber lezê, li mala zilamekî azib hatiye jibîrkirin... Fermanên

ko bi dizî hatine îmzekirin, fermanên ji bo kuştina gelek kesên navdar; kaniyên kerxaneyan yên vekirîhiştî, cidayetiya di navbêra xaniyên xizanan û dewlemendan de; îşkencexaneyên veşartî, rêyên ko bi tenê mirovên ko ew kolane pê dizanin, rêyên di bin erdê de hatine vekirin û ji bin girtîgehekê derdiketin kêleka behrekê…

Robîn her ko ew tişt bianîna bîra xwe, dê ji xwe re bigotaya:

— Piştî wî kabûsî, ez têgihiştim ko ez bi tu gûyê xwe nizanim.

Pir geriyan. Li şopa tiştekî zindî rast nehatin. Deryaya Marmarayê bê xem diherikî û ava ko ji Deryaya Reş dianî, di ser Egeyê re, di nav bêhna mozaîka gelan û çanda wan ya talankirî re, digihand Deryaya Sipî; deryaya ko gelek şerên giran li ser wê çûbûne û bi dû re jî ji bo wê sitranên herî xweş hatine gotin.

Li ser pireya Boxaîçîyê sekinîn. Westiyabûn. Porên wan tev li hev bûbûn. Rîhên wan dirêj bûbûn. Piştên wan ên xûz û gavên wan ên sist, ew dikirin mîna du kalên sedsalî. Enîşkên xwe danîn ser hesinên pireyê û bi çavên kortçûyî li deryaya bêdawî niherîn.

Bişar beyî ko li Robîn binere, bi dengekî pir bikerb got:

— Kes tune ye…

Û tu tiştekî din ji devê wî derneket. Robîn li Bişêr niherî û wî jî bi kerb got:

— Ka tu dibêjî, em çi bikin?

Gava dipeyivîn dengê wan diricifî. Mirov digot qey ji binê erdê dipeyivîn û gava ko dengê wan derdiket ser ruyê erdê, bayekî kur lê dixist. Çavên Robîn li sînorên deryayê yên bêdawî bûn û li benda bersiva pirsa xwe sekinîbû. Deng ji Bişêr nedihat.

Westiyabû. Hingî westiyabû û aciz bûbû, di xwe re nedidît ko li wî bizivire jî. Heta ko dengê xuşîna avê hatê jî li benda bersivê mabû. Bi dengê ko ji avê hat, li xwe zivirî û dît ko Bişar ne li şûna xwe ye. Bi lezekê li dû xwe zivirî û çavên xwe li dora xwe gerandin. Bişar wenda bûbû...

Berê xwe nedayê û li behrê neniherî. Mîna ko bombeyek di hindurê wî de teqiyabe, dilê wî êşiya. Êdî bi tena serê xwe mabû. Wî xwast ko xwe di pey Bişar re biavêje. Lê, her ko sînga xwe digihand hesinê pireyê, diket dudiliyê. Nizanîbû ji bo çi ye, lê newêrîbû xwe bikuşta. Cesaret nekir. Destê xwe kir hutik û ji kerban, bi hemû qeweta xwe ve hişka li hesinî xist. Dengekî xurt ji hesinî derket û di hesinên din de olan da.

Serê wî gêj bû, lê zû hat ser xwe. Kela girî xwe li qirika wî girt. Qerisî. Çîpên wî hew dikarîbû giraniya laşê wî hilgirta. Gêjbûna serê wî bêtir bû.

Ber çavên wî reş bû. Rengê ruyê wî pê re hat guhertin. Çongên wî ji xweber fisiyan. Gava çongên wî difisiyan, herdu destên wî bi kêleka wî de ketibûn. Hemû laşê wî, bi carekê di nav êşekê de gevizî û li erdê ket. Xwîna wî hew herikî. Çavên wî hatin girtin.

Bi dû re, wî ê li ser vê bûyerê, ji xwe re bigota.

— Min got qey ez bi rastî jî mirime.

Bi ketina wî ya erdê re, hemû mirovên li wê dorê, weke ko li tiştekî nedîtî rast hatibin, li ser serê wî civiyan û di nav xwe de her peyivîn. Heryekî li gora xwe behsa sedema ketina Robîn dikir. Qelebalixiya ko li dora wî diciviya, her ko diçû mezintir dibû. Mîtanî û Bedirxan ecêbmayî mabûn û li Robînê ko di nav destê wan de, ji nişka ve ketibû erdê û bêhiş ketibû, diniherî. Tiştekî weha tu carî nehatibû serê wan. Mirov digot qey dest û lingên wan hatibûn girêdan, serên wan gêj bûbûn û bi çavên xwe yên dikira ji serên wan baz bidaya, hey li dora xwe diniherî. Belkî li ruyekî nas ko bikaribe alî wan bike digeriyan, belkî jî li bende bûn ko Robîn bi xwe şiyar bibe. Lê tiştekî din hebû ko ji awirên ewqas însanan aciz bûbûn û hema dixwast zû bi zû Robîn rakin û ji wira bi dûr bikevin.

Yekî digot:

— Avê bînin, avê!

Yekî din digot:

— Erê erê, av baş e. Avê li serê wî bikin!

Dengên niçe niçan û wax waxan tev li hev dibûn û dikir ko Mîtanî û Bedirxan bêtir aciz bibin. Bi dû re, Bedirxan du-sê şîrmaq li Robîn xistin û bi Mîtanî re hey mîna ko ji binê bîreke kûr û tarî bangî wî bikin, bi dengekî bilind navê wî digot. Carekê, mijangên Robîn yên dirêj tev liviyan, bi dû re mîna ko êşeke pir xedar dikişîne çavên xwe hişk girtin. Xwe bi ser kêlekê de qulipand, bi zikê xwe girt û wê gavê, dengê nalîneke kurt ji devê wî hat bihîstin.

Mîtanî û Bedirxan beyî ko zanibin, bê divê çi bikin, serê wî û destên wî mist didan. Bi dû re Bedirxan rabû û ji bo ko qelebalixiya ser serê wî biqewirîne, destên xwe kil kirin û bi wan re xeyidî:

— De vekişin, hela vekişin!

Tu kes venedikişiya. Mirov digot qey wan li filîmekî weha temaşe dikir ko destê wan jê nedibû û ji ber vê yekê, dîsa bi şûn de dihatin. Bedirxên bi awayekî hêrsbûyî çavên xwe girtin, herdu destên xwe rakirin û mîna ko di xortaniya xwe de kiribû, weke pêxwasekî Diyarbekirî, bi tirkî bi dengekî weha qêriya ko kesên dora wî jê tirsiyan.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Açilin laaaan!

Herkesî bi deverekê de baz da û belav bûn. Vê carê jî ji dûranê li wan temaşe dikir. Gava Bedirxên qelebalixiya dora xwe diqewirand, Mîtanî jî bi Robîn girtibû û ew radikir ser piyan. Bi dû re, polîsek hat li ser serê wan sekinî. Mîtanî tişt miştin jê re gotin. Wî jî copê xwe derxist û alî Bedirxên qelebalixî belav kir û çû.

Her yek ketin bin milekî Robîn û ew li kêleka peykêr, li ser kevirekî dan rûniştandin. Mîtanî bi awayekî ko dilê wî bi birayê wî dişewitî, bi heyecan got:

— Çi bi te hat, lawo? Te em tirsandin, ha!

Robîn jî nizanîbû, bê çi hatibû serê wî. Bes dizanîbû ko tiştê hatibû serê wî, ne tiştekî baş bû. Ji lewre, ew jî li hember vê nexweşiya nû, mîna yekî ko cinawireke mirovxwir dîtibe û ji tirsa lal bûbe, bi çavên xwe yên tije meraq li dora xwe diniherî, bala xwe dida wê qelebalixiya dora xwe, li kevokên li meydanê diniherî, bêhna xwe dikişand û qet dengê xwe jî dernedixist. Bi dû re, Mîtanî û Bedirxên dê ji daketina wan ya ji otobusê û heta Robîn bêhiş ketibû erdê, ji Robîn re ta bi derziyê vekira. Wan dê behsa ecêbmayinên xwe, qelebalixiya biheyecan ya li dora wan civiyabû, rewşa wî ya li erdê, gava xwe bi ser kêlekê ve qulipand û bi zikê xwe girt û mîna ko janek dikişand naliyabû, sîleyên ko li ruyê wî dixistin û tirsa xwe bikira. Bes Robîn dê tu carî ne ji wan re û ne jî kesekî din re behsa vî kabûsî û yên ko li dû wî dihatin bikira.

Carinan wî dê ji xwe re bigotaya:

— Kabûs jiyaneke din e. Ji yê ko ew kabûs dîtiye û pê ve, tu kes ne dikare têbigihêje û ne jî mahneyekê bidiyê.

Ji lewre, gava Mîtanî pirsa xwe dubare kir, ji wî re gotibû:

— Ez nizanim, hema ji nişka ve serê min gêj bû. Min ber xwe nedît û ez ketim erdê.

Herçî Mîtanî bû, wî dê baweriya xwe bi vê bersivê neaniya û her meraq bikira bê çi bi serê birayê wî hatibû ko birayê wî jê re nabêje. Wî dê birayê xwe her di rewşeke acizbûyî, an jî liberketî de bidîta. Ji ber vê yekê, ew ê têbigihişta ko tiştin ji wî têne veşartin û nayên gotin. Di ber re jî ew ê bêtir li ber birayê xwe biketa û ji bo ko dilê wî xweş bike, wî dê betir hewil bidaya xwe.

Ji kuştina birayê wan î mezin Seydo û heta wê rojê, ji xwe di navbêra herdu birayan de nêzîkbûn û hezkirineke mezin peyda bûbû. Vê rewşa nuh, dê ew bêtir bi hevdu girê bidana, hezkirina wan xurttir bikira.

Mîtanî dê Robîn her têxista şûna Seydo û hereketên wan bişibandana hevdu. Ji ber vê yekê, wî dê di dilê xwe de, cihekî weha bidaya Robîn ko tu kesî nikarîbû lê bifikiriya.

## 7. Têkçûyin li navê mirov napirse…

»Bîranîyên min nenivîsîne, hinkes dibêjin qey dîrok e...«, *Ahmet Tellî*

Li malê şîv dihat xwarin. Resûl Beg rahişt sênîka xwe û derbasî odeka din bû. Hemû kufletê wî li hêwanê li ser sifreyê bûn. Gelek caran weha dikir û li cem zarokên xwe rûnedinişt. Herçî Resûl Beg bû, piştî kuştina lawê xwe, weke ko ji hemû dinyayê xeyidîbe, li cem tu kesî rûnedinişt. Di vêya de, tesîra emeliyata qirika wî jî hebû. Piştî emeliyata qansêrê, bê têlên dengan mabû û ji ber vê jî hew dikarîbû bipeyiviya.

Resûl Beg, ew mirovê ko di dema xwe de zilamekî li ser xwe, girs û qelew bû û gava ko li Diyarbekirê dimeşiya xelk ji ber wî radibûn ser piyan, bi carekê ketibû, lawaz bûbû. Işaretên vê rewşê, dê xwe di roja kuştina lawê wî de xuya bikira û Resûl Begê ko gelek caran tengasî kişandibû, lê tu carî weha belengaz nebûbû, dê pişta xwe bidaya dîwarekî, serê xwe bera ber xwe bidaya û digel neçariya xwe ya li hember kuştina Seydo û kerba xwe, bi dizî bigiriya.

Resûl Beg ji malbateke mezin bû. Kalikê wî, Silhedînê Mîrxo, berî şerê dinyayê yê yekem ko bi dû re dê sînor têxista nava merivên din, tevî çend malên xwe li deşta Diyarbekirê gundek kirîbû û li wira bi cih bûbû. Di serî de, bi kar û barên xwe bala xelkê gişî kişandibû ser xwe. Ji ber ko Silhedînê Mîrxo alimek bû, xelkê wê dorhêlê, xwe li wî girtibû. Silhedînê Mîrxo û zarokên wî, piştî ko bi temamî bi cih bûbûn û dostaniya eşîrên cîran qezenc kiribû, ji bo ko şerên di nav eşîrên der û dorê de ko gelek mêr ji hev kuştibûn nemîne, heta jê hatibû hewil dabû û bi vî awayî gelek eşîr li hevdu anîbûn. Ew bi xwe bûbû dostê Şêx Seîdê Pîranî jî û di nav wan de, hezkirineke mezin peyda bûbû. Lê çi feyde, dilê Silhedînê Mîrxo li hember kuştina hevalê wî debar nekiribû û sekinîbû.

Bi dû mirina Silhedînê Mîrxo re, malbat hebekî ji hev belav bûbû û nexweşî ketibû nava wan û êşîrên cîran jî. Kurê wî Elîxan Beg, nexwastibû dijîtiya nav eşîran kûr bibe. Ji ber vê yekê, bi her eşîrekê re, bi awayekî dostanî danîbû. Kirîvanî yek ji wan pêşîlêgirtinan bû. Bi vî awayî, xwastibû pêşiyê li nexweşiya nav eşîran bigire û dostaniyê nuh


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bike. Bi dû re, xweha xwe ji xwe re kiribû berdêlî û qîzek ji eşîreke cîran anîbû. Wê gavê, eşîrên din jî hem ji bo xatirê Silhedînê Mîrxo û dostaniya wan a berê, hem jî ji bo hewildanên Elîxan Beg ên aştîxwaz, tevî hemû zilamên xwe hatibûn daweta wan û govend geş kiribû.

Resûl Begê kurê Elîxan Beg, hê di xortaniya xwe de, bi jîrîtiya xwe û bi hurmeta xwe ya li hember însanan, hezkirina herkesî qezenc kiribû. Li gel çend deverên din, li medreseya Cizîrê jî xwendibû, Lê ji ber nexweşiya bavê xwe, dev ji medreseyê berdabû û ji ber ko umrê wî mezin bûbû, li ser daxwaza bavê xwe, bi keça Temîr Axayê dostekî Elixan Beg, bi Leylaya ko dê çar law bidana wî re zewicîbû.

Pez û dewarên wî nedihatin hejmartin. Bi hezaran donim erdên wî hebûn. Meriv pê disekinîn. Li ber barê gelek mirovan radibû. Hema ko mirov ketibe tengasiyekê û carekê berê xwe dabe gundê wî û xwe li wî girtibe, wê gavê nabûn tune bû. Odeya wî hertim tije bû. Li odeyê, qehweya tal tim û tim amade bû. Gava mêvan dihat, şingîniya misînên qehweyê û hime hima zilaman û bêhna qehweya tahl tevî hev dibûn. Vê adeta qehweya tahl jî bi destbirakê wî yê eskeriyê re ji beriya Mêrdînê hatibû gundê wî. Û piştî ko destbirakê wî ji ber dijminatiyê û mehkûmiya ji ber wê, li ba wî sê salan mabû, êdî qehweya tahl bûbû perçeyekî jiyana gundê wî.

Lê rojekê, pêleke mîrata fesadiya eşîran hat û dostanî û aştî dan ber xwe û Resûl Beg ji ber kuştina du pismamên xwe, li hemberî eşîreke din mecbûrî birêvebirina şerekî eşîrî bû. Dijminatiyê jiyana wan bi temamî guhertibû. Êdî, nifşên nuh di nav dijminahiyê de mezin dibûn. Bi hisên heyfhilanînê, bi kîn û nefreta li hember eşîra dijmin xwedî dibûn. Wan û dijminê xwe ji salên şêstî û heta dema lihevhatinê, bi dehan mêr ji hevdu kuştibûn. Bi dehan jin bî mabûn û bi sedan zarok jî sêwî…

Lê belê her ko dem di ser re diçe, civat tê guhertin û ev guhertin rengê minaqeşeyên nava malbatan diguherîne. Zarokên xwende, xortên şiyar vê yekê bê mahne dibînin û tu carî nafikirin ko êdî rahêlin silehan û bera xortên eşîra din bidin. Berê pesnê dijminatiya eşîran pir dihat dayin, lê di bin tesîra wê atmosferê de, mirovên eşîran bi xwe, xortên wan, keçên wan ji navê dijminatiya eşîran fedî dikir û dixwast rojekê beriya rojekê vî navî ji ser xwe biavêjin û pêvajoya telefbûna malbatan a bi vî awayî rawestînin. Rîhsipiyên herdu eşîrên ko heta niha bi dijminatiyê hevdu mahf kiribû, piştî wan guhertinan û tecrubeyên salan jî bi ser de, xatirê xortan û camêrên herêmê neşikenandibû û nexweşiyeke mezin derman

kiribû. Piştî wê jî odeya wî ji berdêla fesadiya ko dijminahî kûr dikir, bûbû cihê minaqeşeyên pirsên cida. Herroj mirovên cida, xortên nûhatî dihatin ba wî, minaqeşeya fikrî bi wan re dikir. Carinan, du grûpên cida li ba wî li hevdu rast dihatin. Wê gavê, gundî hemû li dora wan diciviyan û li minaqeşeya herdu grûpan guhdarî dikir. Odeya wî, bûbû dibistaneke nû. Şevbihêrkên wê bûbûn dersên balkêş û bifêde. Lê, Resûl Beg her wê demê ji xortan re digot; »Lawo, piştî kurmanciya reş û zazakiya xweş hebin, hûn ji bo çi devê xwe xwar dikin û bi zimanekî din minaqeşeyê dikin. Gundî ji we tiştekî fahm nakin.« Ji ber ko li odeya wî, heta wê gavê, ji derveyî memûrên dewletê û cendermeyên qereqolê, suhbet her bi kurdî bû. Kurdî zimanê odeyê bû. Lê, qeweta wî nedîgihişt ko vêya biguherîne, ji ber vê yekê, pêlê ew jî gundiyên wî jî dan ber xwe. Tevî vê jî dilê wî qet ne rehet bû.

Dewran hat guhertin. Pêleke xezebê hat bi ser wan de. Pêleke din û pêleke din… Û wan xwe nema li ber girt. Ji xwe, ji dema dijminatiyê û vir de, maleke wan li Diyarbekirê bû. Ji ber vê yekê, Resûl Beg nîvgundî û nîvdiyarbekirî dihat hesibandin. Piştî ko beriya ko Seydo bê kuştin bi şeş salan, leşker cara dawiyê hatin û li dewsa bênderan, hemû zilam li pêş çavên pîrekan şilf î tazî kirin û pêtiyê agirê ko bi xaniyan ket, di ezmanan re derket û dûmaneke şewatê ya reş ezmanê gundê wan bi temamî nixumand, êdî ji mecbûrî, biryara xwe da.

Heta wê gavê, bi zorê îdare kiribû. Lê gava gundê wan bi temamî hat hilweşandin, cih û war li ber wan hat xerakirin û bi vî awayî kêr gihîşt hestî, wan jî wek gelek kesan, erdên xwe yên ji ber zilmê, bi salan nehatibûn çandin, li dû xwe hiştin û mala xwe ya mayî jî bi temamî bar kir û anî danî ser mala din.

Li Diyarbekirê jî li ber barên gelekan radibû. Mala wî dîsa cihê suhbetê, cihê sitarê, cihê baweriyê bû. Seydo hêdî hêdî bûbû sermiyan û kêfa Resûl Beg bi qasî dinyayekê jê re dihat. Dora wî hertim qelebalix bû. Seydo ne ji bo malbatê, lê herweha ji bo dora xwe jî bûbû hêviyek. Û piştî barkirina wan bi şeş salan, xezeba tarîtiyê bûbû du gule û xwîna sor herikandibû.

Bi dû kuştina lawê wî yê mezin Seydo re, piştî çend tehlîlan doktoran biryara emeliyatê dabû. Wî çi qasî li ber xwe bidaya jî dê bi zora zarokên xwe, li Enqereyê du emeliyatên ko dê ew pênc mehan ji welêt bi dûr bixista û heta dawiya umrê wî tesîr li wî bikiraya, bihatana kirin. Û bi vî awayî, Resûl Beg dê bibûya nîvzilam.

Ew zilamê li ser xwe ko peyva wî li ba xelkê pere dikir û di dema xwe de, bi camêrtiya xwe ve dostaniya herkesî kezenc kiribû û xatirê wî li ba xelkê pir bû, niha fedî dikir ko bi zarokên xwe re şîvê bixwe. Ew ê carinan bi zora kufletên xwe bihata ser sifreyê, lê dîsa jî ji ber ko ji wan fedî dikir, wî ê dev ji vê adeta xwe bernedaya.

Kêfa wî bi tenê ji tiştekî re dihat. Gava zarokên xwe yên mayî bi hevdu re didîtin, ev kêf di dilê xwe de his dikir. Wê gavê, kêfa wî ewqasî dihat, tu nedima ko ji kêfan bask pê şîn bihatana û bifiriya. Niha, her çi qasî zarokên wî dikarîbû bi serê xwe bijiyana jî wî hê xwe li hember wan berpirsiyar his dikir û digot qey heke ew nebe, ew ê zarokên wî ji hevdu bela wela bibin û nema bikaribin bi ser hev de werin.

Wî çi bixwastaya, tavilê dihat ber wî. Zarokên wî nedihişt, ew destê xwe di ava sar û germ de dake. Carinan, Robîn ji bo ko li malê aciz nebe, ew bi xwe re derdixist derve û digerand jî. Carinan jî ew û bermaliya xwe Leyla Xanimê bi hev re derdiketin û li bajarê ko wan ê tu carî jê hez nekira digeriyan. Ji ber ko bi zimanên wan nizanîbû û xwe dûrî wan didît, zêde nediçû qehwexaneyên ixtiyaran yên nêzîkî mala xwe jî.

Ji ber şerwal û êlegê wî, carinan hin zilamên ko wî ew nas nedikirin jî silav didanê. Gava derdiket derve, yên ew bidîtaya, ew nas nekira jî ji meşa wî û niherînên wî dizanîbû, bê wî çi qasî derd kişandiye.

Li malê, ji bo wî odekek hatibû veqetandin. Teyba ko wî bi xwe ji welêt anîbû, li odeyê hatibû danîn. Di wan rojên wî de, teyba wî û kasetên wî yên şixulê dengbêjan, ji wî re bûbûn heval.

Zimanê wî çepikên wî bûn. Bi çepikan bangî yên dora xwe dikir û bi piste pistan derdê xwe bi zorê bûya jî bi wan dida fahmkirin. Ew zilamê ko bi peyveke wî eşîrek radibû ser pêyan, bûbû mîna zarokan êdî. Ji tiştê herî piçûk jî dikarîbû kêfek werbigirta û li çepikan bixista.

Piştî şîvê, Robîn rabû çû odeka wî ko ji wî re bibêje »were çayê vexwe.« Deriyê odeka wî, weke hercar girtî bû. Guhê xwe da derî û guhdarî kir.

Ji hindur dengê kilamekê dihat. Têgihişt ko bavê wî dîsa li ber teybê rûniştiye. Belkî sed kasetên wî yên weha hebûn. Çi yên ji welêt anîbûn, çi yên ko bi dû re jê re hatibûn şandin, çi yên ko heval mevalên Mîtanî ji wî re dianîn…

Robîn derî vekir û ket hindur. Resûl Beg bi wî nehisiyabû. Li ber kilamê ji ser hişê xwe çûbû û xwe li gora dengê dengbêj kil dikir.

... erê lo lo, erê lo lo

lo çeleng û xortê eşîra Mîr Izedîno, lo lo
lo siwarê gundê mino
ma çawa bû ko tu bi tena serê xwe û destvala
di nava eşîra dijminê xwe de mayî, lo lo
de lehengê dilê mino lo
berdilkê keçikên gundê mino, aaax ay...

Dengê dengbêj li odeka nîvtarî belav dibû. Robîn li dora bavê xwe zivirî û hat li pêşiya wî sekinî. Beyî ko tiştekî bibêje, li wî niherî. Serê Resûl Beg di ber wî de bû. Robîn li ber wî daqûl bû. Digel ko dizanîbû, bê ew ê çi bibîne jî serê xwe xwar kir û li ruyê wî niherî û got:

— Tu çi dikî, bavo?

Deng ji Resûl Beg derneket. Gava Robîn çavên wî yên sorbûyî ko li jêrê diniherîn dîtin, têgihişt. Resûl Beg digiriya. Robîn bavê xwe careke din di vê rewşê de dîtibû. Roja kuştina Seydo jî li ber derî weha rûniştibû û bi dizî giriyabû. Vê carê jî eynî mîna wê carê, weke zarokekî ko hinek li ber çavên wî tahdeyê li bavê wî bikin û ew nikaribe bavê xwe xelas bike, qeherî û bêhna wî teng bû. Dilê wî ji ber hêrsa wî rabû û daket. Çavên wî ji nişka ve sor bûn. Kesereke kûr kişand. Bîstikekê li hemberî hev bê deng rûniştin.

Resûl Beg ji bo ko Robîn bi giriyê wî nehise, serê xwe ranekir. Robîn jî weke ko hayê wî ji giriyê Resûl Beg tune be, hereket kir. Resûl Beg jî dizanîbû ko Robîn bi wî hisiyaye, lê belê ne wî û ne jî Robîn ji kesî re behsa vî giriyî kir. Bi dû re Robîn destê xwe dirêj kir û teyb girt. Dengê kilamê biliya. Rabû ser xwe û got:

— Heke tu dixwazî çayê vexwî…

Hew deng ji wî hat. Kela girî xwe li qirika wî jî girtibû. Dengê wî dilerizî. Rewşa wî, bala Resûl Beg jî kişandibû. Ji bo ko lawê wî nekeve ber fediyê, hewil da xwe û beyî ko serê xwe rake, aliyê derî nîşan da û destê xwe mîna ko bixwaze tiştinan bibêje kil kir.

Resûl Beg piştî ko hebekî hat ser xwe, hêdî hêdî rabû, çû destmêj girt. Bi dû re hat û li odeka xwe, di tariyê de limêj kir. Ancax piştî limêjê, hat hêwanê. Ew û Robîn weke ko bîstika din, hevdu di wê rewşê de nedîtibe, weke ko tiştek nebûbe, tev geriyan. Ji bo ko hevdu nexin ber fediyê, li hev jî neniherî.

Qedeha çayê di destê Robîn de, beyî ko bizanibe bê li kîjan kanalê temaşe dike, li televîzyonê diniherî. Resûl Beg çû li ser yanê rûnişt û li


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

benda çayê ma.

Xuya bû ko dîsa aciz bûbû. Kulên dilê wî careke din tev rabûbûn. Her gava ko bi tenê bimaya, hema diket odeka xwe û derî li ser xwe digirt û li ber teyba xwe rûdinişt. Ne ev kasetên kilamên dengbêjan jî bûna, Resûl Beg belkî dê ji qehran biheliya û bimira. Ew kilam û stranên ko wî lê guhdarî dikir, welatê wî yê jihevbelavbûyî, warê wî yê ko niha nikare tevî zarokên xwe vegerê û tê de bistire; miriyên wî, bîraninên wî yên zaroktî û xortaniyê ko li deşta Diyarbekirê û kolanên bajêr ên dîrokî derbas bûbûn, dianîn bîra wî. Her ko weha dibû jî ji ber neçariya xwe digiriya û bi dizî serê xwe li dîwaran dixist. Ew hêrsa ji cerga ko bi xwe dizane di dilê wî de dikeliya, niha ji hercar xerabtir bûbû.

Mehabadê çayek sivik dagirt û anî danî ber wî. Resûl Beg gulpek ji çaya xwe vexwar û weke ko hê jî li wê kilama bîstika din guhdarî dikir, di hindurê xwe de, pê re digot:

... erê lo lo, erê lo lo
jîrikê gundê mino, lo lo
şêrê eşîra mino, lo lo
go bi tenê ev hal tê serê mêra, lo lo lawo
ji dawiyê de li te xist û termê te veşart, lo lo
û erê lo lo, ez hê divêm tu ê rojekê werî lo lo
û ax mîrê mino lo lo û ax li mino aaax ay...

## 8. Kabûs û xewn tev li hev dibin...

Piştî çendekî, nivînên wan hatin danîn. Herkes çû ket nava nivînên xwe û ji derveyî odeka Mîtanî, hemû lempeyên malê tefiyan. Mîtanî li ser piyan sekinîbû û bi jina xwe re dixeyidî. Resûl Beg li odeka kêleka wan, ji kerban, mîna karkerekî ko ji sibehê heta êvarî xebitîbe û westiyabe di xew re çûbû. Leyla Xanimê li cem mêrê xwe Resûl Begê pal dabû û li dengê wan guhdarî dikir.

Bûka wan, keça pismamê Resûl Beg bû. Du meh berê hatibû. Dilê Leyla Xanimê bi ser xwarziya wê Gulperiyê de bû. Hertim digot ko Gulperî wek gulekê ye û jina malan e. Lê piştî dîtibû ko Resûl Beg behsa keça pismamê xwe dike, hew wêrîbû ji wî re behsa ya dilê xwe bike.

Leyla Xanim ji serî de, ji merivên Resûl Beg hez nedikir. Ev kîn ji berê de, di dilê wê de hebû. Çil sal berê, gava ko bi Resûl Beg re zewicîbû,

merivên Resûl Beg ji bo ko ji nav merivên xwe jinek neanîbû, dilê xwe ji wî girtibû û ji bo ko bûbû sedema jihevbidûrketina wan û Resûl Beg jî bi çavên dijminatiyê li Leyla Xanimê niherîbû. Ji lewre, gava ko ji wê hatibû pirsîn, bê ka li ser Binevşê, keça pismamê Resûl Beg, çi dibêje, wê beyî dilê xwe gotibû »baş e, ne xerab e.«

Ji wê rojê de, bala herkesî kişandibû. Xwasteka wê di dilê wê de mabû. Lê, wê tu carî ya dilê xwe ji kesî re negotibû. Hê jî gava ko dengê Mîtanî û Binevşê dihat wê, ji xwe re digot:

— Heke bi ya min bikiraya, ew ê baştir bûbûya.

Leyla Xanim piştî ko weke hercar dengê sîleyên Mîtanî û nalînên Binevşê bihîstin, çavên xwe bi rehetî birin ser hev û raket. Sibehê zû, gava bi xwe bihisiya, dê bidîta ko bûka wê berî wê rabûye û firaxan dixe mekîneyê. Binevşê dê ji aliyekî jî taştê amade bikira. Bes, Leyla Xanim weke navê xwe dizanîbû ko ew ê du rojên din dîsa bihata guhertin û bibûya weke berê. Ji lewre, gava piştî şevên weha, ew di medbexê de didît, di ber xwe de dikeniya.

Dengê şerê Mîtanî û Binevşê çûbû Robîn jî. Hew carinan, gava Mehabadê gazindên xwe yên di vî warî de bi wî dikirin û ji ber wan gazindan aciz dibû, bi Mîtanî re dipeyivî. Ji derveyî wê, elaqa xwe bi wan nedianî. Wê şevê jî gava ko dengê şerê wan bihîst, bêhna wî teng bû. Ji xwe, xew neketibû çavên wî. Nivînên xwe li balqonê danîbû. Enîşkên xwe ji serê xwe re kiribûn destek û veketibû, li ezmên diniherî.

Şev bi qasî ko mirov dikarîbû bifikiriya tarî bû. Hêyv li jorê, mîna sênîkeke zîvî xuya dikir. Li nêzîkî hêyvê, du stêrkên piçûk yên li cem hev diçirisîn. Ji wan gelekî bi dûr, li aliyê rojava, stêrkek ko ji wan ên din hebekî mezintir, xuya dibû. Dengê çirçirkan dihat. Bayekî hênik jî pê re xwe li wî digirt.

Herçî Robîn bû, giriyê bavê wî hê ji bîra wî neçûbû. Ji ber wê, heta ko çavên wî ji xweber çûn ser hev jî li bavê xwe û aciziya wî difikirî.

Gava ko li xwe hay bû, li kolaneke dirêj û tarî bû. Wî tu carî ev kolan nedîtibû. Her dever tarî bû û li der û dorê tu deng jî tune bû. Ji nişka ve dengek hatê û tirsek ket dilê wî. Zilamek ji kuçeya pêşiya wî derket û di nav wê tariyê de, ber bi jorê ve baz da. Du zilamên din jî li wira xuya bûn û da pey wî zilamî.

Çav li Robîn neketibûn. Robîn çi qasî xwast ko vegere û xwe ji wira bi dûr bixîne jî bi awayekî bêhişî bi aliyê wan de diçû. Zilamên ko bera pey yê din dida, gelekî girs bûn û pir bi lez baz dida. Piştî bîstikekê, di neqe-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bekê re bihurîn û wenda bûn. Gava ko Robîn gihîşt serê neqebê, dît ko ew zilamê di pêşiyê de direviya li erdê ketiye û herdu zilamên din, bi silehên destên xwe lê direşînin. Canê wî dikin serad. Zilamê li erdê, bi her guleyekê, carê ji erdê hilor dibû û dîsa diket. Dengên silehan û qêrînên zilêm, tev li hev dibûn û li der û dorê belav dibûn. Herdu zilamên ko cercûrên xwe di mêrik de vala kirin, hingî dilê wan rehet nedibû, bi awayekî hêrsbûyî bi pehînan jî li wî dixist.

Robîn jî nizanîbû bê çima, lê di dilê xwe de his kir ko ew zilam dijminê wî bi xwe ne jî û ger ew têkeve destê wan, ew ê wî jî bidin ber guleyan û bêrîkan di canê wî de vekin. Ji bo ko zilam çav li wî nekevin, xwe bi lez da ser hev û avêt paş neqebê û pişta xwe da dîwêr

Di nav xwêdanê de mabû. Newêrîbû serê xwe ji neqebê derxistaya. Dora wî tarî bû. Mîna ko her dever bi rengê reş hatibe boyaxkirin, tu tişt xuya nedibû. Robîn digot qey ew ê aniha hinek ji nav tariyê derkevin û xwe biavêjin ser wî û wî bifetisînin. Dilê wî dikir gupe gup. Ji gupîna dilê wî, sînga wî jî bi lez radibû û dadiket. Weke ko di bin barana zivistanê de mabe û bi tayê ketibe, diricifî. Çavên wî dikira ji serê wî baz bidaya. Ruyê wî zipîzer bûbû. Tu nemabû ko biketaya û bimiraya .

Wî ê jî bi dû re ji xwe re bigotaya :

— Ez tu carî ewqasî netirsiyabûm.

Piştî ko dengê silehan hat birîn, Robîn ji bo ko der û dorê qontrol bike, xwe hişk bi dîwêr girt û bi tirs serê xwe ji paş neqebê dirêj kir. Ji meytê zilêm pê vê, tu tişt ne xuya bû. Bi dû re dît ko pîrekek ji kuçeyekê bi bazdan hat û xwe avêt ser termê zilêm. Çongên xwe dan erdê û bi hutikan li sînga xwe xist û qêriya. Robîn ew jinik jî nas nedikir, lê dizanîbû ko jina wî zilamê kuştî ye.

Wê gavê, meytê Seydo hat bîra wî û weke ko ji nişka ve kêrek li ser dilê wî bikeve, dilê wî êşiya û dev li lêva xwe kir. Mirov digot qey kuştina Seydo jî eynî weha bûbû. Wî kuştina Seydo nedîtibû, lê aniha didît. Digel ko Seydo azib bû jî Robîn tê derxist ko ew meyt yê Seydo ye. Bi dû re, ew ê jî li vê zanebûna xwe ecêbmayî bimaya û ji xwe re bigotayaya:

— Min jî nizanîbû, bê ev ji kû hate bîra min.

Robîn pişta xwe dîsa da dîwêr û weke ko bêhna wî hebekî hatibe ber wî, xweziya xwe daqurtand û çavên xwe girtin û vekirin. Hew mabû ko gava xwe biavêje û derkeve û bireve, lûleyeke cemîdî di cênîkê xwe de his kir. Di cihê xwe de mat ma. Tu nemabû ko dilê wî bisekiniya. Zilamekî ruyê wî nexuyayî li ber wî sekinîbû û devançeya xwe bi cênîkê wî ve

zeliqandibû. Zilam ne diliviya, ne jî tiştek digot. Robîn dizanîbû ko ji şûna xwe bilive, zilam dê guleyan di pey hev re bera serê wî bide.

Seqemekê xwe li canê wî girt. Weke ko li benda guleyê bisekine, çavên xwe hişk girtin û situyê xwe kişand hindur. Nikarîbû, ne bang bikiraya, ne jî bireviya. Digel ko Robîn ew nedidît jî dîsa bi wî awayê ecêbmayî, dizanîbû ko zilêm tiliya xwe daniye ser lingê wê û dike bikişîne.

Zilêm ling kişand û sekinî. Şerqîniya hesin hatê. Wê şerqîniya ko ji lingê debançeyê derket, di nav bêdengiya tariya der û dorê de olan da û belav bû. Xwîna ko di damarên Robîn de diherikî, bi carekê mîna ko qeşa girtibe, sekinî. Bi dû re, wî ê jî ji xwe re bigotayaya:

— Nayê bîra min ko ez tu carên din ewqasî nêzîkî mirinê bûbûm.

Dengê melayekî hat wî. Mirov digot qey ji her aliyî eynî deng tê. Azaneke dûdirêj ko gotinên wê tu carî nebihîstibû… Robîn têgihişt ko ew azan li ser wî tête xwendin. Melê azan neqedand. Robîn carekê hewil da xwe û gavek avêt.

Gava xwe di valahiyê de avêtibû. Mîna ko mirov bibêje qey hindik maye ko mirov di newalekê de wer bibe, di cih de, xwe hişk bi nivînên xwe ve girt. Bi dû re, gava ko lê hay bû, dît ko lingê xwe beyî îradeya xwe li betaniya xwe xistiye. Bêhna xwe bi rehetî berda û dîsa xwe dirêj kir. Destê xwe da eniya xwe. Eniya wî xwê dabû.

Dinya rohnî bûbû. Roj derketibû. Ji derve, dengê erebeyan dihat. Ji xaniyê ser wan jinikeke ko dengê wê bi Robîn qet nexweş bû, lê tevî vê jî hema her sibeh jî dengê wê dibihîst, derketibû balqonê û bi wî dengê xwe yê ko mirov digot qey hinan pê li teriya wê kiriye, bangî lawê xwe yê li hewşê dikir. Ji xwe dengê wê ne bes bû, îcar dengê giriyê lawê wê jî bi ser de. Gava herdu deng digihîştin hevdu, îmana Robîn dihat serê bêvila wî.

Robîn bi dengê jinikê mahdê xwe tirş kir û xeber ji wê re da. Xwe bi ser kêlekê de xwar kir û ji bo ko wê bi qîrqîra xwe herkes aciz dikir, lahnet li wê anî. Kabûsê xwe ji bîr kiribû. Di ber xwe de kire ufe uf.

Her deverê laşê wî diêşiya. Ev êşa ko carinan gava mirov ji xew radibe, xwe li laşê mirov digire û dike ko mirov hema ji xwe re vekeve û tiraliyê bike, piştî her kabûsekî weha, xwe li laşê wî jî digirt.

## 9. Leyla Xanim, Binevş, Mîtanî, Serdar, Meryem, Mehabad...

Dengên kevçî û qedehan ji hindur dihatin. Xuya bû dîsa yekê beyî dilê

xwe taştê amade dikir. Ji dengên ko derdixistin, eşkere dibû ko ew kes pir hêrs bûye. Çawa mirov ji qazî, kevçî û sênîkan li hev bixe, wê jî eyn weha dikir. Bi dû re, dengê avê hat. Deriyê daşirê vebû. Leyla Xanima ko milên xwe heta enîşkan hil kiribûn û hê jî av ji dest û ruyê wê diniqutî, ji daşirê deriket. Gava ber bi hêwanê ve meşiya, carekê berê xwe da medbexê, di ber xwe de keniya û serê xwe kil kir.

Rahişt sucdeyê û li ber xwe, li erdê raxist. Leçeka serê xwe rast kir. Herdu tiliyên xwe yên girdekê birin binê nermikên guhên xwe û di ber xwe de tiştin gotin. Bi dû re, destên xwe li ser sînga xwe danîn ser hev û tiştin din gotin. Destên xwe birin ser çongên xwe, xwe daqûl kir û dîsa rabû. Eynî hereket dubare kir, lê vê carê çû sucdê û rûnişt. Di ber xwe de jî her dia dixwendin. Piştî ko rik'eta duyem jî qedand û li ser herdu milên xwe bi dorê zivirî û silav da, serê sucdeya xwe lê qulipand û destên xwe vekirin. Vê carê, di ber xwe de gelek tişt gotin û dengê xwe jî piçekî rakir. Bi dû re, destên xwe birin ruyê xwe, ruyê xwe mist da û rabû ser xwe.

Leyla Xanim rahişt tizbiya xwe û hat hêwanê, di kêleka nivînên zarokan re derbas bû û çû li ser yanê rûnişt. Libên tizbiyê yek bi yek dikişand û di ber re jî tişt mişt digotin.

Leyla Xanim piştî ko dîsa destên xwe vekirin, hin dia xwendin û ruyê xwe dîsa mist da, rabû çû medbexê û li sifreya ko Binevşê datanî niherî. Binevşê ji bo ko têkeve çavê wê, weke ko li wê hay nebûbe, mîna pîrekên giran ko gava karekî dikin li tu tiştekî din nafikirin, bala xwe bêtir da karê xwe. Û vê carê, tu deng ji kevçî û sênîkên wê jî derneket.

Binevşê piştî ko zarokên din jî rabûn û nivînên xwe hilanîn, sifreyeke mezin anî û li orta hêwanê raxist. Tişt miştên din jî hêdî hêdî anîn û li ser sifreyê bi cih kirin. Bi dû re, çû Mîtanî jî şiyar kir û heta ko wî serçavê xwe şuşt, destmaleke spî û paqij di dest de li benda wî sekinî.

Robîn her ko ew di vê rewşê de didît, bi awayekî ecêbmayî li wê temaşe dikir. Bes tu carî tesîra lêxistina Mîtanî, zêdeyî sê-çar rojan dewam nedikir. Ew jî hew gava ko Mîtanî li malê bû, yan jî xwesa wê bala xwe didayê, welê bû. Piştî ko Mîtanî diçû kar jî dîsa diket odeka xwe û mîna ko xeyidî be, heta êvarî kesî ruyê wê nedidît. Nedihat firavîn jî bi yê malê re nedixwar. Gava ko birçî dibû, weke ko bi dizî tiştekî bike, diket medbexê û bi tena serê xwe xwarin dixwar. Ji her du-sê rojan carekê jî telefonî mala bavê xwe dikir û ji bo ko li gund herkes behsa wê û rehetiya wê bike û xweziya xwe bi dilê wê bîne, digot »yeka min nabe dudu, ez wek siltana me.«

Piştî demekê, wê jî bawerî bi van derewên xwe dianî û ji xwe re digot qey bi rastî jî bûye siltan û gava ko diketin odeka xwe, dek li mêrê xwe dikir û jê re digot:

— Ez li hindur pir aciz dibim. Welehîn, hema ez dibêjim qey ez dikim bifetisim. Ma ka tu ê min çiçax bibî bigerînî?

Wê gavê, Mîtanî têdigihişt bê derdê wê çi ye û ji ber vê yekê, ji wê re digot:

— Zarok jî li malê aciz dibin. Rojekê, em ê giş bi hevdu re derkevin û biçin seyranê. Wê gavê tu ê jî ji xwe re bigerî û ew ê bêhna te fireh bibe.

Gava Mîtanî weha digot jî ji ber ko bersiv ne li gora dilê wê bû, poşman dibû ko tiştekî weha gotibû. Ji ber ko wê dixwast, mîna ko ji xwe re xeyal dikir, têkeve milê mêrê xwe û mîna yên di filîman de, heta nîvê şevê bi tena serê xwe bigerin. Lê, ew ê ev xwasteka wê her di dilê wê de bimaya û jê re bibûya kul. Ji ber ko Mîtanî dê tu carî ew bi xwe re nebira gerê û bi ya wê nekira.

Heta ko Mîtanî nehat, ew jî li ser sifreyê rûnenişt. Meryem û Serdar jî li vê guhertina ko gelek caran dîtibû, ecêbmayî mabûn û beyî ko hayê Binevşê jê çêbibe, bi dizîka li hevdu û li Robîn diniherî û di ber xwe de dikeniyan.

Serdar xortekî şanzdehsalî û çeleng bû. Porê xwe mîna yê Robîn bi paş de şeh dikir û mîna wî dimeşiya. Ji bo ko têkeve çavê Robîn, çi hevalên wî yên keçik hebûna, dihat û ji Robîn re behsa hemûyan dikir. Gava ko Robîn ne li malê bûya, diket pirtûkxaneya wî, navên pirtûkên nû ji ber dikirin, di rojnameyan de tişt miştên ko li ser wan hatibûn nivîsandin dixwendin û êvarî gava ko dihat malê, ji wî re digot. Ji Robîn hînî xwendin û nivîsandina kurdî jî bûbû û ji bo ko bi wî re li ser wan têkeve minaqeşeyê, carinan pirtûk jî dixwendin. Rojekê weke zilamê rastî, hatibû û ji Robîn re gotibû:

— Van rojan, pir behsa romana Homerosî dikin. Tu dibêjî hêja ye ko mirov bixwîne, lo?

Robîn li hember vê gotinê, xwe negirtibû û têra xwe keniyabû. Bi dû re jî ji bo ko wî nexe ber fediyê, kenê xwe bi zorê sekinandibû û jê re gotibû:

— Eferim ji te re.

Di pê wê re jî gotibû:

— Eferim eferim. Bixwîne, helbet divê tu bixwînî. Homeros çawa ne hêjayî xwendinê ye, malava! Çend kesên ko mirov divê bixwîne hebin, yek ji wan jî ya Homeros e.

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Serdar ji bo ko Robîn gotibû, roja din çûbû û rahiştibû berhemeke Homerosî . Lê di ber re jî li ser wî kenê wî, ji xwe re gotibû:

— Ev Robîn jî hema henekên xwe bi mirov dike.

Herçî Robîn bû, kêfa wî pir ji van tevgerên Serdar re dihat. Ji lewre, carinan mîna ko bi hevalekî xwe re bipeyive, bi wî re dipeyivî. Serdar jî ji bo ko Robîn qîmet dida wî û ew dixist şûna hevalekî xwe, pir ji wî hez dikir û ji bo ko Meryem mîna ko ew ji Robîn hez dike ji wî hez bike, xwendin û nivîsandina kurdî hînî wê jî dikir. Gava Robîn bihîstibû ko Serdar xwendin û nivîsandinê fêrî Meryemê dike, ecêbmayî mabû. Ji bo vê, bi kêf pesinê wî dabû û dîsa ji wî re gotibû:

— Eferim Serdar. Min nizanîbû ko tu ewqasî jîr î ha! Helal be ji te re.

Herçî Meryemê bû, ji xwendinê hez nedikir, lê ji bo ko ji Serdar ditirsiya jî newêrîbû bigota »na« û bi ya wî dikir. Keçikeke esmer û bejinzirav bû. Sê salan ji Serdar piçûktir bû. Çavin wê yên mîna çavên diya wê, gir û reş hebûn. Herdu guliyên wê yên ko diya wê jê re dihûnandin, xwe ji ser herdu aliyên milê wê bera ser pişta wê dida. Ji ber hatina wan a Stenbolê, dereng dest bi dibistanê kiribû. Gava hê nû hatibûn, ji bo ko hevalên wê yên dibistanê henekên xwe bi wê kiribûn û ji wê re gotibûn »tu ji çiyê hatiyî » jî wê salê neçûbû dibistanê. Lê gava dest bi dibistanê kiribû, bi jîrîtiya xwe tavilê bala mamosteyên xwe kişandibû û mamosteyên wê ew ji sinifa yekem derbasî sinifa duyem kiribû.

Gava Mîtanî ket hindur, herduyan jî ji tirsa, kenên xwe birîn û hatin ser sifreyê. Kêfa Mîtanî weke ko do bi şev bi Binevşê re şer nekiribe, li cih bû. Belkî jî wî dixwast weha xuya bibe. Carê li saeta ko li dîwêr daliqiyabû diniherî û bi lez taştê dixwar. Piştî taştê, ji bo ko biçin kar, wî û Mehabadê xwe amade kir.

Mehabad piçûka Mîtanî bû. Ji Mîtanî bêtir bi ser malê de bû. Pêdiviyên malbatê, nemaze jî yên Leyla Xanim û Meryemê li ser wê bûn. Keçikeke xweşik û xwende bû. Ji bo ko balê bikişîne, hewce nedibû ko xwe zêde bixemilîne jî. Weke hercar, hema porê xwe ji paşiyê girê da, kirasê xwe rast kir û da tengala Mîtanî.

Berî ko derkevin, Mîtanî weke her sibehê, pere da diya xwe û bi dizî ji wê re got:

— Tu ê bide Robîn jî. Belkî pereyên wî nemabin.

## 10. Mirov dixwaze hezkiriyeke wî hebe...

»yek ji wan hezkiriyên te ez bûma
û min bikarîbûya di çavên te yên kilkirî de
hêsirên xwe bidîtana...«

Robîn bilêtek avêt qutîkê û ber bi paldankên dawiyê ve meşiya. Lê niherî ko ji derveyî ortê cih nîne, çû li paldankeke ortê rûnişt.

Otobus hema hema tije bû, ji derveyî du sê paldankan, cihê vala tune bû. Robîn lênûska xwe vekir û bala xwe da nivîsekê. Pênûsa xwe ji bêrîka xwe derxist, tiştek çixêz kir. Bîstikekê, beyî ko tiştekî bike, sekinî û li nivîsê niherî.

Otobus li rawestgehê sekinî. Deriyê pêşiyê vebû. Keçikeke ciwan siwar bû. Bilêt avêt qutîkê û zivirî, çavên xwe li cihekî gerandin. Şifêrê otobusê li wê diniherî. Şifêr, zilamekî bêvila wî xwar û pelixî bû. Serê wî rût û çavên wî beloqî bûn û yek jî ji wan piçekî şaş bû. Levên wî jî qalind û daliqiyayî bûn. Ji paş wê bala xwe dayê û kesereke kûr kişand. Bi dû re, bi hişkînî pê li bişkokê kir û derî girt.

Herçî keçik bû, pantolonekî kont î ko çîpên wê xweş zeft kiribûn, li xwe kiribû. Li ser pantolon, tîşortekî reş lê bû ko zikê wê heta ser navikê li derve dihişt. Porê wê heta ser milan dirêj bû. Ruyê wê esmer î zirav î xweşik bû. Bêvila wê piçekî ber bi jorê de rakirî bû. Ne mimkun bû ko bala mirov nekişanda.

Lawikekî ko simbêlên wî yên zirav ji herdu aliyên lêvên wî berjêr dadiketin, gava ko çav li keçikê ket, xwe da ser hev û ziq li keçikê niherî. Keçik di ber wî re derbas bû û hat li paldanka cem Robîn rûnişt.

Robîn hişk bi lênûska li ser çonga xwe girtibû û berê xwe bi camê ve kiribû. Gava ko keçik li cem wî rûnişt, meraq kir û li wê niherî. Ji nişka ve, weke ko bêhna wî biçike, çavên wî fireh bûn û heyecanekê dilê wî da ber xwe. Gupîna dilê wî, ji guhên wî derdiket. Tevzînokên germ xwe li canê wî girt. Ji eniyê û paş situyê xwe his kir ko xwê dide.

Heta ko daket jî Robîn fedî kir ko li aliyê wê binere. Wî digot qey xelk giş li wî dinerin û ji bo ko henekên xwe bi wî bikin li benda hereketeke wî ne; heke bizivire û li vê keçika xweşik ko kêleka wî rûniştiye binere, dê tiştekî xerab were serê wî û ew ê pir li ber bikeve. Bêhna keçikê dihat wî û serê wî gej dikir. Robîn bêhna xwe bi zorê distend û dikira ji ser hişê xwe biçûya.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Heta ko otobus gihîşt cihê ko ew ê dakeve, di nav pêlên heyecanê de gevizî û heliya. Gava Robîn ji bo daketinê rabû ser xwe û ji bo ko keçik rê jê re veke, bi wê re bişirî, hewla wî têrê nekirê ko fediya xwe û sorbûna ruyê xwe veşêre. Ji xwe, hingî bêhna wî çikiyabû, nikarîbû devê xwe vekira û peyvek jî bikira.

Gava ji keçikê bi dûr ket û hat, pê li bişkoka derî kir, hê sorbûna ruyê wî neçûbû. Ancax piştî ko daket û otobus ji wî bi dûr ket, hê nû bêhna xwe berda û hebekî hat ser xwe.

Piştî daketina wî ya ji otobusê, keçika ko bîstika din li kêleka wî rûniştibû, ji bo ko cihê xwe xweş bike xwe bi aliyê camê de bir û li şûna Robîn rûnişt. Wê gavê his kir ko lingê wê li kaxizekê ket.

Keçikê xwe daqûl kir û rahişt kaxiza spî ya li erdê, li ber lingê xwe. Kaxiz anî ber çavên xwe û vekir. Zêde guh nedayê. Heta wê gavê jî tiştekî anormal pêk nehat; lê gava ko di têgihiştina nivîsa li ser kaxizê de zehmet kişand, vê carê bala xwe bêtir dayê. Kir û nekir, tiştek ji nivîsê fahm nekir.

Li dora xwe niherî, got belkî hinek ji qazî weha dikin; lê gava dît ko herkes di halê xwe de ye, berê xwe da pencereyê û ponijî. Piştî ko hebekî din jî fikirî lawikê bîstika din ko li kêleka wê rûniştibû hat bîra wê. Erê erê, ev kaxiz hebe tune be, ji wî ketiye. Ji ber ko lênûskek jî di destê lêwik de bû. Gava ko nuh li cem wî rûniştibû bala xwe dabûyê. Di dilê xwe de, dîsa got ko ev kaxez ji wî lawikî ketiye.

Lê di vê nivîsê de, çi tê gotin gelo? Jê re bû meraq...

Dîsa kaxiz vekir û lê niherî. Tiştê ko di kaxizê de hebû, helbestek bû; ji rêzikan tê derxistibû. Ev ne bi tirkî hatibû nivîsandin, bi zimanekî din bû. Di vê helbestê de, çi dihat gotin gelo?

Bi dû re, Robîn anî bîra xwe. Wê ew gelek caran di otobusan de didît ko pirtûkan dixwîne, an jî tiştinan li lênûska xwe dinivîsîne. Çend caran weha li hevdu jî niherîbû. Gava ruyê wî anî ber çavên xwe û li kaxeza destê xwe ko meraq dixist dilê wê fikirî, meraqek li ser Robîn jî di dilê wê de şiyar bû. Ji xwe re got »gava min ew dîsa dît, ez ê ji wî bipirsim, bê ka di vira de çi nivîsandiye,« û kaxiz pêça û xist bêrîka xwe.

Gulcanê rojên dinê her li Robîn geriya. Dizanîbû ko Robîn li nêzîkî mala wan rûdinê, lê nizanîbû, bê ji kîjan rawestgehê li otobusê siwar dibe. Ji ber wê, hema li rawestgeha nêzîkî mala xwe li benda otobusan disekinî û ji derve bi hêviya ko wî bibîne çavên xwe li hindurê otobusan digerandin. Her gava ko li otobusekê siwar bibûya, berî ko têketa hindur, çavên xwe li wî digerandin. Lê her ko rojek din bi ser diket, hêviya wê

hindiktir dibû, pê re jî bala wê bêtir diket ser Robîn û jê re dibû kul.

Piştî wê rojê bi hefteyekê bû, Gulcanê êdî hêviya xwe birrîbû û çendekî jî ji bîr kiribû. Lê hê jî beyî xwe li wî digeriya. Robînê ko bi wendabûna helbesta xwe hisiyabû, lê nizanîbû bê li kû ji wî ketiye û zêde jî guh nedabû wendabûna wê helbestê, dîsa di otobusê de berê xwe dabû pencereyê û diponijî.

Dinya germ bû, hewa hindurê otobusê mirov gelekî aciz dikir. Gava Gulcanê li otobusê siwar bû û çav li Robîn ket, ji nişka ve, mîna ko çav li hevalekî xwe ketibe, kêfa wê hat û ber bi wî ve meşiya.

Robîn di serî de, li wê hay nebûbû. Lê piştî dît ko dîsa ew keçik ber bi wî de tê, heyecaneke eynî mîna wê rojê, dîsa xwe li wî girt. Tevzînokên germ li paş stuyê xwe his kir.

Keçik bi serê lêvan bişirî û bi awayekî ko Robîn ecêbmayî bihêle, samîmî û bi çavên dawetkar lê niherî û bi dengekî nermik got:

— Merheba.

Herçî Robîn bû, hew dizanîbû, bê dê çi bikira. Wî ev keçika ko berê jî carcaran di otobusê de didît, nas kiribû. Lê tu carî bi hevdu re nepeyivîbûn. Got qey ew ji berê de hevdu nas dikin, lê nayê bîra wî. Bi lez fikirî. Dest û lingên wî li hev geriyan. Ket ber fediyê, lê nehişt ko keçik pê bihise û tavilê bersiva silava wê da:

— Merheba.

Herdu jî bi hev re bişirîn. Robîn bêtir fedî kiribû û xwê dabû. Bi dû re, bala xwe da porê wê. Bi qasî ko dihat bîra wî, porê keçikê, berê dirêjtir bû. Lê tiştê ko niha ew ecêbmayî hiştibû, ne ev bû. Digel ko gelek paldankên din jî vala bûn, keçik hatibû li kêleka wî rûniştibû û silav jî dabûyê.

Gulcanê tavilê xwe da ser hev, ji bo ko vê fersendê ji dest nerevîne, hema bi lez li bêrîka xwe geriya, kaxizek ji bêrîka xwe ya dawiyê derxist û dirêjî Robîn kir.

— Ev çend roj in ko ez li te digeriyam.

Robînê ko ji xwe ecêbmayî mabû, bi vê peyvê çavên xwe qels kirin û bi tirs xwe da bende. Di serî de, tiştê ko hat bîra wî, ew bû ko ev keçik ji bo tiştekî nebaş li wî digere. Wî tiştek xerab bi vê keçikê nekiribû. Na, heke ne weha be, ma ew ê çi karê wan bi hev re hebe..?

Keçikê dîsa li çavên wî niherî û dewam kir. Robîn fedî dikir li çavên wê binere.

— Wê rojê, te ev kaxiz li şûna xwe hiştibû. Belkî jî ji te ketibû, ez nizanim. Lê min ew dît û gava min fahm kir ko ya te ye, min got belkî ez dîsa


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

te bibînim û min veşart.

Ji aliyekî jî kaxiza di destê xwe de vedikir û ber bi wî ve dibir. Robîn gava çav li kaxizê ket û nas kir, bêtir ket fediyê û tavilê rahiştê. Piştî ko hebekî lê niherî, li wê zivirî. Dîsa beyî ko li çavên wê binere, mîna ko di ber xwe de bipeyive, got:

— Ha! Belê belê, ya min e. Ji min ketibû. Ez jî lê digeriyam.

Keçikê peyva wî birî. Disa bi wî dengê xwe yê kubar û nermik, got:

— Min çi qasî lê niherî jî min tiştek jê fahm nekir.

Ji nişka ve, bêgengiyekê xwe li wan girt. Robîn lal bûbû. Hew dizanîbû, bê ê çi bigota.

Robîn helbest di dilê xwe de dixwend û hey li wê diniherî. Nikarîbû tiştek bigota. Xwe dabû benda wê. Keçikê jî weke ko hertişt fahm kiribe, hew tiştek pirsîbû. Carê li wî diniherî û bi dû re dîsa çavên xwe bi meraq dadigerandin ser kaxeza di destê wî de. Robîn dê piştî wê, ji xwe re bigotaya:

— Ez ditirsiyam ko ji min bipirse, bê ka ev bi kîjan zimanî ye. Lê, keçikê qet tiştek nepirsî. ko bipirsiya jî min nizanîbû, bê min ê çi bersiv bidayê. Carê, mîna ko ji wê helbestê têgihîştibe, di qoziya çavên xwe re li min diniherî. Min dizanîbû ko têkîliya min û vê keçikê, bi wê demê ve girêdayî ye. Ji lewre, min jî qet dengê xwe nekir û ez bi heyecan li benda wê mam. Min nizanîbû, bê çi difikire jî. Heke tiştek bigotaya, wê dê dilê min jî rehet bikiraya. Ez him ditirsiyam, him jî min meraq dikir. Bes, tiştek hebû ko divê ez li xwe mukir bihatama; kêfa min pir ji wê re hatibû û min nedixwast ko tiştê ez difikirîm, biqewimiya.

Tiştê ko Robîn jê ditirsiya, pêk nehat. Bes heta ko dema daketina keçikê nehat jî dilê wî rehet nebû. Gulcanê dê heta ko daketaya, nepeyiviya û carê li kaxiza di destê wî de biniheriya û biponijiya; carê jî dîsa di qoziya çavan re li wî biniheriya. Bi dû re, bi awayekî ko ew ê Robîn jî bi dû re ji xwe re bigotaya, keçikê ji bo ko ew dîsa hevdu bibînin, dê civanek bidaya wî û daketaya:

— Ez ecêbmayî mam. Ez sed salî bifikiriyama jî ev îhtîmal nedihat bîra min. Ji ber ko yê min, ez li benda reaksiyoneke cidatir bûm. Tu carî tiştekî weha bi serê min de nehatibû. Keçik berî ko dakeve li min zivirî û got, »heke tu bixwazî, em hevdu bibînin.« Mirov digot qey her tişt ji berê de di serê xwe de plan kiribû û niha jî tedbîq dikir. Ez aniha ji kê re bibêjim, bawer nake û ew ê henekên xwe bi min bike. Ew ê ji min re bibêjin tu zêde li filîmên tirkî temaşe dikî. Roja din, me hevdu dît. Roja

pey wê jî. Hema ez dikarim bibêjim ko hindik mabû min evîn ji bîr bikiraya, ji nû ve ez hatim ser hişê xwe. Piştî şeş salên min ên li Stenbolê, ev cara yekem bû ko min bi destê keçikekê digirt.

## 11. Her evînek bi janekê ye...

Baran dibariya, lê dinya ne sar bû; ji xwe li vî bajarî mirov nizane bê kengî dinya sar e û kengî germ e. Gulcanê, dîsa wî etekê xwe yê reş û fireh ko dadiket heta ser çongan, li xwe kiribû. Herdu guhên qutikê xwe yê belek ko bişkokên wî vekirî jî dîsa li ser nava xwe girê dabûn û zikê xwe heta navê li derve hiştibû.

Baranê tam li wan kiribû. Şil û pil bûbûn. Beyî ko guh bidin baranê, wan hevdu himbêz kiribû û dimeşiyan. Di bin wê baranê de, ji wan pê ve tu kes li derve nemabû. Li dûrî wan, di hindurê bufeyê de, zilamekî dengê teyba xwe rakiribû û li muzîkê guhdarî dikir. Behr belkî piçekî bi têsîra baranê be jî har bûbû û hey xwe bi hengameyeke mezin li zinarên ko li kêleka peravê hatibûn rêzkirin dixist. Digel ko hê nebûbû 'esir jî ezman mîna ko evar be, tarî bûbû. Bayekî cemidî hebû. Ji der û dorê bêhna payizê dihat.

Gulcanê porê xwe yê şil bi destê xwe bi şûn de avêt û serê xwe rakir. Dilopên baranê li ruyê wê diketin. Çavên xwe ji ber baranê bi dijwarî vekirin, li wî niherî û got:

— Ew helbesta wê rojê tê bîra te?

Herçî Robîn bû, gava ko dîsa behsa wê rojê bû, ruyê wî yê ko ji ber baranê şil bûbû, sor bû û di ber xwe de bişirî.

— Belê. Tê bîra min.

Keçikê dîsa bi wî dengê xwe yî ko hişê mirov ji serê mirov dibir û bi awayekî ko mirov nikare dilê wê bihêle, xwasteka xwe got:

— Tu dikarî wê ji min re wergerînî û bixwînî?

Robîn him hebekî fedî kiribû, him jî kêfa wî hatibû. Gulcanê bi xwasteka xwe, romantîkiya xwe dabû dest. Xuya bûbû ko ew jî mîna wî diltenik bûbû. Ji ber vê yekê jî tiştên li ser evînê dilê wê bêtir dilerizand. Belkî ya ko ew bêtir nêzîkî hevdu kiribû jî ev bû.

— Baş e.

Gulcanê, tavilê lê zêde kiribû:

— Bes, divê gava te wergerand, tu wê neguherînî.

Robîn beşek ji wê helbestê wergerand û bi giranî xwend. Herçî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Gulcanê bû, piştî ko Robîn xwendina helbestê qedand jî mîna ko hê guhdarî dikir, li wî niherîbû. Ji derveyî dengê wî, tu dengê din nedibihîst. Ne dengê baranê, ne yê pêlên harbûyî û ne yê tiştekî din. Mirov digot qey guhên wê ker bûne û êdî şiyana xwe ya bihîstinê wenda kiriye. Bi çavên xwe yên xemgîn, beyî ko tiştekî bibêje, bi awayekî jixweveçûyî, li wî niherîbû û bi dû re jî serê xwe danîbû ser milê wî.

Robîn piştî ko ev rewşa wê dît, mîna ko di xewneke xweş de be û li ber serê wî melodiyek ko wî serxweş bike lê bikeve, bi tevgerên giran, ser û çavên wê bi destên xwe paqij kir û ew himbêz kir. Germahiya canê wê di sînga xwe de his kir û mîna ko bi tayê ketibe, lerizî.

— Tu dilerizî?

Robîn tiştek negot. Ev his careke din jî gava ko bi Nûşînê re bû, ew dabû ber xwe. Destê xwe avêt situyê wê û ew bi ber xwe ve kişand. Devê xwe xist devê wê. Di bin baranê de, carê devên xwe ji hev derdixistin û bêhna xwe distend. Sê-çar deqîqeyan bi wî awayî man. Hişên herduyan jî ji serê wan çûbûn û li tu tiştekî din nedifikirîn. Gulcanê piştî maçîkirinê, ew himbêz kir, serê xwe danî ser milê wî û beyî ko tiştekî bibêje, bîstikekê bi wî awayî sekinî.

Gava ko Robîn bêhna canê wê dikişand heta nava dilê xwe û bêtir ji xwe ve diçû, dilê wê jî bûbû mîna çemekî û ber bi wî ve diherikî.

Wê jî dê bi dû re ji xwe re bigotaya:

— Min jî bêriya vê hisê kiribû. Heta wê rojê, na; lê belê, piştî wê rojê, Robîn ji min re bûbû hêviyeke nû. Çawa dibû ko ez heta niha mabûm û min ew nas nekiribû. Ew lawikê bêdeng yê ko her di otobusan de pirtûk dixwend û tu carî jî neketibû bala min, ji min re bûbû dermanekî nedîtî. Wê gavê ez hê nû hîn dibûm: Evîneke ji dil, dermanê hemû derdan e.

Kela giriyê ketibû qirika wê. Lêvên wê hêdîka li hev ketin û dengekî lerzokî ji devê wê derket.

— Helbesteke pir xweş bû.

Bi dû re, ew bêtir himbêz kir û bi dengekî lerzokî û hinekî jî fediyokî, got:

— Ez ji te hez dikim, Robîn. Ez ji te pir hez dikim.

Giriya. Robîn dîsa tiştek negot. Bes ew maçî kir û sekinî. Hêsirên wê bi destê xwe paqij kirin. Ya rastî, wî jî ji wê hez dikir. Bes, li ser vê hezkirinê, gotinek jî ji devê wî derneket. Ew ne li benda vê yekê bû. Ji ber ko wî bawer nedikir ko dîsa bikaribe dil bide keçikekê.

Bi dû re, wî ê ji xwe re bigotaya:

— Min ji wê hez dikir. Him jî ne bi qasî ko ew dikarîbû lê bifikiriya. Piştî Nûşîn, şeş sal zêdetir çêbûbûn ko min bi heyecaneke weha keçikek himbêz nekiribû. Her ko min keçikeke xweşik didît, agir bi dilê min diket. Dilê min dişewitî. Ez ji hemû dinyayê dixeyidîm. Min xeber ji xwe re didan. Gava min didît ko du kesan hevdu himbêz kiriye û maçî dikin, kulên dilê min tev radibûn. Min dixwast ko ez bi kêran bi ser dilê xwe bikevim û xwe bikujim. Ji bo ko yek ji wan keçikên xweşik ji min re bibûya yar, min xwe dixwar. Lê yek jî ji min re nebûbû qismet ko ez vê heyecanê di himbêza wê de bibînim û agirê dilê xwe vemirînim. Herçî Gulcanê bû, ew jî yek ji wan keçikan bû û wê rojê di himbêza min de bû. Bes, êdî ez baş fêr bûbûm: Herçî evîn e, heke di dema xwe de neyê, bi kêrî tu tiştî jî nayê.

Hew peyivîn. Lê Gulcanê li hember vê bêdengiya Robîn, digel dilşahiya vê evîna xwe ya nû, xemgîn bûbû û heta ko çûbûn mala wê jî nepeyivîbû. Ev yek bala Robîn jî kişandibû û ew jî xemgîn kiribû. Di bin wê baranê de, wan heta êvarî hevdu himbêz kiribû û bêdeng meşiyabûn.

Gulcanê dê bi dû re ji xwe re bigotaya:

— Ez wê rojê fêrî tiştekî din jî bûbûm ko dê hemû jiyana min li bin guhê hev bixista. Hema ez bimirama, ji min re çêtir bû. Ji ber ko ez hînî wî tiştî bûbûm ko her evînek bi janekê ye.

Herçî baran bû, gavê hûrik hûrik dibariya, gavê jî dibû mîna çemekî ko ji jorê ve xwe bera jêrê dida. Her ko baran xurttir dibû, kesên li derve, tavilê xwe diavêt quncik muncikan, an jî hindurê dikanan. Mekîneyên ko di wê şiliyê de, li bin guhên hev diketin, dikir ko hemû riyên bajêr bi saetan bên girtin.

Mala Gulcanê fireh bû, hêwaneke wê ya mezin hebû. Li hêwanê, tereheyeke mezin û gewr di nav paldankên ko bi mesafe hatibûn rêzkirin, raxistîbû. Li ser maseyeke cam, li qorziyê televîzyoneke ekranmezin hatibû danîn. Li kêleka maseyê, teybeke mezin hebû. Li qorziya jorê ya hêla balqonê jî argûnekî xweşik ber bi çavên mirov diket. Her der dibiriqî û bêhneke xweş ji hindur dihat. Ji paqijiya xênî diyar dibû ko zêde kes nedihat vî xaniyî.

Gulcanê tavilê çû argûn dada û derbasî odeka din bû. Robîn çû xwe da ber argûnî. Gava ko Gulcanê vegeriya, destmaleke mezin û şortekî behrê di destê wê de bûn. Tiştên destê xwe dan Robîn û ji bo ko ew jî xwe biguhere dîsa çû odeka din.

Herdu bi tenê bûn. Robîn bîstikekê di penceyê re li derve niherî. Dinya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

tarî bû. Baran hê jî dibariya. Birûska ko ji nişka ve veda, şerqîniyek ji ezmên anî û mîna ko ezmên bike du perçe, çixêzeke rohnî pêk anî. Bi vê bûyerê re baran xurttir bû. Piştî du sê birûskên din, ceryan qut bû û her der di tariyê de ma.

Li hindur, ji derveyî ronahiya ko xwe ji êrgûn dida der û pê ve, tu ronahî tune bû. Ji lewre, wan pêwîst nedît ko tiştekî din vêxin. Ji xwe, bi vî awayî hindur xweştir xuya dibû. Robîn çû xwe li ser paldankekê dirêj kir û li wê niherî. Gulcanê jî hat, li kêleka wî rûnişt û bi destên wî girt. Serê xwe danî ser sînga wî. Robîn tiliyên xwe di nav porê wê de digerandin. Gulcanê bîstikekê çavên xwe girtin û got:

— Tu ê tu carî dev ji min bernedî, ne weha? Tu ê min bi tenê nehêlî.

Robîn ew himbêz kir û got:

— Netirse, ez tu carî dev ji te bernadim.

Piştî vê gotinê, dilê Gulcanê hebekî rehet bûbû. Hilma xwe kişand. Di ber xwe de bişirî. Gava ko dikira ji Robîn re behsa evînên xwe yên berê bikiraya, Robîn hêdîka destê xwe da ber devê wê û got:

— Hiş… Nebêje. Bes serê xwe deyne ser sînga min û min himbêz bike.

Robîn destê xwe dirêjî pakêta çixareyê kir û çixareyek jê kişand. Gulcanê ew çixare ji destê wî girt û bi xwe pêxist. Gulpek jê kişand, hebekî ma û berda. Gulpa duyem jî kişand, çixare danî ser xwelîdankê û devê xwe xist devê wî.

Lêvên hevdu têra xwe mêjtin û hevdu di nav tevzînokan de hiştin. Bi dû re, Gulcan vekişiya, rahişt çixareyê, gulpeke din jî lê xist û dîsa bi ser wî de daqûl bû. Piştî ko wan dixana çixareyê jî li hevdu par ve kir, ji hev neqetiyan.

Robîn ew li ser piştê vexist û çendekî li wê temaşe kir. Gava hat bîra wî ko ji cerga hatiye vî bajarî bêriya tiştekî weha kiribû, hebekî xemgîn bû. Lê bi dû re bi hewleke ko dê bala Gulcanê jî bikişandaya, dê bibişiriya û destê xwe di ruyê wê de bidaya.

Qutikê wê hêdîka jê kir, tiliyên xwe li ser bedena wê gerandin û xwe bi ser wê de xwar kir. Ji alîyekî lêvên wê dimêjtin, ji alîyekî jî bi destekî xwe pêsîra wê mist dida û di kefa destê xwe de diguvaşt. Bêhna canê wê, hişê wî ji serê wî dibir. Ew gêj dikir.

Nedipeyivîn. Deng ji wan dernediket. Herduyan jî bêhna xwe ji devê hevdu distend. Wan digot qey, heke bipeyivin, ew ê hemû sêhra wê demê bi carekê betal bibe.

Robîn heta derengê şevê, li cem wê ma. Gava, pîştî bihevşabûnên dirêj,

xwast ko biçe êdî, Gulcanê li ber gerîya.

— Neçe.

Wê ev di ber xwe de û bi dengekî xemgîn gotibû. Çi qasî li ber wî geriya jî ew qane nekir.

Piştî ko ew derket, Gulcanê xwe da ber pencereyê û di pey wî re niherî. Heta ko ew bi dûr neket jî xwe ji wira neda alî. Gava Robîn êdî ji ber çavan wenda bû, Gulcanê kelogirî bû û di ber xwe de got:

— Ez ji te hez dikim, Robîn. Ez ji te pir hez dikim.

## 12. Gava yek têk diçe, jiyan lê diherime...

»jiyan xweş e, lê ji bo yên ko wê nas nakin...«, Alfred de Mussed

Gava ko xatir ji wê xwast û derket derve, li kolanê tu kes tune bû. Dinya sar bû. Erda ko di bin baranê de şil bûbû, dibiriqî. Lempeyên gelek malan hê nehatibûn vemirandin. Ji dengê motor û qorneyên mekîneyan pê ve, tu deng ji der û dorê nedihat.

Li rawestgehê, li otobusê siwar bû. Ji ber ko dereng bû, mekîne vala bû. Çû li dawiyê rûnişt. Di camê re li derve niherî. Tiştek nedît. Lê ji nişka ve, perdeyeke tarî pêşiya wî girt. Ber çavên wî bi carekê reş bû. Destên xwe birin ber çavên xwe. Berçavka xwe peland. Zivirî, li hindurê otobusê niherî. Dengê rêwiyan dihat wî, lê belê, tu tişt nedidît. Bêhna wî çikiya.

Otobus carê disekinî û dîsa dimeşiya. Deriyên wê bi gurmînî vedibûn û dihatin girtin. Dengên lingên rêwiyan dihatin wî. Li aliyê dengan dizivirî, lê dîsa tu tişt nedidît. Otobus dîsa disekinî, deriyên wê dîsa vedibûn û dihatin girtin û dîsa dimeşiya.

Nizanîbû, bê divê çi bikira. Otobus çar caran sekinîbû û deriyên xwe vekiribûn û girtibûn. Ger weha bûya, diviyabû ko li rawestgeha dîtir daketa û ji bo wê jî divê tavilê rabûya, biçûya ber derî û pê li bişkokê bikira. Heke li cihekî din daketaya, îcar wî dê xwe bi vî halî çawa bigihanda malê?

Tiştê ko hat bîra wî, ew tirsand. Ji nişka ve venihurî û bi dû re xwast xwe bi lez bigihîne ber derî. Lê dikir û nedikir, nikarîbû bilezanda. Ji ber vê yekê, destê xwe bilind kir û xwe bi hesin ve girt û bi vî awayî hêdî hêdî ber bi derî ve meşiya. Li bin guhê zilamekî ket. Zilêm jî hema ew dahf da û bi hêrs bang kir:

— Ma qey tu kor î, birê min! Li pêşiya xwe binere, yaho. Tu dibêjî qey


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

tu ji serê çiyê hatiyî!

Robîn ket erdê. Tew di nav wê keft û leftê de, berçavka xwe jî ji çavên xwe xistibû. Otobus hê jî dimeşiya. Yên ko li wî diniherî, digot qey Robîn serxweş e. Mêrik dît ko nikare rabe ser xwe, mahdê xwe tirş kir, bi çengê wî girt û ew rakir. Yekî din jî tavilê daqûl bû û rahişt berçavka wî, da destê wî. Digel ko Robîn dizanîbû, berçavk bi kêrî tu tiştekî nayê jî ji destê mêrik girt û xist çavê xwe. Nizanîbû, bê ev mirovên ko alîkariya wî dikin, kî ne jî. Bi dû re, dîsa ew dengê hov seh kir û veciniqî.

— Te xêr e, birê min? Ma tu serxweş î?

Robîn tavilê bi tirs bersiv dayê:

— Na, na! Ez ne serxweş im! Ber çavên min reş bûye. Ez nikarim tiştekî bibînim.

— Heke tu kor bî, tu çima derdikevî derve, birê min? Ma vê saetê, çi karê te li derve heye?

— Ez ne kor im, lawo! Ma ne min got, ber çavên min reş bûye.

Robîn hilma xwe sitend û berda. Piştî ko bêhna wî hebekî hat ber wî, pirsî:

— Em li kîjan rawestgehê ne?

Dîsa wî dengê hov bersiv da:

— Lastîkçî.

Robîn destê xwe rakir û bi heyecanekê:

— Hah! Temam! Ez ê li vira dakevim!

— Temam, temam. Ez ê jî li vira dakevim. Ka bêhna xwe fireh bike, ez ê bi te re dakevim. Netirse, ez ê alî te bikim.

Herdu bi hev re daketin. Barana ko kêm bûbû, hûrik hûrik xwe li ser û çavên wan digirt. Dinya cemidîbû.

Mêrik ket milê wî. Robîn nizanîbû, bê ew bi kû de diçin. Le ko mêrik ew bibira cihekî din?

Meşiyan. Qet bi tu aliyî de nezivirîn û rast meşiyan. Carê lingên wî li kevir meviran diketin. Mêrik nedipeyivî. Wî Robîn her bi xwe re dikişkişand.

Ev zilam kî bû? Ji kû bû, gelo? Baş bû, an xerab bû? Ew bi kû ve dibir?

Ev pirs hey di serê wî de digeriyan. Xwast ko ji zilêm tiştekî bipirse. Devê xwe livand, lê peyv ji devê wî dernediket. Herçî yên ko derdiketin jî tev li hev dibûn:

— Abba… exxiy… ba… ba… iy…

Çi qasî hewil da xwe jî nikarîbû bipeyiviya. Destê xwe yê vala li destê

zilêm xist, da ko bala wî bikişîne. Herçî zilam bû, qet guh nedida wî û ew bêtir dikişkişand. Li erda şil, çi kortik, cihok û kevir hebûna, ew li wan diqeliband û dikişkişand. Kincên wî di nav heriyê de mabûn. Her derê wî diêşiya. Ji lingên wî yên ko li kevir meviran diketin, xwîn diherikî. Ji êşa canê xwe diqêriya, lê dengê wî dernetiket û zilêm jî qet guhê xwe nedida vê rewşa wî.

Zilam ji nişka ve sekinî. Robîn di kortalekê de berda. Kortal tije av bû. Robîn xwe da ser destê xwe û rabû. Kincên wî tev de lewitî bûbûn. Ji nişka ve, tiştek li ber çavên wî teqiya û ronahiya ji wê teqînê derket, xuya bû. Çavên xwe girtin û vekirin. Çavên wî didît!

Hema berê xwe da zilêm û qêriya:

— Ma qey tu dîn î!

Hemû dengê xwe bi wê qêrînê re berda. Wê gavê, zilêm tavilê kêreke mezin ji paş xwe kişand û da qirika wî. Herdu destên Robîn li hewa man. Nikaribû xwe bilivanda. Bêhna wî çikiya. Xwîna wî sekinî. Rengê ruyê wî hat guhertin. Dikira ji tirsa xwe bifetisiya.

Zilêm bi kêra destê xwe qirika wî jê kir. Herçî Robîn bû, hewil da xwe û bi hemû hêza xwe qêriya.

— Hahooo...!

Şifêr bi qêrîna wî re, got qey pê li tiştekî kiriye û ji ber vê yekê, tavilê pê li firênê kir û li dora xwe niherî. Mekîne bi carekê ve sekinîbû. Rêwiyên ko ji bo li bin guhê paldankên pêşiya xwe nekevin xwe hişk bi hesinan girtibû jî piştî ko ji nû ve xwe da ser hev, bi tirs li dû xwe zivirîbûn. Dengê şifêr î hov hat bihîstin:

— Çi bû, birê min? Xêr e? Ma ev çi warwara te ye?

Robîn li dora xwe niherî. Herkesî bi çavên tije meraq li wî diniherî û di nav xwe de dipeyivî. Ket ber fediyê. Ruyê wî sor bûbû. Bi dû re serê xwe rakir û got:

— Bibuhurin. Ez di xew de bûm. Min beyî hemdê xwe bang kir.

Şifêr serê xwe bi hêrs kil kir û dîsa pê li xazê kir. Robîn rabû ser xwe û çû ber derî. Ji bo ko ruyê xwe veşêre, serê xwe bera ber xwe dabû. Otobus li rawestgehê sekinî, deriyên wê yên dawiyê vebûn û Robîn daket.

Herçî Robîn bû, wî ê bi dû re ji xwe re bigotaya:

— Ev cara duyem bû ko ez ewqasî ji mirinê tirsiyabûm. Ma gelo însanê ko bi rastî kor be jî di wê rewşê de, tu carî dikarîbû bi qasî min bitirsiya? Min wê rojê jiyana kesên kor jî nas kiribû û êdî min dizanîbû, bê ew her roj bi kîjan tirsan dijîn. Ji lewre, ji wê rojê û bi şûn de, her ko min korek


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

didît, dilê min bêtir pê dişewitî û min dixwast ko ez alî wî bikim.

Xwe bi zorê gihand malê. Herkes di xew de bû. Ji ber ko gelek caran weha dereng dihat malê, herkes fêrî vê adeta wî bûbû. Ji bo ko wan şiyar neke, derî hêdîka girt û çû ser nivînên xwe.

Bi tenê Leyla Xanima diya wî, heta ko dengê derî nehatibûyê, xew neketibû çavên wê. Piştî têgihişt ko Robîn hatiye, dilê wê rehet bûbû, hêdîka xwe bi ser kêlekê de zivirandibû û ketibû xewê.

Wê şevê, heta ko xwe ji têsîra wî kabûsî xelas kir, di nav nivînan de xwe bi vî aliyî û wî aliyî de qulipand. Paketeke çixare kişand. Xew neket çavên wî. Serê wî her diêşiya û zingînî ji guhên wî dihat.

Bi dû re, wî ê ji xwe re bigotaya:

— Piştî van kabûsan, şev û rojên min giş tev li hev bûbûn. Min nizanîbû, bê çi bi serê min de hatiye. Ji xwe derdê min ne besî min bû, îcar ev kabûs li serê min bûbûn bela. Êdî min nizanîbû, bê kîjan kabûs e; kîjan ne kabûs e jî. Ji ber van kabûsan, min gelek caran xwast ko ez xwe bikujim, lê belê, min tu carî cesaret nekir. Mezintirîn jana ko ez ji ber ne di tu halî de bûm jî ev bû.

## 13. Jiyana hemû kesên têkçûyî dişibe hevdu...

»Ma kesek heye ko kul û kederên wî tune be?«, Firdewsî

Ro dihat nîvro. Robînê westiyayî di odeka xwe de di xew de bû. Ji xwe, ber destê sibehê dengê kuxika wî hatibû. Yên malê, ji ber ko dizanîbû, ew dereng hatiye malê, ew şiyar nekir.

Binevşê derî li xwe girtibû. Li odeka xwe li hember neynikê rûniştibû û li xwe diniherî. Serdar ji bo ko hevaleke xwe ya keçik bibîne, derketibû derve. Meryem ji xwe re li ber televîzyonê rûniştibû. Resûl Beg li odeka xwe ji xwe re doşekek danîbû û veketibû, li teybê guhdarî dikir. Herçî Leyla Xanim bû, li hêwanê sifreyek raxistibû, neh-deh şûşe danîbûn ber xwe û bahcanê sor, bahcanê reş û fasûliyê şîn dadigirtin.

Robîn çavên xwe vekirin, bawişkî, xwe vezeland û li saeta xwe niherî. Weke ko dereng mabe, bi lez rabû ser xwe û kincên xwe li xwe kirin. Çû serçavê xwe şuşt û hat, rahişt berçavka xwe. Wê gavê Leyla Xanima ko bala xwe dabû vê lezandina wî, rabû ser xwe û jê pirsî:

— Xêr e, Robînê min? Tu bi kû dediçî?

Robîn beyî ko li wê bizivire, tavilê bersiv dayê:

— Divê ez bigihêm cihekî, dayê.

Leyla Xanimê bi gazin gotê:

— Ma te hê taştê jî nexwariye, lawo! Me bizanîbûya, me ê tu piçekî zûtir şiyar bikiraya, kurê min.

Robîn gava sola xwe dixist lingên xwe got:

— Xem nîn e, dayê. Ez dikarim li derve jî li ser lingan tiştekî bixwim. Niha, divê ez derkevim.

Bi lez ji malê derket û ket asansorê. Li ber neynika asansorê, porê xwe yê nîvşilbûyî bi destên xwe rast kir û li xwe niherî. Gava ko da ser riyê, wî jî nizanîbû, bê ew ê bi kû de biçûya. Ji lewre, di dilê wî de, him valahiyek, him jî meraqeke berlênayêgirtin hebû. Bi gavên mezin û weke ko dixwaze xwe zû bi zû bigihîne cihekî, bi lez dimeşiya. Piştî hebekî din jî lezand, dest bi bazdanê kir. Mirov digot qey dabû pey hinekan.

Wî jî nizanîbû, bê bi kû dediçû. Di dilê wî de, teşqeleyeke mezin hebû. Wî digot qey ji bo çûna deverekê dereng mabû û her direviya. Lê çi qasî hewil dida xwe jî nedihat bîra wî ko ji tu kesan re gotibû »em ê hevdu bibînin.« Ji lewre, gava ko baz dida, carê ji xwe re digot, »ma gelo ez bisekinim« û diket nava teşqeleyeke din. Di nav van ramanan de heta rawestgehê, beyî ko li devereke din bisekine, baz da.

Gelek caran li wî weha hatibû. Beyî îradeya xwe derdiket û digeriya. Çi cihên ko nas nedikirin hebûna, diçûyê. Heta ko li wî dibû êvar, li wan deveran rûdinişt û çavên xwe bi hêviyeke ko tu carî nediqediya li dora xwe digerandin. Digot qey hinekan ji wî re gotibû; were û ew jî ji ber vê yekê çûbû wira. Belkî jî ev tev de fantaziyên wî bûn. Ji lewre, hercar destvala û stuxwar vedigeriya malê û li ber vê rewşa xwe diket. Carinan jî digot qey dîn bûye û dilê wî bêtir bi wî dişewitî.

Du otobus hatin, li rawestgehê sekinîn û dîsa riya xwe domand. Robîn nizanîbû çima, lê li herduyan jî siwar nebû. Otobuseke din hat, li ber wî sekinî û deriyên wê yên pêşiyê vebûn. Robîn li şifêr niherî. Şifêr zilamekî qelew î kal î porsipî bû. Bi destê xwe işaretî Robîn kir ko siwar bibe. Wê gavê, weke ko şîrmaqek xwaribe, hat bîra wî ko ji malê bê pere derketiye. Valahiyek di dilê xwe de his kir. Xwe mîna ko xwarî erdê bûbe his kir.

Robîn çû ber derî û bi awayekî fediyokî got:

— Bilêta min tune ye.

Şifêrê qelew î kal, weke ko bibêje »tişt pê nayê« dîsa eynî işaret kir. Robîn sipasî wî kir û siwar bû. Digel ko otobus vala bû jî gava ber bi dawiyê ve diçû, ji nişka ve li ortê sekinî û li xwe zivirî. Çav li xortekî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ketibû. Du-sê gav bi şûn de avêtin û hat ber lêwik û bala xwe dayê.

Robîn veciniqî. Çavên wî fireh bûn. Belê. Ew bi xwe bû. Bişar bû.

Vî tiştî bala Bişêr jî kişandibû. Wî jî serê xwe rakiribû û li wî diniherî. Herçî Bişar bû, ruyê wî fireh û çavên wî kortçûyî û piçûk bûn. Porê wî yê xelek xelekî tev li hev bûbû. Xuya bû, ev çend roj bûn ko wî jî rîha xwe kur nekiribû. Herduyan jî mîna mirovên ko nizanibin bê ji kû hevdu nas dikir ziq li hevdu diniherî û mîna li hêviya hev bin ko yek ji wan dest bi peyvê bike, sekinîbûn. Bi dû re, Robîn hêdîka xwe bi hesinê paldanka wî girt û bi dengekî nizm, bi tirsa ko ew jî nizane bê ew ê çi bersivê werbigire, got:

— Ez dikarim tiştekî ji te bipirsim?

Bişar jî bi qasî wî şaş bûbû. Çavên xwe qels kirin, xweziya xwe daqurtand û got:

— Heke tu bixwazî, ka ji kerema xwe re bisekine, ez ji te bipirsim.

Robîn beyî ko tiştekî bibêje, di cihê xwe de sekinî.

Lêwik pirsî:

— Te jî ew kabûs dîtin, ne weha?..

## 14. Ez tu me, tu jî ez…

»Di her mirovî de hemû rewşên mirovahiyê hene...«, Montaigne

Robîn di pencereyê re li derve diniherî. Dinya tarî bûbû. Baran hey dibariya. Kolan tev şil bûbûn. Li herdu aliyên riya jêrê, kortal tije av bûbûn. Mekîneyên ko diçûn, xwe li kortalan dixist û av dipejiqandin dora xwe. Du kesên ji bo xwe ji ba û baranê biparêzin di bin sîwaneke reş de ketibûn milê hev, bi lez û bi gavên mezin dimeşiyan. Bayê ko xwe li sîwana wan dixist û carê ji ser serê wan dida alî, darên mezin ên li kêleka riyê jî dihejandin.

Piştî bîstikekê, vegeriya û çû li ser paldanka dirêj ya li hember Bişêr rûnişt. Herçî Bişar bû, du caran li Robîn bû. Qama wî pir dirêj bû. Robîn li cem wî mîna zarokekî xuya dibû. Destên xwe li ser sînga xwe danîbûn ser hevdu û li hember argûnê ko hindur dikir weke tenûrê lingên xwe li erdê dirêj kiribûn. Ji cerga ko hatibûn, ev çixareya çaran bû ko li ser hev dikişand.

Bişêr weke ko ji hinan veşêre, bi dengekî nizm got:

— Ev çî te ye, lo?

Û bi serê xwe û birûyên xwe ve medbex îşaret kir.

Robîn got:

— Hevala min e.

Piştî ko piçekî fikirî, lê zêde kir:

— Keçikeke baş e.

Gava ko Gulcanê bi siniya destê xwe ya ko sê fîncan qehwe û qedeheke av li ser bûn, ket hindur, herduyan bi hevdu re dengê xwe birî û bala xwe da wê. Rewşa wan bala Gulcanê jî kişand û têgihişt ko ew li ser tiştekî dipeyivîn û hatina wê bûye sebebê ko dev ji mijarê berdin. Her yekî ji wan rahişt qehweyekê. Gulcanê jî tevî siniya destê xwe li kêleka Robîn rûnişt û bala xwe da wan.

Piştî ko qehweyên xwe vexwarin û herkê çixareyeke din pêxist, dîsa dest bi peyvê kir. Robîn bêtir li wî guhdarî dikir. Bişar ji wî zêdetir dipeyivî û gava ko dipeyivî jî her li ber xwe diniherî û serê xwe bi kerb kil dikir. Li ser hev çixare pê dixistin. Xwelîdanka ber wî bi boçikên çixareyan tije bûbû. Ji bo ko meseleya xwe baştir bide fahmkirin, carê destên xwe jî bi kar dianîn. Carê jî li Gulcanê diniherî û digot, hela bê fahm dike, an na. Bi dû re, dîsa li Robîn diziviri û peyva xwe didomand.

Carekê, weke ko li hember pirsgirêkekê neçar bimîne, destên xwe bi herdu aliyan de rakirin û daxistin. Kesereke kûr kişand û ma. Bîstikekê deng ji wî derneket. Bêdengiyek li hindur çêbû. Piştî ko hebekî fikirî, Robîn ew bêdengî xera kir û dest bi peyvê kir.

Herçî Gulcanê bû, ji ber ko ew bi kurdî dipeyivîn, wê tiştek ji devê wan fahm nedikir. Carê li Robîn diniherî, carê jî li Bişêr. Ji ber ko Bişar carê di nav peyvê re, weke ko gumanan ji wê dike, li wê diniherî, an jî bi wê weha dihat, hebekî ji wî tirsiyabû. Dîsa jî dengê xwe nedikir û beyî ko tiştekî ji wan fahm bike, bi çavên tije meraq, bala xwe dabû wan û guhdarî dikir.

Bi dû re, wê ê ji xwe re bigotaya:

— Robîn li ser Bişêr gotibû »hevalekî min e« û ew bi min dabû naskirin. Lê belê, ne bi qasî ko hevalê hevdu bin, bi hev re dipeyivîn. Min dizanîbû ko tiştek di navbêra wan de hebû, lê min nizanîbû bê çi bû. Herçî Bişar bû, ne bi qasî Robîn kubar bû. Gava ko dipeyivî, carê di qorziya çavan re li min diniherî. Lê bi qasî ko min bala xwe dabûyê, ne yekî dilxerab bû û Robîn pir qîmet didayê. Ji peyva wî jî diyar dibû ko ne însanekî vala bû. Ji ber çi ewqasî bikerb bû, min têdernedixist.

Gavekê, Robîn li Gulcanê niherîbû û lê hay bûbû ko ew aciz bûye, peyv



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

guhertibû û bi tirkî dewam kiribû. Lê gava ko xwe ji bîr kiribû, dîsa vegeriyabû ser kurdî. Gava ko Gulcanê di ber xwe de bi vê rewşa wî keniyabû, bala wî jî kişandibû. Ketibû ber fediyê. Ruyê wî hebekî sor bûbû.

Piştî ko peyva xwe xelas kir, li wê zivirî, bişirî û got:

— Me tu pir bi tenê hiştî, ne weha? Ez dibêjim, tu aciz bûyî. Li qisûra me nenihere.

Gulcanê ji bo ko wan nexe ber şermê, tavilê got:

— Na, na! Ne ewqasî jî.

Ji bo ko bi wê re jî peyivîbûn, kêfa wê hebekî hatibû cih. Robîn û Bişar piştî bi qasî pênc deqîqeyan bê deng man û di wê navê re qehweyên xwe vexwarin, dîsa ketin peyvê. Lê vê carê, ji bo ko Gulcanê jî tev li suhbeta xwe bikin, bi tirkî dipeyivîn. Gulcanê jî rabû xwelîdankên ber wan vala kirin û çû ji wan re fêkî anî.

Bişêr rahişt sêvekê û got:

— Herçî jiyan e, her ko diçe, bêtir diherime. Têkîliyên germ nemane. Insan ji hev pir bi dûr ketine. Hevaltî mevaltiyên mîna berê jî nemane.

Rawestiya. Li Robîn û Gulcanê niherî. Keserek kişand. Wê gavê, Robîn çixareyeke nû pê dixist. Bi dû re dewam kir:

— Carinan ez dibêjim qey evînên berê jî tevde derew bûn, lê ez bawer nakim ko weha be. Ji ber ko di demên evînên mezin de, însan hê ewqasî fêrî zexeliyan nebûbûn.

Robîn di ber xwe de keniya û got:

— Na, lo! Ne ewqasî jî! Herçî evîn e, ji cerga ko însan hatine ser ruyê dinyayê, her hebûye. Bes her ko çûye, qîmeta xwe wenda kiriye. Ji ber ko însanan êdî heyecanin nû ji xwe re dîtîne. Ma dibe ko evînên di helbestên Fuzûlî, Ahmedê Xanî û Melayê Cizîrî de ne, giş derew bin. Ma qey çîroka Leyla û Mecnûn û ya Mem û Zînê, belasebeb nehatine heta îro!

Bi dû re, lê zêde kir:

— Hertişt ji pêdiviyê tête pê. Tew di vî zemanê ko mirov bêtir ber bi tenêtiyê ve dahf dide de, pêdiviya wî bêtir bi evînê heye.

Herçî mijara evînê bû, ew hebekî şên kiribûn. Ramanên wan ên li ser evînê, bala Gulcanê jî kişandibû. Lê, wê tu carî peyvên weha xweş yên ko pesinê evînê didin, nebihîstibûn. Kêfa wê jî ji vê mijarê re hatibû. Guhê xwe baştir dabû wan. Wê jî xwastibû tiştinan bibêje, lê him ji fediyan û him jî ji bo ko peyva wan nebire, nepeyivî.

Robîn got:

— Herçî evîn e, li gora kesan tê guhertin. (Hebekî fikirî.) Niha navê wî nayê bîra min, bes yekî gotibû; »evîn dereweke mezin e ko mirov bi wê xwe dixapîne.« Yekî din jî gotibû; »evîn gurekî har e, çi qasî mezin be, dikarî te ewqasî bileztir bixwe.«

Hersê jî keniyan. Bişêr serê xwe bi ken jê re hejand. Bi dû re Robîn sekinî, serê xwe bera ber xwe da û fikirî. Berê xwe da Gulcanê. Destê xwe danî ser milê wê û li çavên wê niherî. Kesereke kûr kişand û got:

— Û evîn… mîna sêhezarê pinîkêr e… bi destê herî erjeng jî dikare hemû lîstikan bide qezenckirin.

Dil û hinavên Gulcanê li hember vê gotinê heliyan. Wê tiştek ji peyva pinîkêr fahm nekiribû, lê bi gotina ko bi dû wê re hat, têgihişt bê Robîn dixwaze çi bibêje. Canê wê tevizî. Lerizî. Hema xwast ko xwe biavêje stuyê wî, wî himbêz bike û heta ko ji wê bê, bigirî û dilê xwe rehet bike. Lê wê weha nekir. Wê gavê li Bişêr hay bûbû û ji wî fedî kiribû. Xwasteka wê di dilê wê de mabû. Ew jî bi xwe têgihiştibû ko êdî hew dikare dev ji Robîn berde û bi wî ve hatibû girêdan.

Piştî ko bîstikeke din jî rûniştin û şevbihêrka xwe kir, li saetê niherîn. Şev dereng bûbû. Rabûn, solên xwe xistin pê û derketin. Li derve, tu kes tune bû. Erd tevde şil bûbû. Dinya jî pir sar bû. Wan di xwe re nedît ko bi şûn de vegerin. Ji bo ko necemidin, xwe bêtir nêzîkî hev kir û ketin milên hev. Ji ber bayê cemidî, bi zorê dimeşiyan. Qerisîn. Robîn bi gazinî di ber xwe de, got:

— Xwezî me tiştek ji Gulcanê bistendaya; bi vî awayî, em ê heta malê ji sermayê biqefilin.

Mekîneyek bi lez di ber wan re bihurî. Hindik mabû ko li bin guhê wan biketa. Xwe hema bi zorê ji ber da alî. Robîn bi dû mekîneyê re, destê xwe bi hêrs rakir û qêriya:

— Hey ker lawê kera! Ma tu li ber xwe biniherî, tu ê bimirî qey! Lawo, înşaleh mekîneya te dê biqelibe û situyê te di bin de bimîne! Tu hew bikaribî bigihêjî cihê xwe, înşellah!

Bişêr bi destê wî girt û got:

— De heydê, dev jê berde, lo! Em hebekî din jî xwe biştexilînin, em ê li vira bibin qeşa, ha!

Gava ko dimeşiyan, Robîn hê jî di ber xwe de xeber dida. Heta rawestgehê jî ew hêrsbûn ji ser xwe neavêt. Ji wî aliyê rêyê, çend zilam ji kuçeyekê derketin û ber bi wan de baz da. Bi dû re, çend kesên din jî xuya bûn. Her kesek bi aliyekî de direviya. Yên ko ew dîtin, bi destên xwe



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

işaret dikir, da ko ew jî birevin. Lê belê, wan tiştek ji wan fahm nekir. Gava ko yek di ber wan re derbas bû, bang kir:

— Birevin, lawo! Birevin!

Herdu jî di cihê xwe de mat mabûn û li kesên ko bi tirs direviyan diniherî. Wan yek sekinand.

— Xêr e, heyran? Hûn ji bo çi direvin?

Zilam li paş xwe zivirî. Bi dû re, weke ko tiştek dîtibe, veciniqî û dîsa reviya. Bang jî dikir:

— Birevin, lawo! Kê bigirin dibin dikujin, welleh!

Herduyan jî tiştek ji wî jî fahm nekiribû. Li hev zivirîn. Çavên herduyan jî fireh bûbûn.

— Kabûs!!!

Dengê silehan hat wan. Piştî wê, dengê reprepa leşkeran hat. Leşkeran ber bi wan de bazda, berê silehên xwe da wan û ji nişka ve li ser wan girêda. Bû vizîniya guleyan. Gule di ber guhên wan re diçûn. Li ser serê wan bû tara bêjingê. Di wê navberê de, dengê perwaneyekê ji ezmên hat. Piştî bîstikekê, helîkopterek li jorê xuya bû. Bombe diavêt der û dorê. Dengê teqîneke ko heft xwezî bi teqîna berê hat bihîstin. Bi wê teqîna mezin re agir bi çend avahiyan ket.

Robîn û Bişêr li dû xwe nediniherî û kuçe bi kuçe direviyan. Piştî bîstikekê, gihîştin daristanekê. Derketin ser dareke mezin û gulî û pelên wê darê ji xwe re kirin sitar û xwe di nav de veşart.

Her dever tarî bû. Leşkeran dev ji yên din berdabûn û di bin daran de jî li wan digeriyan. Bi şewqekê, herduyan jî berê xwe da wî aliyê ko dengê leşkeran jê dihat. Wan dît ko sê kes li ber dîwarekî, li kêleka hev hatibûn rêzkirin û leşkeran berên silehên xwe dabûn wan. Di bin şewqa lempeya ko di destê leşkerekî de bû, ruyên hersê zilaman xuya dibûn. Hersê jî xort bûn. Tev nediliviyan. Deng jî ji wan dernediket. Yekî ji wan xortan, destê xwe yê çepê kir kulm û ber bi jorê ve rakir, serê xwe jî bilind kir û li ezmên niherî. Herduyên din digiriyan.

Çavên Robîn û Bişêr firehtir bûbûn. Herdu jî têra xwe tirsiyabûn. Ew dîmena li hember wan û dengê perwaneya helîkoptera ko li ser serê wan diçû û dihat, tev li hev dibû û tirsa wan mezintir dikir.

Xwe hişk bi guliyên darê girtibû. Dilerizîn. Diqerisîn. Tirsê ew ji halekî xistibûn halekî din. Wan digot qey ew ê aniha erd biheje û herdu dê li ber leşkeran li erdê bikevin. Lê hîn ew weha difikirîn, dengê fermanekê hat bihîstin. Wî dengê bixezeb di wê tariyê de, hem Robîn û hem jî Bişar

ewqasî tirsand ko herdu jî ziravqetiyayî bûn.

Sileh giş teqiyan û agirê xezebê berê xwe da sê xortan. Hersê xort ketin erdê û di nav xwînê de vegevizîn. Xortê ko bîstika din kulma xwe bilind kiribû, li erdê jî û heta ko can da jî kulma xwe sist nekir.

Helîkopterê ji nişka ve şewqek avêt ser wan û leşkeran dora wan girt. Wan jî nizanîbû bê çawa çêbû, bi tenê dît ko leşker wan dadixin. Leşkeran ew birin û dan ber wî dîwarê ko bîstika din ew hersê xort li ber hatibûn kuştin. Çavên xwe ji ber şewqa lempeyê, bi zorê vedikirin. Tiştekî din xuya nedibû. Leşker li hember wan rêz bûn.

Dengekî xurt qêriya:

— Ateeeş!

Û sileh giş bi hev re teqiyan. Qudûmê wan şikestibû. Serê wan gêj bûbû. Ber çavên wan reş bûbû. Nava wan qetiyabû. Çongên wan sist bû û herdu jî li ser hevdu ketin erdê. Herduyan jî nikarîbû çavên xwe vekirana. Canê wan her diêşiya, lê wan nizanîbû, bê gule li kû wan ketibûn. Ji ber ko her devera laşên wan bi hev re diêşiya. Tev nediliviyan. Di cihê xwe de hişk bûbûn. Deng ji wan dernediket.

Bi dû re dengekî din hat wan:

— Robîn! Robîn!

Robîn veciniqî û çavên xwe vekirin. Li wê zivirî. Mîna ko ji binê bîreke kûr derketibe, bêhna wî çikiyabû. Him bi lez hilma xwe distend, him jî ji tirsan digiriya. Xwe avêt situyê wê û weha sekinî. Herçî Bişar bû, di şûna xwe de serê xwe bera ber xwe dabû û diponijî. Robîn di himbêza wê de dilerizî û dinaliya:

— Min bernede, Gulcan! Min bernede!

## 15. Bûkên nû û yên berê...

Dinya rohnî bûbû. Dengê bayê derve, dihat heta hindur. Sobeya hindur, ji êvarî de venemirîbû. Leyla Xanim ji şeveqê de rabûbû. Piştî ko nimêja sibehê kiribû, ketibû medbexê û firaxên ko ji roja berê de ketibûn ser hevdu dişuştin.

Herkes di xewê de bû. Resûl Beg ji ber ko di xwe re nedîtibû, wê sibehê jî ranebûbû nimêjê. Wî hercar weha dikir. Nexweşiya xwe jî ji xwe re dikir mahne û ranedibû. Leyla Xanimê carinan di nav malê de, qerfên xwe pê dikirin û behsa vî hawê wî dikir. Resûl Beg nîvrokî radibû, diçû destmêja xwe digirt û nimêja xwe qeza dikir. Gava ko nimêj dikir jî weke

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ko hinan dabe pey wî, bi lez diçû sucdeyê û radibû ser xwe. Gava zarokên wî li wî û li nimêja wî ya ko wî di hindurê deqîqeyekê de dikir, ecêbmayî diman, mina ko ji wan re digot »guh nedinê« dikeniya û destê xwe kil dikir.

Leyla Xanim gava ko di medbexê de bi paçikekî şil fayans paqij dikirin, ji hêrsa xwe di ber xwe de digot:

— Îşev, ez ê ji Mîtanî re bibêjim; bila vê carê hestiyên wê bişkîne. Ew ê heta nîvro rakeve û ez ê tevî vî porê xwe yê spî rabim û ji wê re xizmetê bikim. Wele wele! Icar me li bavê xwe zêde kir, ha! Yê min, heta ko xwe-sa min sax bû, min nehiştibû ko ew rojekê jî destê xwe bide karekî. Gava ko ket ber destan jî min bin wê paqij dikir. Heke rojekê tiştekî weha bi me were, vê kûçikbava ha, dê li me jî nenihere û me biavêje derve, weleh!

Her ko ji xwe re weha digot, bûka wê bêtir li ber çavên wê reş dibû. Binevşê di odeka xwe ya ko deriyê wê hertim girtî bû de, di himbêza mêrê xwe de û beyî ko hayê wê ji van tiştan hebe, di xewê de bû. Heta derengê şevê, di himbêza mêrê xwe de veketibû û behsa xeyalên xwe yên li ser zaroka di zikê xwe de kiribû.

Leyla Xanimê çayê dabû ser û rahiştibû tizbiya xwe û çûbû, li hêwanê ji xwe re rûniştibû. Gavekê rabû û çû ser Meryemê nixumand. Herçî Meryema piçûk bû, di xew de hertim ser xwe kifş dikir. Digel ko hindur germ bû jî Leyla Xanim gava ko bi xwe dihisiya, ji ber ko ev êdî ji wê re bûbû tebîetek diçû ew saxtî dikir û dihat.

Piştî bîstikekê, dengê zîla saeta hindur hat. Ji odeka ko zarok lê radiketin, dengê teperepa lingan hat bihîstin. Bi dû re, deng ji saetê biliya. Deriyê odekê vebû, Mehabad jê derket û ber bi lawaboyê ve çû. Gava ko vegeriya, berê li medbexê niherî, bi dû re jî hat hêwanê. Mîna ko dike bi hinekan re şer bike, herdu destên xwe dan kêlekên xwe û ji diya xwe re got:

— Dayê, qey te medbex paqij kiriye?

Leyla Xanimê tizbiya xwe dikişand. Serê xwe mîna ko bibêje »erê,« kil kir. Mehabadê awirên xwe tûj kirin, destê xwe ber bi odeka Mîtanî ve kil kir û got:

— Çima xanimê ranebûye?

Leyla Xanimê mîna ko hebekî dilê xwe girtibe, lê weke ko hayê wê ji tiştekî tunebe û tew ne di bala wê jî de be, got:

— Nizanim.

Mehabadê di ber xwe de kir ufe uf û vegeriya medbexê. Ji zû de ye ko

ew jî ji ber tevgerên Binevşê aciz bûbû. Carinan, gava ko li qayişkişandina wê û diya xwe difikirî, ji xwe re digot:

— Xwezî derfet hebûya û me ew cihê bikirana, lê belê em çi bikin. Mecbûrî...

Ji cerga ko Binevşê û Mîtanî zewicîbûn, di nav malê de dijiyan. Li malê odekek li ser hesabê wan bû, lê dîsa jî him yên malê û him jî Binevşê ji ber vê rewşê ne razî bûn.

Di serî de tu problem di navbera wan de çênedibû, lê bi dû re, her ko bêtir hînî hevdu bûn û perda ruyê wan li hember hevdu qetiya, wan êdî dilê xwe jî ji hev digirt. Leyla Xanimê dixwast ko Binevşê jî wek dema ko ew bûk bû, ji malê re bûktiyê bike. Lê, Binevşê wek ko wê dixwast nedikir û bi serê xwe hereket dikir.

Gava Mehabad ji nû ve vegeriya hêwanê, Leyla Xanima ko hê jî tizbiya xwe dikişand, keserek kişand û got:

— Ez dizanim, bê meqseda wê çi ye.

Mehabadê guhên xwe bi meraq miç kirin.

Diya wê dewam kir:

— Meqseda wê ew e ko em wan ji malê cihê bikin.

Mehabadê di ber xwe de kir niçe niç. Wê ji berê de bi vêya dizanîbû, lê ya ko ew li ber diket ew bû ko diya wê bi awayekî tundî li hember fikra cihêbûnê derdiket. Ne ko Mehabadê heq nedida Binevşê jî. Heke ji wê bihata pirsîn, wê ê bigotaya, bila cihê bibin. Lê belê, ji ber rewşa malê û sermiyanbûna Mîtanî, wê dizanîbû ko ev tişt niha nabe. Her çi qasî rewşa wan ne xerab bûya jî ger Mîtanî ji malê cihê bibûya, jê û pê ve dê rewş bihataya guhertin. Ji ber ko Robîn bi vî awayî nikarîbû sermiyantî bikira û wê jî bi tena serê xwe nikarîbû. Carinan, li ser vê meseleyê bi Mîtanî re jî dipeyivî, lê Mîtanî nedixwast ko nîqaşeke bi vî rengî têkeve nav malê. Wî digot, »em mecbûr in bi hev re îdare bikin.«

Leyla Xanimê dîsa dewam kir:

— Erê wele! Xweş mesele ye! Ji sibehê heta êvarî, heta ko ez vê malê didim ser hev, hal di min de namîne û vêya ko me ji nav rêxê derxist, bila ji xwe re rakeve. Tew îja zikê xwe ji xwe re dike mahne. Hingî radikeve, ew ê zaroka xwe jî di zikê xwe de bifetisîne, weleh!

Mehabadê bi gazind got:

— Ez nizanim, ez çi bikim ji we!

Leyla Xanimê di ber xwe de got:

— Zaroka wê jî zarok bûya! Xwedê kir ko keçik e!


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Mehabadê dîsa keserek kişand û vegeriya çû medbexê. Li dema çayê niherî. Çû li deriyê wan xist û ew şiyar kirin. Dengin ji hindur hatin. Binevşê mêrê xwe şiyar dikir. Derî vebû. Serê Binevşê di ber de, çavên wê li xew, di ber Mehabadê re bihurî û berê xwe da daşirê.

Zikê wê mezin bûbû, êdî bi temamî xuya dikir. Ruyê wê, dibe ko ji ber wî halê wê be, hebekî werimîbû. Herçî Mehabadê bû, di pey wê re, ji hêrsa xwe dev li lêva xwe kir û serê xwe kil kir. Gava ko Mîtanî jî ji odekê derket, ji bo ko kincên xwe li xwe bike, çû odeka xwe.

Gava sifre hat danîn, zarokên din jî şiyar bûbûn. Hew Robîn û Resûl Beg di xew de mabûn. Leyla Xanim li hêwanê, berdilka Meryemê li wê dikir. Porê wê ji paşiyê ve hûnabû. Herçî Serdar bû, berî Meryemê rabûbû, bedlê xwe yê reş ko ji êvarî de hatibû ûtîkirin li xwe kiribû û li ber neynika lawaboyê porê xwe jole dikir. Di ber re jî ji xwe re difîkand. Qutikekî spî yê dibiriqîne, di bin êlegê bedlê wî re xuya dibû. Qirewateke sor xistibû situyê xwe û rîha xwe jî kur kiribû.

Li ser sifreyê, zêde nepeyivîn. Lê dengê kenê Meryemê ko henekên xwe bi porê Serdar î jolekirî dikir, dihat bihîstin. Serdar jî carê tepek li serê wê dixist, da ko wê bide sekinandin. Mehabad jî bi wan dikeniya.

Taştiya xwe xwar û berî ko derkeve, Mîtanî ji diya xwe re got:

— Yadê, min pere daye Binevşê, îroj tu û ew biçin nexweşxaneyê.

Leyla Xanim berî ko bipeyive, di bin çavan re li Binevşê niherî û got:

— Xêr e? Çî wê heye?

Mîtanî ruyê xwe hebekî tirş kir, serê xwe bera ber xwe da.

— Ez nizanim. Do verişiyaye. Dibêje, ez ne baş im.

Wê gavê, Leyla Xanimê berê xwe da Binevşê û weke ko bi wê re bixeyide, got:

— Ma çend mehên te qediyane, lê?

Binevşê ket ber fediyê. Ruyê wê hebekî sor bûbû. Serê xwe bera ber xwe da.

— Şeş meh xelas bûn.

Leyla Xanim li Mîtanî zivirî û weke ko henekên xwe bi wan bike, got:

— Hê tişt tune ye, lo! Mala te nekeve! Tu dibêjî qey xelkê tu carî zarok neanîne.

Binevş bêtir ket ber fediyê.

Mîtanî got:

— Tişt pê nayê. Hûn dîsa jî biçin. Hela ka bê textor çi dibêjê.

Leyla Xanimê ji neçarî got:

— Baş e. Em ê biçin. Lê, ez dibêjim; em ê belasebeb pereyên xwe bi bidin textoran.

Mîtanî fahm kir, bê nêyta diya wî çi ye.

— Na, na! Ne belasebeb e. Hela hûn biçin. Piştî ko hûn vegeriyan jî telefonî min bikin. Bila hayê min jê hebe.

Bi dû re, li aliyê odeka Resûl Beg niherî û got:

— Bavê min jî bi xwe re bibin. Bila ew jî hebekî ji xwe re bigere. Li hindur aciz dibe.

Leyla Xanimê bi mahdekî tirş li Binevşê niherî. Niherîna wê bala Mîtanî jî kişand. Wî jî mahdê xwe tirş kir û aciz bû. Binevşê bala xwe nedabûyê. Serê wê hê di ber wê de bû û li wan guhdarî dikir. Leyla Xanim ji bo ko bi ya wê nebûbû, li ber ket. Keserek kişand. Dîsa li wî zivirî.

— Baş e. Bila weke te be, lawo.

Mîtanî bi dû re destekî xwe ber bi wê de rakir û ji jina xwe re got:

— Binere! Tu dîsa wî kirasê xwe yê do li xwe nekî, ha! Tiştekî ko zikê te zêde xuya neke, li xwe bike.

Binevşê di ber xwe de got:

— Temam.

Ji ber ko mêrê wê li ber xwesa wê û gorma wê Mehabadê û zarokên din bi wê re xeyidîbû, li ber xwe ketibû. Piştî ko mêrê wê derket, ket odeka xwe û giriya. Nehat hêwanê û sifre jî ranekir, lê Leyla Xanimê vê carê guh nedabûyê. Ji ber ko Mîtanî li ber herkesî ew rezîl kiribû, dilê wê jî li Binevşê rehet bûbû. Piştî ko Leyla Xanimê Serdar û Meryem jî bi rê ve kirin, çû xwe li ser nivînên xwe dirêj kir û bîstikek tê re neçû jî ket xewê.

Heta nîvroyê ranebû. Hew carekê gava ko Resûl Beg rabûbû, ji odekê deriketibû û bi dû re, dîsa vegeriyabû, bi dengê lingên wî bi xwe hisiyabû,.

## 16. Û jan jî kedî dibin...

Yekî rokekê li ser dîwarekî bi boyaxeke sor nivîsandibû:
»û jan jî kedî dibûn di nav çûyin û hatinên demsalan de
bi bayekî nas î kevin naxape êdî ev dil...«

Ro dihat nîvro. Li derve, baranê dest pê kiribû. Resûl Beg nimêja xwe qeza kiribû û hatibû ji xwe re li ber televîzyonê rûniştibû. Di televîzyonê de filîmekî li ser gundiyan hebû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bi dengê telefonê re veciniqî û rabû ser xwe. Çû ser serê Robîn û ew şiyar kir. Gava ko Robîn çavên xwe vekirin jî weke ko dixwaze tiştekî bibêje, li çepikan dixist û aliyê hêwanê nîşan dida. Wê gavê Robîn tiştek ji wî fahm nekir, lê gava ko dengê telefonê dîsa hat, rabû ser xwe û xar bir telefonê. Ji aliyekî jî şîlaqa çavên xwe paqij dikir. Resûl Beg jî da pey wî û hat li ber wî sekinî.

— Elo, kerem bikin.

Dengekî zilaman bi kurdî û bi ken bersiv dayê:

— Merheba ji te re, Robîn.

Robîn deng nas nekir.

— Merhaba ser çavan. Tu kî yî?

— Te ez nas nekirim, ne weha?

Dengê hember weke ko henekên xwe bi wî bike dipeyivî. Ji lewra hebekî hêrs bû. Ji ber ko kêfa wî qet ji van henekan re nedihat. Resûl Beg carê niquşk li wî dixistin û weke ko bibêje »kî ye«, destê xwe radikir û li wî diniherî. Robîn qet bersiv nedidayê. Hew carekê weke ko bibêje »bes e, lo« destê xwe jê re kil kiribû. Dengê hember dîsa keniya.

— Xayin! Ma mirov hevalê xwe ji bîr dike?

Vê carê, êdî xulqê wî tam teng bûbû, lê ji bo ko ev xuya neke, dîsa weke berê pirsî:

— Ev tu kî yî?

— Ez im, ez! Elî.

— Elî?

Çi qasî fikirî jî kesekî bi navê Elî nehat bîra wî.

Dengê hember dîsa got:

— Heyla Xwedê li te bixe, lawo! Ez Eliyê Artîst im. Artîst!

Robîn bi vê gotinê, ew nas kir. Ruyê wî anî ber çavên xwe. Nizanîbû bê dê çi bigota. Hema ji ber xwe ve got:

— Wey, Artist! Tu ji kû derketî, lawo?

— Erê lawo, te em ji bîr kirine, ne weha?

Kenîya, nizanîbû bê çi dikir.

— Lawo, ma ez hê nû ji xew rabûme. (Bi dû re jî got.) Hela tu dev jê berdî. Tu ji kû digerî?

Elî keniya.

— Ez li Stenbolê me.

— Tu henekên xwe bi min dikî. Tu li kû yî, niha?

— Weleh, ez li Stenbolê me. Ez aniha jî li cem Mîtanî mim. Ger tu

bawer nakî, ez ê telefonê bidim wî.

Piştî ko dengê Mîtanî hatê, Robîn hê nû bawer kir.

Got:

— De binere. Tu bi tu deveran ve neçe, ha! Va ez aniha derdikevim. Hema heta saetekê ez li wira mim.

Bi lez xwe girê da û derket. Ji ber barana ko dibariya, rê hatibûn girtin. Ji lewre, heta ko mekîne gihîşt cihê ko Robîn dê lê daketaya, du saet derbas bûn.

Herçî Elî bû, gava ko Robîn ket kargeha Mîtanî, berê ew nas nekir. Lê belê, ji ber berçavka wî û kenê li ruyê wî ket gumanê. Li hevdu niherî. Robîn dikeniya. Elî rabû ser xwe û çû pêşiya wî. Hevdu himbêz kir.

— Tu bi xêr hatiyî. Tu çawa yî, lo?

Li hember hev, li ser kursiyan rûniştin. Ji cerga ko Robîn hatibû Stenbolê, hevdu nedîtibû. Hey bi ken li hevdu diniherî. Mîtanî rabû çay ji wan re xwast. Karkerekî wî çû pênc-şeş çay anîn û hat. Him henek menek bi hevdu dikirin, him jî Elî ji wan re behsa sedema hatina xwe ya Stenbolê dikir.

Herçî Elî bû, li Diyarbekirê bi alîkariya bavê xwe, ji xwe re dikanek vekiribû. Niha jî ji bo ko di dikanê de bifiroşe, hatibû ji febrîqeyeke tekstîlê alavan bikire. Çer ko daketibû, çûbû alav stendibûn û biribûn terminalê, bi dû re jî hatibû cem Mîtanî. Gava ko ji Robîn re got »ez zewicîme û du zarokên min jî hene«, Robîn ecêbmayî mabû. Hayê wî ji van tiştan çênebûbû.

Piştî ko bi hev re firavîn jî xwar, herduyan xatir ji Mîtanî xwast û derketin.

Dinya sar bû. Berf û baran tev li hev dibariyan. Herduyan ber xwe girt û ketin milê hev. Li ber derî sekinîn.

Robîn li dora xwe niherî û got:

— Em biçin kû, lo?

— Weleh, hema tu me bibî kî derê, em ê biçin wira.

— De hey em nikarin di vê hewayê de, tu tahmê ji xwe bikin. Hema ka em biçin malê çêtir e.

Xwe bera aliyê behrê dan. Herçî Elî bû, qama wî hema hema bi qasî ya Robîn bû, bes hebekî ji wî girstir bû. Ruyekî wî yê weha hebû ko mirov digot qey Xwedê ji qazî weha afirandiye. Çavên wî di bin birûyên stûr de wenda dibûn. Bêvila wî piçûk û gulover bû. Wexta ko dimeşiya, milên wî bi herdu aliyan ve kil dibûn.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Hevaltiya wan ji salên lîseyê hebû. Wê gavê, ji bilî Şêxo ji xwe sê-çar hevalên Robîn tenê hebûn. Elî jî yek ji wan bû û gelek tişt bi hev re par kiribûn.

Piştî ko hebekî meşiyan, Elî ji wî re got:

— Mîtanî got ko te dev ji mektebê berdaye.

Robîn keserek kişand. Destê xwe bi gazind rakir û got:

— Erê, lo! Belasebeb bû.

— Te bi zorê qezenc kiribû, lawo.

— Na lo, dev jê berde. Hingî ji min re bûbû meraq, ez ketibûm îmtihanê. Ji xwe, Mîtanî nehişt, ez qeyda xwe jê bibim. Heqê wê radizîne banqeyê. Bi xêra wê, em narin leşkeriyê jî.

Elî tiştekî din nepirsî. Ji xwe, ji ber sermayê hew dikarîbû bipeyiviyana jî. Di bin baranê de şil bûbûn. Gava ko behsa rojên xwe yên berê dikir, Robîn pirsî:

— Îja, hevalên me yên din çi dikin, lo? Te qet behsa wan nekir. Qey hûn hevdu nabînin?

Elî piçekî fikirî û li bersivekê geriya, lê tiştek negot.

Bi dû re, wî jê pirsî:

— Tu li kê dipirsî?

— Mesela, Selman hebû, Şêxo hebû û…

Li navê yekî din jî fikirî. Nehat bîra wî.

— Navê wî çi bû, lo! Te dît ew ê ko li dora qîza polîsekî digeriya, lo.

Tu deng ji Elî derneket. Bi dû re, got:

— Ha… tu behsa Hemdîn dikî.

Elî weke ko nedixwast behsa wî bike, navê wî gotibû. Vêya bala Robîn jî kişandibû.

— Erê erê. Hemdîn. Ma çi bû ji wî?

Elî kesereke kûr kişand. Deng ji wî derneket. Piştî ko hebekî meşiyan, di ber xwe de got:

— Hemdîn sala par hat kuştin, Robîn.

Kenê li ruyê Robîn ji nişka ve cihê xwe ji ecêbmayinê re hiştibû. Mat mabû. Sekinîn. Robîn ziq li wî diniherî. Nepeyivî. Elî dîsa ket milê wî û meşiyan.

Ji wî re got:

— Apê wî li wî dabû. Tê bîra te, ne weha? Apê wî Fermano sîxur bû. Dihat gotin ko çend caran pev çûne. Hemdîn carekê ew birîndar jî kiribû, lê nemir, bênamûs! Carekê deng hew ji Hemdîn derket. Piştî wê

bi rojan jî meytê wî li ser riya Bismilê hat dîtin.

Hew peyivîn. Li otobusê siwar bûn û çûn malê.

Gava ko daketin, Elî got:

— Te dizanîbû ko Selman derketiye çiyê, ne weha?

— Na, lo!

— Weleh! Ew jî hema hema sala te neqediyabû, derket.

— Hayê min jê çênebûye.

Piştî ko hebekî ponijî, got:

— Tu xeber ji wî hene gelo? Hê sax e?

— Na. Tu xeber jê derneket. Pismamên wî hene, ez carinan ji wan dipirsim. Hayê wan jî ji wî tune ye. Ez dibêjim qey hê sax e.

Robîn rojên berê anîn bîra xwe. Ew û Hemdîn û Şêxo tu carî ji hev nediqetiyan. Wê roja ko kuştina Seydo bihîstibûn jî herduyan bi wî re baz dabû û heta ji wira bar kirin û hatin Stenbolê jî ji wî neqetiyabûn. Bi hev re diçûn û bi hev re dihatin.

Di ber xwe de kir niçe niç. Çendekî bê deng meşiyan. Bi dû re, ji bo ko nepirse, di ber xwe de da, lê dîsa jî bi xwe nikaribû, got:

— Le Şêxo?

Elî jî li hember vê pirsê, bîstikekê bêdeng ma.

— Hayê te ji wî jî tune ye, ne weha?

Robîn beyî ko serê xwe rake, got:

— Naaa.

Elî keserek kişand, mijangên xwe rakirin li cihekî gelekî dûr niherî û sekinî.

— Şêxo di hefsê de ye.

Tu deng ji Robîn derneket. Ji vê rewşê diyar dibû ko êdî hertişt baş fahm kiribû û hewce nedîtibû ko li tiştekî din bipirse. Elî piştî ko di vê rewşa wî de têgihişt, bêtir hêrs bû û lêva xwe gez kir. Serê xwe rakir û li jorê niherî. Serê xwe bi kerb hejand.

Dinya dicemidî. Berfê hêdî hêdî erd digirt. Ser mekîneyên ko li qiraxa riyê hatibûn rêzkirin, bi berfê ve dihat nixumandin.

Elî dîsa çavên xwe dagerandin ser riyê û serê xwe bera ber xwe da.

— Dihat gotin ko gerîlayekî li ser wî îfade daye. Qey wî şevekê ew li mala xwe hewandibû. Gava ko tê girtin navê hemû kesên ko alî wî kiribû, dide. Şêxo jî li xwe mikur nehat. Dihat gotin ko kûçikan ew pir êşandiye. Heyşt sal ceza jê re tê xwastin. Lê mehkemeya wî hê jî xelas nebûye.

Bi dû re jî got:



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

— Ez carinan diçim cem wî. Bes zor e. Êdî nahêlin em hevdu bibînin. Ez jî nameyan ji wî re dişînim. Gava bihîst ko ez ê werim Stenbolê, ji te re silav şandin. Digot, ez dixwazim wî jî bibînim.

Robîn pir li ber ketibû. Serê xwe her bi kerb kil dikir û li ber xwe diniherî. Elî jî ferq kiribû, bê çi tesîr lê bûye. Ji ber vê yekê, wî jî hew behsa wî kir.

Ji ser riyê dageriyan dikanekê. Elî hinek şêranî kirî û derket. Heta ko gihiştin malê, berf jî sekinîbû. Di şûna wê de, bayekî kur dest pê kiribû. Rojê ji bo çûyinê, haziriya xwe ya dawiyê dikir. Hêdî hêdî dibû êvar.

Wê şevê heta dereng şiyar man. Behsa rojên ko bi hev re derbas kiribûn kir. Behsa hevalên xwe yên berê ko niha bûbûn noka li kevir û wekî din jî behsa evînên berê kir. Robîn ji wî re behsa Gulcanê jî kir. Hew behsa Nûşînê nekir. Ew jî Elî çend caran xwast ko peyvê bîne ser wê, lê gava dît ko Robîn behsa keçikeke nû dike, dev ji wê peyvê berda.

Nîvrokî, Elî xatir ji malê xwast û herdu bi hevdu re derketin, çûn termînalê. Gava ko gihîştin termînalê, ji çûyina mekîneyê re, hê saetek hebû. Ji ber ko dinya sar bû, ew jî çûn li kafeteryaya li kêleka termînalê rûniştin. Herkê çayek vexwar. Berî ko rabin, Elî hebekî jî bi tirs, weke tiştekî ko wî ji bîr kiribe bîne bîra wî, got:

— Te qet li Nûşînê nepirsî.

Ji cerga ko hatibû, dixwast li vê yekê bipirse, lê ji ber ko peyv nehatibû ser, cesaret nekiribû ko vê mijarê veke. Herçî Robîn bû, ji cerga ko Elî dîtibû, him digot hema bila neyê bîra wî û wê behsê veneke, him jî dixwast ji wî re rûne û behsa wê bike. Ditirsiya. Ji lewre, gava ko navê wê hat gotin, berê xwe da aliyê camê. Tiştek negot. Aciz bû. Ji hêrsa xwe, diranên xwe jidandibûn û li derve diniherî. Bi dû re lêva xwe xwar kir, keserek kişand û got:

— Dev jê berde, lo… Tiştê çû, nede dû.

Elî bişirî û got:

— Weleh ez nikarim, Robîn. Keçikê silav jî ji te re şand.

Robîn, him kêfa wî bi vêya hat, him jî hêrsa wî û liberketina wî mezintir bû. Ji kerban, keniya. Elî bala xwe dida tevgerên wî û dixwast têbigihêje bê ka çi difikirî.

Robîn çixareyek pêxist. Bêyî hişê xwe hilmeke kûr lê xist. Di nav dûmanê de ma. Mîna ko ruyê Nûşîn anîbe ber çavên xwe, hebekî bêdeng ma û li ber xwe niherî. Bi dû re, bi dengekî lerzokî got:

— Xêr e? Bi çi ruyî silavan dişîne?

— Ez jî nizanim. Carinan em hevdu dibînin. Lê çavên min bar nabin ko ez bi wê re bipeyivim. Rojekê hat dikana min. Qey ji hinan bihîstibû ko nûmaraya telefona te li ba min heye. Ji min xwast. Min got, »ez nikarim bidim.« Wê jî behsa te kir. Serê xwe bera ber xwe da û giriya. Gava ko Mîtanî hatibû Diyarbekirê, wê ew li sûkê dîtibû. Li gora ko ji min re got, ji wê rojê û vir de ye ko her roj xewna te dibîne. Gava ko serê xwe rakir, min li çavên wê niherî, Robîn. Derew nedikir. Bi rastî jî ji te hez dike.

Robîn bêtir hêrs bû. Ev yek berî niha bi çar pênc salan ji wî re bihataya gotin, wî ê belkî reaksiyoneke cidatir nîşan bidaya. Wê gavê, peyveke mîna vêya dikarîbû bikira ko Robîn bi şûn de vegere welêt jî. Lê îro?.. Îro ji bo van tiştan, dereng e êdî.

— Te jî bawer kir, ne weha? Ma qey ez nizanim, Elî? Min dizanîbû ko tu ê dawiya dawiyê behsa wê jî bikî. Û va ye te asoxî bi a xwe kir.

Serê xwe bi kerb hejand, destê xwe kir hutik û li maseyê xist. Çend saniyeyan bêdeng sekinî û li ber xwe niherî. Diranên xwe hişk jidandin. Kesereke kûr kişand. Bi destê xwe yê rastê eniya xwe hebekî mist da. Bi dû re, dîsa peyva xwe domand:

— Piştî ewqas salan, Elî. Piştî ewqas salan, ew ê silavan ji min re bişîne, ha!. Wexta ko li kuçeyên Diyarbekirê xwe dikişand, em nedihatin bîra wê, ne weha!

Robîn bi hêrs dipeyivî. Mirov dizanîbû ko dilê wî ji kerban tije bûye. Mirov digot qey ew ê aniha serê xwe deyne û bigirî. Dengê wî dilerizî.

— Yê te… tu silavên min li wê neke, Elî. Min têra xwe kişandiye. Min ji ber wê, tu xêr ji vî umrê xwe nedîtiye. Ji cerga ko ez ji wê veqetiyame, her ko ew tê bîra min, eynî weke ko xencereke zingarî li ser dilê min bikeve, Elî! Tu jî hatiyî û ji min re behsa giriyê wê dikî. Ma qey ew dikare bi qasî min bigirî? Ez ji kerba wê, hertim dev li canê xwe dikim, Elî! Tiştê ko vê qahpikê aniye serê min, dijmin jî nayne serê dijminan. Ma ez ê çawa baweriya xwe bi giriyê wê bînim? Ma qey tu vê rewşa min nabînî?

Û dîsa berê xwe da aliyê camê. Çavên wî zor didan sînorên xwe. Elî serê xwe bera ber xwe dabû. Ew jî poşman bûbû ko behsa Nûşînê kiribû. Divê ji berê de reaksiyona Robîn bihesibandaya. Ji ber ko Robîn hêrs bûbû û bi dengekî bilind bi wî re xeyidîbû jî bêtir li ber xwe ketibû.

Çend kesên li dora wan jî bala xwe dabû wan. Robîn piştî ko hebekî hat ser xwe, çixareyeke din jî pêxist. Tiliyên wî dilerizîn. Bîstikeke bê deng man. Di navberê de, carekê zivirî û li çavên Elî niherî. Bi dû re, dîsa veg-


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

eriya ser camê û beyî ko bala xwe bide tiştekî, li kesên di nav wê berfa ko hûrik hûrik dibariya de diçûn û dihatin niherî.

Bêhna wî hebekî hatibû ber. Dîsa li Elî zivirî û got:

— Xwezî te ez fahm bikirama, Elî. Wê gavê… min ê ji te re tişt miştên din jî bigotana.

Çendekî sekinî. Fikirî û li Elî niherî.

— Ez ji te tiştekî bi tenê dixwazim, Eli. Gava tu daketî, ji bîr neke, berê berê biçe cem Şêxo. Divê tu tu carî nehêle ko ew bibêje »hevalên berê ez ji bîr kirime.« Û jê re bibêje, Elî. Min hê ew rojên ko em li cem hev bûn, ji bîr nekirine û ez bêriya wî dikim.

Hew peyivîn. Herçî Elî bû, tu gotin ji devê wî derneket. Heta ko xatir ji hev xwast û li mekîneyê siwar bû jî li ser tiştekî din nepeyivîn. Otobusê li ser berfa erdê qirçe qirç ji tekerên xwe derxist û hêdî hêdî bi paş ve kişiya û ji peronê derket. Serê Elî hê jî di ber wî de bû.

## 17. Ez ji te hez dikim, Gulcan…

Tarî diket erdê. Dinya sar bû. Berf bi hemû hêza xwe dibariya. Digel ko dibû êvar jî erd di bin berfê de, mîna zeviyên pembo xuya dibû. Ji ber şewqa berfa erdê, mirov nikarîbû lê biniheriya. Darên ko tazî mabûn, xwe bi berfê nixumandibû. Bayê kur, meş zehmet dikir, ji sermayê, ruyê mirov pûç dikir. Ezman xuya nedibû. Zivistanê cihê xwe xweş dikir.

Robîn ji bo ko neqefile, xwe xûz kiribû, destên xwe xistibûn bêrîkên qapûtê xwe û dimeşiya. Xwe baş girê dabû. Qapûtekî kesk ko heta paş situyê wî digirt û ew ji hercar girstir rê dida, li xwe kiribû. Herçî berf bû, xwe li ser porê wî û rîha wî ya ko ev deh roj bûn ko nehatibû kurkirin danîbû û ew mîna kalekî dida xuyakirin.

Li der û dora wî, hin zilaman ji xwe re maseyên piçûk danîbûn û kincên zivistanê yên ko ser wan bi naylonan hatibû nixumandin, difiroştin. Çend xortên ko dest û milên xwe tije tiştên firotinê kiribûn, bi wan kesên din re bang dikir:

— Saet, bazin, pênûs, zincîr…

Dengên kesên ko dixwast tiştan bifiroşin, tev li hev dibûn. Di ber wan re, kesên ko xwe xûz kiribû û bi lez dixwast bigihêjin derinan, diçûn û dihatin.

Serê Robîn di ber de, di nav wan kesan û dengan re derbas bû. Ruyê wî, ji ber bê sor bûbû. Li rawestgehê, di nav gelek kesên din de, xwe da ben-

da otobusê.

Hin kesan pif destên xwe dikir, hin kesên din jî ji bo ko xwe germ bikin, di cihên xwe de direqisîn. Çavên herkesî bi bêsebirî li riyê bû. Mekîne diçûn û dihatin. Her ko mekîneyek dihat, giş bi hevdu re ber bi wê de direviyan û nivîsa ser wê dixwend.

Herçî Robîn bû, hingî di hindur de aciz bûbû, rabûbû û bi tena serê xwe derketibû derve. Di bin wê berfê de, bêserî meşiyabû. Çûbû li peravê, li kafeteryayekê rûniştibû û li deryaya ko dîsa har bûbû temaşe kiribû. Çavên xwe bera ser keleka ko li ser pêlan bi tena serê xwe kil dibû, dabûn. Heta êvarî, li wê kelekê temaşe kiribû û aciz bûbû.

Meşiyabû. Beyî ko ber bi deverekê ve biçe û beyî ko li wext û sermayê bifikire... Gava ko westiyabû jî telefonî Gulcanê kiribû û gotibû »ez aciz bûme, ka were, em hevdu bibînin.« Gulcanê jî gotibû »ka tu were cem min, derve sar e. Ez li malê, li benda te me.«

Hindurê mekîneyê bûbû ko mirov nikarîbû gava xwe biavêje. Berî ko otobus tije bibe, ji xwe re cihek zeft kir. Him serê wî ji ber êşê dikira biteqiya, him jî hingî di wê sermayê de meşiyabû, westiyabû. Çavên wî diçûn ser hev. Carê serê wî diket ber wî û dîsa şiyar dibû. Zêde hewil neda xwe ko şiyar bimîne.

Bexçeyekî mezin hat pêşiya wî. Her celeb kulîlk, giha, dar; dengê çivîkan û bêhneke xweş… Çemekî zirav di nav bexçe re diherikî û dengê xwe tev li yên doraliyê dikir. Ava çem dibiriqand û kefê lê digirt.

Zilamekî porreş di nav wê xweşiyê de, li ber wî çemî, pişta xwe dabû aliyê Robîn û rûniştibû. Darikek di destê wî de bû û bi wî darikî tiştek li erdê xêz dikir.

Robîn digel ko dûr bû jî dikarîbû tê derxistaya bê zilam çi dinivîsand. Bi dû re, ew ê jî li vêya ecêbmayî bimaya. Zilêm piştî ko nivîs qedand û keserek kişand, darikê destê xwe li erdê bi hêrs cit kir û bîstikekê sekinî. Diranên xwe jidandin û li nivîsa xwe temaşe kir.

ba...

Gava Robîn gihîşt cem wî, zilam di ser situyê xwe re zivirî û li wî niherî. Zilam dişibiya Seydo, an jî Robîn digot qey weha ye. Çavên wî şil bûbûn û hêsir ji wan diniqutîn xwarê. Lêva xwe gez kiribû. Gava ko li Robîn niherî, axînek jê derket û dû re berê xwe guhert û serê xwe bera ber xwe da.

Ji nişka ve, dengê silehekê teqiya li doraliyê. Wê gavê ew hemû xweşî,


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

di bin reşahiyekê de ma. Deng ji çivîkan biliya. Bêhna xweş ya bîstika din wenda bû. Her tişt mat ma.

Dengê teqîna silehê, careke din hat. Qêrînek bi dil û mejiyê Robîn ve ket. Mirov digot qey qirika wî dike biçire. Dengê teqîneke din jî hat û bi dû re hertişt bû mîna berê. Lê Seydo wenda bûbû û ew çemê bîstika din bûbû çemê xwînê. Robîn di cihê xwe de mat mabû. Çavên wî fireh bûbûn û şibiyabûn du tasan. Digiriya.

Yên dora wî, gişan bi awayekî ecêbmayî li Robîn diniherî. Serê wî li ber camê bû. Hêsirên wî ji ser hinarikên wî diherikîn xwarê. Bes, hê jî di xew de bû.

Zilamekî kal hêdîka bi ser wî de daqûl bû û bangî wî kir:

— Xorto, xorto!

Gava Robîn çavên xwe vekirin û li dora xwe niherî jî zilêm got:

— Tu baş î?

Zilêm bi dengekî nerm ko mirov ji ber neêşe pirsîbû. Yên dora wan jî bêtir bala xwe dabû wan. Robîn digel ruyê xwe yê sorbûyî, bi dengê xwe yê lerzokî got:

— Ez baş im, spas.

Û serê xwe bera ber xwe da. Herçî kesên li dora wî bûn, dilê wan bi wî şewitî û mîna ko ew ketibin wê rewşê, hin kesan ji wan fedî kir. Heta ko Robîn daket jî bala wan li ser wî bû. Robîn jî heta ko daketibû, serê xwe ranekiribû û li dora xwe neniherîbû. Wî dizanîbû ko çavên kesên li dora wî tevde li ser wî ne û gişan bala xwe daye wî. Gava daket û wî bayê xurt xwe li wî xist û ew cemidand, Robîn hê nû hebekî hat ser xwe.

Gulcanê berî ko Robîn were, ji ber ko hew sebir dikir, di hindurê malê de vir de û wê de diçû û dihat. Bêserî digeriya. Carê diçû ber pencereyê, li derve diniherî. Ditirsiya ko Robîn fikra xwe biguhere û neyê cem wê. Argûn geş kiribû, hindur kiribû mîna tenûrê.

Çi qas çêbûbû, çend meh di ser re derbas bûbûn? Nizanîbû. Lê digot qey ji cerga ko xwe nas kiriye, bi wî re ye û êdî hingî fêrî wî bûye, nema dikarîbû beyî wî îdare bikiraya. Piştî ko ew nas kiribû, tevgerên wê jî hatibûn guhertin. Çavên wê her li rêyê bûn, guhê wê her li telefonê bû. Tim li benda wî bû. Bihataya jî nehataya jî. Her li benda wî dima û bêriya wî dikir.

Carinan, hayê Robîn jê nebûya jî gava ko heta êvarî, li bende dima û Robîn nedihat, hema serê wê diket ber wê, stuyê wê xwar dibû û wê keçika ko xort giş li dorê digeriyan û ji bo ko xwe di rêya wê de feda bikin

hema li benda işaretekê bûn, wê keçika ko kesî nikarîbû red bikiraya, wê keçika esmer ko ne mimkun bû ko dilê zilaman nelerizandaya, bi derbekê re dibû yeka weha ko dilê mirov pê bişewite. Hema serê xwe datanî û digiriya... Digiriya.

Guhên wê li derî bûn. Gava ko dengê derî hat, baz da û derî vekir. Demekê li devê derî mîna ko lal bûbe, tiştek negot û li wî temaşe kir. Ji kêfa, dikira bigiriya. Hema li wira xwe avêt situyê wî û ew himbêz kir. Da girî.

Kêfa Robîn jî bi vê himbêzkirinê hatibû cih. Xwe di himbêza wê de, serbest berda. Pişta wê mist da û ew bi ser sînga xwe de eciqand. Memikên wê di sînga xwe de his dikir. Ew bir hindur û li ser çonga xwe da rûniştandin.

Gulcanê ji kêfa nema dizanîbû bê dê çi bikiraya. Her ew maçî dikir û digot:

— Min pir bêriya te kiriye, Robîn. Pir!

Devê xwe xist devê wî. Heta ko av di lêvên wan de neman û tevizîn, devên xwe ji hev dernexistin. Hevdu tazî kir û lempe vemirand. Gava ko canê wan giha hevdu û germahiya canê hevdu di dilê xwe his kir, heyecana dilê wan ew dilerizandin. Hevdu himbêz kir û heta ko ji ser hişê xwe ve çûn, bi wî awayî man. Dilên xwe bi wê himbêzkirinê germ dikirin û serxweş dibûn.

Robîn carekê serê xwe ji ser sînga wê rakir û li çavên wê niherî. Hingî hindur jî germ bûbû, herduyan jî xwê dabû. Kokên porên wan şil bûbûn. Canê wan nermtir bûbûn. Gulcanê bi wî halê xwe, ji her awayî xweşiktir bûbû. Gava Robîn li wê temaşe dikir, ket ber fediyê, xwast ko pêsîrên xwe veşêre, lê Robîn nehişt. Hêdika bi destê wê girt û ew da sekinandin. Gulcanê ji fediyan bişirî. Bi dû re, destên xwe serbest berdan û danî ser pişta wî, ew ber bi xwe de kişand. Robîn serê xwe dîsa danî ser sînga wê, hilma xwe berda û ew himbêz kir, maçî kir.

Wê rojê heta derengê şevê, di himbêza hev de man û ji hevdu pê ve, li tu tiştekî din nefikirîn. Herçî Robîn bû, nehat bîra wî bê çiçax serê xwe danîbû ser sînga wê û ketibû xewê jî.

Bi dû re, wî ê ji xwe re bigotaya:

— Ji zû ve, ez ewqasî bi rehetî û ji ber xwe ve neketibûm xewê. Ecêb e, min wê şevê, tu kabûs jî nedîtin. Gava ko ez diketim himbêza Gulcanê, mirov digot qey min hemû kul û kederên xwe ji ser xwe avêtine, min xwe ji wan şuştiye. Ez mîna ko di bihuştê de bim, dilgeş dibûm, bêhna min


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

fireh dibû. Gulcanê ez rehet dikirim. Bi vî awayî, her ko diçû, ez bêtir bi wê ve dihatim girêdan û min Nûşînê jî ji bîr dikir.

Tu carî li tiştekî weha nefikirîbû, lê wê şevê, tirsiya ko wê keçikê wenda bike. Qey ji ber wê ye, xwast bi wê re bizewice, da ko tu carî ji wî veneqete û wê wenda neke. Lê belê, wî ev yek ji wê re negot. Vêya jî heyecaneke mezintir dixist dilê wî. Wî nedixwast ko ev heyecan tu carî biqediyaya. Wê şevê, êdî têgihiştibû: Wî ji Gulcanê hez dikir.

— Ez ji te hez dikim, Gulcan.

Te dît, gava ko hezkiriyê keçikekê ji şerekî giran ko hezkiriyên gelek keçikan hew dikarin jê vegerin, vegere û ji ber vê yekê, ew keçik çawa kêfê bike, Gulcanê jî eynî weha kêf kir. Xwe mîna perîkekê sivik his kir. Digot qey di xewnekê de ye û nedixwast şiyar bibe. Di serî de, bawer nekir. Sê-çar caran çavên xwe qirpandin û dîsa li çavên wî niherî. Ji kêfan, nizanîbû bê dê çi bikiraya. Hema, xwe avêt situyê wî, ew himbêz kir û giriya. Têra xwe giriya. Bi dû re, Robîn ew rakir, hesirên wê bi tiliyên xwe paqij kirin û ew maçî kir.

## 18. Zayin…

Nîvê şevê bû. Berf sekinîbû. Dengê bê hê qut nebûbû. Li derve, seqemeke mezin hebû. Li hindurê malê, çûyin û hatinek, tevliheviyek…

Herkesî xwe bi lez girê dida. Dest û lingên wan li hev geriyabûn. Carê weke ko tiştek ji bîr kiribe, diketin odekan û derdiketin. Resûl Beg ji bo ko zarok hebekî din jî bilezînin, li ber derî sekinîbû û destên xwe li hev dixistin, işaret dikir. Divê zû bi zû derketana. Ew ê biçûna nexweşxaneyê.

Binevş evarî ji nişka ve, li erdê bêhiş ketibû. Giş tirsiyabûn. Herçî Binevşê bû, berî ko bikeve, tu tiştekî wê tune bû. Weke hercar, şîva xwe xwaribû û rabûbû li ser yanê rûniştibû, bala xwe dabû televîzyonê. Gava ji bo ko biçe çayê bide ser rabûbû ser xwe, ketibû erdê û kef bi ser devê wê ketibû. Robîn û Mîtanî tavilê ew rakiribû nexweşxaneyê.

Kesek li malê nemabû. Giş hatibûn nexweşxaneyê. Nexweşxane pir mezin bû. Her deverên wê dibiriqand. Resûl Beg û Leyla Xanim li qorîdora qatê zayinê, li ser kursiyan rûniştibûn. Zarokên din jî li kafeteryaya nexweşxaneyê li benda xebereke xêrê bûn. Gava ko Robîn bi hemşîreyan re dipeyivî, Mîtanî bêserî li qorîdorê diçû û dihat. Giş li benda bûn ko Binevşê ji emeliyatê derkeve.

Piştî du saetan, deriyên asansora mezin vebûn. Giş bi hev re, ber bi wê

de reviyan. Binevş di nav çend hemşîreyan de, li ser sedyekê ji asansorê derdiket. Jana ko dikişand, ji ruyê wê xuya dibû. Lêva xwe gez kiribû. Porê wê bela wela bûbû, ruyê wê nepixîbû, di nav xwêdanê de mabû. Serûm di piyê wê de bû. Hê nehatibû ser hişê xwe.

Hemşireyan ew bir odeya ko ji bo wê hatibû amadekirin. Textora wê nehişt tu kes têkeve odeya wê. Mîtanî çi qasî li ser rewşa wê ji hemşîreyan pirsî jî tu bersiv wernegirt.

Hemşîreyekê ji wî re got:

— Divê hûn bi textora wê re bipeyivin. Yê me, em bi tiştekî nizanin.

Piştî çend deqîqeyan, pîrekek ko berdilkeke spî lê bû, ji serê qorîdorê xuya bû. Hat û piştî ko tişt miştin ji hemşîreyan re gotin, çû ket odeya Binevşê. Hemşîreya ko bîstika din bi Mîtanî re peyivîbû, hat cem wan û got:

— Textor Xanim dixwaze bi mêrê wê re bipeyive.

Mîtanî rabû da pey wê. Robîn jî bi wan re çû. Ketin odeya Binevşê.

Textor li ber serê wê, li ser lingan sekinîbû, serûma wê rast dikir. Gava ko Mîtanî û Robîn silav da û ketin hindur, li wan zivirî. Got:

— Kîjan ji we mêrê wê ye?

Mîtanî got:

— Ez im.

Bala wî li ser Binevşê bû. Gava ko ew di wê rewşê de dît, dilê wî êşiya, zikê wî bi wê şewitî. Bes guhê wî li ser textor bû.

Textor, pîrekeke kinik û xweşik bû. Ruyê wê makyajkirî bû. Yê nizanîbûya, bawer nedikir ko ev pîrek niha ji emeliyatê derketibû. Kubar û bi ken dipeyivî:

— Derbasbûyî be. Rewşa nexweşa me pir baş e. Emeliyateke pir dijwar derbas kir. Niha, ne li ser hişê xwe ye. Bîstikeke din, ew ê were ser hişê xwe. Ji bo ko cihê emeliyata wê neêşe, ew ê hemşîre were û hebekê bidê. Heke ew heta sibehê bi xwe nehise, baş e. Ji ber vê yekê, ez naxwazim îşev tu kes têkeve odeya wê. Sibehê, ez ê dîsa werim û li wê biniherim.

Carekê li Binevşê zivirî. Dilê wê pê şewitî. Bi dû re, dîsa berê xwe da wan û got:

— Ma qey ev zaroka we ya yekem bû?

Mîtanî got:

— Belê.

Jinikê dîsa li Binevşê niherî. Ji dekan bişirî û got:

— Zor e. Lê belê, divê hûn niha li nexweşa xwe bifikirin. Bila heta


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

sibehê, di xew de be. Bi dû re, hûn dikarin dîsa wê bibînin.

Keserek kişand û li Mîtanî zivirî.

— Hela bila îşev derbas bibe, Xwedê mezin e.

Ruyê Mîtanî zer bûbû. Dikira bigiriya. Ji êvar de nesekinîbû. Ji xwe, ne yekî xurt bû. Ji mirina jina xwe jî pir ditirsiya. Herçî Robîn bû, weke ko ne xema wî be, bê deng sekinîbû û li jinikê guhdarî dikir.

Jinikê got:

— Ne pêwîst e ko hûn îşev li vira bimînin. Lê heke we pîrekek bi xwe re anîbe, hûn dikarin ji bo alîkariyê li cem wê bihêlin.

Bi dû re, jinikê berê xwe da derî.

— Hûn dixwazin, ka em derkevin. Hûn jî biçin mala xwe, ji xwe re rakevin. Ez dizanim ko niha hûn ji wê bêtir westiyane. Qet meraqan nekin. Sibehê, piştî ko min dîsa li wê niherî, ez ê bi we re bipeyivim. Hûn ê bibînin, tiştekî wê namîne. Gelek nexweşên min ên weha çêbûne. Xwedê bibêje erê, du rojên din hûn ê nexweşa xwe bibin malê. Dîsa derbasbûyî be.

Jinik ji odeyê derket. Wan jî da pey wê. Li ber derî xatir ji wan xwast û çû, bi dizî ji hemşîreyê re got:

— Heke tiştek bibe, xeberê bidin min. Ji deh deqîqeyan carekê jî li tansiyona wê biniherin.

Textor çû. Hemşîre carekê ket odeyê û derket. Mîtanî û Robîn bîstikekê li ber derî çûn û hatin. Bi dû re, giş bi hev re daketin cem zarokên din. Mehabad û Serdar û Meryem li benda wan bûn.

Mîtanî piştî ko ji wan re jî behsa rewşê kir, got:

— Bila Mehabad biçe cem wê. Hûn jî biçin malê. Yê min, ez ê li vira rûnim. Belkî tiştek lazim bibe.

Mehabad rabû çû odeya Binevşê. Yên din çûn malê. Mîtanî jî çû ji xwe re qehweyek kirî û hat çixareyek pêxist.

Binevşê wê şevê, du caran bi xwe hisiya û bi qasî ko nexweşxaneyê rake ser lingan qêriya. Heta nexweşên din jî bi dengê wê derdiketin ber deriyên xwe û bi meraq li aliyê odeya wê diniherîn. Hemşîre giş, ber bi odeya wê ve direviyan. Her ko ew bi xwe dihisiya, hemşîreyê derziyeke din lê dixist û ew dixist xew.

Mîtanî heta sibehê, li ber deriyê wê nobedarî kir. Ji bo ko hemşîre bêtir guh bide Binevşê, hinek pere jî da wê. Heta sibehê, di dilê xwe de dia dikir, da ko jina wî nemire. Rewşa ko ew ketibûyê bala nexweşên din û hemşîreyan jî kişandibû. Dilê gişan bi wan dişewitî. Kesî bawer nedikir

ko li Binevşê bibe sibe.

Roja din, gava ko bûyerên şeva çûyî ji textora wê re hatin gotin, textorê jî weke ko tiştekî pir asayî be, gotibû:

— Qet tişt pê nayê. Ji xwe re nekin xem.

Bi dû re jî weke ko her textor ji bo nexweşên xwe dibêjin, bi awayekî bixwebawer, gotibû:

— Hûn ê bibînin, sibehê tu tiştekî wê namîne. Bi xêr û silamet, em ê du rojên din wê ji nexweşxaneyê derxînin.

Herçî Mîtanî bû, piştî tiştên ko ji devê textorê bihîstibûn, dilê wî hebekî rehet bûbû; lê dîsa jî di dilê xwe de gotibû:

— Ev jinik çi qasî xemsar e, lawo! Her ko jina min diqîriya, min digot qey ew ê bimire; îja ev textora han ji min re dibêje ko ji xwe re nekin xem. Xwedê kesî nexe ber destê van textorên bêbav, lawo! Ev nizanin, bê mirov çi dikişîne. Gava ko me ji wê re behsa qêrînên Binevşê kir, tew li ber jî neket.

Binevşê ber êvarkî, hat ser hişê xwe. Ev serûma çaran bû ko dihat guhertin. Hayê wê ji tiştên ko hatibûn serê wê tune bû. Lê her derê wê diêşiya. Gava lê hay bû ko zaroka wê ji ber wê çûye, mîna ko xwîna wê zuha bûbe, bîstikekê bê deng sekinî. Çavên wê fireh bûn. Fedî kir ko li ruyê Mîtanî û Robîn binere. Bi dû re, ji bo ko ruyê wê neyê dîtin, mîna sûcdarekî hêdîka berê xwe ji wan guhert û giriya. Tansiyona wê rabû. Hemşîreyê dîsa derziyek lê xist. Di xew re çû.

Piştî sê rojên din, Binevş ji nexweşxaneyê derket. Pîrek ketin milê wê û ew bir odeka wê û li ser textê wê yê razanê vexist. Hefteyekê di nav nivînan de ma. Heta ko baş nehat ser xwe, Leyla Xanim û Mehabadê nehişt ko ew destê xwe bide karekî jî. Ew jî li vêya ecêbmayî mabû.

Wê tiştin din hêvî dikirin. Digot qey ji bo ko zaroka wê ji ber çûbû, ji niha û bi şûn de, li vê malê, tu kes dê xatir nede wê. Tew ditirsiya ko wê biavêjin ber derî. Belkî wan ê ew bişanda mala bavê wê jî. Lê belê weke ko ew difikirî nebû. Mehabada ko berê guh nedida wê, bi carekê ve hatibû guhertin. Ji bo nexweşiya wê, ji karê xwe destûr jî stendibû. Leyla Xanim û Resûl Beg ji ber serê wê ranedibûn. Herçî Mîtanî bû, dilê wî bêtir bi wê ve bû û êdî êvaran zûtir dihat malê. Tiştên ko dihatin pê, giş bi dilê wê bûn.

Gava Binevşê dît ko nexweşiya wê bi kêrî gelek tiştan hatiye û zaroka ji ber wê çûye jî ne xema kesî ye, digel ko di hefteyekê de rehet bûbû, hefteyeke din jî di nav nivînan de ma. Her gava ko ji bo tiştekî rabûya ser


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwe jî dek dikir û carê bi dereke xwe digirt û dîsa xwe diavêt ser nivinên xwe. Dixwast ko bi vî awayî, mêrê xwe dîsa bi xwe ve girê bide.

Dek û dolabên Binevşê yên nû, bala Leyla Xanimê kişandibû. Ji ber ko Mehabadê jî dîsa dest bi karê xwe kiribû, ew bi tenê mabû û karên malê jî giş di situyê wê de mabûn. Carinan, di ber xwe de dipeyivî û gava hinan lê bipirsiya jî tavilê dest bi gilî û gazindên xwe dikir û dîsa tansiyona wê radibû.

Gava Meryemê û Serdar didît ko digel ko nexweşiya Binevşê derbas bûye jî ew ji nav nivînan dernakeve û diya wan bi tenê karên malê gişî dimeşîne, pir bi wan tahde hatibû. Ji lewre, gava ko çav li Binevşê diketin, weke ko çav li dijminê xwe bikevin, hêrs dibûn. Lê belê, ji tirsa Mîtanî, kesî ji wan newêrîbû dengê xwe jî derxistaya.

# Beş II, Ez ne ez im êdî...

## 1. Hespê har…

Ev ji nîv saetê zêdetir bû ko Robîn li wira sekinîbû. Carê li saeta xwe dinihêrî, serê xwe bi aliyê rêyê de dirêj dikir û di cihê xwe de dikir ufe uf. Ji xwe re digot, »ez belasebeb li vira rawestiyame.«

Dinya sar bû. Li erdê, bi qasî bihustekê berf hebû. Bayekî weha sar dihat ko gava li ruyê mirov diket, mirov digot qey gwîzên dibirî. Kesî nikarîbû germahî bianiya bîra xwe jî. Her dever bûbû qeşa. Mekîneyên ko derbas dibûn, ji bo ko neşemitin û li bin guhê hev nekevin, hêdî hêdî diçûn. Li ser hinekan ji wan, berfa ko ji êvarî de dibariya hebû.

Kesên ko li rawestgehê li benda otobusan bûn, ji bo ko xwe germ bikin, bi vir de û wê de diçûn û dihatin. Gişan ji serma piştên xwe xûz kiribûn, herdu milên xwe bilind kiribûn û situyên xwe mîna kîso kişandibûn hindur. Xortekî girs û dirêj, çefiyek li serê xwe gerandibû, destên xwe xistibûn bêrîka qapûtê xwe û ji bo ko xwe hebekî germ bikiraya di cihê xwe de direqisî. Ji çavên wî pê ve, tu deverên wî yên din xuya nedibûn. Pîrekek ko bevila wê bûbû mîna gêzerekî, ji sermayê dilerizî û diranên wê li hev diketin. Şeq şeqa diranên wê, yên dora wê ji guhan dikirin. Lê hingî canên wan gişan pûç bûbûn, tu kesî di xwe re nedidît ko li xwe bizivire û li dora xwe jî binihere.

Robîn aciz bûbû. Ruyê wî sor bûbû. Digot qey lêvên wî qeşa girtiye. Heke yekî ji wî tiştek bipirsiya, devê wî dê negeriya û wî dê nikarîbûya tu bersiv bidayê. Ji sermayê, serê tiliyên lingên wî tevizîbûn. Mîna ko pêxwas li ser wê erda hişk û sar sekinî be, lingên wî pûç bûbûn. Digot qey lingên wî dikin ji wî bikevin. Guhên wî qeşa girtibû. Hiseke weha pê re çêbû ko heke wî dest guhên xwe bidaya, guhên wî jî dê ji wî biketana. Ji ber vê yekê, newêrîbû dest guhên xwe bidaya. Bevila wî ya sorbûyî carê diherikî û wî dikir fişe fiş. Lê hingî cemidî bû, her ko wî ji bo kişandina bêvila xwe destê xwe didayê, bi awayekî weha dişewitî ko tu nemabû, dilê

wî ji bîr biçûya. Sermayê, zor dida sebra wî jî û canê wî giran dikir. Dixwast hema xwe bigihîne deverekê û ji xwe re pal bide.

Teqsiyeke zer hat û li ber wî sekinî. Serê Robîn di ber wî de bû. Yekî serê xwe ji camê derixist, li derve niherî û bangî wî kir:

— Robîn!

Robîn li wî dengî zivirî. Lêwik destê xwe ji wî re kil kir. Ev Bişar bû. Robîn di ber xwe de bişirî, serê xwe ji wî re hejand û ber bi wî de meşiya.

— Tu li kû mayî, lawo? Ez li vira ji sermayê mirim, wey!

Bişêr peyva wî birî û bi kenekî şermokî got:

— Tu çi bibêjî, heqê te heye. De ka were, siwar bibe, em ê bi dû re bipeyivin.

Çer ko siwar bû, cihê xwe xweş kir. Germahiya ko xwe di hindurê mekîneyê belav kiribû, laşê wî hêdî hêdî germ kir. Piştî ko germahiya hindur, laşê wî bi temamî nerm kir, sistbûnek li laşê wî peyda bû û ji ber ko tirsa sermayê nemabû, wî jî ber xwe hêdî hêdî vekir. Bişêr çixareyek da wî, yek jî ji xwe re pêxist. Bi dû re, li wî zivirî, ji bo ko xwe bide efûkirin, got:

— Li qusûra min nenihere. Welehîn, ne sûcê min e. Li Yenîkapiyê rê hatibû girtin. Em saetekê li wira awiqîn. Ancax me xwe gihand vê derê.

Dît ko Robîn bi hêrs li wî dinihere. Ji awirên wî fahm kir ko ew pir li benda xwe sekinandiye. Tişt negot. Hema bi destê wî girt û weke ko li ber wî bigere, bişirî.

Robîn li ser vê hereketa wî, piçekî nerm bûbû.

Bi gazindî got:

— Tu çi bela yî, lawo! Ez nizanim bê ez ê çi bikim bi te…

Bişar keniya. Bîstikekê bi çavên tijehezkirin li ruyê wî niherî. Bi dû re berê xwe guhert, destê xwe bir ber devê xwe û gulpek ji çixareya xwe kişand.

Bişêr tiştek ji şifêr re got û erebeyê xwe ji neqeba pêşiyê bera jêrê da. Di nav trafîka Stenbolê de, bi zorê diçûn. Xwe asoxî, ji nav trafîka tevlihev derxist û ketin nava taxekê. Piştî ko du-sê kuçeyên din jî li dû xwe hiştin, hatin li ber apartmaneke mezin sekinîn.

Robîn got:

— Ev tu me dibî kû, lo?

Bişêr dîsa bi ken bersiva wî da:

— Hela tu ka were, tu ê bibînî.

Ketin hindurê apartmanê. Apartmaneke bêdeng û tarî bû. Dengê derî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û yên lingên wan di hindurê vê avahiya tarî ko saw dixist dilê mirov de, olan dida. Piştî ko ketin asansorê û pê derketin jorê, Bişêr ji awirên Robîn yên bimeraq fahm kir ko divê zû bi zû tiştekî bibêje. Gava ko asansor li qatê çaran sekinî û derketin, berê xwe da deriyekî. Robîn jî dabû pey wî. Gava Bişêr mifta xwe dixist derî, di ber xwe de, got:

— Ji min pê ve, tu kes jî bi vî xaniyî nizane. Carinan, gava ko bêhna mirov teng dibe, xaniyekî weha jê re

pêwîst e.

Bi dû re jî got:

— Du sal berê, min bi hevalekî xwe re ev xanî kirê kiribû. Bi dû re ew vegeriya welêt. Min jî dev ji vî xaniyî berneda. Çi çax ez aciz bibim, ez hema têm û xwe diavêjim vira.

Heta ko wî peyva xwe xelas kir, ketibûn hindur jî. Robîn tiştek negot. Zêde guh nedabûyê. Bes weke ko bibêje »min fahm kir«, serê xwe hejand. Berê, çavên xwe li hindur gerandin û bi dû re jî qapûtê xwe danî û çû xwe li ser paldankekê dirêj kir.

Hindurê xênî sar bû. Bêhna çixareyê ketibû hindur. Xwelîdankên tije li rastê bûn. Merşa ko li erdê hatibû raxistin jî gemarî bûbû. Ji rewşa wê diyar dibû ko ji zû de nehatibû şuştin. Doşekeke ko ser wê bi newresîmekê hatibû nixumandin li erdê bû. Li kêleka doşekê jî betaniyek xuya dibû. Li kêleka paldanka ko Robîn xwe li ser dirêj kiribû jî li ser kursiyekê teybek û li ber wê jî çend kaset hatibûn danîn. Xuya dibû ko Bişar zêde li vira dima.

Robîn, berê, serê xwe zivirand û li kasetan niherî. Bi dû re, rabû ser xwe û çû rahişt wan. Yek dudu xistin teybê û ceribandin. Kêfa wî ji wan re nehat. Mahdê xwe hebekî tirş kir, bi dû re rahişt yeka ko tu nav li ser tune bû û xist teybê. Guhê xwe da melodiyê. Bi naskirina melodiyê re kêfa wî hat. Pê re, xemgîniyek jî peyda bû di dilê wî de. Ji ber ko her melodiyeke nas a kevn, bi xwe re ji demên bihurî hin dîmen jî dianîn û keserek bera dilê mirovî dida.

... hey lo bira
Heseno bira
Şûrê destê te sincirî...

Bîstikekê li ber rûnişt û lê guhdarî kir. Bi dû re, ji wira rabû, hat şûna xwe û dîsa pal da, guhê xwe da teybê.

Bişêr sobeyeke ceryanê anî û fîşa wê xist pirîzê. Xwelîdankên li erdê birin û vala kirin. Çû perde ji ber pencereyê da alî û bîstikekê bi awayekî bêdeng li derve niherî. Ji bo ko bêhna hindur derkeve, pencereyek vekir. Bayê cemidî hat hindur. Wî ew bayê cemidî kişand hindurê xwe. Li berfa sipîboz, darên riq û rût, rêya vit î vala niherî. Guhê xwe da dengê bê. Keserek kişand. Bi dû re, pencere girt, perdeya wê da ber û hat li hember Robîn, li erdê, xwe da ser balgifekê û rûnişt.

Robîn pal dabû, çavên xwe girtibûn û li teybê guhdarî dikir. Kilaman dikir ko herdu jî dengê xwe dernexin û guhdarî bikin. Kilamên ko ew bi xwe ve girê didan…

Piştî bîstikekê, Bişêr, beyî ko serê xwe rake û li wî binihere, got:

— Ez pir aciz dibim, Robîn. Ez nizanim bê ez ê çi bikim.

Çixareyek pêxist. Robîn tiştek negot. Wêneyekî çarçovekirî li dîwêr hatibû daliqandin. Robîn çavên xwe di wî wêneyî de cit kirin. Wêne reş û spî bû, mirov digot qey bi destan hatibû çêkirin. Tê de, şervanekî şût î tazî xuya dibû. Li ser hespê xwe bû û tivingek li milê wî bû. Herdu destên xwe hişk şidandibûn, ber bi jorê ve vekiribûn û li ezmanê tarî diniherî û dia dikir.

Di binî de jî helbestek hatibû nivîsandin:

di şerekî dijwar de, ez bi tena serê xwe mame
hevalên min giş hatine kuştin, ya rebbî
tu min li ber bîraninên wan fedîkar dernexe
û ji vî şerî bi saxî venegerîne…

Bişêr bala xwe nedabû wî. Rûniştibû û li çixareya xwe ya ko dûmana wê bi ser serê wî ketibû û ber bi jorê ve hildikişiya, diniherî. Destê xwe, beyî ko bizanibe, bê çi dike, di xwelîdankê de dida. Hê jî di ber xwe de dipeyivî:

— Ez ji vî bajarî hez nakim, Robîn. Ne ji ber tu sedeman. Ez ji tu bajaran hez nakim. Her der mîna hev in. Îmana min ji vê dinyayê diçe.

Êşek ketibû serê wî. Bîstikekê sekinî, serê xwe bera ber xwe da. Bi dû re serê xwe rakir, li aliyê Robînê ko li çixareya destê xwe temaşe dikir, niherî.

Bi dû re got:

— Ez carinan li kuştina xwe jî difikirim, weleh. Belê, ez ji dil dibêjim; ez bi awayekî cidî li xwekuştinê difikirim. Lê ez cesaret nakim.

Peyvên wî yên dawiyê, bi zorê ji devê wî derketibûn. Dengê wî piçekî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

hatibû guhertin, lerizîbû. Weke ko bi xwe re bipeyive, peyivîbû. Lê, ji ber ko behsa derdê xwe kiribû jî kulên dilê wî ji nû ve tev rabûbûn. Kela girî ketibû qirika wî.

Ji bo ko negirî, dev ji peyva xwe berda. Weke ko diayek kiribe, bi destekî xwe ruyê xwe mist da, keserek kişand, berê xwe da aliyê dîwêr û ma.

Robîn piçekî din dirêjkirî ma. Bi dû re, rabû ser xwe. Bêhna wî teng bûbû. Keserek kişand. Li Bişêr nediniherî. Weke ko ji berê de bi van tiştan dizane, aciz bûbû. Hew dikarîbû xwe ragirtaya.

Bi gazind, got:

— De here, lo! Tu dibêjî qey tu bi tenê weha yî, ne weha? Bi hezaran kesên mîna te hene. Ma kî ji vê dinyaya kambax razî ye? Mirov li mala xwe rûne, nikare çareyekê ji xwe re bibîne. Ma tu dibêjî qey hema tu li xwe weha bikî û ji însanan birevî, tu ê bikaribî dilê xwe rehet bikî? Ma qey tu ê bi dû re, dîsa nekevî eynî rewşê?

Robîn bi vê rewşê pir baş dizanîbû. Di dilê xwe de, wî jî baweriya xwe bi gotinên weha nedianî. Carinan, gava ko ew jî weha bêhnteng dibû û neçar dima, serê xwe li dîwaran dixist. Lê belê, ev tecrube, tu carî bi kêrî çareserkirina rewşa ko niha Bişar tê de bû, nedihat. Ji bo kesê ko di rewşeke weha de ye çi qasî zor be, ji bo yê ko dixwaze çareyekê ji vî derdî re bibîne jî ewqasî zor e. Belkî jê zortir e jî. Ji lewre, hew dizanîbû bê mirovî di rewşeke weha de, dikarîbû çi bigotaya.

Hêrs bûbû. Çavên wî yên reş fireh bûbûn. Li benda bersiva Bişêr sekinî. Bişar nepeyivî. Berê wî hê li dîwêr bû. Robîn çû li ber wêneyê li dîwêr sekinî. Bi destê xwe wêne nîşan dayê, li wî zivirî û weke ko bi wî re bixeyide, got:

— Te ev wêne ji bo çi li dîwêr xistiye? Ma ne ji bo ko te hê jî hêviya xwe ji tiştinan qut nekiriye? Bibêje, kerb! Bibêje, kîn! Bibêje, şer! Lê nebêje, xwekuştin.

Bişar li ber xwe ket. Serê xwe xist ber xwe û sekinî. Êşa serê wî mezintir bû û xwe di damarên wî re, li canê wî gişî belav kir. Dîsa weke ko bi xwe re bipeyive, bi dengekî gelekî nizm, di ber xwe de got:

— Kerb… Kîn… Mirin…

Diranên xwe jidandin û bêhna xwe ji bêvilê berda. Serê xwe kil kir û dîsa di ber xwe de got:

— Ez ji vana pê ve, baweriyê bi tiştekî din naynim. Şer ne karê herkesî ye. Ez bawer nakim ko şer bikaribe bibe çare. Tew gava ko ez xwe di na-

va şeran de difikirim, dilê min bêtir dişewite. Ez ê çawa bikaribim şer bikim?

Serê xwe rakir. Çavên wî yên kortçûyî, qels bûbûn. Di ruyê wî de, qet dewsa tu kenî ne xuya bû. Mirov digot qey ev dev tu carî nekeniyabû. Qermîçokên dora çavên wî bêtir kûr bûbûn.

Ziq li çavên Robîn niherî. Bi awirin weha tûj diniherî ko Robîn ji wî tirsiya. Destên xwe li çongên xwe xistin û qêriya:

— De ka tu bibêje îja, ha! Ma ez ê çawa bikaribim şer bikim, ji bo Xwedê?

Ew jî hêrs bûbû. Çavên wî yên piçûk, sor bûbûn. Bûbû mîna çiyayekî weha ko li ber teqandinê bû. Dîsa berê xwe guhert, pişta xwe da dîwêr, serê xwe ber bi jorê ve bilind kir. Keserek kişand û bîstikekê bi wî awayî sekinî. Bi dû re, beyî ko berê xwe bide aliyê Robînê ko li ser lingan li wî guhdarî dikir, got:

— Tu dizanî, bê dilê min çawa dişewite? Ez hatime vira, min xwe xistiye quncikekê û ez di vê quncikê de, asê bûme. Ez nizanim, ez ê bi kû de herim. Ez ji vê jiyanê, tahmê hew distînim. Rêkên min giş xetîmîne, Robîn. Ez asê bûme. Tew carinan, ez ji xwe re dibêjim ko »ez belasebeb dijîm.«

Dengê xwe birî û sekinî. Serê xwe bi kerb hejand û dîsa xwe bera ber xwe da û ma. Robîn hew dikarîbû tiştek bigotaya. Ev peyvên Bişêr ên dawiyê, tesîreke weha li wî kir ko ew jî li xwe bifikire. Di ber xwe de got:

— Kerb!..

Û serê xwe bi kerb kil kir, keserek kişand û ma.

Derdê wî û yê Bişêr yek bûn. Lewma, êşek ket serê wî jî. Hêdîka çû û li şûna xwe ya berê, li ser paldankê rûnişt. Pişta xwe sipartê, serê xwe ber bi jorê ve rakir û li ser qiraxa wê ya jorê danî. Çi çax li wî weha bibûya, canê wî sist dibû û hema dixwast ko rakeve. Ji xwe, ji ber ko gelekî li ber wê sermayê mabû, canê wî jî westiyabû. Çer ko serê xwe danî, çavên wî pê re çûn ser hev.

Demeke dirêj, deng ji herduyan jî derneket. Bi dû re, Bişêr serî di ber de got:

— Ez gelekî fikirîm, Robîn.

Û piştî ko keserek kişand, got:

— Ez ê herim Diyarbekirê.

Robîn tu bersiv nedayê. Ji zû de, di xewê re çûbû. Dengê wî nebihîstibû. Gava Bişar lê hay bû ko hevalê wî di xewê de ye, xwe bêtir bi tenê

his kir. Serê xwe danî ser çonga xwe û ma. Demeke dirêj, ji cihê xwe ranebû.

Ew bêdengiya bîstika din, dîsa li dora wan çêbûbû. Tîna sobeya cereyanê, bi kêrî germkirina hindur nedihat. Li derve, fîzîna bayê kur her ko diçû xurttir dibû. Di ber deriyê balqonê û qiraxên pencereyan re, bayê cemidî dihat. Hindurê xênî sartir dibû. Tevî tesîra êşa serê xwe û sarbûna hindur jî li hember giranbûn û sistbûna laşê xwe têk çû û ew jî cihê xwe de ket xewê.

Robîn carekê bi xwe hisiya û li dora xwe niherî. Situyê wî qerimîbû. Bi zorê rabû ser xwe. Lempeya hêwanê vêxistî bû. Bişar ne li hindur bû. Got qey li hêwanê, li ser nivinên xwe razaye. Wî jî xwe li ser doşeka erdê dirêj kir û dîsa çavên xwe girtin.

Gava ko şiyar bû, dinya rohnî bûbû. Ji xewê westiyabû. Çavên xwe vekirin û li dora xwe gerandin. Bêdengiya ko ji êvarê de xwe li hindur belav kiribû, hê dom dikir. Hindur nîvtarî bû.

Bişar ne li hindur bû. Li ser yanêya hember, betaniyeke pêçayî û balgîfek bi ber çavên wî ve diketin. Betaniyek jî bi ser wî de hatibû werkirin. Lê fikirî. Hat bîra wî ko êvarî ser xwe nenixumandibû û di xewê re çûbû. Lê bi dû re, têgihişt ko divê Bişêr ew nixumandibe. Lê, ka Bişar? Bi heyecanekê ji nav betaniyê pengizî.

Rabû ser xwe û çû li hindur, li Bişêr geriya. Li hêwanê niherî...

Bişar ne li malê bû. Vegeriya û li ser betaniya xwe rûnişt. Li saeta li dîwêr niherî. Bi dû re, di pencereyê re li derve niherî. Berf dibariya û tu der xuya nedibû. Bi dû re, dîsa berê xwe ji nişka ve da aliyê saetê. Li biniya saetê kaxizek hatibû daliqandin. Cara din, gava ko li wî aliyî niherîbû, lê hay nebûbû. Bi heyecan û lezekê rabû ser xwe û çû ew kaxiz ji dîwêr rakir. Gurpe gurpa dilê wî bû.

Robîn,

Ez diherim. Hespekî har di bin min de ye. Ez nikarim wî rawestînim.

Dilê xwe negire. Ez ji xatirxwastinan hez nakim. Ji ber wê, min ev rê hilbijart.

Mîna ko cereyanê ew girtibe, lerizî. Çavên wî hingî fireh bûn, dikira ji serê wî baz bidaya. Her deverên wî, bi carekê pûç bûbûn. Got qey di cihekî de asê maye û nikare xwe xelas bike. Bîhna wî dikira biçikiya. Xwendina kaxizê beyî hişê xwe domand.

Belkî ez li wan deveran, ji xwe re çareyekê bibînim.
Belkî jî ez bêtir di nava vî derdê giran û kerba dilî de vegevizim. Ez hew dizanim.
Gava ko ez van rêzikan dinivîsînim jî tiliyên min dilerizin. Ji xwe, tu ê ji nivîsa min têbigihêjî.
Hespê har rabûye ser piyan, Robîn. Guh nade tu tiştekî.
Divê ez herim.
Yan na,
Ez ê ji kerba xwe dîn bibim û tiştin xerab bi xwe bikim.
Ez ji vê yekê pir ditirsim…

Min ji te re got. Tu deng ji te derneket.
Xwezî tu jî bi min re bihatayî...

Li xwe miqate be.
Bişar

Robîn di cihê xwe de mat ma. Bûbû wek ko mirov kûzeke ava sar bi ser de dakiribe. Bawer nekir. Berê, xwast xwe bixapîne û got qey hevalê wî henekekan bi wî dike. Lê wî bi xwe jî bawerî bi tiştê ko lê difikirî neanî. Tevî vê jî demeke dirêj, bi bêsebiriyeke mezin li benda Bişêr ma. Hisên weha cida û tevlihev ew dabû ber xwe ko carinan hêvî pê re çêdikirin û carinan jî ew bi yekcarî bê hêvî dihişt.

Bêhna wî teng bûbû. Carê radibû û diçû ber pencereyê, li derve diniherî û dîsa dihat, li şûna xwe rûdinişt. Her ko diçû, hêviya wî bêhtir qut dibû, lê tevî vê jî ji bo ko bi temamî bê hêvî nemîne, hewil dida. Guhê wî her li derî bû.

Du saet derbas bûn. Robîn li ser hevdu çixare ji pakêta li ber xwe dikişand û vêdixist. Xwelîdankek tije boçik kir. Deng ji derî nehat. Mîna ko di nav valahiyekê de mabe, xwe li ser piştê dirêj kir û ma.

Bişar venegeriya. Wê gavê, Robîn têgihişt ko ew hew vedigere. Dîsa çû li şûna xwe rûnişt û çavên wî li kaxizê, ponijî. Çûna Bişêr û bêdengiya hindur, ew xistibû nav valahiyeke bêsînor. Bi tenê mabû. Mîna ko kêrek lê ketibe, dilê wî diêşiya.

Ji derveyî Bişêr, tu hevalê wî tune bû. Wî jî ew terikand û çû. Acizî, bitenêtî, neçarî… Giş tev li hev dibûn; dibûn gulokeke mezin û xwe li dilê wî dixist.

Robîn ew rêzikên dawiyê yên kaxiza ko Bişêr hiştibû, dîsa xwend.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bihata kû? Bişêr mîna ko şîfreyek an jî işaretek hiştibe, nivîsandibû. Lê, eşkere nekiribû. Fikirî. Ew bûya, ew ê biçûya kî derê? Ma yekî di rewşa Bişêr de be, dê bixwaze biçe kî derê. Cihekî din, bajarekî din? Welat?… Şer?… Diyarbekir?…

Wî jî nizanîbû, bê ev tişt giş ji kû dihatin bîra wî. Mîna ko romaneke polîsiye bixwîne, fikirî. Tiştên ko hatin bîra wî, ew ji wan ramanan dibir devereke din. Çima Bişêr xwastibû ko ew jî bi wî re biçe? Ma qey wî jî tiştekî weha dixwast? Çima çer ko li ser çûyinê fikirî, hema Diyarbekir hat bîra wî?

Pakêta ber xwe vala kiribû. Paketeke din ji bêrîka xwe derxist. Çixareyek pêxist. Destê xwe da eniya xwe û fikirî. Çi tiştên ko li ser navê Diyarbekirê dizanîbûn, giş hatin bîra wî.

Zarokatiya wî, lîskên wî yên li ber deriyan, şerên wî, hevalên wî, evînên wî û bitenêtiyên wî. Seydoyê ko hertim tê xewna wî û bangî wî dikir, Selmanê ko derketiye çiyê û niha kî dizane, bê li kû ye, Şêxoyê girtî, Hemdînê kuştî, Eliyê ko dilê wî jê mabû û çûbû… Nûşîna ko her di bîra wî de bû… Çavên wê, ruyê wê yê xweşik, porê wê, bêhna wê, bejna wê ya zirav… Bêrikirinên wî, helbestên wî, tirsên wî… Wê roja ko ew ji welêt derketin... Xwastina wî ya çûyinê ko heta niha ji herkesî veşartibû û belkî heke ne ji vê nameya Bişêr bûya jî wî dê bi qasî niha serê xwe pê neêşandaya...

Dilê wî careke din êşiya. Li ber xwe ket. Zikê wî bi wî şewitî. Kela girî ket qirika wî. Çavên wî sor bûbûn. Ji bo ko negirî, dev li lêva xwe dikir. Dîsa jî nikarîbû xwe bigirtaya. Çixareya xwe vemirand û yeka din ji pakêta li erdê kişand û xist devê xwe. Hilmeke kûr bi keserê re kişand û ma.

Dilê wî bûbû wek bombeyeke ko pîmê wê hatibe kişandin. Ji bo teqînê li hemanan bû. Hê jî diricifî. Li xwe heyirî. Li hespê har ko Bişêr behsa wî kiribû, fikirî. Gulpeke din ji çixareya xwe kişand. Destên wî mîna ko bi cereyanê ketibin, dilerizîn. Serê xwe xist nava herdu destên xwe û ma. Bi dû re, bi dengekî lerzokî, hêdîka di ber xwe de got, »heqê ez jî bi te re bihatama…«

Rabû ser piyan, situyê xwe xwar kir û rahişt qapûtê xwe. Derî li pey xwe kişand û derket derve. Berê xwe rast da rawestgehê. Heta ko ji malê bi dûr ket jî digot qey ew ê aniha Bişar ji nişka ve derkeve û bangî wî bike.

## 2. Di xelasbûna her evînê de, dîroknivîs pênûsên xwe dişikînin...

»Evdal im binêr hemû çiya digo çiya ne
Heyran çiya digo em çiya ne
Çavên reş û belek
Dinya alemê Xwedê zane çend bela ne, dimirim ax
Ay li minê ax ay Xwedê.
Herkesî dost û yarê xwe girtine
Wê kafir û kafirbavê
Kî xwe girtiye ez û tu terk dane
Xirabmal im yeman bendewar im yeman
Ax ez aşiq im dîno...«

Dinya sar bû. Berfa ko ji do de nesekinîbû û li eniya kesên ko dimeşiyan dixist hê jî dibariya. Bayê kur hê jî dom dikir. Mirov digot qey tofaneke ecêb rabûbû.

Hemû mekîneyên ko di ber wî re derbas dibûn, tije bûn. Rêwiyan gişan di caman re li berfa ko dibariya temaşe dikir. Berfê nedihişt ko mirov ber xwe bibîne. Ji ber wê, mekîne hêdî hêdî diçûn.

Heta ko otobusa ew ê lê siwar bibûya hat, Robîn ji serma qefilî. Lêvên wî qeşa girtibû. Bêvila wî bûbû mîna gêzerekî. Guhên wî hingî sor bûbûn ko wî digot qey ew ê aniha jê bikevin. Pişta wî bûbû mîna ko tu derziyan tê re rakî. Çongên wî dilerizîn. Tiliyên lingên wî hew diliviyan. Çer ko deriyê otobusê vebû, xwe bi lez avêt hindurê wê.

Çû weke hercar li paşiyê, ji xwe re cihek zeft kir û rûnişt. Berê xwe da camê.

Nameya Bişêr û çûyina wî, Diyarbekir xistibû bîra wî. Hê li rojên xwe yên li Diyarbekirê difikirî; bêtir jî roja ko cara dawîn ew bi Nûşînê re li parkekê rûniştibû.

Rojeke havînê ya germ bû. Li ser maseya hercar, li bin siya dara mezin rûniştibûn. Herduyan jî ji zû de hevdu nedîtibû. Robîn bi hemû hezkirina dilê xwe li wê diniherî. Lê Nûşînê, ne Nûşîna hercar bû. Nedipeyivî. Li wî nediniherî. Wek hercar nedikeniya jî. Her li deriyê parkê diniherî û diponijî. Dixwast ko zû bi zû rabe û biçe qey...

Robîn têgihiştibû ko dixwaze dev ji wî berde, bes bawer nedikir. Ew ji xwe re difikirî ko piştî ewqas tiştên ko bi hev re kiribûn, dê çawa bikarîya


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

dev ji wî berdaya.

Ji salekê zêdetir çêbûbû ko wan ji hevdu hez dikir. Gelek caran li deverên weha, li ser bircan li hezkirina xwe mukir hatibûn. Gelek caran bi hezar derewan malbata Nûşînê xapandibû û li malên hevalên xwe yên xwendekar li cem hev razabûn. Gelek caran heta sibehê, di himbêza hevdu de, bi hev re şiyar mabûn. Gelek caran, Robîn helbestên xwe ji wê re xwendibûn. Îja niha, ew ê ji hevdu veqetiyana û Robîn bi vêya dizanîbû. Digel ko hê mîna rojên ko heta sibehê di hembêza hevdu de diman ji wê hez dikir jî ew ê ji hevdu veqetiyana. Belkî jî ji wan rojan bêtir…

Ji xwe ev demeke dirêj bû ko dengê hevdu jî nebihîstibûn. Çend caran Robîn telefonî mala wan kiribû jî Nûşîn yan ne li malê bû, yan jî karekî ko destê wê jê nedibû dikir. Tu carî nedihat ser telefonê. Cara dawiyê gava hatibû jî ji bo ko hevdu bibînin û li ser tiştekî girîng bipeyivin, civan dabû Robîn.

Robîn xwe dabû benda wê ko ew tiştekî ji wî re bibêjê û dilê wî rehet bike. Heta ko ji devê wê nebihîstaya jî dilê wî nediket cih. Robîn bi kerb bû, xemgîniya xwe ji ruyê wî û niherînên wî dida der. Meraq dikir. Di ber re jî ditirsiya ko têkîliya wî û Nûşînê biqede. Qey gava mirov ji hinan hez bike, hema ditirse ko ew kes dev ji wî berdin û herin. Ji ber vê yekê, got:

— Tu çima ji min direvî, Nûşîn?

Nûşîn ji xwe li benda pirseke weha bû û bersiva xwe jî ji berê de amade kiribû. Lê, devê wê negeriyabû ko bigotaya. Xwe bi ser hev de civandibû, berê xwe dabû wî. Lêva xwe xwar kiribû, keserek kişandibû û gotibû:

— Hin problemên min hebûn. Ji ber wê ez li te nedigeriyam.

Robîn bi hemû dilsafiya xwe gotibû:

— Te dikarîbû ji min re bigotaya. Ma qey çi ji destê min bihataya, min ê ji bo te nekiraya?

Ev peyv bi awayê ko li ber wê bigere, ji devên wî derketibûn.

Nûşînê dîsa kiribû ufe uf û gotibû:

— Tu min fahm nakî, Robîn.

Bi dû re jî mîna ko ji berê de peyvên xwe ji ber kiribû, li pey hev rêz kiribûn.

— Binihere, Robîn. Tu kesekî pir baş î. Ez hê jî ji te hez dikim, lê ne weke berê. Ew hestên min yên berê nemane…

Ew peyv bûbûn mîna kelemekê û di dilê wî de rabûbûn. Wî ê ev peyv tu carî ji bîr nekirana. Ziq li çavên wê niherîbû. Mîna ko kûzeke ava sar bi ser wî de hatibe dakirin, mat mabû. Belê, tirsa wî rast derketibû. Çawa

qesirek ji binî ve bihedime, ew jî weha bûbû. Digot qey tiştin di hindurê wî de ji hev diqetin. Gava têgihiştibû bê Nûşînê dixwast çi bibêje, beyî ko bizanibe bê ew ê bi dû re çawa li ber bikeve, peyva wê bi carekê ve birîbû û gotibû:

— Hela bisekine, bisekine! Ev tu çi dibêjî?

— Ez dibêjim ku…

Êdî dilê Robîn ketibû cih. Ne hewce bû ko Nûşînê tiştekî din bigotaya. Dîsa peyva wê birîbû û hêdîka gotibû:

— Binihere, Nûşîn. Min nexapîne û peyvê dûdirêj neke. Ez ê carekê bi tenê bipirsim. Tu jî peyvekê bi tenê ji min re bibêje.

Ma çawa dikarîbû dev ji wê berdaya. Ma qey wî ê ev roj û ev peyvên ko hatibûn kirin, qet bikarîbûya ji bîr bikirana? Sozên ko dabûn hev hatibûn bîra wî. Demên ko di himbêza hev de bûn û devên wan di devên hev de bûn, mîna filîmekî di ber çavên wî re bihurîbûn. Xwastibû hema wê gavê rabûya û bi hemû hêza xwe biqêriya û bigotaya:

— Ez ji te hez dikim…

Xwe bi zorê zevt kiribû. Ji bo ko neqîre, dev li lêva xwe kiribû. Bi dû re, dîsa li çavên wê niherîbû û gotibû:

— Tu dixwazî ko ev têkiliya me xelas bibe, Nûşîn?

Lê di ber re jî gava ko li benda bersiva wê bû, di dilê xwe de li ber wê digeriya û digot:

— Dev ji min bernede, Nûşîn. Min terk neke...

Rengê ruyê Nûşînê yê xweşik ji nişka ve hatibû guhertin û zer bûbû. Wê bi xwe bawer nedikir ko dê ewqasî zû biqediyaya. Mîna ko li yekî biyanî binihere, li wî niherîbû û mabû. Tiştek negotibû. Bi tenê, serê xwe bi mahneya ko bibêje »erê«, kil kiribû û bi awayê ko ew ê tu carî ji bîra Robîn neçûya, gotibû:

— Hi hi…

Wê gavê, Robîn hema destên xwe mîna ko mirov karekî xelas dike, li hev xistibûn û bi awayekî liberketî gotibû:

— Hingê weha be, tu çima dirêj dikî? Baş e, bila xelas bibe.

Lê belê, hê jî di dilê xwe de digot:

— Na, Nûşîn! Ez bi qurbana te bim, dev ji min bernede... Nûşîn, dev ji min bernede...

Nûşîn careke din şaş mabû. Ew li bende bû ko Robîn li ber wê bigere. Wê nehesibandibû ko Robîn dê xelasbûna vê têkîliyê ewqasî bi rehetî bipejirîne. Ji bo ko Robîn zêde li ber nekeve, wê hin peyvên din jî di serê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

xwe de amade kiribûn.

Vê carê wê peyva Robîn birî:

— Lê belê, ez beriya wê, dixwazim tiştekî ji te re bibêjim.

Robîn tavilê ew dabû sekinandin. Ruyê wî jî zer bûbû.

Gotibû:

— Tiştekî ji min re nebêje, Nûşîn. Ez nikarim li tiştekî din guhdarî bikim. Min berê jî ji te re gotibû. Gava ko tu ji min aciz bûyî, tu ê bihatayî cem min û beyî ko peyvê dirêj bikî, te ê ji min re bigotaya. Êdî, bes e. Tiştê ko te got, temam e. Hewce nake ko tu lê zêde bikî.

Lê dilê wî weha nedigot.

Dilê wî digot:

— Bipeyive, Nûşîn. Ji bo Xwedê, bipeyive û dilê min rehet bike...

Nûşînê weke ko bibêje, »tu dizanî… yê min ne xema min e«, lêva xwe xwar kiribû, milên xwe kil kiribûn û tu tiştekî din negotibû. Robîn serê xwe bera ber xwe dabû. Digot qey xelk giş li wan dinihere, şerm kiribû, pir li ber xwe ketibû. Xwastibû hema zû bi zû xwe bigihandaya deverekê, serê xwe daniya û têra xwe bigiriya. Çavên wî tijê hêsir bûbûn. Heke peyveke din kiribûya, ew ê giriyabûya.

Bîstikekê, bi wî awayî li hember hev rûniştibûn. Nûşînê ziq bala xwe dabû wî û ji bêdengiya wî tirsiyabû ko Robîn tiştekî xirabtir bike ko herdu jî di nav xelkê de bihetikin. Lê belê, Robîn tiştek nekiribû. Hew peyivîbû jî. Piştî bîstikekê, gava ko bêhna wî hebekî hatibû ber wî, careke din serê xwe rakiribû û dîsa weke ko li ber wê bigere, li çavên wê niherîbû.

Wî dê ew nêrîna dawiyê tu carî ji bîr nekiraya û tu carî nizanîbûya bê ji bo çi têkîliya wan bi dawî bûbû. Ji ber wê, her ko bihataya bîra wî, weke ko birîna wî bi kêreke zingarî were kolandin, dilê wî dê biêşiyaya. Carinan, gava li vî bajarê dîrokî, berê xwe bidaya dîwarên qesir û qonaxên ko bêhna demên kevin ji wan dihat, wî ê her bigotaya qey nivîsek hebû ko lê hatibû kolandin. Nivîseke kûrkolandî. Ji ber vê yekê, serê wî dê biêşiyaya, bêhna wî dê teng bibûya. Ew ê li ber xwe biketaya, kelogirî bibûya û çavên xwe di nivîsa ko wî digot qey di dîwêr de hatibû kolandin de, cit bikirana:

… û yê herî egîd jî nikarîbû li ber jana evînê debar bikira…

Piştî wê cara dawîn ko bi Nûşînê re peyivîbû, berî ko werin vî bajarê mezin, careke din jî ew li sûkê dîtibû. Lê ji bo ko li çavên wê nenihere û

kula dilê wî dîsa tev ranebe, çi qasî bi wî bi tahde bûya jî serê xwe bera ber xwe dabû û di ber wê re bihurîbû. Herçî Nûşînê bû, li wî hay bûbû û heta ko jê bi dûr ketibû jî li xwe zivirîbû û di pey wî re niherîbû. Ji wê rojê û bi şûn de, zewac jî û evîn jî dê li Robîn heram bibûna. Heta ko ew li Gulcanê rast bihataya, rewşa wî dê her weha bûya.

Niha jî gava ko di otobusê de, serê xwe dabû camê û li wê roja berê û wê niherîna dawîn difikirî, hingî dilê wî diêşiya, çavên xwe girtibûn û dev li lêva xwe kiribû. Jana dilê wî xwe di ruyê wî de dabû der. Bi dû re, çavên xwe yên sorbûyî vekirin û du niqut hêsir, bi ser hinarikên ruyê wî de, hêdîka bi ser hev de gindirîn.

Ev çend roj çêbûn ko li Gulcanê jî negeriyabû. Ji cerga ko hevalê wî Elî hatibû û ji wî re behsa Nûşînê kiribû û vir de, hew carekê bi tenê çûbû cem Gulcanê. Wê rojê, ji wê re gotibû »ez ji te hez dikim.« Lê belê, niha wî jî bi xwe hew dizanîbû bê ka ji kê hez dikir. Ji lewre, carinan dilê wî jî bi Gulcanê dişewitî.

Gulcan… Keçika esmer… Lihevhatî... Bedew… Narîn... Yar û hevala rojên bitenêtiyê… Keçikek û xweşikbûneke dilrevîn... Evîndara nedîtî…

Nûşîn… Keça Kurdan... Hezkiriya kevin… Niherîna wê ya dawîn… Çavên wê… Birîna dil… Qêrîneke dil ya veşartî… Sernavê kul û derdan… Evîna nîvcomayî... Jana herî mezin… Kerb…

Kerb…

Kerb!..

Ji xwe aciz bûbû. Lahnet li dinyayê û li hemû tiştên wê dianî. Hêrs bûbû. Dilê wî dîsa tije bûbû. Dikira biteqiyaya.

Rabû ji mekîneyê daket. Di bin wê berfa ko nedihişt mirov ber xwe bibîne de, heta malê, di ber xwe de giriya û meşiya. Hişê wî ne li serê wî bû. Çi kevirê ko bihataya ber wî, weke ko kerba xwe ji serê wî derxîne, bi hemû hêza xwe pehînek lê dixist û bêtir dida girî.

Carekê destê xwe bir ber çavên xwe û hêsirên xwe paqij kirin. Bi dû re dîsa meşa xwe domand û xwe di newala kûr a fikiran de werkir. Dinya anî bîra xwe, jiyan anî bîra xwe, civat anî bîra xwe, têkîliyên mirovan, hevaltiyên wan, hezkiriyên wan, evînên wan, derewên wan û hevxapandinên wan... Wek ko hemû li hember wî bin û ew jî xwe ji vê minaqeşeyê re amade bike, fikirî. Hem digiriya û dimeşiya, hem jî difikirî. Ji ser hişê xwe ve çûbû û berê xwe şaş kiribû.


E-POSTE: **INFO@NEFEL.COM** MALPER: **WWW.NEFEL.COM**

## 3. Nefîkiriyê dinyaya xwe...

»Ez di nav wan de me, lê ez ne ji wan im.«, *Byron*

Ez li vê dinyayê najîm. Erê, ez li vê dinyayê me, erê bedena min li vira ye û erê herkes dibêje qey ez jî wek wan dijîm; lê dîsa jî tu têkîliyên min bi jiyana vê dinyayê re tune ye.

Du dinyayan bînin ber çavên xwe. Du dinyayên ji hev cida… Herdu jî di nav hev de ne. Gava mirov lê dinihere, mirov dibêje qey herdu jî yek in. Lê heke hûn jî weke min li derveyî herdu dinyayan bimînin, wê çaxê hûn ê fahm bikin ko hertişt ne wek wê rastiyê ye ko em pê dizanin.

Ez nikarim derewan bikim. Ne ji bo ko ez bi xwe re dipeyivim, ha! Ez dizanim ko niha hûn li min guhdarî dikin. Erê dengê min dernakeve derve, lê ez baş dizanim ko hûn jî bi qasî min dengê min dibihîsin. Belkî jî hûn ji min çêtir dibihîsin.

Ez najîm, lê ez ne mirî me jî. Beyî ko ez jî bizanibim, bê ji ber çi sedemê ye, ez li ser ruyê vê dinyayê, bêserî diçim û têm, diçim û têm... Mîna însanên din. Belkî piçekî ji wan cidatir, lê dîsa jî mîna însanên din.

Mîna ko di nava du dîwaran de asê bûbim, mîna ko di binê bîreke kûr de mabim... Hawîrdor reş û tarî. Serê xwe radikim ko li ezmanan binerim, lê ezman xuya nabin.

Aniha, heke hayê dinyayiyan jê hebe, ew ê bibêjin qey ez behsa wê dinyayê dikim ko mirov di serê xwe de ava dike, ne weha? Na, na; ez behsa wê dinyaya ko herkes pê dizane nakim. Ji xwe, heke weha bûya, min ne serê xwe diêşand û ne jî yê we.

Erê, ez jî dizanim ko carinan mirov di serê xwe de dinyanin cida ava dike û ji xwe re di wira de dijî, têkîliyên xwe ji hemû dinyayên din û jiyanên din qut dike. Di salên xortaniya xwe de ko ez hêdî hêdî li xwe hay dibûm, belkî jî wê gavê ez ji xwe bi dûr diketim, min fahm kir ko herkes li gora xwe û dinyaya xwe dijî. Lê tiştekî din jî heye: Dinyaya herkesî li dora wî dizivire. Hertiştên wê dinyayê li ser wî û li gora wî hatine çêkirin. Heta, tişt miştên ko gava em bifikirin û qet nayên bîra mirov jî…

Belê, baweriya min bi zanebûna we tê û ji ber wê, ez dibêjim qey we jî heta niha fahm kiriye. Jiyan filîmek e. Filîmekî dûdirêj. Û her kesek jî filîmekî wî heye. Herkes di filîmê xwe de serleheng e. Hemû bûyer û mekan, ji bo ko filîmê wî li gora senaryoya ko xwedêgiravî ji berê de hatiye nivîsandin dewam bike û ji derveyî senaryoyê tiştêk pêk neyê, ji

berê de tên amadekirin. Rola herî mezin ya wî kesî ye. Hemû însanên din jî di filîmê wî de fîguran in. Dor bi dor tên û diçin... dimirin an jî terk dikin.

Îcar de bifikirin. Mirov bi qasî barê heft hespan pirtûkan binivîsîne, an heft rojan li civatekê nesekine û bibêje jî têrê nake.

Mesela, ka bala xwe bidinê, carinan di jiyana mirov de tiştin weha pêk tên ko hişê mirov jî bi xwe nagihêjê. Mirov sed salî jî bifikire, tiştekî bi wî rengî nayê bîra mirov. Lê ji nişka ve ew bûyer pêk tê û bûyera ko mirov jê re dibêje tesaduf, an jî rastlêhatin, hemû jiyana mirov diguherîne. Ma ne weha ye? Rahme li bavê we!

Tê gotin ko senaryoya filîmê mirov ji berê de hatiye nivîsandin. Hê gava ko nuh em ji diya xwe dibin, kamera dest bi karê xwe dike. Senaryo, rol, tîp, bûyer, dîalog, hûnandin, sahne, dekor û kamera… Mirov jî tê, li wê sahneyê cîhê xwe digire û çîrok dest pê dike. Tu û şensa xwe...

Ma ger hertişt ji berê de hatibe plankirin, çi şensa mirov dimîne? Ez jî nizanim. Tiştê ko ez dizanim ev e ko ez li senaryoyeke ko ez bikaribim tesîrê lê bikim digerim, roleke weha ko ez bikaribim hilbijêrim, bûyerin weha ko ez bi îradeya xwe beşdar bibim…

Ez dizanim bê hûn ê di vira de çi bibêjin. Erê, ez jî dizanim ko Xwedê gava dide mirov, nabêje tu lawê kê yî. Lê ez dibêjim qey ev rewşa ko ez tê de me, hebekî dûrî karê Xwedayan e. Ez ji çi çaxî de di vira de me, hûn dizanin? Ez ji çi çaxî de bi kesî re nepeyivîme?

Niha, ez ne ez im êdî. Ez yekî din im. Lê ez wî yekê din nas nakim. Bi rastî, ew jî xwe nas nake. Gelo ez kî me? An kî ez im? Gelo ez bi rastî yekî din im? An yekî din ez im? Carinan ez ji xwe dipirsim, bê hela kîjan ji me ji yê din baştir e. Lê her yek li dinyayeke din dijî, herkê jiyaneke wan heye. Bîr û baweriyên wan, xusûsiyetên wan, niherînên wan, rabûn û rûniştinên wan, çûyin û hatinên wan û tevgerên wan naşibin hevdu. Ne wek hevdu ne, yanî. Min lê niherî ko nabe, min dev ji herduyan jî berda.

Her çi qas niha bi zorê were bîra min jî ez berê zarokek bûm, lê aniha ez hatime guhertin. Û ez dibînim ko çerxa felekê jî bi min re hatiye guhertin. Niha gava ez li xwe dinerim, dilê min bi min dişewite, bi Qur'an, bi wê Qur'ana ko çi îmana we pê bê, an jî neyê. Yekî mîna min... Yekî mîna min ko herkesî dixwast bibûya wek wî. Pîrekên taxê, gava dihatin çav li min diketin, hema digot ax û ji diya min re digot, »Xweziya me bi dilê te ko lawekî te yî weha heye.«

Ez jîr bûm. Jêhatî bûm. Him di xwendinê de û him jî di şer de, kesî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

nikarîbû zora min bibiraya. Ji ber ko rojekê min kêr li du serseriyên ko dihatin taxa me û bela xwe di zarokên taxa me dida kişandibû, navê min zû belav bûbû. Hê di zarokatiya xwe de, gava ez derdiketim derve, hemû zarokên wê der û dorê, ji bo ko hevaltiyê bi min re bikin bi hev re şer dikir. Yê min, min ji nav wan ji yên herî bijarte hez dikir. Min bi tenê hevaltî bi wan re dikir. Ji ber wê jî hê ez duwanzdehsalî bûm, hin îşaretên vê tenêtiya min dest pê kir û ez ji der û dora xwe hêdî hêdî bi dûr ketim. Lê tevî vê jî heval û hogirên ko ez bi yekcarî bi tenê nehiştim jî hebûn. Ên ko me bawerî dida hevdu. Ên ko em ji hevdu re dibûn pişt. Ên ko me bêyî hevdu debar nedikir. Ên ko em niha heryek bi devereke de belav bûne…

Berê, herkesî bi serê min sûnd dixwar, tu barê ko min nikarîbû hilgirtaya tune bû. Lê aniha..? Aniha ez bûme wek miriyekî. Tiştek di min de nemaye. Ez dijîm, an najîm, ew jî ne xema kesî ye. Belkî jî ne weha ye û ez dilê xwe bi xwe dişewitînim; lê ji derveyî vêya jî tiştekî din nayê bîra min.

Kesek nikare pê bizanibe bê hêrseke çawa heye di dilê min de.

Li dinyaya we, kesî ez nas nedikirim. Dîsa jî min herkes nas dikir. Ji ber ko gava ez derdiketim derve, min çavên xwe digerandin û li dora xwe diniherî. Mîna ko kamerayek di destê min de be, min jiyana we giş qeyd dikir. Lê min bi awayekî weha qeyd kiriye ko gava hûn lê temaşe bikin, hûn ê xwe nas nekin. Ji ber ko ruyê wan kesên ko di dîmênên jiyana we de ne, tune ye. Min aliyê dinyaya we yî bêdeng kişandiye. Yanî min tevliheviya dinyaya we kişandiye. Lê hûn ê di wan dîmenan de, bêdengiya xwe bibînin. Belkî hûn ê bigirîn, belkî jî hûn ê henekên xwe bi xwe bikin. Wek ko aniha ez dikim.

Wê gavê, ez bi tenê bûm. Sibehê zû derdiketim. Carinan min taştê jî nedixwar. Ji bo min bûbû tebîetek. Ez her sibeh derdiketim û diçûm, min xwe bera nava jiyana we dida. Her êvar serê min di ber min de, ez vedigeriyam malê. Gava min dixwast ez ji we û jiyana we ya herimî bi dûr bikevim, hema wê rojê ez ji nava nivînên xwe dernediketim. Min newêrîbû çavên xwe vekirana. Gava min çavên xwe vedikirin, her yek ji we dibû pîrhebokek û bi ser min de dihat. Gava ez di xewê re biçûma jî kabûs dihatin min. Li aliyekî cin û pîrhebok û hûn, li aliyekî jî kabûs û ez bi tena serê xwe...

Kesî ji we ez fahm nekirim. Gava ez dipeyivîm, we gişan serê xwe kil dikir û li min guhdarî dikir, lê mîna ko ez bi zimanekî din peyivîbim, yekî ji we tiştek ji devê min fahm nedikir. Ji bo ko ez bi we bidim fahmkirin û

hûn alî min bikin, min qirika xwe çirand, dilê min werimî, ez behecîm, lê we fahm nekir. Pê re hêdî hêdî têkîliyên me qut bûn. We jî hin têkîlî qut kirin. Hin jî min qut kirin. Belkî weha çêtir bû. Him ji bo we û him jî ji bo min…

Ez êdî bi xwe re dipeyivîm. Min derdê xwe ji xwe re digot û min li xwe guhdarî dikir, lê ji bo ko ez xwe xelas bikim, tiştek ji destê min nedihat. Min xwe himbêz dikir û pişta xwe difirkand. Kesek tune bû ko min derdê xwe jê re bigotaya. Ne hevalekî ko ez serê xwe deynim ser milên wî û bigirîm, ne jî dostekî ko bikaribûya ji min fahm bikiraya an jî ez bikaribim pê bişêwirim…

Heta demekê, keçikeke ko bikaribe himbêza xwe ji min re veke û derdê min bi min bide jibîrkirin jî tune bû. Çi ji min hat, min kir, belkî jî min qet tiştek nekir, lê her çi be, min dîsa jî keçikeke xweşik ko hema carekê bi tenê li min bizivire û li hindurê çavên min binihere nedît. Agir bi kezeba min diket. Min çi bêriya germahiya canê jinekê kiribû, hûn nizanin. Carinan min hertişt ji bîr dikir û ez bi tenê bi wê hesretê dinaliyam ko ez şevekê heta sibehê di himbêza jineke xweşik de bimama, min serê xwe daniya ser memikên wê û di xewê re biçûma. Heta ko min Gulcan nas kir, ez bi vê hesretê şewitîm. Niha, ne bi temamî be jî Gulcanê ev hesret di dilê min de sivik kiriye. Lê ez nizanim, dîsa jî tiştin di dilê min de tev dilivin. Dilê min dîsa jî tiştinan dixwaze, bi hesreta tiştin din dişewite.

Min pir li ber xwe da, tu rê nema ko min neceriband. Lê, nebû. Piştî ko min lê niherî ko ez çi qasî di ber xwe de bidim jî belasebeb e, êdî min jî dev ji xwe berda. Min got, hema çi dibe bila bibe, belkî çêtir bibe.

Niha ez ji hemû dinyayê xeyidîme. Ez bi tena serê xwe li dinyaya xwe dijîm. Heke hûn rastiyê bixwazin, ev ne dinyaya min e jî. Belkî ya yekî din e û xwediyê wê niha ne li vira ye. Belkî jî carê yek, dor bi dor, em tên vira û diçin. Ez nizanim.

Belê, êdî jiyana min naşibe ya we. Ew ê tu carî jî neşibiyê. Ji ber ko em nema ji hevdu fahm dikin. Ne ez ji we fahm dikim, ne jî hûn ji min fahm dikin. Ez nema bi henekên we dikenim. Hûn jî nema bi yên min... Ji lewre, ez jî henekên xwe ji xwe re dikim. Ez bi xwe derdikevim sahneyê û li xwe temaşe dikim û bi xwe dikenim. Hingî kêfa min ji henekên min re tê, ez ji kena bi zikê xwe digirim û li ser piştê li erdê dikevim. Di ber re jî ez ji xwe re dibêjim, heke hayê însanên din ji van henekan hebûya, ew ê ji kena bimirana, weleh!

Min têkîliyên xwe yên bi dinyaya we re qut kirine. Li gora we, niha ez


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

najîm. Lê ez li wira me, li cem we me. Wek siyekê, wek xeyalekê di nav we de digerim... Belkî hayê we ji min heye, belkî ne xema we yekî ye jî.

Belê, ez najîm. Di navbera du sahneyan de diçim û têm. Li herdu sahneyan jî filîmên min dilîzin; lê herdu filîmên min qet naşibin hevdu. Kesê ko ji dêleva min di wan filîman de dilîze, an jî kesê ko herkes dibêje qey ez im, an jî ez... Ew zilam ne ez im.

Ez nema dikarim vegerim dinyaya we. Ne di destê min de ye, em wek hevdu najîn. We xwe hişk bi jiyanê girtiye. Hûn ji jiyanê hez dikin. Lê ez... Hema ez ji we re bibêjim û bila dilê we rehet bibe: Heke jiyan ev be, îmana min ji we û jiyana we diçe!

Hertişt li aliyekî, ez ê çawa bikaribim xwe xelas bikim, ez nizanim. Min çavên xwe girtin û vekirin, min dît ko çerxa felekê bi carekê ve hatiye guhertin. Ez gêj bûbûm. Mîna ko şev li min geriyabe û ez dewx bûbim, min hema çavên xwe bi tirs digerandin. Lê belê min heta niha ne vî warê xwe yî nuh nas kir û ne jî min riya vegerê dît.

Rojekê ez ê bimirim, yanî ez ê bi temamî bimirim û xelas bibim. Bi dû re herkes dê bimire. Hinên din dê werin şûna me. Yanî em ê bimirin û biçin. Yanî tu tişt ji me namîne. Yanî em belasebeb dijîn? Aha ez vêya qebûl nakim, ha!

Îro ez heme, lê sibehê tune me. Yanî kî bimire ji kîsê xwe diçe? Ya ko li zora min diçe jî ev e, ji xwe...

Ez kî me, çi karê min heye li vê derê, çawa hatim vira, herkes li kû ye, çima kesek dengê min nabihîse, çima em mecbûrin ko bijîn, çima em ê rojekê bimirin?.. Em li vira li çi gûyê xwe digerin, em ji bo çi dijîn?

Niha ez nizanim bê ez ji bo çi dijîm. Gelo hûn dizanin? Lê tiştek bi tenê heye ko niha ez pê dizanim; ez êdî ne ez im.

Heke ez ez bim jî ez bi tenê me. Bi tena serê xwe… Di dinyayeke xalî de… Qesasê bitenêtiya min »ne diyar« e. Ez di destên »qesasnediyaran« de, ne di tu halî de me.

Niha hat bîra min. Belê, baş hat bîra min. Berê, min ji we fahm dikir û we jî ji min. Berê, me bi hevdu re xwe li dinyayeke hevbeş radikişand. Berê, ez bi henekên we dikeniyam û hûn jî bi yên min… Lê çi bû? Çi bi me hat?

Ma çi bi me nehat, lo!.. Erê, erê… Ji bo her yarekî »qesasnediyarek«... Dil şikestin. Situ xwar man. Agir bi warekî ket. Dixan ji deverekê çû. Pêleke koçberiyê… Tofaneke tirsê. Xezebeke dîsa »qesasnediyar«… Lehîyek. Lehîyeke sor. Lehîyeke ko dil kirin gor…

Û ez serê we zêde neêşînim, dinya li dereke teng li me çû ava, du çavên ez bi hesreta xwe hiştim, cara talî li dinyaya gewrik niherî û xezebê hêlîn li ber gelek dilan xera kir û dilên neçar, dilên peritî xwe li tariya biyanistana bêbext girt.

Haho, ma ev ne bes in? Ma hîn dê çi bibe?

## 4. Kîjan...?

wecihê te Diyarbekirê tîne bîra min...

Qerisîbû. Gava ko li xwe hay bû, dît ko ji zû ve di ber malê re bihuriye. Mal li dû wî mabû. Çavên wî werimîbûn. Hêsirên wî li ruyê wî qeşa girtibûn. Ji sermayê dilerizî. Diranên wî li hev diketin. Ji şeq şeqa diranan pê ve, tu tişt nedibihîst. Vegeriya û heta ko gihîşt malê, dilê xwe bi xwe şewitand û ponijî. Hingî di bin wê sermayê de mabû û ji hal de ketibû, çer ko gihişt malê, serê xwe danî û raket.

Ta girtibû. Di xew de dinaliya. Gava ko diya wî Leyla Xanim bi dengê nalîna wî hisiyabû, çûbû odeka wî û heta sibehê li ber serê wî rûniştibû. Xew ketibû çavên miriyên mezelan, lê neketibû çavên wê.

Kincên lawê xwe yên ko ji ber xwêdana wî tev şil bûbûn, ji wî kiribûn û yên zuha lê kiribûn. Her ko Robîn dinaliya, Leyla Xanimê destê xwe di eniya wî ya fireh de dida, porê wî mist dida û di ber xwe de digiriya. Dilê wê bi lawikê wê dişewitî.

Robîn herroj bê serî derdiket derve û êvaran ruyê wî daliqiyayî dihat malê. Carinan jî diket odeka xwe û heta êvarî deng ji wî nedihat. Êdî mîna berê, bi Serdar û Meryemê re jî elaqadar nedibû. Acizî û bêhntengiya wî li malê, bala herkesî dikişand.

Robîn heta sibehê bi xwe nehisiya. Gava çavên xwe yên westiyayî vekirin, lê hay bû ko canê wî ji xwêdanê tev şil bûye. Vêya ew bêtir aciz kir. Berî ko ew şiyar bibe, bi çend deqîqeyan mîrata xewê zora Leyla Xanimê biribû û ew li ber serê wî di xew re çûbû.

Robîn li wê niherî. Nehat bîra wî, bê kengî hatibû malê û ketibû nav nivînên xwe. Gava çav li rewşa diya xwe ket, lêva xwe gez kir. Êşiya. Bala xwe da ruyê wê yê ko kul û derdan cih ji tu tiştekî re nehiştibû. Dilê wî bi wê şewitî. Gava dît ko çavên diya wî tev liviyan, dîsa çavên xwe girtin û xwe li xewê danî.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Leyla Xanim bi paçikê destê xwe ruyê wî yê xwêdayî paqij kir. Bi dû re, rabû ser xwe û çû ber derî. Westiyabû. Berî ko derkeve, dîsa li xwe zivirî û bi çavên xwe yên ji bêxewiyê nepixîbûn û bi zorê vedibûn, li ruyê lawikê xwe niherî. Bi dû re zivirî, derî bi kerbeke mezin li pey xwe girt û derket.

Gava derî hat girtin, Robîn çavên xwe dîsa vekirin. Canê wî giran bûbû. Lihêf ji ser xwe avêt, rabû û rûnişt. Kincên xwe yên şilbûyî ji ser xwe avêtin. Hew bêcemeyê wî lê mabû. Xwe bi wî awayî dîsa li ser nivînên xwe dirêj kir.

Çavên wî vekirî bûn û li bin zikê xênî diniherî. Bîstikekê weha ma û her fikirî. Ji ber ko li malbata xwe dibû bar, ji ber xwe fedî kir. Mîna ko hinekan tif ser çavê wî kiribe, li ber xwe ket, ruyê wî sor bû. Serê xwe bera ber xwe da.

Ji xwe re got:

— Ez ji tu gûyî re nabim! Ez ji tu gûyî re nabim...

Divê êdî tiştek bikira. Tiştekî din. Tiştekî nû ko wî ji vê rewşê xelas bike.

Gava li xelasiyê fikirî, Bişar hat bîra wî. Bi hêrs li nameya wî fikirî dîsa. Qet nebe wî ceribandibû! Heke bi ser neketibe jî ew ê ji xwe re bibêje »min ceriband.«

Rêza yekem ya nameya wî di serê xwe de dubare kir.

… Hespekî har di bin min de ye. Ez nikarim wî rawestînim.

Gava derî vebû û Serdar ket hindur, wî hîn ew rêzik di serê xwe de dubare dikir. Serdêr li wî niherî. Hêsir ji çavên Robîn diherikîn û ji kêlêkên çavên wî xwarî erdê dibûn. Ziq li bin zikê xênî diniherî. Li wî hay nebûbû. Ji bo ko wî nexe ber fediyê, Serdêr jî tiştek negot. Berê xwe da aliyê din, pirtûkek ji refikê daxist û beyî ko dîsa li wî binihere, ji odeka wî derket.

Çavên Robîn dîsa hêdîka çûn ser hev. Ji nişka ve ruyê Bişêr hat ber çavê wî û çû. Mîna şewqeke ko ji nişka ve vêkeve û wenda bibe. Çavên xwe bi tirs vekirin û sekinî.

— Ev çi bû, îja?

Çavên xwe dîsa birin ser hevdu. Vê carê, li devereke din bû. Ji bo ko nas bike, li dora xwe niherî. Hindur nîvtarî bû. Li dora wî çend textik mextik, lodeyeke pûş î piçûk û çend sergîn û tepikên rêxê yên jihevbelavbûyî hebûn. Bêhneke kevin û sar ji hindur dihat.

Serê xwe rakir û li jorê niherî. Bin zikê xênî mîna camiyekê bû. Konên

pîrê li dîwaran çêbûbûn. Hawîrdor gemarî bû. Berê xwe da aliyê din.

Ji nişka ve çav li wêneyekî ket. Wêne mezin bû û pir li jorê hatibû daliqandin. Pîrekeke ciwan a xweşik, bi fîstanekî şîrkî û di himbêza wê de jî lawikekî piçûk î kirasspî yî porzer û çavşîn hebû. Li dora serê lêwik, şewqeke zer çêdibû ko dora xwe ronî dikir. Bi awayekî ecêbmayî li wêneyî niherî. Reşahiyek ber bi çavên wî ket. Li wî aliyî zivirî.

Keçikek. Bejna wê zirav û lihevhatî. Esmer. Porê xwe bera ser milên xwe daye. Çavên wê reş û gir, ruyê wê zirav û lêvên wê xweşik. Li hember wî, di nav bêhna hindur de, mîna semboleke bedewiyê sekinîbû û li wî diniherî.

Robîn ji xweber destê xwe dirêj kir û got:

— Nûşîn...

Nûşînê jî destê xwe dirêj kir, lê wek ko tiştek wê bi paş ve dikişîne, hêdî hêdî bi şûn de çû û di nav wê tariyê de wenda bû. Serê Robîn hêdîka ket ber wî.

Dîsa vegeriya û li erdê niherî. Çavên wî li tiştekî din ketin. Li wî aliyî zivirî. Bişêr li ser lodeya pûş, herdu destên xwe xistibûn nav çongên xwe û xwe xûz kiribû. Raketibû. Kincên wî tev qetiyayî û gemarî bûn. Bala xwe da ruyê wî. Ji rîha wî û gemara ruyê wî xuya bû ko ji zû ve ji vira derneketibû. Ruyê wî zer bûbû. Biniya çavên wî reş bûbû. Lawaz bûbû. Ji sermayê dilerizî.

Robîn veciniqî û rabû ser xwe. Li dora xwe niherî. Pencere, dîwar, pirtûkxane, maseya xebatê ya ko ev çend roj in, wî ne berê xwe dayê û ne jî rêzek nivîsandiye, kaxiz maxizên li ser wê, li dîwêr wêneyekî pira dehderî û bircên Diyarbekirê…

Hêdîka rabû ser xwe, rahişt qutikê xwe yê li ser kursiyê û çû ber pencereyê. Li derve niherî. Dinya rohnî bû. Berf sekinîbû. Her dever spî bûbû. Bajar di bin berfê de mabû. Ji şewqa berfa erdê, çavên wî şewitîn. Çavên xwe rakirin û li avahiyên ko ji dûranê xuya dibûn, niherî. Ezman çik î sayî bû. Bi hemû zelaliya xwe dibiriqand.

Vegeriya û dîsa li ser nivînên xwe rûnişt. Serê xwe xist nava herdu destên xwe û ma. Çavên xwe bera ser teraha li erdê da û çend deqîqeyan bê tevger sekinî. Bi dû re, keserek kişand û rabû ser xwe. Çû li ber wêneyê li dîwêr sekinî. Ew ji dîwêr daxist û di destê xwe de girt. Bîstikekê lê niherî. Hêrs bû. Çavên wî sor bûn. Tiliyên wî şidiyan. Xwast ko wêneyê di destê xwe de biavêje erdê û bişkîne, di ser de jî bi hemû hêza xwe pihînekê lê bixe û perçe perçe bike. Belkî bi wî awayî, dilê wî dê hebekî rehet bibûya.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Weha nekir. Wêne avêt ser maseyê û dîsa çû ber pencereyê. Bi çavên ko ji kerban bûbûn wek du bizotên êgir li dûranê niherî. Destên xwe kirin kulm û şidandin. Bi dû re, dîsa vegeriya ser nivînên xwe û rûniştۥ Canê wî hêdîka sist bû û ma. Hew dizanîbû, bê dê çi bikira. Dîsa serê xwe xist nava herdu destên xwe û bala xwe da perxaneya ko li odeka xwe çêkiribû.

Bişar dîsa hat bîra wî. Ew dîmena di hindurê wê dêra kevin de... Zikê wî bi hevalê wî şewitî. Bêriya wî kir. Hew wî bi tenê dikarîbû ew fahm bikira. Niha li kû bû gelo?

Le çi karê Nûşînê hebû di wê dîmenê de? Ma qey dibe ko xewna wî rast be û hin işaretan bi ber wî bixe? Nizanîbû. Bê çare mabû. Vir de diçû, wê de diçû, dîsa dihat û li şûna xwe rûdinişt.

Bişar çûbû, wenda bûbû. Ew dîsa bi tena serê xwe mabû. Hew dixwast çav li Gulcanê jî bikeve. Li neheqiya ko li wê dike, fikirî. Him ji wê hez nedikir, him jî qet nedixwast ko serê xwe ji himbêza wê rake. Ji ber xwe fedî kir. Hema xwast ko bimire û ji vî derdî xelas bibe.

Serê xwe bi kerb hejand. Kela girî dîsa ket qirika wî. Kir û nekir, nikarîbû bigiriya. Hêrsa wî di dilê wî de bûbû gulokek û mezin dibû. Pakêta xwe ji bêrîka qapûtê xwe derixist û çixareyek pêxist. Wê gavê, dît ko tiliyên wî dilerizin. Ne bi tenê tilî, lê her deverên wî dilerizîn. Hew dikarîbû li ser lingan rawestiya. Zû bi zû çixare danî ser xwelîdanka li ser maseyê. Di cihê xwe de rûnişt û xwe bi ser piştê de avêt erdê.

Serê wî gêj dibû. Piştî ko çend deqîqeyan li erdê bi wî awayî ma, berî ko hin werin hindur û wî di wê rewşê de bibînin, rabû ser xwe û dîsa çû, li şûna xwe ya berê rûnişt û ma.

Tiliyên wî hîn jî dilerizîn. Jana ko di mejiyê wî de digeriya û ew di nav xwe de vedigevizand, mîna esrarê di damarê wî de digeriya û ew bêhiş dikir. Sînga wî bi lez radibû û dadiket. Bi dû re, bi vê serxweşiya xwe, dîsa rabû û bi gavin giran çû, hêdîka rahişt wêneyê li ser maseyê. Li dewsa wî ya berê daliqand. Gemara ser wêneyî, bi kefa destê xwe paqij kir û bala xwe dayê.

Her gava ko wî li vî wêneyî diniherî, bêhna wî fireh dibû. Lê, vê carê weha nebû. Mirov digot qey ew sêhra vî wêneyî betal bûbû û çûbû. Vê carê bêhna wî ji berê bêtir teng bûbû. Ew jî li vê yekê hay bûbû. Dîsa li wêne niherî, mîna ko li dijminê xwe binihere çavên xwe qels kirin, diranên xwe şidandin, hêrsa xwe li ser hev civand û mîna ko bi însanekî re bixeyide û biqîre, di dilê xwe de got:

— Tu jî hew ji tû gûyî re dibî, weleh!

Kir niçe niç û bi wî awayê xwe yê ko tu nemabû ji hêrsa xwe biteqiya, bi kerb serê xwe kil kir. Kesereke kûrtir kişand, axînek ji sînga wî ber bi qirika wî ve hat û derket derve. Kelogirî çû li ber pirtûkxaneya xwe sekinî. Serê xwe rakir û bi çavên xwe yên şil û sorbûyî li refika jorê niherî. Ji wira rahişt torbeyekî naylon û hat dîsa li ser nivînên xwe rûnişt. Torbeyê reş û tozgirtî dawişand û vekir. Destekî xwe rada hindurê wî û wêneyek jê derixist. Hêsirên wî hêdî hêdî diherikîn.

Têra xwe lê niherî. Mîna ko mirov li çavên hezkiriya xwe ya kevin binihere û tê de biçe binê newalên kûr, çolên bêdawî, okyanûsên bêbinî…

Wêneyekî din derxist û danî ser yê din. Dîsa yê din ji binî derxist û ji berê kûrtir lê niherî. Bîstikekê, carê li yê din û carê li yê ko bi dû re ji torbe derxistibû vegeriya û ma. Bêhna wî li ber çikînê bû. Hêsirên wî mîna ko xwe li ber melodiyeke giran berdin xwarê, herikîn ser hinarikên ruyê wî û ji xwe re rêyin peyda kirin, daketin heta jêra çenga wî û ji wê derê jî niqutîn xwarê. Her ko hêsirekî din diniqutî, bêvila xwe dikişand û kerba dilê xwe dikir axîn û derdixist derve.

Çend wêneyên din jî avêtin ser yên din. Hin ji wan bi niqutên hêsirên wî şil bûbûn û xera bûbûn. Bi êşa serê wî, him giriyê wî û him jî hêrsa dilê wî pirtir dibû. Heta ko ruyê wî û çavên wî nepixîn, giriya. Wêne giş ji torbe derxistin, di destê xwe de dan ser hev, mahdê xwe tirş kir û bi hemû hêza xwe, got 'peleq' û ew li bin guhê dîwêr xistin. Wêneyên ko li dîwêr ketin, li wê rastê bela wela bûn.

Xwe bi ser dev de avêt ser nivînên xwe û demeke dirêj bi wî awayî ma.

Çûyin? Mayin? Çûyin? Mayin?… Kerb… Bitenêtî… Keser… Hesret… Mirin… Giş jî weke hev… Yek ji yekê xerabtir…

Serê xwe ranekir. Giriyê wî sekinî. Westiyabû. Lê, hê jî dilê wî rehet nebûbû. Dikira dîn bibûya. Çûyin û mayin, bûbûn mirin û mirin. Tiştekî din nedihat bîra wî. Rêyeke din. Dermanekî din. Merhemek ji vê birînê re. Haho!!! Hawar gidiyano!!!

Mayin: Terikandina hertiştî. Jibîrkirin. Her û her di nav bêrikirinê de helandina dil û mejî…

Çûyin: Çûyina kî derê? Ji bo çi? Bi çi mebestê?..

Kîjan? Kîjan?

Kîîîîîîîjaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaaan!

Di nav van fikran de, asê mabû. Ev asêbûn jî tirs bera dilê wî dida. Her ko digot 'çûyin,' tirsa wî mezintir dibû. Bi vê tirsê re meraq û heyecana wî jî... Jan…

Hew dikarîbû xwe ji nav van fikran xelas bikira. Tirs, meraq û heyecan, tev li hev dibûn di dilê wî de, diçûn û dihatin. Şerekî mezin dest pê kiribû. Hêdî hêdî ber bi têkçûyinê ve diçû. Sînga wî wek volkanekê dikeliya, dikeliya. Hindik mabû ko bigota 'gurm' û biteqiya.

Tirsê zora heyecan û meraqê bir. Mîna ko li tiştekî ecêbmayî mabe, çavên wî fireh bûbûn. Çi tiştê ko dizanîbû, çi kesên ko nas dikirin, çi ruyên ko di bîra wî de mabûn; çi bira, çi heval, çi yar; çi kolan, çi bajar, çi welat; çi stran, çi helbest, çi çîrok, çi romanên ko dihatin bîra wî hebûna… Gişan ji wî re eynî tişt digot. Û ji nava wan, yek jî li dijî yên din dernediket. Heta, kabûsên wî jî ji wî re eynî tişt digot:

Vegere. Vegere û were.
Ez werim?
Belê.
Ji bo çi?
Rizgarî.
Çawa?
…
Kî der?
…

## 5. Tifaq…

Gava Robîn di odeka xwe de, di nav kul û derd û janên xwe de vedigevizî, diya wî Leyla Xanimê jî ji bo wî li serşokê av germ dikir.

Leyla Xanim heta sibehê, li ber serê wî mabû. Xwêdana eniya wî û pişta wî paqij kiribû. Ji ber ko ji rewşa kurê xwe, tu tişt fahm nedikir û nikarîbû çareyekê jê re bibîne, bêtir li ber diket. Di ber xwe de digiriya. Ji bo ko kes bi wê û giriyê wê nehise jî ji serşokê dernediket.

Serdar carekê ji bo ko dest û ruyê xwe bişo, ketibû serşokê; lê gava ko çav li diya xwe û giriyê wê ketibû, dibe ko têgihiştibe, beyî ko wê bi xwe bihisîne, serê xwe bera ber xwe dabû û hêdîka bi şûn de vegeriyabû. Ji xwe, gava ji bo pirtûkê ketibû odeka Robîn, ew bi çavên xwe dîtibû û rewşa wî fahm kiribû.

Robîn her ko diçû ji wan bi dûr diket. Êdî, hew henek jî bi wî dikirin. Hew bi wî re dipeyivî. Dereng vedigeriya malê. Tew carinan kesî nizanîbû, bê diçe kî derê. Gava dihate malê jî ji odeka xwe dernediket.

Herçî Serdar bû, ji ber ko pir ji Robîn hez dikir, niha dilê wî pê dişewitî. Gava di ser de çav li wê rewşa diya xwe ket, hew dikarîbû debar bikira. Hema zû bi zû kincên xwe li xwe kirin, beyî ko dest û ruyê xwe bişo û xwe weke hercar bixemilîne, porê xwe jole bike û li benda taştê bimîne, digel ko hê ji çûyina wî re, gelek wext mabû jî bi dizî derketibû derve û çûbû.

Gava Robîn ji odeka xwe deriket, Leyla Xanimê jî ava wî bera teştê dida. Çavên wê nepixîbûn, bêvila xwe bi pişta destê xwe paqij dikir. Piştî ko Robîn serî di ber de, di ber wê re derbas bû û ket serşokê, ji bo ko kes tiştekî jê nepirse, hema ket hêwanê û secadeya xwe raxist û dest bi nimêjê kir. Heta ko Robîn ji serşokê derket û tev li destmala ko pê porê xwe zuha dikir, berê xwe da odeka xwe jî ew ji ser secadeyê ranebû. Dengê lingan ji medbexê hat û hin di ber deriyê hêwanê re çûn û hatin jî ew qet ji şûna xwe ranebû û berê xwe jî neda wan. Hey selawat kişandin û ji bo ko Xwedê rêyeke baş ber bi kurê wê bixe, dia kirin.

Mehabad rabû çû metbexê. Piştî ko taştê amade kir, ji bo ko Mîtanî şiyar bike hat li ber deriyê odeka wî sekinî. Dengê Mîtanî ji hindur dihat. Li gora dengan, xuya bû ko dîsa bi Binevşê re dixeyidî. Wê gavê Mehabadê mahdê xwe tirş kir, kire ufe uf, dîsa vegeriya medbexê û li ser sifreyê rûnişt. Meryemê jî berdilka xwe li xwe kiribû û hatibû, li ser sifreyê rûniştibû.

Herdu li benda xelasbûna şerê wan sekinîn. Herçî Mehabad bû, ji bo xelasbûna vî şerê ko êdî hizûrê di mala wan de nahêle, çi ji destê wê bihata dikarîbû bikira. Lê ji tirsa Mîtanî, newêrîbû dengê xwe derixistaya. Bîstikekê li ser sifreyê çavên xwe bera niqteyeke ko nayê dîtin dan û sekinî. Ponijî.

Bêhna wê pir teng bûbû. Îmana wê ji herduyan jî diçû. Ji cerga ko Binevş hatibû nav vê malê, tifaq di nav wan de nehiştibû. Mîtanî jî dikir û nedikir, bi wê nikarîbû. Binevşê tu carî bi ya wî nedikir. Ji ber wê, wan hema hema herroj şer dikir êdî.

Bi qêrîneke Binevşê bi xwe hisiya, dîsa rabû ko biçe ber derî. Resûl Beg jî bi dengê wan rabûbû û bi destan tiştin ji Leyla Xanimê dipirsîn.

Mîtanî hey ji Binevşê re digot:

— Keçê, li min guhdarî bike, keçê! Destê xwe deyne! Destê xwe deyne,



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ez ji te re dibêjim!

Û diqêriya. Dengê wî û dengê giriyê Binevşê tev li hev dibû û dihat derve. Carekê, dengê sîleyekê jî hat bihîstin. Bi dû re, yeka din û yeka din.

— Serê xwe rake, keçê! Keçê, serê xwe rake!

Binevş digiriya û diqêriya. Dengê Mîtanî bi ser yê wê diket:

— Hiş be! Negirî! Negirî, keçê!

Dengên sîleyan li pey hev dihatin. Leyla Xanim û Resûl Beg û Mehabadê nizanîbû, bê divê wan çi bikira. Şaş mabûn. Mîtanî û Binevşê berê jî gelek caran pev çinîbû, lê tu carî li şerekî wan yê bi vî rengî rast nehatibûn. Ruyê hersiyan jî zer bûbûn, çavên wan fireh bûbûn. Carekê, Resûl Beg xwast ko deriyê wan veke û têkeve nav wan, lê Leyla Xanimê ew zevt kir û nehişt tev bilive. Bi zorê peyv anîbûn ser hev û got:

— Bihêle, hela. Bihêle, bê çi dibe.

Di dilê xwe de jî digot:

— Ox bû. Divê Mîtanî berî niha lêxistineke baş li wê bikira. Vê qahpika hanê, tifaq di mala me de nehişt.

Şêrê wan her ko diçû, gurtir dibû. Piştî dengê çend sîleyên din ko li Binevşê ketin, derî ji nişka ve vebû û Binevş bi bazdan derket, di nav wan re derbas bû û berê xwe da deriyê derve.

Li xwe dixist û digiriya. Çavên wê tu der nedidît. Dikir haho. Ne li ser hişê xwe bû. Diricifî. Mîna dînan hereket dikir. Porê wê tev li hev bûbû. Heke aniha derketaya derve, yê rastî wê bihataya, dê bigotaya qey ev jinik ji şerekî mezin derketiye, xwe ji nav lepên deh kesan xelas kiriye û hatiye. Hema li dora xwe diziviri û dima. Nizanîbû bê dê çi bikiraya.

Bi dû wê re jî Mîtanî ji odekê derket. Çavên wî weha bûbûn ko dikira ji serê wî baz bida. Dev li zimanê kiribû. Hêrsa wî ji çavên wî yên sor, xuya dibû. Hê Binevşê nû derî vekiribû, hema xwe çeng kirê û hişk bi destê wê girt.

Binevşê dikir haho û bi destên xwe ruyê xwe ji ber sîleyên wî diparast. Dengê wê li hindurê apartmanê belav bû û olan da. Cîrana hemberî wan, bi dengê wê re deriyê xwe vekir, li wê niherî, lê bi dû re ji tirsa, dîsa deriyê xwe girt û ket mala xwe.

Binevş li erdê rast bûbû. Li her cihê ko derb lê diket, şûna tiliyên Mîtanî çêdibû. Mîtanî him lê dixist, him jî ew di pey xwe re dikişkişand odekê.

Di ber re jî digot:

— Tu bi ya min nakî, ne weha! Tu bi ya min nakî. Ez ji te bim, heke dîsa min tu bi xwe re birî cihekî, lê! Tu bi ya min nakî, ne weha! Ez ji te

re dizanim!

Ew di pey xwe re xist odekê û derî dîsa li ser xwe girt. Mîtanî di ber Leyla Xanim, Resûl Beg û Mehabadê re bihurîbû. Tew belkî li wan hay nebûbû. Belkî jî ji wan pê ve, li tu tiştekî din nedifikirî.

Ya rastî, gava biryara xwe dabû ko di pey Binevşê re derkeve, rezîlbûna xwe ya li hember malbata xwe jî hesibandibû. Hêrî zêde jî li ber vê yekê diket. Ji ber wê, gava li wan rast hat û bi hêrs di nav wan re derbas bû, mîna ko li wan hay nebûbe tev geriyabû û ji bo ko hetika wan anîbû, piştî dîsa derî li ser xwe girt, têra wê li Binevşê xistibû û kerba xwe ji serê wê derixistibû.

Piştî çend deqîqeyan, deng ji wan biliya. Hew carê dengê Mîtanî dihat, lê ew jî nedihat fahmkirin. Xuya bû ko bêhna wî jî hatibû ber û êdî dev ji lêxistinê berdabû û şîret li jina xwe dikirin. Gava ko peyva wî xelas bû jî got:

— De rabe, biçe serçavê xwe bişo. Ji vê carê û pê ve jî xwe bike însan û gava ko hinekan tiştek ji te re got, bi ya wan bike. Ne ko tu tiştan bi serê xwe bikî. Ez dîsa destê xwe bi te bikim, welehîn, heta ko ez te nekujim, ez dev ji te bernadim. Bila vêya jî di bîra te de be. De rabe ser xwe. De!

Piştî bîstikekê, Binevşê derî vekir, serî di ber de derket û berê xwe da serşokê. Mîtanî jî di pey wê re derket. Berê, li ber deriyê serşokê sekinî, bi hêrs li wê niherî, diranên xwe şidandin, serê xwe jê re kil kir û kesereke kûr kişand. Bi dû re jî berê xwe guhert û çû medbexê, cem yên din, li ser sifreyê rûnişt. Ji ber ko li ber gişan li jina xwe xistibû, yên din jî ji wî tirsiyabûn. Hayê wî jî ji vê yekê hebû. Ji lewre, mîna axayekî ko biçe nav xulamên xwe ketibû medbexê.

Yên din mîna ko tiştek nebûbe, çay jê re dagirt, qedeha wî danî ber wî û dîsa bala xwe da xwarinê. Berî ko ew bi xwe bixwaze, şekir jî û nan jî danîn ber wî. Qedeha wî ya avê jî hat ber. Wan digot qey hema Mîtanî li wan li hemana ye û dike dora wan jî bê. Him tirsiyabûn ko Mîtanî destê xwe bi wan jî bike, him jî ji bo ko dilê wan li Binevşê rehet kiribû, hurmeta wan ya li hember wî, bêhtir bûbû. Lê dîsa jî dilê wan bi Binevşê şewitîbû.

Ji nav yên malê, bi tenê Resûl Beg cida difikirî. Ji derveyî liberketina wî ya ji bo tunebûna tifaqa malê, ji bo kurê xwe jî li ber diket. Her ko dengê wan bihata wî, bêtir li ber diket û hey ji xwe re digot:

— Ev kurê min, bi vî karî nizane. Hê nikare bi jinekê re derkeve serî, tew ew ê çawa ji vê malê re sermiyantiyê bike. Rojekê serê min bi aliyekî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

de bikeve, Xwedê neke tiştek bi min were û ez bimirim, ew ê ev mal xera bibe. Xwedê çê bike!

Çend caran wî jî xwastibû ko bi lawê xwe û bûka xwe re bipeyive, lê belê hem ji ber qirika xwe û hem jî ji ber ko tirsiyabû ko kes bi ya wî neke û ji ber wê dev ji vê fikra xwe berdabû.

Herçî Resûl Beg bû, piştî wê emeliyata ko dengê wî birîbû, êdî hew bi xwe bawer dibû. Ji xwe, yên malê gişan dizanîbû, bê Resûl Beg li ser rewşa Mîtanî û Binevşê çi difikire. Gişan dizanîbû ko ji ber şerê wan pir aciz dibe, lê nahêle ev aciziya wî xuya bibe.

Carinan, ew jî li vê rewşa xwe difikirî û li ber diket. Heke ew qeweta wî ya berê hebûya û dîsa mîna berê bikarîbûya peyva xwe bi yên dora xwe bida guhdarîkirin, wî ê bi du sîleyan Mîtanî jî Binevşê jî bidaya ber xwe û bikiraya ko nema deng jî wan derketaya. Ji lewre, her gava ko ev yek dihat bîra wî, hema serê xwe bera ber xwe dida, diponijî û kesereke kûr dikişand ko bala herkesê dora wî dikişand.

Binevşê nehat ser sifreyê. Mîtanî bi dengekî bangî wê kir, lê deng jê nehat. Piştî ko serçavê xwe şuştibû, çûbû û xwe avêtibû ser nivînên xwe.

Nedigiriya. Ne di xew de bû jî mîna hercar. Her gava ko ji hinan bixeyidiya, hema xwe diavêt odeka xwe û radiket. Lê vê carê, mîna ko ji xwe re li rêyekê bigere, çixareyek pêxistibû û diponijî. Çavên wê nepixîbûn û biniya wan reş bûbû. Lêva wê jî xuya bû ko derbeke nebaş xwaribû.

Carekê fikirî ko xeberekê bide mala bavê xwe, da ko werin û têkevin nav wan. Lê, ji tirsa ko bavê wê jî li pişta mêrê wê rabe, dev ji vê fikra xwe qeriya. Bi vî awayî navbera wê û mêrê wê jî dikarîbû bêtir xerab bibûya. Li Stenbolê, tu merivê ko di vî warî de peyva wî li ba mala mêrê wê pere dikir jî tune bû.

Divê ji xwe re rêyek bidîtaya. Hew dikarîbû debar bikiraya. Ji ber xwesiya xwe û gorima xwe newêrîbû devê xwe li malê vekira. Herduyan jî bi çavê dijminan li wê diniherî. Li vê malê, tu kesî ji wê hez nedikir. Newêrîbû biçûya nav wan jî. Di hindur de, her aciz dibû. Ji yên malê ditirsiya ko rojekê li wê bicivin û tiştekî bi wê bikin. Mehabadê jî girê xwe ji wê digirt. Her ko dihat malê, tiştekî nû ji xwe û Meryemê re dikirî, lê heta aniha tiştek jî ji wê re nekirîbû. Her şev gava ko diket cem mêrê xwe, ji wî re ev tişt digotin.

Mîtaniyê ko li van peyvan guhdarî dikir, tavilê bawerî bi peyvên wê dianî. Dibû dijminê xwehên xwe. Diya wî jî li ber çavên wî reş dibû. Ji ber vî girê pîrekan, bêhna wî teng dibû. Êdî, nedixwast ko êvaran were malê.

Gava li diya xwe jî guhdarî dikir, ji malê bêtir sar dibû. Li gora diya wî jî ji cerga ko Binevş hatiye, rehetî nedaye wan. Hê destê xwe nedaye tiştekî. Her gava ko Mîtanî ji malê derdikeve, ew jî dikeve odeka xwe û heta êvarî ji wira dernakeve. Bi kesî re napeyive, nayê nav malê, derdê xwe ji kesî re nabêje. Gava ko li wan dinihere jî eynî mîna ko li dijminê xwe binihere, awirên tûj dide wan. Bi dizî nên dixwe. Ji wan hez nake.

Li gora Leyla Xanimê, armanceke Binevşê bi tenê hebû. Binevşê dixwast Mîtanî ji malê cîhê bike. Ji bo vêya jî nexweşiyê li malê derdixe û tifaqê xera dike. Êvaran jî fesadiyê ji wî re dike û dike ko mal li ber çavên wî reş bibe. Ji lewre, ne ew ji kesî hez dike, ne jî kes hez ji wê dike.

Herçî Mîtanî bû, li kê guhdarî bikiraya, ji wan bawer dikir. Lê dîsa jî ji diya xwe re digot:

— Hûn neheqiyê li jinikê dikin. Heke hûn bixwazin, hûn ê bikarin wê baş bikin, lê hûn naxwazin.

Gava ko diçû cem jina xwe jî ji wê re digot:

— Tu nizanî xwe bidî hezkirin. Tu karê malê nakî. Gava tu dikî jî tu mineta xwe dikî. Ew ji te mezintir in. Diya min û Mehabad çi ji te re bibêjin, tu ê bi ya wan bikî. Ger tu weha bikî, şer jî nema di nav we de derdikeve.

Li ser taştê, bêdeng rûniştibûn. Kesî newêrîbû dengê xwe jî bikira. Wê gavê, weke ko li tiştekî hay bibe, Leyla Xanimê serê xwe rakir û li dora xwe niherî.

— Ma qey Serdar ne li hindur e?

Meryemê bi hemû safbûna xwe bersiva wê da.

— Derket derve. Çû.

Herçî Leyla Xanim bû, ji vê bersivê ket gumanê. Hebekî fikirî. Bi dû re jî got:

— Ma hê saet çi ye?

Vê carê Meryemê bersiv neda. Li ser sifreyê, bêdengiyeke mezin çêbû. Gişan serên xwe bera ber xwe dan. Ji Meryemê pê ve, kesî hew devê xwe da nên. Mîtanî got qey ji ber şerê wî û jina wî, rewşa malê ji nişka ve hat guhertin. Ew jî hêdî hêdî têdigihişt, bê ka şerên wan dibe sedema çi. Ket ber fediyê. Ruyê wî sor bû. Ji lewre, ew jî qet nepeyivî.

Wê gavê, Leyla Xanim lê hay bû ko malbata wê dike ji hev belav bibe. Heta niha, tu carî tiştekî bi vî awayî neanîbû bîra xwe jî. Lê îroj, êdî ji vê fikra xwe ditirsiya. Ji ber wê, bêhna wê teng bû. Tansiyona wê dîsa rabû. Hêdîka xwe bi dîwêr girt û laşê xwe yê giranbûyî ji erdê rakir û rabû ser


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

piyan. Gava ko rabû ser piyan, serê wê gêj bû, ber çavên wê reş bû. Bîstikekê xwe tev nelivand. Heta ko nehat ser hişê xwe jî weha ma. Bi dû re, bi zorê be jî gavek avêt.

Bi dengekî lerzokî, got:

— Hela ez herim, bê Robîn çawa kir.

Berê xwe da odeka Robîn û derket. Resûl Beg serê xwe rakir û di pey wê re niherî. Ji meraqeke mezin ko ew bi temamî xistibû bin tesîra xwe û pê ve, tu tişt di çavên wî de xuya nedibû. Pariyê nên di destê wî de mabû. Pariyê ko dicût, di devê wî de zuha bûbû û mabû. Mehabadê di bin çavan re li Mîtanî diniherî. Serê Mîtanî hê di ber wî de bû.

Leyla Xanim li ber deriyê odeka Robîn sekinî. Bi qiraxa leçeka serê xwe, çavên xwe paqij kirin. Malbata xwe tu carî, di rewşeke weha de nedîtibû. Li mala wê, êdî her û her şer û pevçûn hebû. Kurê wê û bûka wê li hev nedikir. Kesek ji wan jî nikarîbû têketa nav wan. Kurê wê yê din hemû pêywendiyên xwe ji herkesî qut kiribûn, bi nexweşiyeke ko kes pê nizane, ketibû. Yê biçûk jî niha dabû ser şopa wî. Heke rojekê, serê wê jî bi aliyekî biketaya, zarokên wê dê bi tena serê xwe çawa bikarîbûna li hember van kul û derdan tifaqa xwe biparazta û ji hev belav nebûna. Ji xwe, Resûl Beg bûbû nîvînsan, hew dikarîbû bi kêrî van tiştan bihataya. Ji ber wê, hertişt dîsa diket ser milên wê. Divê tiştek bikira ko dîsa tifaqa wan a berê çêbibûya. Divê tiştek bikira...

Piştî taştê, Mîtanî derket. Mehabad jî di pey wî re derket. Meryemê hinek pere ji bavê xwe stend û berê xwe da dibistanê. Ji nav wan, herî hindik ew li ber vê rewşa malê diket. Lê dîsa jî digel zarokbûna xwe, bîra hin tiştan dibir. Ji hersê birayên xwe jî hez dikir û heta niha dilê wê ji wan nemabû. Ji ber ko piçûka malê bû, herkesî ji wê hez dikir û ew li ser destan digirt. Çi bixwastaya, ji wê re dihat kirîn. Yeka wê, nedibû dudu. Delaliya malê bû. Carinan, Serdêr hebekî tahde li wê dikir jî wê dilê xwe ji wî nedigirt. Bi zora Serdêr fêrî xwendin û nivîsandina kurdî jî bûbû. Bi dû re, wê jî ji vî karî hez kiribû. Ji ber ko wan bi kurdî dixwend û dinivîsand jî herî zêde ji Robîn û Serdêr hez dikir.

Herçî Meryemê bû, digel ko heta niha nebûbû dijminê tu kesî, îmana wê jî ji Binevşê diçû. Her gava ko Mîtanî li ber herkesî henekek bi Binevşê dikir û dibû tîqe tîqa Binevşê, eynî mîna ko li dijminê xwe binihere, li wê diniherî. Dibe ko ev ji ber tesîra Leyla Xanimê be jî.

Gava Meryem derket, Resûl Beg jî ketibû odeka xwe û dîsa li ber teyba

xwe rûniştibû. Her ko Leyla Xanimê ew di vî halî de didît, agir bi kezeba wê diket.

Di malê de, herkes bi derdê xwe biliyabû. Gişan bi derdê hevdû dizanîbû jî kesî ji kesî re nedigot. Roj dibûn meh, meh dibûn sal, sal diqulipîn… Ev bajarê mezin, ev warê nû, çi qasî tişt dabe wan, ji wê zêdetir jî ji emrên wan dibir. Hew hayê Leyla Xanimê ji vêya hebû.

Ji aliyê aborî ve, tu kêmaniya wan nebû, lê dîsa jî wan li hev nedikir. Şer, pevçûn, çavnebarî, dijminahî ketibû nav wan. Her gava ko Leyla Xanim weha difikirî, ji xwe re digot:

— Tifaq.

Bi dû re jî digot:

— Gava ko tifaq di mala me de hebûya, em nediketin vî halî. Ne ev bajar, deh bajarên mîna wî jî bihatana, dê nikarîbûna zora me bibira.

Li gora Leyla Xanimê, sedema nebûna tifaqê jî ji hertiştî bêhtir, hatina Binevşê ya vê malê bû. Ji xwe, ew ji serî de, ji vê zewacê ne razî bû. Ji lewre, her gava ko biraziya wê Gulperiyê dihat bîra wê, ji xwe re digot:

— Aaax… aax. Kesî bi ya min nekir. Heke bi ya min bikiraya, ev bela jî nedihat serê me û em weha ji hevdu bi dûr nediketin. Gulperî keçikeke xwende bû, zane bû, eşîr bû, karê deh pîrekan dikir. Aaax… Bi ya min nekir û ev bela anî serê me…

## 6. Bes tu bixwazî…

Qey carinan evîn jî li hember hin derdan bêkêr dima...

Robîn kincên xwe li xwe kirin û derket derve. Heta ko ew bi dûr ket û wenda bû jî Leyla Xanimê ji balqonê, di pey wî re niherî. Lawikê wê mîna yekî ko bi jana zirav ketibe, ji ber wê jî êdî têkîliya xwe ji her tiştî qut kiribe û xwe dabe benda mirinê, dimeşiya. Giran, hêdî, serî di ber de, mîna ko beyî hişê xwe bimeşe.

Ji vî lawê xwe pir hez dikir. Ji herdu lawên wê, herî zêde, Robîn dişibiya Seydo. Her gava ko li wî diniherî, Seydo dihat bîra wê. Ew jî mîna wî bi xwendinê mijûl dibû û bi kurdî dinivîsand. Mîna wî tev digeriya. Ji ber wê bû ko Leyla Xanimê carinan nikarîbû li ruyê wî bineriya.

Seydo jî derdê xwe ji kesî re nedigot. Carinan, wê ew jî mîna Robîn di quncikan de zevt dikir ko digiriya. Çi qasî dipirsî jî nikarîbû peyvek ji devê wî derixistaya. Bes ferqeke Seydo hebû; ew ji Robîn bêhtir bi însanan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

re diket têkîliyê. Xwe mîna Robîn, ji herkesî bi dûr nedixist. Belkî sedema vêya, jiyana li welêt be jî. Ji ber ko Robîn, piştî hatina vî bajarê mezin weha hatibû guhertin.

Berê ne weha bû. Gava ko di civatekê de rûdinişt, herkesî bi wî re suhbet dikir. Lê piştî hatina vî bajarî, êdî hew diçû civatan. Gava ko diçû jî zêde nedipeyivî û her diponijî. Ji civatan aciz dibû, guh nedida wan; mirov digot qey li tiştekî temaşe dike ko tu kes pê nizane, an jî li dinyayeke din dijî. Vê rewşê bala herkesê dora wî dikişand. Lê dîsa jî awirên wî, kenê wî yê ko niha hatibû jibîrkirin, hurmeta wî ya li hember kesên dora wî, ew bêhtir dişiband Seydo.

Carinan jî ditirsiya ko qedera Robîn jî bişibe ya Seydo. Ji bo ko weha nebe, destên xwe li ber Xwedê vedikirin û her dia dikir. Niha, gava ko di pey wî re li meşa wî diniherî jî ji xwe re digot:

— Ya Rebî! Tu çi qasî mezin î! Tu tiştinan dixuliqînî, qet naşibin hevdu; tiştinan jî dixuliqînî ko mirov qet nikare wan ji hev derxîne. Hişê mirov nagihêje karê te. Yek dibe yê din; yê din dibe herdu…

Robîn da nav berfê û çû. Dîsa Xwedê dizane, bê ew ê kengî vegere malê. Her gava ko ew ji malê derdiket, Leyla Xanimê digot qey kurê wê hew vedigere malê. Ji ber ko Seydo jî eynî mîna wî kiribû. Rojekê serê sibehê, ji malê derketibû û hew vegeriyabû malê. Ji lewre, her gava ko Robîn dereng bimaya, heta ko bihata malê, destê wê di dilê wê de bû.

Herçî Robîn bû, baş dizanîbû ko diya wî di pey wî re diniherî. Hayê wî ji Resûl Beg jî hebû. Carekê, Resûl Beg heta rawestgeha otobusan dabû pey wî. Robîn li wî hay bûbû. Lê qet nehiştibû ko Resûl Beg bi vêya bihise. Ji ber ko dê û bavê wî weha dikir, carinan ew jî ji xwe ditirsiya û her gava ko hin ji serê neqebekê derbiketana, an jî li serê riyekê sekinîbûna, wî digot qey ew ê aniha xwe biavêjin ser wî. Ji ber vê yekê, xwe dida benda wan û heta ko ew bi dûr neketana, taya mirinê ew bernedida. Hema bi carekê ve dilê wî dikir gupe gup û tu nedima ko bisekine.

Nizanîbû, bê bi kû de diçû. Dinya sar bû ji xwe, ne roja ko mirov derketa derve bû; lê belê ew hema aciz bûbû û derketibû derve. Piştî ko hebekî meşiya, berê çû, ket dikanekê. Ji dikandêr destûr xwast û rahişt ahîzeyê ko li Gulcanê bigere. Ji zû ve hevdu nedîtibû û li wê negeriyabû jî. Tew vê yekê, ew bêhtir ji Gulcanê bi dûr xistibû. Digot qey ev salek wan e ko wan hevdu nedîtiye. Ruyê wê bi zorê anî ber çavên xwe, li wê temaşe kir. Wê gavê, fahm kir ko pir bêriya wê kiriye, li ber xwe ket.

Nûmareya mala wê zivirand û li dengê zingila wê guhdarî kir. Piştî ko

du caran lê xist, telefon vebû. Dengê Gulcanê yê nerm, tiştin di dilê wî de livandin. Gulcanê çi qasî digot »elo, kerem bikin« jî wî tu bersiv nedayê. Piştî ko Gulcanê jî êdî dev ji peyvê berda û li bêhnstendina kesê hember guhdarî kir, Robîn ahîze danî û telefon girt. Bîstikekê weha ma.

Dikandarê kal bala xwe dabû wî. Heta ko Robîn ahîze danî û hat cem wî û perenin ji bêrîka xwe derixistin jî tev neliviya. Rewşa Robîn fahm kiribû. Gava Robîn pere dirêjî wî kirin, bi destê xwe ew da sekinandin û jê re got:

— Xem nîne, bila bimîne.

Robîn pereyên xwe dîsa xistin bêrîka xwe û beyî ko tiştekî bibêje, serê xwe bi mahneya ko bibêje »bila weha be, spas,« hejand û derket.

Gava derket derve û ba li eniya wî ket, mîna ko hişê wî hebekî hatibe serê wî, sekinî û li dû xwe niherî. Dikandarê kal hê li paş camê rawestiyabû û li wî temaşe dikir. Tu mahne neda perenewergirtina dikandêr. Ji ber ko li vî bajarê mezin, xelkê dikarîbû ji bo çend qurûşan hevdu bikuşta jî. Fikirî, lê ji ber ko nexwast serê xwe zêde biêşîne, dev jê berda. Bi dû re, dîsa zivirî, destê xwe xist bêrîka xwe û meşiya.

Di dilê xwe de, hebekî poşman bûbû ko li Gulcanê geriyabû. Lêva xwe xwar kir, li ber ket. Çima ji wê direviya? Digel ko hê ji wê hêz dikir, çima nikarîbû biçûya cem wê? Wî jî nizanîbû. Qey carinan evîn jî li hember hin derdan bêkêr dima...

Bi xwe re ketibû mihakemeyekê. Lê hay nebû, bê çawa gihîşt rawestgehê.

Otobusek hat û li ber wî sekinî. Deriyê wê yê pêşiyê vebû. Robîn siwar bû. Heta ko biletek avêt qutîkê, şifêr li wî niherî. Bi dû re, dîsa derî girt û otobus ji rawestgehê bi dûr ket. Robîn berê, çavên xwe li hindurê otobusê gerandin, bi dû re jî çû li paldankeke dawiyê rûnişt.

Di otobusê de, ji wî pê ve, zilamekî kal bi tenê hebû. Gava robîn bala xwe dayê, digel ko herkesê li vê taxa piçûk rûdine nas dikir jî lê hay bû ko wî ev zilam tu carî li vira nedîtîbû. Bala xwe zêde nedayê. Dîsa berê xwe da camê û dest bi temaşekirina derve kir. Piştî bîstikekê, mîna ko li tiştekî din jî hay bibe, veciniqî. Herçî otobus bû, digel ko li her rawestgehê rêwî hebûn jî li tu deveran nedisekinî. Gava ko ji nû ve çavên xwe li dora xwe gerandin, ew zilamê kal rabû ser xwe û ber bi wî ve hat.

Robîn, berê ji vê rewşê tirsiya, lê piştî ko bala xwe da zilêm, tirsa wî piçekî daket. Kincên wî yên spîboz dibiriqand. Di destê wî yê ko bi qasî bala mirov bikişîne xweşik û paqij de, gopalek hebû. Awirên wî yên nerm



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

û ruyê wî yê ko mirov digot qey nûr jê dibariya, hurmeta mirov li hember wî bêtir dikir. Rîha wî ji adetê spîtir û dirêjtir û porê wî yê bi qasî riya wî spî û dirêj jî ji paşiyê de hatibû hûnandin.

Piştî ko Robîn çav li van xusûsiyetan ket, ji berdêla tirsê, hiseke ko ji hezkirin û hurmetê pêkhatî pê re peyda bû. Bi temamî dev ji wê tirsê berda û bi çavên heyirî li hatina wî niherî. Li gora wî, divê ev ne însanekî wek me bûya. Na, ew ne yekî weha bû ko bikare xerabiyê bi însanan bike. Lê belê, ev çi ye? Çima otobus li rawestgehan nasekine? Çima ji wan pê ve, tu kes di vê otobusê de nîne?

Ew zilam hat û li kêleka Robînê ko şaş mabû, sekinî. Çavin wî hebûn ko ji ber xweşikbûna wan, hişê mirov ji serê mirov diçû. Zilêm bala xwe da wî û bi dengekî ko mirov digot qey ji dûranê dihat, hêdîka got:

— Tu dibêjî qey tu nikarî tiştinan biguherînî, ne weha?

Herçî Zilamê Kal bû, mîna ko bi hertiştê wî dizanibû, pirsîbû. Bi pirsa wî û tevgerên wî yên ecêb, çavên Robîn firehtir bûbûn. Piştî ko dîsa bala xwe da kincên wî yên ko berî niha bi hezar salî însanan li xwe dikirin, xweziya xwe daqurtand û peyv di hişê xwe anîn ser hev. Bi tirs pirsî:

— Tu jî kabûs î, ne weha?

Zilamê Kal hêyla xwe da ser gopalê xwe û xwe bi ser wî de xwar kir.

— Ev ne xewn e, Robîn; ne kabûs e jî. Li dora xwe binihere. (Destekî xwe rakir û derve nîşan da, di pencereyê re li derve niherî.) Bala xwe bide tiştan. Bifikire. Jiyan çi qasî xewn be, ez jî ewqasî xewn im.

Ev çi ye, îcar? Ma însan tu carî peyvên weha ecêb dikin. Robîn jê bawer nekir. Ji xwe, nedişibiya însanan.

Zilamê Kal xwe hebekî din daqûl kir, li hindurê çavên wî niherî û got:

— Li hindurê çavên min binihere û bibêje. Tu ji min bawer nakî, ez dizanim.

Vê carê, Robîn bi tirs bi paş de vekişiya. Mîna ko ji wî bireve, xwe xist quncikê. Tirsiya.

— Netirse, Robîn. Ji min netirse. Belê, ez naşibim însanên ko tu herroj wan dibînî. Kincên min jî ne mîna kincên wan in. Lê ev tişt nabin sedema ko tu ji min bitirsî.

Robîn eynî mîna ko zilêm gotibû li hindurê çavên wî diniherî û guhdarî dikir. Dîsa bala xwe da wî. Fikirî. Herçî Zilamê Kal bû, mirov digot qey dizanîbû, bê Robîn çi difikirî, xwe dabû benda wî ko bigihişta biryarekê. Robîn dîsa mîna berê, xwe bi ser hev de civand, li hindurê çavên wî niherî. Zilamê Kal pişta xwe rast kiribû.

— Tu baş fikirî?

Robîn serê xwe kil kir.

Zilêm got:

— Îja, de ka bibêje. Bersivekê bide min.

Û pirsa xwe dubare kir:

— Tu dibêjî qey tu nikarî tiştinan biguherînî, ne weha?

Robîn pêwîst nedît ko tiştekî bibêje. Ji xwe, zilêm dikarîbû fikrên wî bixwendana. Dîsa jî herdu destên xwe mîna ko neçar mabe, vekirin û got:

— Ez nizanim.

Zilamê Kal got:

— De îja, bala xwe bide min.

Robîn têgihişt ko zilam dike ji wî re tiştin ko ew pê nizane, bibêje. Bi meraq xwe da benda wî.

— Tu tişt nîne ko hişê mirov nagihijê. Ma tu dibêjî qey ev tişt giş hatine nivîsandin? Ma gelo mirov nikare li hember hin pêvajoyan derkeve û wan li gora xwe biguherîne?

Robîn hebekî fikirî. Zilamê Kal giş li ser hevdû pirsîbûn. Pirsên wî jî eynî mîna wî ecêb bûn. Bi dû re, got:

— Insan nikare qedera xwe biguherîne.

— Belê, rast e. Lê heke weha be, heke qedera herkesî ji berê de hatibe nivîsandin, însan çima dijîn? Çima ji bo ko ew vê dinyê fahm bikin, mîna te hey serê xwe diêşînin?

Robîn tu bersiv nedayê. Zilamê Kal dîsa peyva xwe dewam kir:

— Em bibêjin, her însan sînorekî wî yê jiyanê heye. Di jiyanê de diçe û tê, li cihekî disekine, ne weha?

Robîn serê xwe bi mahneya erê, hejand.

— Xwedê Teala, hertiştî dide mirov. Tiştekî wî ji yê yekî din kêm nagire. Dinya tije na'met e. Hinek însan ji bo ko xwe bigihijîne wan na'metan û wan bi dest bixe, dikare hertiştî bikin. Hinek jî ji ber nebûna van na'metên dinyayê ko Xwedê ew ji bo me şandine, her diponijin û serê xwe diêşînin, tiştekî nakin. Hinek jî hema çi bi dest bixe, şikiriya xwe bi Xwedê tîne.

Robîn di vira de hebekî aciz bû. Xwe negirt û got:

— Ez van tiştan gişan berê dizanim. Ez bawer nakim ko tu ji bo van gotinan hatibî vira.

Zilamê Kal bişirî.

— Eferim, ji te re. Te li ser zanebûn û gihiştina xwe ez qane kirim. Bes



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

tu tiştekî ji bîr dikî. Binihere; min ji te re behsa sê celeb însan kir, lê te nepirsî bê çima însan giş mîna hev tev nagerin.

Bala xwe da Robîn, bê piştî vê gotina wî, çi dike û difikire.

Bi dû re, dîsa dewam kir:

— Insan giş mîna hev in. Vêya tu carî ji bîr neke. Giş mîna hevdu hatine afirandin, lê jiyan hin xususiyetên wan ji wan distîne û dibe.

— Yê me, tişt bi me nehiştiye!

— Tu xelet î. Jiyanê tiştekî we ji we nestendiye. Lê, we jî tiştek bi dest nexistiye. Welatê we ber bi bayekî ket, hayê wê kesî jê çênebû. Hûn herkê bi deverekê de belav bûn, ketin nav jiyanin biyanî, hatin guhertin. Bi dû re hûn li xwe vegeriyan û hatin ser hişê xwe. Lê wê gavê, ji wê bedewiya welatê we tiştek nemabû. Wê gavê we çi kir?

Robîn vê carê, serê xwe bera ber xwe da.

— Ev yek divê nebûya sedema ko hûn dev ji jiyanê berdin. Di welatekî mîna yê we de, kesên mîna te pir in. Ma tu dibêjî qey tu bi tenê weha yî?

Robîn dîsa tiştek negot. Serê wî hê di ber wî de bû.

— Li xwe bifikire. Te qet carekê jî negotiye ko ez ê berê jiyana xwe biguherînim. Ji ber ko te tiştekî xwe baş zevt nekiriye jî her bayê ko hatiye, tiştek ji te biriye û çûye. Lê, gelo te qet carekê jî gotiye, ez ê tiştên xwe ji nû ve bidim ser hevdu û bimeşim?

Kela giriyê ket qirika Robîn. Mirov digot qey zilam di hindurê wî de bû. Bi hertiştên wî dizanîbû. Lê ya ecêb ew bû ko zilêm hesab ji wî dipirsî.

Serê xwe hêdîka rakir, li çavên wî yên gir ên mîna okyanûsan niherî û got:

— Tu kî yî?

Zilamê Kal dîsa bala xwe da ruyê Robîn. Bîstikekê sekinî, bi dû re got:

— Tu çi navî li min bikî, ez ew im.

Herçî Robîn bû, ji xwe têgihiştibû ko esrarengiziyeke vî zilamî heye. Bi vê bersiva wî ya ko dişibiya peyvên kesên ko di romanan de dibin leheng, êdî baş bawer kir ko ev zilam ne rastî ye. Dîsa di xewnekê de ye. Lê heta niha, tu xewnên wî an jî kabûsên wî belasebeb nehatibûn pêşiya wî. Di pey her yekê re, bivê nevê tiştek derdiket. Divê sedemeke vî zilamê kal jî hebûya. Lê… çi?

— Tu çima serê xwe bi min re diêşînî?

Zilêm herdu destên xwe li ser gopalê xwe dane ser hev û çendekî li wan niherî. Bi dû re, dîsa serê xwe rakir, hilma xwe stend û bi wî dengê xwe yê ko mirov digot qey ji bêdengiyeke mezin tê û ji lewre hişê mirov ji serê

mirov dibir, got:

— Gava kesên mîna te di nav hin tiştan de vegevizîn û asê bûn, yekî mîna min tê û riyekê bi ber wan dixe. Min gelek rê bi ber te xistin, lê te neda ser wan. Ka bifikire. Ew tiştên ko te digot »ecêb e, çawa ev tişt li gora dilê min çêbûn,« û te digot qey şens bû, giş min pêk dianîn. Bi dû re, hemû tiştên ko min ji te re şandin, te pişta xwe da wan. Êdî, ez jî mecbûr mam ko bi xwe werim û rê bi ber te bixim.

Robîn bêhtir ecêbmayî mabû. Çawa yekî ko heta niha ew nedîtîbe, tê û rê bi ber wî dixe. Hebekî hêrs bû. Bi dû re, kenê wî bi vê xewnê hat. Serê xwe kil kir û di ber xwe de keniya. Mîna ko henekên xwe bi zilêm bike, got:

— Ka te tu rê bi ber min nexistin.

Zilêm dizanîbû ko Robîn henekên xwe bi wî dike, lê mîna ko hayê wî jê tune bû, tev digeriya.

— Ji xwe, ez li benda vê bersivê bûm.

Bi dû re jî lê zêde kir:

— Bila tu vêya baş bizanibî, ez nikarim riyan bi ber te bixim. Ji ber ko tu bi xwe dikarî riya xwe hilbijêrî. Ez vêya baş dizanim. Heke tu bixwazî, tu bi xwe dikarî di jiyana xwe de hin tiştên ko te berê digot; »ez qet nikarim vana biguherînim,« ji kokê de biguherî. Bes tu bixwazî! Wê gavê, tu ê di her tiştî de, bi ser bikevî.

Gava ko Zilamê Kal ev tişt digotin, Robîn berê xwe dabû camê û li derve niherî. Bala xwe baş da derve, lê hay bû ko hê li wî cihî bû ko li otobusê siwar bûbû. Veciniqî û bi lez li Zilamê Kal zivirî. Lê, di otobusê de, ji wî pê ve kes tune bû.

Wê gavê, otobus sekinî. Deriyê wê yê dawiyê vebû. Robîn bala xwe da şifêr. Şifêrê otobusê jî tune bû. Heke weha be, ev otobus çawa hatibû heta vê derê? Ma qey derî bi xweber vebûbû?

Fikirî. Heke xewna wî xelas bûbe, çima hê di vê otobusa ecêb de bû? Zilamê Kal bi kû de çûbû? Ma gelo bi rastî jî ew tiştên ko wî digot; »tesaduf e«, bi xêra vî zilamî dihatin pê? Ne xwe, hemû tiştên wî di destê vî zilamî de bûn. Ji ber ko jiyan bi xwe tesaduf bû. Ma qet dibe ko jiyana wî di destê vî zilamî de be?

Rabû, weke ko nû ji xewê şiyar bûbe, li dora xwe niherî û ji otobusê daket. Piştî ko ew daket, deriyê otobusê dîsa hat girtin. Gava ko Robîn ji nû ve bala xwe da hundurê otobusê, dît ko Zilamê Kal li paş camê ye, li wî dinihere û dibişire. Xwast ko dîsa biçe û têkeve hindurê otobusê. Çer


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ko gava xwe avêt, Zilamê Kal bişirî û bi destê xwe işaretî wî kir, da ko di cihê xwe de raweste. Wê gavê, Robîn rawestiya û mîna ko li ber bigere, li wî niherî. Zilamê Kal destê xwe ji wî re kil kir. Mijekê hêdî hêdî xwe bera ser riyê da. Otobus wenda bû û çû…

Robîn ji sermayê ricifî û veciniqî. Dinya sar bû. Lingên wî cemidîbûn. Serê tiliyên wî ji niha ve qeşa girtibû. Hema, xwe da kêleka riyê û li benda mekîneyekê sekinî. Otobusek ji wê de xuya bû. Robîn heta ko otobus gihîşt cem wî, nivîsa li ser wê xwend û xwe da bendê. Otobus hat û li ber wî sekinî. Robîn siwar bû û çû li dawiyê rûnişt.

Dîsa serê xwe spart camê û li derve temaşe kir. Gava ko otobus di ber rawestgeha nezîkî mala Gulcanê re derbas bû, Robîn çavên xwe li kuçan gerandin. Û gava ko otobus bi dûr ket jî serê wî hêdîka ket ber wî. Çavên wî şil bûn.

Heta ko ji otobusê daket, ruyê Gulcanê ji ber çavên wî neçû. Di nav re jî niherîna Nûşînê ya dawiyê, carê dihat ber çavên wî. Zilamê kal jî hey dihat û di guhên wî de, bi wî dengê xwe yê ko hişê mirov ji serê mirov dibe, digot:

— Çavên xwe veke, bala xwe bide dora xwe. Heke tu bixwazî, tu ê bi ser bikevî.

Otobus dimeşiya. Ruyê Gulcanê bi dûr diket. Gulcanê di pey otobusê re digiriya.

Nûşînê dimeşiya, bi dû re li xwe diziviri û destê xwe dirêjî wî dikir. Dibişirî.

Wêneyê Diyarbekirê li ber çavên wî dinepixî û mezin dibû… Bircên xerabe bangî wî dikir.

Seydo ji wira li wî diniherî…

Hevalên wî yên din. Hemdîn. Şêxo. Selman. Elî.

Hesret…

Kîn…

Hêrs…

Zilamê Kal hey xwe bi ser wî de daqûl kiribû û di guhê wî de dixwend:

— Binihere, Robîn... Binihere... Hingî tu ê bi ser bikevî.

Otobus dimeşiya. Robîn hêdîka serê xwe rakir. Pişta xwe baş spart paldankê. Çavên xwe girtin û ma. Bêhna wî hatibû ber. Heyecanek ketibû dilê wî. Agirek hêdî hêdî mezin dibû û di hindurê wî de belav dibû…

# Beş III, û şeytan vegeriya...

## 1. Bajarê bêşeytan

Got, her bajarek şeytanekî wî heye; lê bi tenê, yê vî bajarî tune ye. Wî ev peyv di zarokatiya xwe de, ji parsekekî kal bihîstibû. Li gora efsaneyê, rojekê şeytanek li serê vî bajarî jî dibe bela û ji nişka ve di nava du malbatên mezin de, bi tevlêbûna gelê bajêr jî şerekî mezin dest pê dike. Vî bajarê ko li der û dora wî gelek ewliya jiyabûn û heta wê rojê bi wê xusûsiyeta xwe ve wek bajarekî pîroz hatibû naskirin, piştî ko Şeytên li wira dest bi lîstikên xwe kiribû, bûbû bajarê şer û talanê.

Kesên ko xwe li dora du malbatan girtibû, hevdu li kû bidîtaya efû nedikir; êrîşî malên hevdu dikir û talan dikirin. Gelê bajêr ji ber vê rewşê bêzar bûbû. Kesî nizanîbû bê ji bo çi şer jî dikir. Heta ko dilê ewliyayekî mezin bi gelê bajêr dişewite û radibe bi Şeytên re şer dike, ev rewş her weha dewam dike. Li gelek deveran dihat gotin, ko ew ewliyayê mezin hesinkerek bû. Ji ber vê yekê, di encama şerekî mezin de zora Şeytên dibe; wî dixe hundirê hesinekî, li ser deriyekî kelehê bi zincîran ve girê dide û bajêr ji wî şerê ko kesî nizanîbû bê sebeba wî çi bû, xelas dike.

Wî hesinê ko li ser deriyê keleha hundir hatiye zincîrkirin, rojekê tê dizîn û nema tê dîtin. Li şûna hesinê ko heta roja ko hate dizîn jî her kesê di deriyê kelehê re derbas dibû tû dikirê û digot »lahnet li çavên Şeytên bê,« niha bi tenê zincîrên wî mabûn.

Dihat gotin ko kesê ew hesin dizîbû, dixwast bi xêra wî hesinî bibe xwediyê hêzên şeytanî û herkesî têxe bin emrê xwe. Lê, ji dêleva ko Şeytan têkeve bin emrê wî, ew bûbû hêsîrê Şeytên. Rojekê dîn dibe û hesin li ser dilê xwe cit dike. Piştî ko hesin bi xwîna zilêm dihele, Şeytan jî xwe ji hundirê wî xelas dike û ji ber tirsa xwe ya ji zincîrên li ser deriyê keleha Diyarbekirê, nema vedigere bajêr. Lê dîsa dihat gotin ko gava Şeytên li derveyî bajêr li dû xwe niheriye, ji hêrsan agir bi çavên wî ketiye û hema li wê derê, li ber wê kelehê, li ser heyfa xwe sûnd xwariye û gotiye:

— Ez ê rojekê dîsa vegerim...

Li gora ko Robîn bihîstibû, zilamê ko Keleha Diyarbekirê ava kiribû, ew zilam bû ko bi birayê xwe re ava jiyanê vexwaribû û bi vî awayî gihaştibû mertebeya nemirtiyê. Kilsa kelehê jî bi spîka hêkan li hev xistibû. Herçar deriyên wê ji dêreke Dêrsimê anîbûn û lê xistibûn. Li gora efsaneyê, ev zilam hê sax bû, carê radibû û dipirsî; bê hela Keleha Diyarbekirê hilweşiyaye, an na. Ji ber ko hilweşîna vê kelehê, wek alameta roja qiyametê dihat qebûlkirin. Herçî mîmarê kelehê ye, piştî ko dipirse û bersiva xwe distîne, dîsa diçe û radikeve.

Li gora Robîn, di bin her kevirekî vî bajarî de, efsaneyeke jibîrbûyî hebû. Tev li wan hemû efsaneyan jî zarokatiya wî ko êdî bi zorê dihat bîra wî. Di her kuçeyekê de, ruyê hezkiriyeke wî hebû. Li kîjan aliyî biniheriya, berê xwe bida kîjan aliyî, wî ê di wira de, bîranîneke xwe bidîtaya.

Hemû kuçe û kolanên vî bajarî, mîna ko wî ew çêkiribin, yek bi yek nas dikir. Tu qula ko neketibûyê, nehiştibû. Ew û havalên xwe, Şêxo, Selman, Hemdîn û Elî, çi gava ko aciz dibûn hema diçûn ser bircan û carinan, ji ber ko pir digeriyan serê wan diket belayê jî.

Rojekê, bi dizî ketibûn xaneke mezin û dîrokî ko di destê belediyeyê de bû û deriyê wê her girtî bû. Bêhna wê ya ko bi sedan salan nehatibû guhertin û bêdengiya wê ya ko xof bera dilê mirov dida, ew kişandibûn hundirê xwe. Gava li xwe hay bûbûn, riya xwe wenda kiribûn. Wan jî êdî nizanîbû bê çawa riya xwe wenda kiribû. Xwe ji tirsa, hişk bi hevdu girtibû û di kuçeyên tarî re derbas bûbûn. Gava ko ji xwe re li rêyekê digeriyan ko derkevin derve, bi xêra pisîkekê, lê hay bûbûn ko di binê vê xanê de, derbendên veşartî hene. Piştî ko dîsa bi xêra wê pisîkê riya xwe dîtibû û derketibûn, ji zilamekî nodsalî hîn bûbûn ko ji bilî wan derbendan hê gelek derbendên din jî hene.

Zilêm ji wan re gotibû ko di binê vî bajarî de, duwanzdeh heb derbend hene; belkî hinên din jî hebin, lê hayê kesî ji wan nîne. Ew jî ji kalikê xwe hîn bûbû û niha jî ji wan re digot. Wî zilamê kal ko dê piştî wê bi salekê bimiraya, ji wan re gotibû ko heke mirov bizanibe bê serê derbendê li kî derê ye û heta kî derê diçe, mirov dikare bi xêra wan gelek tiştan bike. Lê çi fêyde, ko tu kesî bi vêya nizanîbû. Gelek kesên ko li pey vê pirsê, xwe bera nav derbendan dabû jî hew vegeriyabûn. Kes newêrîbû bi dû wan de biçûya û meytên wan jî bianîna. Lê însanan ev derbend her meraq kirin û di nav xwe de, li ser van derbendan gelek tişt jî gotin.

Ev hemû tişt niha mîna xeyalekê dihatin ber çavên wî. Piştî ewqas


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

salan, ewqas derdan, ewqas kerban, dîsa vegere! Li her tiştî.

Vegera welatê bav û kalan.

Warê dengbêjan…

## 2. Ev lawik kî ye...?

»û keder li pişta hespê mirov siwar dibe û tê...«, *Horatius*

Li balafirgehê ruyekî nas jî tune bû. Gava ko ket hundirê hêwana mezin, bi heyecana dîtina hin kesên nas, dilê wî dikir gupe gup. Çavên xwe bê serî digerandin. Lê dû re, hat bîra wî ko xeber nedabû tu kesî, sekinî. Xwe da aliyekî û bala xwe bîstikekê da kesên ko hevdu himbêz dikir.

Gelo çend kes ji van mirovên ko bi wî re hatibûn, bi qasî wî ji vî bajarî bi dûr mabûn? Çend kesan bi qasî wî bêriya vî bajarî kiribû?

Di nav ewqas însanên nenas de, li ruyekî nas geriya. Dijmin be jî! Bes ruyekî nas ko Robînê piçûk bîne bîra wî, Robînê xort.

Kesên ko dihatin bîra wî, heval, meriv, yar, giş hatin û yek bi yek ew himbêz kir û dîsa wenda bûn. Robîn li dora xwe niherî, wêne li ber çavên wî sarbûn û man. Xemgîn bû û serê xwe bera ber xwe da.

Wî digot qey herkes li wî dinere. Mîna ko qebeheteke mezin kiribe, berê xwe bi awayekî dilşikestî guhert û meşiya. Di pey wî re, kî têketaya hêwanê, hema hinek radibûn û bi kêf dihatin pêşiyê. Her ko yek diket hêwanê, pîrekên ko dişibiyan diya wî, keçikên ko dişibiyan Nûşînê, bi heyecan radibûn ser lingan û ber bi wî ve direviyan.

Yê wî, kesekî ko bihataya pêşiya wî û ew himbêz bikiraya, tune bû…

Li derve, li ber teqsiyekê sekinî. Serê xwe ranekir û li dora xwe neniherî. Ezmanê şîn nedît.

Zilamekî simbêlboq baz da û hat li ber wî sekinî. Bi tirkiyeke xerabe pirsî.

— Kerem bike, keko!

Robîn derî vekir û li dawiyê rûnişt. Şifêrê teqsiyê berî ko biajo, li dû xwe zivirî û bala xwe da wî. Weke ko li xortaniya xwe binere, çavên xwe bi melûlî li ruyê wî gerandin. Li rewşa wî hay bûbû, bes tu mahne nedidayê. Tiştek ji wî nepirsî. Berê xwe dîsa zivirand û mekîne şixuland.

Serê Robîn di ber de bû. Heta ko mekîne ji balafirgehê bi dûr ket jî serê xwe ranekir. Dû re, Robîn di ber xwe de tiştin gotin, lê şifêr jê fahm nekir. Şifêrê simbêlboq, di mirêka pêşiya xwe re li wî niherî. Robîn gotina xwe

hêdîka careke din jî dubare kir. Çavên şifêr ji nişka ve fireh bûn.

Carekê jî serê xwe ranekir. Mekîne di nav çend taxên din re jî derbas bû û ji ser riyekê dageriya nava bajêr. Her ko diçû dengê der û dorê zêdetir dihat. Piştî demekê, bêhna fêkiyan hatê. Bêhna mastê tirş. Dengê zarok marokan... Kesên ko tiştin bi hev re bazar dikirin. Deng giş tev li hev dibûn.

Şifêr carê di mirêkê re bi çavên bimeraq li wî diniherî.

Serê Robîn hê di ber wî de bû.

Piştî bîstikekê, êdî ew dengên ko tev li hev dibûn li dûranê mabûn. Wê gavê, Robîn carekê bi tenê serê xwe rakir û li dora xwe niherî. Mîna ko tiştin hatibin bîra wî, bi çavên bikerb li derve niherî. Ruyê wî tevizî, kelogirî bû û serê wî dîsa ket ber wî. Vê yekê bala şifêr jî kişandibû.

Mekîne hat û li ber goristaneke mezin sekinî. Şifêr dîsa di mirêka xwe re li wî niherî. Lê, ji wî re tu tişt negot. Dû re, li xwe zivirî û dîsa bi tirkiya xwe ya xerabe, hêdika pirsî:

— Ez li benda te bimînim keko?

Robîn bi pişta destê xwe, çavên xwe paqij kirin. Dû re, rahişt berçavka xwe ya ko danîbû kêleka xwe û bi tevgereke giran derî vekir. Daket. Berê, li ezmên niherî. Keserek kişand û meşiya.

Ewrên reş hêdî hêdî ezman dinixumand. Şînahiya ezmên a bîstika din, cihê xwe ji ewrên mahdtirş re hiştibû. Ewr giş li hevdu diciviyan û ji bo dinyayê ji xafil de bigirin, plan çêdikirin.

Hêdîka ber bi goristanê ve meşiya. Sê-çar zarokên ko ji cerga mekîne sekinibû xwe dabû bende, rabûn û da pey wî. Serê Robîn di ber de, di ber çend goran re derbas bû. Beyî ko hayê wî jê hebe, navên li ser wan yek bi yek dixwend û dimeşiya. Ji nişka ve, çav li navê li ser gorekê ket û sekinî. Mîna ko kêrek li pişta wî bikeve, dilê wî êşiya û çavên xwe girtin. Hêdîka vegeriya û hat ber. Navê ko bi boyaxa sor li ser kevirekî hatibû nivîsandin, dîsa xwend.

Hew mabû ko ji hêrsan bêhna wî biçikiya. Ziq li axa ser gorê diniherî. Mîna ko tiştekî di wê axê de bibîne... Lêvên wî ji ber xwe ve liviyan, ricifîn. Bi dû re çavên xwe hêdîka girtin û vekirin. Du niqut hêsir, hêdîka di ser hinarikên wî re herikîn. Bêvila xwe kişand, bi zorê rabû ser xwe û meşiya.

Şifêr jî ji mekînê daketibû, pişta xwe spartibû pêşiya wê û çixareya xwe dikişand. Bala wî li Robîn bû. Carê jî çavên xwe bera jêrê didan û bi tiliyên xwe yên dirêj, bi simbêlê xwe yê reş dilîst.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Gava Robîn gihişt ser gora Seydo, hêsirên wî xurttir bariyan. Zarokên ko bi hêviya şekir, an jî pereyan bi dorê ketibûn jî piştî ko çav li vê rewşa wî ketin, vegeriyan û çûn li ber deriyê goristanê, li hember şifêr rûniştin. Carê li wî û carê jî li Robînê ko li ber serê gorê rûniştibû diniherî.

Şifêr destê xwe xist bêrîka xwe û bangî wan kir. Zarok bi lez rabûn, hatin û pereyên ko şifêr di destê xwe de dirêjî wan kiribûn girtin û bi kêf ji wira bi dûr ketin.

Herçî şifêr bû, mîna ko ew wan kesên di wan goran de radizên nas dike, yek bi yek çavên xwe li ser wan digerandin û keser dikişand. Dû re, çixareya xwe avêt û bi lingê xwe eciqand û vemirand. Dîsa li Robîn niherî. Çû di mekîneya xwe de rûnişt, derî girt û kaseteke kurmancî danî ser.

Ewrên reş, weke ko mirov perdeyê bikişîne ber pencereyê, xwe li ezmên digirt. Digel ko hê roj neçûbû ava jî di ezmên de piça ronahiyê nemabû. Ji nişka ve, şirqîniyeke mezin hat bihîstin û çirûskek li ezmên pêket û dîsa wenda bû. Eyn mîna ko têleke elektrîkê ketibe xwarê, agir jê çû. Piştî çend deqîqeyan, êdî şirqînî û gurmîniya ko ji ezmên dihat bêhtir bûbû û ronahiya ko bi carekê şewqa xwe dida der û bi şûn de vedikişiya bêhtir dihat dîtin. Asoxî, ewran bi a xwe kir û ji nişka ve, bi xezebekê, berê berhema xwe da dinyayê.

Baranê berê bi çipik çipik dest pê kir û dû re, mîna ko dixwaze cama teqsiyê qul bike, xurt bariya. Şifêrê ko di xew re çûbû, hema çer ko li xwe hay bû û çavên xwe vekirin, bi lez derî vekir, daket û li aliyê Robîn niherî. Robîn hê jî mîna berê li goristanê bû û xwe bi ser gorê de avêtibû. Heta ko şifêr li wî hay bûbû û xwe di bin wê baranê de bi zorê gihandibû ba wî, canê wî tev şil bûbû.

Şifêr serê wî rakir û ruyê wî yê ko tev bûbû herî, bi destê xwe paqij kir. Berçavka wî derixist û xist bêrîka çakêtê xwe.

Tu deng ji Robîn nedihat. Ne li ser hişê xwe bû. Çavên wî werimîbûn. Di her destekî wî yê ko hişk jidandibû de, kulmek ax hebû.

Mêrik kir û nekir, Robîn nehat ser hişê xwe. Hema ew rakir û xist himbêza xwe. Hew mabû ko ber bi teqsiyê ve bireve, weke ko tiştek hatibe bîra wî, sekinî. Li lawikê himbêza xwe niherî.

Ruyê wî yê bi baranê hatibû şuştin, spîboz bû û dibiriqand. Porê wî tev şil bûbû. Berçavka wî ya bêçarçove anî bîra xwe. Li kincên wî yên nû û xweşik niherî.

Ev lawik kî bû? Qet nedişibiya Diyarbekiriyan.

Baran bi hêztir dibariya. Herdu jî şil û pil bûbûn. Erda goristanê giş bûbû herî. Bi lez vegeriya cem wê gora ko Robîn li ser digiriya. Hey pirsek di serê xwe de dubare dikir û bi heyecaneke mezin li bersiva wê difikirî.

Ev lawik kî bû?

Ji bilî vê pirsê, tu tiştekî din nedihat bîrê. Dilê wî bi lêwik şewitî.

Gava ko xwe daqûl kir û navê li ser mermera gorê xwend, bi carekê ve veciniqî. Dîsa xwend. Dîsa xwend. Dîsa vegeriya ser lêwik.

Çi têkîliya vî lawikê himbêza wî û vê gorê hebû? Ma ev lawik kî bû? Çi karê wî li ser vê gorê hebû?

Hemû pirsên bi vî rengî, dibûn gulok û di serê wî de diçûn û dihatin. Piştî ko kulîlkeke sor jî li ser axê dît, êdî bi temamî meraq kiribû. Ev esrarengîziya vî lawikî, bi meraqeke mezin re, şewatek xist dilê wî ko wî jî nizanîbû bê sebeba wê çi bû. Hema di nav wê heriyê de, bi lez xwe gihand cem teqsiya xwe û deriyê dawiyê vekir. Robîn li ser paldankê dirêj kir û derî dîsa girt.

Ev lawik kî bû?

Deriyê pêşiyê bi lez vekir û ket hundir. Heta ko bêhna wî hebekî hat ber, sekinî. Canê wî şil bûbû. Dilopên baranê, ji nav porê wî diherikîn ser ruyê wî û ji wira jî xwe bera nav canê wî didan. Bi lez çakêtê xwe ji xwe kir û destmalek ji ber paldanka xwe derixist, ruyê xwe û porê xwe zuha kirin. Rahişt rojnameya kêleka xwe û li ser paldanka din raxist. Qondera xwe ya bi herî ji lingê xwe kir û danî ser. Di ber re jî nivîseke mezin ya li ser rojnameyê xwend:

»Di şerê ko şeva çû li Colemergê çêbû de, çar mirî, deh birîndar hene. Şer hê jî dom dike.«

Şifêr diranên xwe hişk şidandin û serê xwe bi kerb hejand. Bi dû re kesereke kûr kişand ko axîneke jidil ji sînga wî ber bi jorê ve derket derve. Bi hêrs pê li debriyajê kir û destê xwe li fitêzê xist. Mekine bi rê ket. Ji nav heriyê derket ser riya asfalt.

Baran hê jî dibariya. Şifêr êdî bi dijwarî ber xwe didît. Paspasên cama teqsiyê, bi lez diçûn û dihatin. Mêrikê ko ji ber nûçeya rojnameyê hêrs bûbû û di ber re jî ev lawikê biyanî ko di mekîneya wî de bêhiş veketibû meraq dikir, carê di mirêkê re li Robînê ko li ser paldanka dawiyê dirêjkirî bû, diniherî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ev lawik kî ye?

Robîn beyî ko deng jê derkeve veketibû. Çongên wî heta nava wî kişiyabûn. Mijangên wî hê şil bûn. Tev nediliviya.

Piştî bîstikekê, mêrik leza mekîneya xwe kêm kir û xwe hêdîka da kêleka riyê. Dîsa di mirêkê re li wî niherî. Serê xwe bera ber xwe da û ponijî.

Nizanîbû bê dê çawa bikiraya. Gelo lawik bibiraya kû? Berê, fikirî ko li benda lêwik bimîne ko were ser hişê xwe; lê bi dû re, dev ji vê fikira xwe berda.

Piştî demeke dirêj, dîsa keserek kişand û serê xwe rakir. Li dû xwe zivirî û li ruyê lêwik niherî. Robîn hê jî beyî hişê xwe û beyî ko tev bilive, di xew de bû.

Ev lawik kî ye? Ji kû tê û diçe kû? Çi karê wî li vira heye? Çi têkîliya wî bi Seydo re heye?

Herçî şifêr bû, Seydo baş nas dikir. Seydo heyşt sal berê hatibû kuştin û şehîdekî bi nav û deng bû. Li Diyarbekirê herkesî navê wî dizanîbû. Gava ko hatibû kuştin, ji bo wî, hefteyekê dikan giş hatibûn girtin. Meşeke mezin çêbûbû. Yên ko ew nas nedikir jî wêneyê wî mezin kiribû û li malên xwe daliqandibû. Li ser wî gelek stran û çîrok hatibûn gotin. Xelkê navê wî li zarokên xwe kiribû.

Lê belê, ev lawik kî ye? Qet dirûbê wî jî nade. Çi têkîliya wî bi Seydo re heye?

Dîsa bi hêrs diranên xwe şidandin û pê li xazê kir. Beyî ko bizanibe bê bi kû de dihere, berê mekîneya xwe da nav bajêr. Piştî ko du caran li eynî cihî vegeriya, xwe di neqebekê re bera nav kuçeyan da.

Mekîne li ber apartmaneke bilind rawestand. Herdu destên xwe dane ser direksiyonê û beyî ko ew jî bizanibe bê li kû dinere, ziq li dûranê niherî. Bîstikekê weha ma. Xwe bi xwe, di nav şerekî mezin de bû.

Piştî çend deqîqeyên din, bi tevgerin giran ji mekîneya xwe daket û hat ber deriyê dawiyê.

Baran kêm bûbû. Mirov digot qey hema hema nedibariya. Lê, ewrên reş hê jî belav nebûbûn. Feq li ber şevê vedida. Ji xwe ro hatibû ‘esir.

Şifêrê dirêj û girs, bi destê xwe yê ko ji hêrsan pûç bûbû derî vekir. Dîsa bala xwe da lêwik û sekinî. Ma gelo ew bibiraya li otêlekê bi cih bikiraya, dê ne baştir bûya?

Na, ne dibû. Him nizanîbû bê ev lawik kî ye, him jî ditirsiya ko heke wî ji xwe biqetîne, tiştekî xerab were serê wî. Wî jî nizanîbû bê ew ji bo çi weha difikirî. Hema dijminê mirov be jî divê mirov li yekî di vê rewşê de

be, bi xwedî derkeve.

Dilê wî bi lêwik dişewitî. Ji ber ko ew li ser mezelê Seydo dîtibû jî nêzîkahiyek li hember lêwik his dikir. Hezkirineke weha bû ko wî jî bi wê nizanîbû û nikarîbû bigotaya bê ka ji bo çi bû. Li xwe heyirîbû û mabû. Nikarîbû biryarek bidaya.

Destê xwe bir ber devê xwe û hebekî din jî fikirî. Ew fikrên bîstika din dîsa hatin bîra wî. Bi dû re, di ber xwe de kir ufe uf û sekinî.

Rahişt lêwik û ji mekîneyê daxist. Bi lingê xwe li derî xist û girt. Beyî ko li lawikê himbêza xwe binere û dîsa li ser rastbûn an çewtbûna vê biryara xwe bifikire, ew bir mala xwe.

Robîn heta êvarî nehat ser hişê xwe. Tew demekê şifêr tirsiya ko ev lawikê biyanî di nav lepên wî de bimire. Heta ko ew nehat ser hişê xwe, ew bi tenê nehişt. Qapûtê wî û qazaxê wî yê şilbûyî ji wî kiribûn û eşofmanekî xwe lê kiribû.

Gava ko Robîn hat ser hişê xwe û li dora xwe niherî; ewilî ji tariya hundir pê ve, tu tişt nedît. Dû re, li du zilamên ko xwe dabûn quncikeke odeka teng û bi dengekî nizm dipeyivîn hay bû. Heta ko têbigihêje bê ka li kû ye, dîsa xwe li xewê danî. Çi qasî hewil da xwe jî tiştek nehat bîrê.

Ji balafirê daketibû, li teqsiyekê siwar bûbû û çûbû ser mezel. Çend zarokên ko li dora wî civiyabûn jî dihatin bîrê. Mezelê Hemdîn jî hat ber çavên wî. Dû re, çûbû ser mezelê Seydo. Gemara ser axa wî bi kefa destê xwe dabû alî û kulîlka ko ji bêrîka qapûtê xwe derxistibû, danîbû ser axê. Belê belê! Heta vê derê, giş dihatin bîra wî... Le bi dû re? Bi dû re, çi bûbû ji wî?

Kir û nekir nehat bîra wî. Serê wî gêj bû. Dengê herdu zilamên ko ruyê wan di tariyê de dima, kir ko ji nû ve vegere ser wan. Wî ew nas nedikirin. Na! Qet! Lê belê, çawa hatibû vira?

Tirsiya. Le ko ev zilam kesin xerab bin! Bêtir tirsiya. Herdu zilam hê lê hay nebûbûn ko Robîn hatibû ser hişê xwe û her dipeyivîn. Deng bi dijwarî dihatê, bes Robîn tê derxistibû ko ev zilamên nenas bi kurdî dipeyivin. Wê gavê, dilê wî hebekî rehet bû û bêhna wî hat ber.

— Dibeje; herkesî digirin, weleh. Divê van rojan, em li xwe miqate bin.

Yê din bi gazind got:

— De her car weha dibe, lo! Çi gava ko navê kurdan were rojevê, weha dikin.

— Lê vê carê, ne weke hercar e, ha! Pir tirsiyane, weleh. Hew dizanin


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bê ew ê çawa bikin. Çavê dinyayê gişî li ser wan e. Dewletên Ewrûpayê li wan li hemanan e, weleh.

— Kuro, ma herçî Dewletên Ewrûpayê ne, heke ne ew bûna, niha ji zûde ev mesele çareser bûbû. Ew jî tu dibêjî qey hê nû bi me hisiyane.

— Weleh, do televziyonê digot, li Ewrûpayê gelek tişt çêbûne.

Robîn guhê xwe dabû ser peyvên wan. Ji peyvên wan têgihişt ko ev ne ew kesin weha ne ko bikaribin xerabiyê bi wî bikin.

Lê, ev kî ne? Çawa hatibû nav wan?

Herdu zilamên ko bîstika din behsa kurdan dikir, ji nişka ve mijara xwe guhert û dest bi behsa maça Fenerbahçe û Galatasarayê kir. Zimanê xwe jî guhert û vê carê, bi tirkiyeke xerabe dipeyivîn. Wê gavê Robîn lê hay bû ko ew bi wî hisiyane.

Tirkiya zilaman tiştekî din jî anîbû bîra wî. Şifêrê teqsiya ko ew ji balafirgehê biribû ser mezel. Gelo ew bi kû de çûbû? Bi kû de wenda bûbû?

Ev zilam kî bûn? Çi karê wî li nav wan hebû? Çawa hatibû vira?

Tu îhtimaleke din tune bû. Hebe nebe, wî şifêrî ew anîbû vê derê. Lê çawa? Ma çi bi wî hatibû ko weha ji ser hişê xwe çûbû?

Piştî ko gihaşt vê encamê, dilê wî rehettir bû. Lê, dîsa jî tev neliviya. Heta ko zilaman dev ji wê mijara maça do berda û çixareyên xwe pêxistin, weke ko li benda tiştekî bin sekinîn jî bêdeng ma...

Dilê Robîn dikir gupe gup. Digot qey ew ê aniha bi dengê dilê wî bihisin. Wî jî nizanîbû çima, lê nedixwast, xwe eşkere bike. Heke wî şifêrî ew anîbe, divê heta ko ew were ji nav cihê xwe dernekeve. Ji ber ko ji wî pê ve li kesekî din rast nehatibû. Ne mimkûn bû ko ew tiştê lê difikirî, çewt bûya. Miheqeq, wî şifêrî ew anîbû vê derê. Lê di dilê xwe de bawerî bi vêya nedianî.

Heta ko dengê deriyekî ji aliyê din ve ji nişka ve hat û Robîn veciniqî jî zilaman bawer nekiribû ko ew şiyar bûye. Bi dû re, pêjina yekî hat. Çavên xwe girtin û xwe bi heyecan da bende.

Derî vebû û zilamekî silav da û ket hundir. Robîn tavilê dengê wî nas kir. Digel ko gava di mekîneya wî de bû, zêde bi wî re nepeyivîbû jî dengê wî di hişê Robîn de mabû.

Şifêr piştî ko kilîta destê xwe xist bêrîka xwe û çakêtê xwe ji xwe kir, serê xwe ber bi aliyê doşeka Robîn ve kil kir û bi kurdiyeke bi qasî ko bala Robîn bikişîne delal, bi dengekî nizm, pirsî:

— Çawa bû? Mêvanê me bi ser hişê xwe ve nehat?

Ji herdu zilaman yekî bersiva wî da:

— Nizanim, wele. Lê, heke tu bixwazî, hela bangî wî bike. Belkî heta niha hatibe ser hişê xwe.

Şifêr, xwe hêdîka bi ser wî de daqul kir û destê xwe da ser milê wî:

— Arkadaş, uyan?k m?s?n? (Heval, ma tu şiyar î?)

Cara ewilî tu deng ji Robîn derneket. Lê hew mabû ko zilam careke din jî bangî wî bike, Robîn hêdîka çavên xwe yên westiyayî vekirin û li wî zivirî. Ji bo ko yên dora xwe pê nehisîne ko ji zû de şiyar bûye, hewleke ecêb dabû xwe. Çavên xwe mîna ko bixwaze bizanibe bê li kû ye, bi meraq li dora xwe gerandin. Li herdu zilamên din niherî, li dîwarên ko çend kartpostalên çarçovekirî ko li kêleka wan helbestin hatibûn nivîsandin, niherî. Bi dû re, bala xwe da zilamê ber serê xwe.

Şifêr bi awirin nerm û samimî li wî diniherî û dibişirî. Robîn di serî de gava ko çav li qilafetê wî yê girs ketibû, ji wî tirsiyabû; lê aniha, gava ko çav li van awirên ko dilê mirov germ dikirin û bişirandina samîmî ket, ji ber xwe fedî kir.

— Çok merak ettik, walla. Korktuk. Alt? saatt?r bayg?ns?n. (Me pir meraq kir, wele. Em tirsiyan. Ev şeş saetên te ne ko tu di xew de yî.)

— Ne oldu bana? ( Çi bi min hat?)

Zilêm bi ken bersiva dayê.

— Boş ver. Önemlî degil. Sonra konuşuruz. Şimdi kalk hele, git elini yüzünü y?ka sen. ( Dev jê berde. Ne muhîm e. Em ê bi dû re bipeyivin. Tu niha rabe hela, here dest û ruyê xwe bişo.)

Robîn lihêfa xwe hêdîka rakir û rabû ser xwe. Serê wî gêj bû û ber çavên wî jî reş bû, xwe bi dîwêr girt. Zilêm da pêşiya wî û ew bir ber kaniyê. Heta ko wî karê xwe xelas kir jî peşkîreke spî di dest de, li bende sekinî.

Gava ko dîsa vegeriyan hundir, Robîn berçavka xwe ji destê şifêr girt, peşkîr di dest de hat, bala xwe da çarçoveyeke dîwêr û sekinî. Canê wî pûç bû û bê tevger ma. Çavên wî dîsa li hemanan bûn. Gava ji nav nivînan derketibû, lê hay nebûbû. Wêneyekî Seydo yî mezin li ser serê wî hatibû daliqandin. Piştî ko çavên xwe hebekî li ser wêneyî gerandin, hêdîka serê xwe bera ber xwe da û meşiya hat li ser balgîfekê rûnişt.

Tevî şifêrê ko ew anîbû wira, herdu zilamên din jî ziq li wî diniherî. Gava ko li ber wêneyê Seydo sekinîbû, herdu zilamên din bi awayekî ko tiştinan jê bipirsin, li şifêr niherîbû û sekinîbûn.

Robîn serê xwe rakir, bi çavên xwe yên sorbûyî li şifêr niherî û bi dengê xwe yê westiyayî, hêdîka got:

— Elbiselerîmî verebilir misin? (Tu dikarî kincên min bidî min?)



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Mêrik piştî ko hebekî fikirî, dengê xwe li gora yê Robîn eyar kir û got:

— Heke tu bixwazî, tu dikarî îşev li vira bimînî.

Berê xwe da aliyê pencereyê û bi dû re dîsa li wî vegeriya.

— Ji xwe, dinya tarî bûye. Û tu jî hê baş nebûyî.

— Na, na. Ez baş im, spas.

Mêrik cihê xwe xweş kir û dîsa bi wê tirkiya xwe ya xerabe, got:

— Binere heval, ez jî nizanim çima, lê min alî te kir. Tu di bin wê baranê de, li ser mezel ji ser hişê xwe ve çûbûyî. Belkî tu ê bibêjî meraq, belkî jî dilsafî, lê min xwast ko ez te nas bikim.

Robîn li erdê diniherî. Mêrik piştî bêdengiyeke kurt, pirsa ko ji sibehê de li serê wî bûbû bela, hebekî jî bi tirs pirsî û dilê xwe rehet kir:

— Ew kesê ko tu li ser mezelê wî bûyî...

Sekinî. Gava dît ko serê Robîn ket ber, poşman bû ko meseleya mezêl vekir. Xweziya xwe daqurtand û bi dû re ji bo ko peyva xwe biqedîne û wê meraqê ji dilê xwe bi temamî derxîne, digel ko wî jî tê de derdixist ko nikare tu bersivê werbigire, dîsa domand:

— Tu wî nas dikî?

Robîn tu bersiv nedayê. Mêrik jî pirsa xwe hew dubare kir. Ji xwe, piştî wê bêdengiya ko li dû pirsa wî li hundir belav bûbû, ew jî têgihiştibû ko nebaş kiribû. Fedî kir. Li ber xwe ket. Herdu zilamên hevalên wî jî ev rewş fahm kir û mîna ko ew bûbûn sedema vê rewşê, ketin ber fediyê. Ji lewre, heta ko Robîn ew di meraqeke mezintir de hiştin û ji mala wan derket jî mîna ko qebeheteke mezin hatibe kirin, hew li ruyê hev niherî û tu deng jî ji kesî derneket.

## 3. Dilo rebeno, lo dilo...

Bûbû êvar. Barana ko bi roj dest pê kiribû û hê jî dibariya. Lê serma jî hebekî şikestibû. Bi tenê bayekî hênik ko mirov jê aciz nedibû, dihat. Ezman ne xuya bû.

Erd hê jî şil bû. Li derve, ji çend mekineyên ko ber bi bajêr ve diçûn pê ve, li tiştekî din rast nehat. Kolanên ko tê re dibihurî, di bin ronahiya lempeyên dîrekan a qels de, ew dibir demên berê.

Zaroktiya wî di wêneyekî vî bajarî yî kevin de mabû. Wê gavê, hejmara avahiyên bilind ne ewqasî zêde bû. Sînorên dora bajêr, ne ewqasî fireh bûn. Gelek kolanên ko niha çav lê diket jî ne asfaltkirî bûn. Belkî ew bajarê ko dihat bîra wî jî êdî di wêneyên zarokatiya wî de mabû. Herdu bi

hev re, di nav gelek wêneyên din de, di torbeyekî naylon de, li refika pirtûkxaneya wî mabûn. Belkî, tiştê ko ji wan û bîraninên wan deman mabû jî hew ev bû.

Li van kolanan hindik negeriyabû. Gava ko hê nû li xwe û li dinyayê hay dibû, wê gavê bi wê lêhaybûna xwe re nû bi nû fêrî bitenêtiyê jî dibû. Gelek caran, bi tena serê xwe li van kolanan û gelek yên mîna wan, beyî ko ew jî bizanibe bê ji ber çi sedemê bû bê serî geriyabû. Çend caran, ev adeta wî li serê wî bûbû bela jî. Ji ber ko heta derengê şevê li derve digeriya, hindik caran neketibû qereqolan û ji polîsan hindik lêxistin nexwaribû.

Ev kolanên ha û gelek kolanên din yên vî bajarî, bûbûn destbirakên wî yên kul û derdên dilê wî. Di dema xwe de, wan ew bi hemû xusûsiyetên wî nas dikir. Her gava ko serê wî diêşiya, tavilê xwe diavêt himbêza wan û ji bo ko dilê xwe aş bike, kul û derdên xwe hebekî ji bîr bike, heta ko ji ser hişê xwe ve diçû û serê wî bêtir diêşiya, dimeşiya. Belkî bi wî awayî, dilê wî rehet dibû; belkî jî ew kul û derdên dilê wî bêtir tev radibûn û bêtir diket nava bitenêtiyê.

Wî ev kolan baş nas dikirin. Ji lewre, niha gava ko dîsa eynî mîna wan rojan, bi êşa serê xwe ji ser hişê xwe ve çûbû û dimeşiya, digot qey kolan jî wî nas dikin, mîna ko mirov hevalekî xwe yê kevin bibîne, bi çavin xemgîn bala xwe dabû dora xwe. Lê belê, bi çavin fedîkar jî.

Gava ko li xwe û li ewqas salên çûyî fikirî, wî jî bi xwe didît ko hê Robînê berê ye, qet nehatiye guhertin. Belkî jî hingî di nav janên ko di her roja çûyî de zêdetir dibûn de vegevizîbû, êdî ew roj nedihatin bîra wî. Digot qey hema bi vî halî ji diya xwe bûye û ji cerga ko bi xwe dizane jî, di vê rewşê de ye. Robînê piçûk yê ko di van kolanan de bi kêf baz dida, dilîst û stran digot, êdî hew dihat bîra wî.

Gava ko li vê yekê fikirî, lê hay bû ko ji zû de stran negotiye. Cara dawîn, li ber tembûra Bedirxên çend stran gotibûn. Bedirxan û Mîtanî hatin bîra wî. Malbata wî... Gulcan...

Niha çi dikirin gelo?

Giş yek bi yek hatin ber çavên wî û bihurîn. Ji ber ko li gora wî, ew li serê gişan bûbû bela û ji bo ko bêyî wan hatibû vira jî neheqiyeke mezin li wan kiribû, dilê wî bi wan şewitî û li ber wan diket. Belkî jî niha ji ber wî, jiyana wan tev de li bin guhê hev ketibe. Belkî niha giş li her derê li wî digerin. Belkî jî ji bo vê wendabûna wî ya ji nişka ve, tev de perîşan bûne û mane.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Serê xwe kil kir, kelogirî bû. Bû fiş fişa wî û hêdî hêdî di ber xwe dest bi stranekê kir.

... dilo rebeno lo dilo, dilo feqîro lo dilo
dilo şewitiyo lo dilo
dilo peritiyo lo dilo...

Gava ko gotinên vê strana kevin, ko ew jî nizane bê ji kû hat bîrê, ji devê wî derdiketin, hêsirên ko bi wî bayê hênik dicemidîn jî li gora melodiya stranê, xwe ji ser hinarikên wî hêdî hêdî bera jêrê dida û şopa xwe di ruyê wî de dihişt.

Diviyabû çi bikira? Wî jî bi xwe nizanîbû. Gava ko ji bo hatina Diyarbekirê biryar dabû, ji xwe re tu program çênekiribû. Negotibû, ez ê herim vira û wira. Ji lewre, aniha dîsa aciz bûbû. Nizanîbû bê ew ê bi kû de biçûya. Heke bixwastaya, dikarîbû niha sed malên ko dê bi kêfxweşiyeke mezin wî biezibînin û li cem xwe vehewînin, peyda bikirana.

Di bin wê barana ko çipik çipik dibariya de, beyî ko bi zanebûn berê xwe dabe aliyekî, bê serî meşiya. Lingên wî, ew ber bi kolanên teng û dirêj ve bir. Qet hayê wî ji dora wî çênebû jî. Gava ko ji nava wan kolanên tarî derket, di bin tava heyvê de, li biniya bircên xerabe, li xwe hay bû.

Ew bircên ko xerca wan bi spîka hêkan hatibû çêkirin, bi hemû bedewiya xwe li ber çavên wî sekinîbûn. Bala xwe da xetên kevin ên li ser wan, destê xwe di wan de da. Efsaneyên ko di zarokatiya xwe de li ser Keleha Diyarbekirê bihîstibûn hatin bîra wî. Piçekî xemgîn bû pê re. Mîna ko di wan keviran de, li tiştin wendayî bigere, destê xwe li ser wan digerand. Serê xwe rakir, di bin mijangên xwe yên dirêj î mîna yên keçikan re, bi çavên birqokî li bilindbûna wan niherî. Di ser bircên bilind re, heyv xuya dibû.

Di pêlikên ko bi keviran hatibûn çêkirin re, derket ser bircan. Gava ji bo ko nekeve, xwe bi keviran girt, destê wî bûbû herî. Destên xwe bi pantorê xwe paqij kir û meşiya.

Baran kêm bûbû. Ew bayê hênik hê jî dihat. Ji doraliyê, bêhneke xweş ko bêhna mirov fireh dikir difûriya. Li hebekî dûranê, li jêrê, şewqa lempeyên bajêr xuya dibû. Piştî ko bala wî ji ser hin cihên bircan yên ko ji hev ketibûn çû ser dora wî, hat cihekî fireh û sekinî. Herdu destên xwe dan noqa xwe û bala xwe da wê dîmena bajêr a bêhempa.

Mîna ko bixwaze wî bajarî himbêz bike, lê diniherî. Çavên wî yên ko di bin tava heyvê de dibiriqîn, piştî ko demeke dirêj li bajêr niherîn, hêdîka dageriyan jêrê.

Westiyabû. Beyî ko bifikire ko ew ê kincên wî edem bibin, çû li ser kevirekî rûniştt. Destên xwe li nava xwe li hev gerandin û dîsa bala xwe da bajêr.

Ji dûranê, dengê stranekê dihat wî. Xuya bû ko ew dengê zîz bi kerb bû. Bi wî bayê hênik re dihat û li nav bircên xerabe belav dibû. Guhên xwe bel kirin û li wî dengî guhdarî kir. Wî melodiya vê stranê nas dikir, lê tu tiştt ji gotinên wê fahm nedikir.

Hêdîka rabû û berê xwe da wî aliyê deng û meşiya. Wê gavê dît ko germahiyek jî ji wî aliyî tê. Çû û li ber dîwarekî kavil sekinî. Vê carê, gotinên stranê jî baş dihatinê.

... ey dîlberê, ay dîlberê
ey nazikê, wey esmerê...

Tev neliviya. Heta ko wî dengê zîz strana xwe qedand, lê guhdarî kir. Dû re, bû fiş fişa yekî, bêvila xwe dikişand. Dengê kuxikeke xurt jî hatê. Piştî wê, bêdengiya bîstika din, dîsa xwe li doraliyê belav kir.

Robîn fikirî. Xwast ko here cem wî dengbêjî, lê hebekî tirsiya jî. Di nav wê bêdengiyê de, piçekî din jî sekinî. Dû re, rabû ser xwe û ji paş dîwarê kavil derket.

Li cihekî fireh, mîna cihê ko bîstika din ew lê bû, du zilaman agirek dadabû û xwe dabû dorê. Şewqa êgir dida ruyê wan û dora wan jî rohnî dikir. Rîha yekî ji wan dirêj bûbû û qapûtekî kevin li piştê bû. Xwe li ber êgir xûz kiribû, ji şûşeya destê xwe tiştek vedixwar û li kesê hember xwe diniherî. Umrê wî, li dora çilî bû. Bes dibe ko ji ber rîha xwe weha kal xuya dikir. Yê din, hebekî ji wî ciwantir bû. Rîha wî jî hatibû, lê ne bi qasî rîha yê din dirêj bûbû. Çaketek û şalekî qetiyayî lê bû û serê xwe bera ber xwe dabû û kil dikir. Li ber wî jî şûşeyek hebû. Xuya bû, yê ko stran digot ev bû.

Herdu jî li Robîn hay nebûbûn. Lê, Robîn ji bo ko wan netirsîne û hayê wan ji xwe çêbike, kir ko dengê lingên wî biçe wan. Berê, zilamê rîhdirêj li aliyê deng zivirî, bi dû re jî yê din serê xwe rakir û li wî niherî. Robîn bi awayekî fediyokî be jî silav li wan kir û hat ba wan. Ji bo ko tiştekî din neyê bîra zilaman, li ber êgir sekinî û bala xwe dayê.

Çavên herdu zilaman li wî bûn. Zilamê rîhdirêj silava wî lê vegerand û


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

bi tirkî, bi dengê xwe yê westiyayî û devê xwe yê ji şerabê sistbûyî, got:

— Kerem bike.

Robîn dizanîbû ko divê tiştekî ji wan re bibêje. Piştî ko zilamê din kevirek nîşanî wî da û rûnişt, destê xwe li ber êgir germ kir. Li zilamê rîhdirêj zivirî, bi destê xwe dîwarê kavil nîşan da û bi kurdiya xwe ya kubar, got:

— Ezbenî, ez jî li paş vî dîwarî rûniştibûm. Dengê we hat min, min got ez rabim herim cem van camêran.

Yê rîhdirêj ji ber ko Robîn bi kurdî peyivîbû, şaş bûbû; lê nehişt ko ew bi vêya bihise. Yê din ji xwe li tiştekî hay nebûbû.

— Ser çavan.

— Ser û çav neêşin.

Zilamê rîhdirêj bala xwe da Robîn. Wî ev lawik tu carî nedîtibû. Li porê wî yê tevlihevbûyî niherî, li kincên wî yên gemarî niherî, bi dû re bala xwe da ruyê wî yê xweşik û rîha wî ya ko xuya bû, ev çend roj in ko nehatibû kurkirin. Eynî dişibiya kesên esrarengîz yên filîman. Ji ruyê wî mirov tê derdixist ko mirovekî xwende bû, zane bû; lê heke weha bûya, çima di nav van kincên gemarî de bû. Mirov digot qey riya xwe şaş kiribû û di van deran re derketibû. Belkî ne li ser hişê xwe bû jî.

Na! Na , wî ev lawik nas nedikir. Ne ji van deveran bû. Lê, kurdiyeke wî ya kubar û delal hebû. Ev yeka ha, bûbû sedema ko baweriya xwe bi samîmiyeta wî bîne. Di nav kesên ko wî ew nas dikirin de, hejmara kesên weha xweş û paqij bi kurdî dipeyivîn, ne zêde bû. Hebekî din fikirî. Dû re, çavên xwe qels kirin û mîna ko tiştinan di mejiyê xwe de bi hev ve girê bide, bi wî awayî bala xwe da Robîn û sekinî. Paş situyê xwe xurand, dîsa di bin çavan re li wî niherî û fikirî. Serê xwe mîna ko dilê wî bi Robîn şewitîbe hejand û bera ber xwe da.

Berî niha bi çend rojan, yekî din jî mîna vî lawikî hatibû vê derê, ew jî nedişibiya Diyarbekiriyan. Ecêb e, herdu jî mîna hevdu ji nişka ve derketibûn ortê. Kurdiya herduyan jî weke hev xur û paqij bû. Yê din jî mîna viya, riha wî hatibû û kincên wî gemarî bûbûn. Ji peyva wî xuya dibû ko ew jî mîna viya, yekî xwende bû. Zilêm dîsa li wî niherî û bi vê niherînê re ruyê lawikê din jî anî bîra xwe. Robîn xwe li ber êgir germ dikir.

— Kerem bike, tu jî qurtekê vexwe.

Zilêm şûşeya destê xwe dirêjî wî kiribû. Robîn li ruyê wî niherî. Bi wê samîmiyeta wî ya ko xwe bi bişirandineke fediyokî dida der re, hemû belengaziya wî ya ji çavên wî yên westiyayî û kortçûyî dihat xwendin jî

derdiket meydanê. Robîn jî pê re bişirî, bi tiliyên xwe yên ziravik berçavka xwe rast kir, şûşe ji destê wî girt û bir ber devê xwe.

Zilêm bi awayekî ko mirov ji ber neêşe, mîna ko ji bo wî tiştekî girîng be, bi dengê xwe yê ko ji serma mîna pelên çilo dilerizî, pirsî:

— Tu ji kû yî, keko?

Robîn mîna ko li benda vê pirsê bû, berê hebekî fikirî, bi dû re li wî zivirî. Dîsa li ruyê wî niherî. Şûşeya ko mêrik bîstika din dabûyê, dîsa bir ber devê xwe û qurteke din jî jê vexwar. Şûşe danî erdê, bîstikekê bala xwe da wê û bêdeng sekinî.

Di ber xwe de got:

— Ez ji vira me.

Zilamê rîhdirêj, dîsa bi eynî awayî got:

— Min qet tu li vira nedîtiyî, ji ber wê...

Robîn peyva wî bi kubarî birî.

— Ez dizanim.

Zilamê rîhdirêj digel ko peyva wî nîvco mabû jî piştî vê peyvê sekinî. Hebekî fedî jî kir. Ji ber îmaja Robîn ko di serê xwe de çêkiribû, li ber xwe ket. Serê wî ket ber wî. Sorbûna ruyê wî bi tîna agirê ko xwe didayê dihat veşartin. Dû re, serê xwe rakir, ji ber ko dizanîbû ko Robîn dê xwe negire û dawiya peyva xwe bîne, xwe da benda wî.

Robîn çavên xwe hebekî li dora xwe gerandin, li ronahiya lempeyên bajêr ko ji jêra bircan xuya dibûn niherî, keserek kişand û lê zêde kir:

— Ez ji zû de nehatime van deran...

Piçekî rawestiya û bi dû re dîsa dewam kir:

— Ez niha li dora xwe diniherim... ev bajar çi qasî hatiye guhertin!

Piştî vê peyvê sekinî, behna xwe berda. Zilamê rîhdirêj bala xwe dabû wî û tevgerên wî. Yê hember wan ko serê xwe bera ber xwe dabû û mîna ko dinaliya, di ber xwe de distira jî beyî ko hayê wî ji wan hebe, carê şûşeya xwe dibir ber devê xwe û vedixwar.

Robîn bi destê xwe li jêra bircan deverin nîşan dan û got:

— Ez li Xençepekê mezin bûm. Wê demê jî her gava ko bêhna min teng dibû, ez dihatim vê derê û heta sibehê dimam. Heta ko xewê zora çavên min bibira û ez biwestiyama, min stêrikên ezmên yek bi yek dijmartin û navên hevalên xwe li wan dikirin.

Sekinî. Wê gavê, zilamê hemberî wan, yê ko bîstika din distira, şûşeya destê xwe rakir û bi kêf got:

— Noş, keko. Tu bi xêr hatiyî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Herdu jî li wî zivirin û bişirîn. Robîn jî şûşeya xwe li ber ya wî rakir û serê xwe bi ken li ber tewand. Zilamê ko bîstika din stran digot, piştî ko ji şûşeya destê xwe qurtek vexwar û daqurtand, bi wî dengê xwe yê bikerb dîsa dest bi stranekê kir. Çavên wî yên ko ji ber şerabê sor bûbûn, li ber şewqa êgir dibiriqandin.

Dengê wî di nav wê bêdengiya êvarê ya giran de li doraliyê belav bû û geriya. Bi dengê wî, yên din ji ser hişê xwe ve diçûn. Ji ber şeraba ko ji êvar de vedixwe, bi vê stranê êdî wî jî nema dizanîbû bê çi dike, çi dibêje; gêj bûbû û çûbû. Dengê wî mîna melodiyeke kevin ko keman jî li ber lê dikeve derdiket. Dengê bayê ko leza xwe xurt dikir û agirê ber wan dihejand jî jê re dibû muzîka fonê.

bextê te me ay ay gundî û cîran bêjin
ev ê hanê çi ne
bêje hekîm loqman e hatî li ser e li min
ez xirabmal im yeman
ez bendewar im yeman
serê çendî çend salan e ez li hêviya te me
min terka miletê xwe da
ez li dû te mame ay ay...

Piştî ko stran qediya û zilêm hêdîka dengê xwe birî, çendekî bêdengiyeke ko wan ji berê serxweştir bike, hat û xwe li dora wan pêça. Wê gavê, tariya ko li dora wan girtibû, hebûna xwe bêtir nîşanî wan da. Bayê ko bi zorê ji diwêr difilitî, xwe li êgir dixist lê nikarîbû vemirandaya. Gava lê hay bûn ko dinya her ko diçe sartir dibe, bêtir ber bi êgir ve hatin û xwe xûz kir. Wê gavê, dengê zilamê rîhdirêj, bêdengiya doraliyê belav kir.

— Wê rojê, yekî din jî mîna te hatibû vê derê.

Çavên Robîn ji nişka ve fireh bûn. Dilê wî kir gupe gup. Beyî ko tiştekî din bike, ziq li zilêm niherî û xwe da benda peyva wî. Vê heyecana ko ji nişka ve di dilê Robîn de çêbûbû û xwe dabû der, bala herdu zilamên din jî kişand.

Mêrik dîsa bi awayê şermokî domand:

— Ew jî ji Stenbolê hatibû.

Piştî ko hebekî sekinî û berê xwe bi êgir ve kir û dewam kir.

— Ji ber ko kurdiya te jî mîna ya wî paqij bû, bala min kişand. Ew jî nedişibiya ên van deveran û bi kurdiyeke kubar dipeyivî. Ruyekî wî yî

ecêb hebû.

Dû re, lê zêde kir:

— Ev hûn çawa dikarin weha xweş bi kurdî bipeyivin, lo?

Robîn hê jî li benda peyva wî ya berê bû. Mîna ko pirsa wî ya vê dawiyê nebihîstibe, bi heyecan pirsî. Zilamê rîhdirêj ji vê rewşa wî tirsiya.

— Bi dû re çi bi wî lawikî hat? Bi kû de çû?

Zilamê rîhdirêj xwast ko têbigihêje bê ji bo çi viya li wî lawikî dipirse. Dû re, mîna ko aciz bûbe, herdu destên xwe ber bi jorê ve rakirin û got:

— Weleh, ez nizanim. Piştî ko hebekî bi me re vexwar, rabû û çû. Dû re, me ew hew dit. Ma tu çima lê dipirsî? Qey tu wî lawikî nas dikî?

Serê Robîn hêdîka ket ber. Piştî ko hebekî fikirî û serê wî ji berê bêtir êşiya, destên xwe xistin nava porê xwe û bir û anîn. Serê xwe rakir û li êgir niherî. Mîna ko canê wî êşiyabe an jî mahdê wî ji tiştekî xeliyabe, ruyê xwe tirş kir. Herdu zilaman ziq bala xwe dabû wî.

Robîn tu bersiv neda xwediyê pirsê. Mîna ko li şifêrê teqsiyê û hevalên wî kiribû, ev zilam jî di nav meraqeke mezintir de hiştin û rabû ser xwe. Wan bi tenê bi çavên miştmeraq li wî temaşe dikir. Herduyan jî digot qey ev herdu lawikên ko bi kurdiyeke paqij dipeyivîn û zêde behsa xwe nedikir, ji derve hatibûn, belkî jî bi karekî ko aqilê wan nedigihiştê mijûl dibûn û ji ber vê yekê, pirsên wan bêbersiv dihiştin. Ji lewre, wan newêrîbû dengê xwe derxistaya û bela xwe di wan de bidaya.

Robîn beyî ko tiştekî ji wan re bibêje, xatir jî ji wan nexwast û bi dûr ket. Zilamê rîhdirêj piştî ko Robîn bi dûr ket, rabû ser xwe ji ser bircan li çûna wî niherî. Piştî ko siya wî jî di nav tariyê de wenda bû, dîsa hat li şûna xwe rûnişt û xwe da ber êgir. Lê ji ruyê wî xuya dibû ko ew ê tu carî van herdu lawikên biyanî û ecêb ji bîr neke.

Herçî Robîn bû, heta ko ji wira bi dûr neket jî lê hay nebû ko xatir ji wan nexwastiye û rabûye. Eyb çêbû. Zilaman cih di nav xwe de dabûyê, hiştibû ko ew jî xwe li ber agirê wan germ bike. Ya herî mezin jî ew bû ko wan şeraba xwe bi wî re par ve kiribû. Gava ko li vana fikirî, pir li ber xwe ket, fedî kir. Heta ko gelekî meşiya û beyî xwe hat li ber devê goristana ko bi roj hatibûyê sekinî jî ji bîra wî neçû.

## 4. Şop...

Hê nû li xwe hay bûbû ko beyî xwe daye ser şopa Bişêr. Çawa dibe ko herdu jî tiştên mîna hevdu bikin? Ecêb e. Belkî jî ne ewqasî girîng be, lê


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ev rastlêhatineke ecêb e, bi rastî. Bişêr tu şop li dû xwe nehiştiye. Lê ji nişka ve, li cihekî ko sed salî bifikire jî nayê bîrê, li cem du zilamên araqvexwir ko di jiyana xwe de, ew tu carî nedîtine, li şopa wî rast tê.

Heke weha be, qedera wî bi ya yekî din ve dihat girêdan û wî yekî çi kiribe, ew ê jî eynî tiştî bike. Lê, le ko Bişêr tiştekî ko ew ê tu carî neke jî kiribe. Tirsiya, lê ji ber ko nizanîbû bê çi hatiye serê Bişêr, bêhtir tirsiya.

Niha jî dîsa hatibû li ber goristanê sekinîbû. Lingên wî ew beyî wî anîbû vê derê. Çi karê wî hebû li vira, çawa ji xweber hatibû û li ber devê goristanê bi xwe hisiyabû, wî jî nizanîbû.

Di ber xwe de got

— Zilamê Kal..!

û sekinî. Li hundirê goristanê niherî.

Ji piçûkanî de, ji goristanan ditirsiya. Rojekê, yekî jê re gotibû ko gava dibe êvar û dinya tarî dibe, hemû mirî radibin ser xwe, nobedariya goristanê dikin. Kî di cem wan re derbas bibe, destê xwe dixin qirika wî û difetisînin. Bi dû re jî xwîna wî vedixwin û laşê wî diavêjin ser riyê.

Niha, hew ji tiştên weha bawer dikir û tu carî jî nedîtibû ko ev mesele rast derketiye; lê dîsa jî ditirsiya. Wî jî bi xwe nizanîbû bê ji bo çi ditirse. Hat bîra wî ko di zarokatiya wî de, gava ev tişt jê re dihatin gotin, heval mevalên wî gişan derzî û merxez bi xwe re digerandin. Ji ber ko li gora kesê ko ev mesele ji wan re digot, ger mirov tiştekî hesinî bi xwe re bigerîne, hingê pîrhebok jî ji mirov ditirsin. Lê wî nizanîbû bê tiştê ji bo pîrhebokan dihat gotin, ji bo miriyan jî derbas dibû an na. Ji xwe, ger ji bo miriyan derbas bibûya jî niha ne derziyek û ne jî merxezek bi wî re hebû. Gava li vana fikirî, him di ber xwe de keniya him jî xwast ko aniha merxezek di beskura qapûtê wî de hebûya. Ji lewre, çavên xwe bi tirs li dora xwe digerandin û bê hemdê xwe destê xwe di bêrîka xwe de li tiştekî digerand..

Bi tirs, lê weke ko vê tirsê ji xwe veşêre, ket hewşa goristanê. Tarî bû. Tava heyvê siya wî li paş wî dihişt. Şev, mirov çi qasî bikaribe fikire, ewqasî bi tirs û bê deng bû. Robîn ziq li pêşiya xwe diniherî. Digot qey aniha hin kes dê xwe ji paş de biavêjin ser wî. Newêrîbû ji bo ko wê tirsê ji dilê xwe biavêje li dû xwe jî biziviriya.

Heke ne weha bûya û gava ko biziviriya çav li siya xwe biketaya, belkî bêtir bitirsiya. Ji bo ko netirse, tevî ko li hewşa goristanê bû jî di dilê xwe de stranên reqsê digot û dimeşiya. Dîsa jî carê gotinên wan stranan ji xweber dihatin guhertin û dibûn ko Robîn wan ji bîr bike.

Gava gihaşt ber gora Seydo, tirsa xwe ji bîr kiribû jî. Ji ber ko ji nişka ve ruyê Seydo hatibû ber çavên wî û bala wî kişandibû ser xwe. Robîn hebekî din lezandibû. Digot qey rastî ye. Gava ko hebekî din meşiyabû, ruyê Seydo hêdîka di nav tariyê de wenda bûbû. Robîn dîsa jî nesekinîbû. Heta ko li xeyalbûna wê dîmenê hay bû û gihaşt ser gorê, hêsirên wî xwe bera jêrê dabû jî. Dû re, gava ko Robîn li vê şevê bifikiriya, dê bi xwe lê hay bibûya ko heke di wê rewşê de ruyê Seydo nehataya ber çavên wî, belkî wî ê nikarîbûya tirsa xwe ji bîr bikiraya û li wira bimaya.

Aniha, hinan ew bidîtaya, dê bigotaya qey vî lawikî aqilê xwe wenda kiriye û dîn bûye. Li ber gorê rûniştibû, berê xwe dabû aliyê derî û mîna ko li benda hinan be, sekinîbû. Newêrîbû li axê binihere. Her gava ko berê xwe dida gorê, cendekê Seydo yê bibirîn dihat ber çavên wî. Gava ko di bin wê barana bi roj de hatibû ser gorê, ev tişt nehatibû bîrê.

Demeke dirêj bi wî awayî sekinî. Ji cihê xwe tev jî neliviya. Dinya reş û tarî bûbû. Dengê fizîna bê, bitenêtiya wî bêtir dianî bîra wî. Deng mengên tenekeyên ko li ser kolanê ji ber bê dileqiyan, carê ew ditirsand. Di nav wê reşahiyê de, carinan çavên wî ew dixapand û wî digot qey dûmanek ji ser goran ber bi jorê ve bilind dibe. Dû re, ew dûman dibû beş bi beş û her beşek dibû pîrhebokek û ber bi wî ve dihat. Her gava ko weha dibû, çavên xwe diqirpandin û didît ko ji tirsan, van tiştan dibîne.

Wext derbas nedibû. Pêjina însanekî jî nedihat. Mirov digot qey her ko diçe dinya tarîtir dibe. Herçî ba bû, mîna ko ew jî westiyabe, leza xwe kêm kiribû.

Robîn ji bo ko ji gorên dora xwe netirse û tiştên ko tirsê têxe dilê wî neyne bîra xwe, li ser hevdu çixare pêdixistin. Hingî li wira rûniştibû û ziq li aliyê derî niherîbû, çavên wî jî qerimîbûn.

Pakêta wî hindik mabû ko xelas bibe. Ber lingên xwe tije boçikên çixareyan kiribû. Çixareyeke din jî pêxist û ya di destê xwe de ko li ber xelasbûnê bû, avêt erdê. Ji nişka ve reşek ber bi çavên wî ket. Weha his kir ko bizinek di ber deriyê gorê re bihurîbû û li aliyê wî niherîbû. Ji çavên bizinê, sorahiyeke piçûk fûriyabû.

Di piçûkaniya wî de jê re hatibû gotin ko carinan pîrhebok xwe dixin şiklê bizinan û derdikevin hemberî mirov. Tirsiya. Dikira bibizdiya. Nema wêrîbû li wî aliyî binihere, lê ji bo ko tirsa xwe ji ser xwe biavêje, rabû ser xwe û li aliyê ko reş ber bi çavên wî ketibû niherî. Tu tişt xuya nedibû. Newêrîbû derketaya û bidaya pey wî reşî jî. Dîsa li şûna xwe rûnişt û mîna berê, bala xwe da aliyê derî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Vê carê, hebekî bêtir tirsiyabû. Bes tu carî negot ko ka ez çima ji vê goristanê dernakevim. Ew ê li wira bimaya. Ev biryareke qet'î bû. Ji ber ko li du tiştên din hay bûbû. Dabû ser şopa Bişêr, ev yek; ya duduyan jî ne mimkûn e ko şopa Bişêr ji xweber derketaya ser riya wî. Va ye, beyî xwe hat vegeriya ser gora Seydo jî. Belkî ev yek fantaziyeke vala be jî lê digel lêhaybûna xwe ya li ser fantazîbûna van tiştan, carinan mirov ji fantaziyên xwe jî bawer dikin. Tiştê ko ew bi jiyanê ve girê dida jî ev bû ji xwe. Rehetiya mirov ya jiyanê û hizûra wî çi qasî kêm be, fantaziyên wî jî ewqasî pir dibin û xurt dibin.

Wî jî nema dizanîbû bê ev çend saet in ko li ber gorê rûniştiye. Pakêta wî qediyabû. Pelçiqandibû û ew jî avêtibû cem boçikan. Westiyabû. Di nav hezar celebên ramanan de û bi tirsa ko miriyek rabe û were dest têxe qirika wî, an jî pîrhebokek xwe têxe şiklê bizinekê û were xwe biavêje ser wî, serê wî ketibû ber û di xew re çûbû. Hêyv nêvî bûbû û diket paş ewrên nexuyayî. Ezman hêdî hêdî bi temamî reş û tarî dibû.

Destekî mezin hêdîka hat û li ser milê wî sekinî. Robîn bi xwe nehisiya. Wî destî carekê ew hejand û Robîn ji nişka ve çavên xwe vekirin. Gava ko li xwe hay bû bê li kû ye û di wê tariyê de çav li kesê hember xwe ket, ji tirsa xwe tu nemabû ko laşê wî giş bibûya qêrîn û biteqiya. Destekî din hat û li ser devê wî sekinî. Lal bûbû. Serê wî gêj bû. Ber çavên wî reş bû. Dikira ji ser hişê xwe ve biçûya, zingîniya sîleyekê ji bin guhê wî hat. Mîna ko mirov darekê bihejîne, ew jî carekê hejiya. Bi dû re, sîleyeke din jî lê ji ya berê xurttir…

Çavên wî vebûn. Ziq li kesê hember xwe niherî. Dikira dîsa mina bîstika din ji ser hişê xwe ve biçûya, dengê nerm yê kesê hember ko mirov digot qey ji binê bîreke kûr dihat, ew şiyar kir.

— Robîn!

Robîn dev ji livandina xwe berda, xwe di nav lepên wî de rast kir. Wî kesî ew hêdîka berda û sekinî. Ruyê wî bi zorê xuya dibû, lê Robîn dikarîbû tê derxistaya ko kesê hemberî wî yekî weha qilafetgirs bû. Piştî ko hebekî din lê niherî, ruyê kesê hemberî wî bi carekê ve biriqî û ew ruyê mîna ko nûr jê dibariya derket holê. Rîha wî ya ko ji adetê dirêjtir bû, bi dû re jî porê wî yê dirêj ko ji paşiyê ve hûnandibû, xuya bû.

Hilma xwe bi zorê distend. Sînga wî bi lez radibû û dadiket. Piştî ko hilma wî hat ber wî û wî ew kesê li hember xwe nas kir, dilê wî bêtir rehet bûbû. Bi çavên biberger li ruyê wî kesî diniherî.

— Alî min bike! Rêyekê bide ber min! Ez xulam, ez di dexlê te de me...

Serê xwe hêdîka bera ber xwe da û giriya. Heke negiriyabûya, belkî dê nikarîbûya hêrsa xwe vala bikira.

— Ji bo Xwedê! Rêyekê bi ber min bixe. Min xelas bike...

Kesê hember wî dîsa bi wî dengê xwe yê ko mirov ecêbmayî dihişt û dixist bin bandora xwe, got:

— Min berê jî ji te re gotibû, Robîn. Ez nikarim tu riyan bi ber te bixim û ji bilî te, tu kes nikare te xelas bike.

Zilamê Kal serê xwe rakir û li ezmanê ko bêhna sibeheke nû jê dihat niherî.

— Binere, rojeke nû dike hilê. Tu ji bo çi ewqasî bi rik î? Tu hema xwe bi destên van xeyalan de berdidî. Bes e, êdî li xwe binere. Tiştekî bike.

Serê Robîn di ber wî de bû. Zilamê Kal piştî ko hebekî bala xwe dayê, got:

— Tiştekî bike, Robîn! Tiştekî nû ko bikaribe hemû jiyana te biguherîne...

Zilamê Kal destê xwe dîsa danî ser milê wî, mist da û dubare kir:

— Divê tu tiştekî bikî, Robîn. Tiştekî nû...

Peyva wî ya dawiyê, çend caran di guhên Robîn de olan da û belav bû. Bayekî hênik hat û xwe li nav porê wî xist. Qerisî. Gava ko serê xwe rakir, Zilamê Kal dîsa wenda bûbû; lê dengê wî hê di guhê Robîn de olan dida:

— Tiştekî bike, Robîn. Tiştekî bike...

## 5. Sond... heta mirinê... çi bibe jî...

»tu ji nav hemû janan janekê bîne ji min re
û hemû sûcên ko li te hatine birrîn...«

Dibe ko ji ber destê sibehê bû jî dinya pir sar bû. Seqema ko hebû, kiribû ko cihokên li kêleka riyan jî qeşa bigirin. Darên derûdorê giş tazî mabûn. Zivistanê li Diyarbekirê, cihê xwe xweş kiribû. Êdî xuya bû ko ew ê berf jî bibariya.

Robîn şeva çû, heta ko li ber wê seqemê ji ser hişê xwe ve çûbû, li goristanê mabû. Zilamê Kal dîsa anîbû bîra wî ko divê ew tiştinan bike. Nikarîbû bifikiriya. Qerisîbû. Îmana wî ji dinyayê çûbû. Belkî di vêya de rola edembûna kincên wî û bêbiryariya wî ya li ser kirina gelek tiştan jî hebû. Belkî ji ber ko di wê şevê de li derve mabû, weha difikirî. Wî nema dizanîbû.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ji wî pê ve, li derve tu kes tune bû. Wî dizanîbû, wê saetê li derve, bi tenê qesas û araqvexwir mabûn. Ew jî niha di quncik muncikan de bûn. Heke hebekî din jî ber bi nava bajêr de biçûya, ne mumkun bû ko li polîsan jî rast nehataya. Wê saetê û li Diyarbekirê, mirov herî bêtir ji polîsan ditirsiya. Heke wan ew bidîtaya, belkî ew jî ji wî bitirsiyana.

Nizanîbû bê divê çi bikiraya. Bi dû re, beyî ko biryarekê bide, xwe di nav wê tariyê de û bi dizî, gihandibû mala Elî. Li ber derî çendekî sekinîbû. Li dora xwe û li ezmên niherîbû, bi dû re hêdîka du caran li derî xistibû û sekinîbû. Demekê, deng ji hundir nehatibû. Di wê navê re ew jî li xwe poşman bûbû ko hatibû wira. Lê bi dû re, hê ew li poşmaniya xwe difikirî, dengekî bitirs ji hundir hatibû.

— Kî ye?

Robîn gava dengê Elî seh kiribû, ketibû ber fediyê. Di serî de bersiv nedabû, xwastibû bi şûn de vegere, lê bi dû re bi zorê gotibû, »ez im«. Fahm kiribû, ko kesê li paş derî, dixwaze dengê wî nas bike. Sekinîbû. Derî hêdîka vebûbû. Di wê tariyê de û tevî wê riya wî ya dirêj, Elî çawa ew nas kiribû, wî jî nizanîbû; ji wî jî nepirsîbû.

Eliyê Artîst, gava ko çav li hevalê xwe yê ko soza mirinê bi hev re dabû ket, mîna ko her derê wî qeşa girtibe, mat mabû. Qederekê tev jî neliviyabû. Hişê wî sekinîbû. Ji ber ko ji xew rabûbû, bawer nekiribû ko Robîn e. Gava hatibû ser hişê xwe jî ji bo ko kesek nebîne, hema zû bi zû ew kişandibû hundirê hewşê û derî girtibû.

Qet nepeyivîbûn. Ji ber ko nedixwast tu kes bi wan bihese, lempe jî vênexistibûn. Di wê tariyê de, herdu jî bê deng li hember hevdu rûniştibûn û li nefesa hevdu guhdar kiribû. Bi xêra tariyê, wan ruyên xwe jî ji hevdu veşartibûn. Dû re, pîreka Elî hema zû bi zû nivînê Robîn danîbû û çûbû. Heta ko Eliyê Artîst rabûbû, hatibû cem Robîn û ew himbêz kiribû jî ji şûna xwe ranebûbûn. Robîn di himbêza wî de giriyabû. Elî pişta wî mist dabû û ew biribû ser nivînê wî, xistibû xewê.

Sibê zû jî jê re av germ kiribû ko xwe bişo û riya xwe kur bike. Kincên nû jî anîbûn, li paş deriyê serşokê daliqandibûn.

Heta piştî taştê jî nepeyivîbûn. Bi dû re, Robîn bi dengê xwe yê westiyayî jê re gotibû, »ez ê tiştekî ji te bixwazim, Artîst.« Hê bi wî navî bangî wî dikir. Kêfa Elî hatibû bi vêya, dîmenên berê hatibû ber çavên wî, xemgîn bûbû û meraq jî kiribû bê Robîn çi dixwaze.

Robîn gotibû, »ji bo xatirê hevaltiya me, heta demekê ji kesî re nebêje ko te ez dîtime.« Serê Elî bi wê gotinê re ketibû ber. Lê, negotibû »çima«.

Nepirsîbû. Tevî ko hewil dabû ko wî fahm bike jî tu mahne nedabû wê xwasteka wî. Hema serê xwe bi mahneya ko bibêje »bila be,« hejandibû û mabû. Heta Robîn beyî ko tiştekî din bibêje derketibû jî nepeyivîbûn.

Gava Robîn ji mala Elî derket, bêhtir li jiyana wî fikirî. Ji xwe re malek ava kiribû. Zewicîbû. Heyata wî ketibû ser riya xwe û diçû. Lê ya wî? Yê wî, ew di refê qulingan de yekî nefikirî bû û mehkûmî vê jiyana xwe bûbû ko êdî tu tahma wê nemabû...

Tew zewac, zarok û malbat...! Ew nikare xwe di wê rewşê de bifikire jî.

Li ber deriyê girtîgehê, qelebalixa ko gelek caran bala herkesê ko di wira re dibihurî dikişand, tune bû. Qey ne roja hevdîtinê bû. Leşkerê qamkinik ko bêvila wî ji serma sor bûbû, hingî Robîn ajotibû ser wî, hew di ber xwe de dabû û ji bo ko ji serleşkerê xwe bipirse, çûbû wê avahiya piçûk a ko bi qasî sed mitroyan ji derî dûr bû.

Piştî pênc-şeş deqîqeyan, bi leşkerekî din re xuya bû ko herdu destên xwe dabûn paş xwe û paçikeke sor bi milê wî yê çepê ve bû. Qama vî leşkerî ji yê din dirêjtir bû û qilafetekî wî yê girs jî hebû. Ne ji bêvila wî ya dirêj bûya, tew kes bi serê wî yê piçûk jî nedihisiya. Pir bi quretî dimeşiya.

Leşkerê ko vê dawiyê hat, ji bo Robîn bitirsîne, bi awayekî hêrsbûyî awirin dan wî. Mîna ko li dijminê xwe binere û dike sixêfan bike, li wî diniherî. Digel ko ji çavên wî xuya dibû ko ew ne yekî ewqasî qure bû jî dixwast xwe weha nîşan bide.

Robîn bi psîkolojiya leşkerên weha baş dizanîbû. Ev leşkerên ko rutbeya wan piçûk bû, gava ko derdiketin hemberî xelkê û tew ko tu kesî din li ser serê wan nebûya, mîna ko hertişt ji wan dihat pirsîn tev digeriyan.

Leşkerê ko quretî dikir, ji serî heta binî li Robîn niherî. Dû re, li leşkerê kêleka xwe zivirî. Leşkerê nobedar, li ber wî herdu destên xwe dabûn ber çîpên xwe, sînga xwe ber bi pêş ve rakiribû û sekinîbû. Ji bo ko qama wî hebekî dirêjtir xuya bibe, carê xwe radikir ser tiliyan jî.

— Ma yê ko dixwaze wî terorîstî bibîne, ev e?

Leşkerê qamkinik bi carekê ve bersiv dayê.

— Belê, Serleşkerê min!

Leşkerê qure diranên xwe şidandin û li Robîn zivirî.

— Min xelet nebihîst, ne weha? Tu dixwazî wî terorîstî bibînî.

Robîn fahm kir bê vî leşkerê ha dixwast çi bibêje, lê xwe li nezaniyê danî.

— Weleh, ez nizanim. Yê ko ez dixwazim wî bibînim, navê wî Şêxo ye.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Leşkerê qurê ji bo ko peyva wî bi ser ya Robîn bikeve û li ber leşkerê xwe nekeve rewşeke nebaş, xwe hêrs kir, dengê xwe bilind kir.

— Qeşmeriya neke, ûlen! Em dizanin bê tu behsa kîjan kûçikî dikî!

Kenê Robîn bi vê quretiya wî ya derewîn hat, bes nehişt ko kenê wî derkeve derve.

— Here roja sêşemê were! Îro, ne roja hevdudîtinê ye.

Robîn fahm kir ko heke li ber negere, nahêle têkeve hundir. Tam gava ko ew ê li dû xwe biziviriya, bi dengekî kubartir bangî wî kir.

— Serleşkerê min!

Leşkerê qure bi vê bangkirinê hebekî din pesinî û sînga xwe bilind kir. Vê carê, awirên wî ji yên berê nermtir bûbûn. Çavên wî diçirisîn. Bi wê kêfê, mîna zarokekî bû.

— Serleşkerê min, ez ji Stenbolê hatime vira. Ez li wira di şîrketekê de dixebitim û ji ber ko destûra min xelas dibe, divê ez vê êvarê bi rê ve bikevim. Min bilêta xwe ya balafirê jî girtiye. Ez di bextê te de me, hela bê tu nikarî tiştekî bikî ji bo min.

Leşkerê qure dîsa bi awayê kesê hemberî xwe piçûk dibîne, li wî niherî. Bala xwe da kincên wî. Bi dû re li porê wî niherî, bala xwe da berçavka wî ya bêçarçove ko heqê wê pereyekî pir bû û ruyê wî yê xweşik û birqokî ko qet nedişibiya yê Diyarbekiriyan.

— Weleh... ez nikarim tiştekî bikim. Lê, ez bala xwe didim te, tu naşibî wan kesên xerab. Çi têkîliya te bi vî kûçikî re heye?

— Ezbenî, ev deh salên min in ko ez li Stenbolê mim. Gava min li heval mevalên xwe yên mektebê pirsî, ez hîn bûm ko Şêxo li vira ye, min jî got hema ez seriyekî bidim wî. Ketibe ser rêyeke xerab û cahiliyek kiribe jî hêvalê mirov e. Weke hûn jî dizanin, mirov nikare hêvalên xwe yên berê nebîne û here.

Leşkerê ko bala xwe dabû tirkiya Robîn a kubar û delal, destekî xwe bir jêra lêva xwe, çenga xwe hebekî xwirand û sekinî.

Bi dû re got:

— Baş e. De hela ka tu bisekine. Ez ji serleşkerê xwe re jî bibêjim. Heke bihêle, belkî ez ê bikaribim te ji bo demeke kurt berdim.

Robîn tavilê ji bo nermkirina wî, hewildaneke din kir.

— Ez ê mînetdarê te bim, ezbenî.

Leşkerê qure, yê nobedar li wira hişt û çû dîsa ket hundir. Piştî deh deqîqeyan, dîsa xuya bû. Gava ko ji hundir derket, herdu destên wî li ber çîpên wî bûn û bi paş ve derketibû, lê bi dû re gava ko berê xwe da wan,

dîsa destên xwe danîn paş xwe, sînga xwe rakir û dîsa bû qureyê berê. Bi gavin giran ber bi derî ve hat.

Ji bo ko derî li Robîn veke, bi destekî xwe işaretek da leşkerê nobedar. Robîn nasnameya xwe da destê leşkerê nobedar û alav malavên ko dikare xeter ji wan çêbibe jî li hundirê qulûbeya wî danîn. Wê gavê, dengê leşkerê qure hat bihîstin:

— Bi tenê, ji bo deh deqîqeyan, ha! Tu careke din jî neyê ziyareta vî dêqahpî.

Robîn bi wê peyva wî ya dawiyê, hebekî hêrs bûbû jî dengê xwe nekir. Gava di ber wî re bihurî, destê xwe yê rastê danî ser sînga xwe û got:

— Spas, ezbenî. Xwedê ji we razî be.

Robîn da pey leşkerê nobedar î kinik û ber bi avahiyên mezin ko dixana reş bi ser serê wan ketibû, meşiyan. Li pey leşkerê nobedar dimeşiya û carê bala xwe dida hewşa girtîgehê jî. Leşkerê qure ko hê di pey wan re diniherî, di bin simbêlan re dikeniya û serê xwe kil dikir.

Ev avahî ko hingî kevin bûbûn, mirov digot qey dê bi derbekê hilweşin. Cihê ko mehkûm lê diman jî ev der bû. Li dora wan, li ser dîwarên bilind, qulûbeyên nobedaran hebûn. Li rasta qulûbeyan, ser dîwaran, seranser bi têlan hatibûn bilindkirin.

Ev girtîgeha navdar ko gelek girtiyên bi nav û deng lê mabûn û ji ber vê xusûsiyeta xwe bûbû mijara gelek pirtûkan, tirseke mezin dixist dilê mirovê ko di ber re dibihurî. Bayê cemidî ruyê mirov wek ko gwîzan lê ketibe, diêşand. Ji ber wê bêdengiya doraliyê, girtîgehê mîna avahiyeke ko tu kes bi ser de nayê û bêxwedî mabû xuya dikir.

Gava gihaştin ber avahiyeke ji wan avahiyên mezin, berê, çavên wî bi nivîsa ko li ser derî hatibû daliqandin ket. Li ser wê avahiya kevin mîna pîneyekî xuya dibû. Li ser tabelayeke nû û reş ko dibiriqand, bi nivîseke mezin û zer hatibû nivîsandin:

»Ne Mutlu Türküm Diyene«

Di bin wî deriyî re derbas bûn û ketin hundir. Herduyan li qorîdorê, berê xwe da odeyeke piçûk. Leşkerê qamkinik nasnameya Robîn da zilamekî sivîl î simbelboq û tiştin di guhê wî de gotin. Yê sivîl di bin çavan re li Robîn niherî, mahdê xwe tirş kir û jê re got:

— Derkeve û li ber derî bisekine!

Piştî gavekê, zilamê simbêlboq derket. Bi awirin tûj dîsa li Robîn niherî û lêva xwe xwar kir. Robîn bi wî û awirên wî yên xerab hisiyabû, lê mîna ko hayê wî ji tiştekî nebe, ji xwe re li dora xwe diniherî. Zilêm di ber xwe


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

de kir niçe niç û meşiya. Ket neqebekê û wenda bû. Dengên lingan, mifteyan, deriyan, însanan bi dû hev re hatin bihîstin.

Leşkerê qamkinik hat cem Robîn û ew bi xwe re bir odeyeke din. Ode bi hesinên ko ber bi jorê ve bilind dibûn û nedihiştin mirov derbasî aliyê din bibin, bûbû du beş. Li herdu aliyên hesin jî herkê kursiyek hatibû danîn. Aliyê din, ji aliyê ko Robîn lê bû firehtir xuya dikir. Deriyekî din jî di wira de hatibû vekirin. Wê gavê, Robîn têgihişt ko ew ê Şêxo di wê derê re bînin.

Leşker çû pişta xwe da dîwêr û sekinî. Robîn destûr jê xwast û çixareyek ji bêrîka xwe derxist. Guhê xwe da aliyê din, lê tu deng ji wî alî nedihat. Çixareya xwe xelas kir û di pencereya kêleka xwe re avêt derve.

Bîstikekê li derve niherî. Berfê hêdî hêdî dest pê kiribû. Piştî ko bala xwe hebekî dayê, bi berfê re xemeke giran xwe li dilê wî girt.

Niha, mîna ko li filîmekî kevin temaşe bike, dihat bîra wî. Ew di zarokatiya xwe de, her gava ko berf dibariya, bi kêf û bi heyecan direviya derve û xwe li ser erda berflêgirtî diavêt erdê. Kîjan nasê wî di wira re derbas bibûya, bi topikên berfê êrîşî wan dikir. Ji ber ko berf hercar nedibariya, çi lîstikên li ser berfê bihatana bîrê, giş di carekê de dilîstin. Bûka berfê çê dikir, wî û zarokên cîranan li ser berfê bi topê dilîst. Derdiketin ser dîwaran û xwe diavêt ser berfê. Di nav berfê de dimeşiyan. Tew berfdimsk bi tu tiştî nedida.

Leşkerê ko pişta xwe dabû dîwêr û li wî diniherî, fahm kir bê Robîn di wê berfê de çi dibîne. Li ser tûtikan rûnişt û bala xwe dayê. Heta ko dengê lingan ji wî aliyê hesinan nehat jî ranebû ser xwe û xwe rast nekir.

Bi dengê lingên ko di qorîdorê de olan dida, Robîn jî li xwe zivirîbû. Ji xwe, wê dîmena berfê ew biribû bîranînên zarokatiya wî û kiribû ko kela girî têkeve qirika wî. Gava ko deng hatibûyê, êdî çongên wî sist bûbûn û bi zorê xwe gihandibû heta ber hesinan.

Ne dengê lingên kesekî bi tenê bû. Xuya bû ko du kes dihatin. Lê kesên ko dihatin, hêdî hêdî dimeşiyan. Dengê lingan kêm kêm dihat û carê jî dihat birîn. Deriyê hesinî ko li aliyê din bû, vebû. Piştî gavekê, zilamê simbêlboq di bin çengê yekî din de xuya bû û ew ber bi hesinan ve anî.

Hê du-sê gav mabûn ji hesinan re, Şêxo sekinî û li Robîn niherî. Zilamê simbêlboq ew hişt û bi paş de vekişiya. Wî jî weke yê leşker, xwe da ber dîwêr û bala xwe da wan.

Robîn dikira ew nas nekiraya. Herçî Şêxo bû, berê ne ewqasî zeîf bû, lê niha mîna kalên heftêsalî, pişta wî xûz bûbû û bi zorê dimeşiya. Porê wî

jî tev de weşiyabû.

Berî ko Robîn bi malbata xwe re here Stenbolê, bi qasî pênc salan hevaltî bi hevdu re kiribû. Di wê maweyê de, gelek tişt bi hevdu re kiribûn. Ji bo hevdu gelek caran ketibûn nava şerên mezin û zilam jî birîn kiribûn. Mirov digot qey navika wan bi hevdu re hatibû birîn. Her bi hev re bûn. Li Diyarbekira ko tirsê ew dagir kiribû, wan cesaret ji hevdu werdigirt û bi hevdu re bi mêrxasî li hember xezeba tirsê radiwestiyan. Bi stranên xwe, bi govendên xwe, bi pêywendiyên xwe û bi evînên xwe, ne li qedexeyan guhdarî dikir û ne jî tu sînor nas dikirin. Ew wê demê, bi baweriya xwe ya bi hevdu, bi misteweya xwe ya têgihîştinê û bi wêrekbûna xwe ji bo gelek xortan nimûne bûn.

Gava ko herdu bi hevdu re bûna û tew Selman û Elî jî li kêleka wan bûna, tu kesî newêrîbû derketaya ser riya wan. Herkesî ew baş nas dikirin. Şêxo ji destê xwe re pir baş bû. Robîn jî ne kêmî wî bû. Ew jî bi desthilanîn bû. Herkesî bi vêya dizanîbû.

Piştî kuştina Seydo, wî û Şêxo û Selman bi hevdu re biryar dabû ko jiyana bajêr terk bikin. Lê hê wan xwe baş amade nekiribû, Resûl Beg nexweş ketibû. Wê gavê, Robîn ji mecbûrî biryara xwe guhertibû û li bajêr mabû. Ji bo ko ew ji biryara xwe vegeriyabû, yên din jî neçûbûn.

Giş bi carekê ve hatin ber çavên wan û bihurîn. Wê demê, hemû derdên xwe ji hevdu re digotin. Carinan, gava ko wan hew dikarîbû li hember bitenêtiya êvarên ko tu kesî newerîbû derketaya derve debar bikiraya, serên xwe datanîn ser milên hevdu û digiriyan. Gava ko yek ji wan nexweş diket, yê din heta sibehê li ber serê wî rûdinişt û ji bo ko tişt bi hevalê wî neyê, tevî ko bawer nedikir jî dia dikir. Dihat gotin ko tu hevaltiya di ser ya wan re heram e. Heta mirinê jî dilên wan dê bi hevdu re bûna.

Gava ko Robîn wê şeva dawiyê xatir ji wî xwastibû, herduyan hevdu himbêz kiribû û bi hevdu re sûnd xwaribû.

— Em tu carî hevdu ji bîr nakin. Heta mirinê... Çi bibe jî...

Şêxo, çer ko çav li Robîn ket, hêdîka pişta xwe rast kir û sekinî. Nedixwast ko di wê rewşa xerab de derketaya hemberî destbirakê xwe yê mirinê, lê belê...

Destên xwe dirêj kirin û xwe bi hesinan ve girt. Çavên wî yên ko kerba salan tê de diyar dibû, bi hesreta salan ji nişka ve tije hêsir bûbûn, sor bûbûn û hêsir ji bo herikandinê li hemanan bûn. Di nav hesinan re bi destên hevdu girt û mist dan.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Şêxoyê ko gava hatibû girtin sal û nîvekê di îşkenceyê de mabû û negotibû ay jî li ber vê hevdudîtina ko wî qet hêvî nedikir û ji nişka ve pêk hatibû, hew xwe li ser lingan zevt kir û hêdîka xwarî erdê bû, li ser çongên xwe sekinî. Robîn jî bi wî re xwe bera jêrê da.

Destên wan di nav hev de, bi çavên westiyayî ko dixwazin gelek tiştan ji hevdu re bibêjin, li hev diniherî. Şêxo, ji bo ko negirî, lêva xwe gez kiribû. Robîn lê hay bû ko Şêxo destê wî dieciqîne. Wê gavê, fahm kir ko hevalê wî ji ser hişê xwe ve çûye û ji bo ko negirî, xwe dişidîne.

Şêxo hew xwe girt, lêva wî hêdîka ricifî. Hêsirên çavan xwe hêdî hêdî bera jêrê da. Dû re, serê xwe bera ber xwe da û bû kûr kûra wî...

Digel ko Robîn xwe ji berê de, ji bo vê rewşê amade kiribû û ji xwe re gotibû »ez nagirîm«, niha ew jî digiriya. Lê, dil li tu emiran guhdarî nedikir. Ew filîmê kevin dîsa hat ber çavên wî. Hemû demên ko ew bi hevdu re jiyabûn... Kêf... henek... lîsk... şer... xeyalkirina tiştên nedîtî... evînên nîvcomayî... girî... hesret...

Wê gavê, hînî tiştekî din jî dibû. Dû re, wî ê ev tiştê nû, di helbesteke xwe de binivîsandaya û her ko wî ew helbest bixwenda jî ew ê ji nû ve biçûya wan rojan û bigiriya:

»her tişt, di dema xwe de tête jiyîn,
bes di hişê mirov de dimînin hemû bîranîn
tu tişt bi şûn de venagere... »

Xwast ko bipeyive, bes mejî hew dixebitî. Li ruyê hevalê xwe niherî. Mîna ko bixwaze wî himbêz bike, lê niherî. Hêsir ji çavên wî diniqutîn xwarê.

Peyv bi zorê anîn ser hev. Carê jî disekinî û bêvila xwe dikişand. Ma gelo gava mirov hevalekî xwe yê bi vî rengî dibîne, dikare çi bibêje?

Şêxo... Hevalê heta mirinê. Niha, çi qasî belengaz û neçar mabe, ew çend jî xurt û bixwebawer bû. Bes xuya bû ko pir dilşikestî bû. Kerba salan û rewşa wî ya xirab ko dest û lingên wî girê dabûn, dikarîbû di ruyê wî yê bikeser û çavên wî yên xembar de bihataya dîtin. Mîna ko ji şerekî mezin derketibe. Birîndar. Têkçûyî. Westiyayî. Dilşikestî... Dilê mirov bi wî dişewitî.

Piştî bêdengiyeke ko herdu jî birin wan rojên berê û serên wan li hember vê rewşê ji neçarî tewandin, Robîn bi dengê xwe yê westiyayî û lerzokî, got:

— Ez... ez hatim sûnda xwe nû bikim, Şêxo... Tu jî heyî?..

## 6. Here ji vira...

Gava nasnameya xwe ji destê leşkerê qamkinik girt, çavên wî dîsa dageriyan ser wan avahiyên ko niha di ber re bihurîbû. Kîn û kerba dilê wî, xwe ji ruyê wî û niherînên wî dida der. Hêrsa wî bêhna wî diçikand û dihişt. Şêxoyê ko bûbû nîvînsan, Şêxoyê ko berê xurtê xurtan bû...

Dilê yê leşker jî bi wan şewitîbû. Gava herduyan li hundir wê odeka ko bi hesinan bûbû du beş, destên xwe di nava wan hesinan re dirêjî hevdu kiribûn û mist dabûn, mîna ko agirek bi dilê wî jî bikeve, ji nişka ve janekê xwe li sînga wî girtibû û wî wê gavê berê xwe dabû alî, debar nekiribû ko li wan temaşe bike. Ji lewre, rewşa wan fahm kiribû. Mîna ko Robîn nexweşekî li ber mirinê be û bixwaze alîkariyê bi wî bike, bi kubarî kaxizên wî dabûn wî. Heta ko çûbû jî ji paş deriyê hesinî lê niherîbû. Serê xwe bi mahneya ko bibêje »erê...« bi kerb hejandibû.

Robîn di tevliheviya hisên yekî ko di şerekî hebûn û nebûnê de têkçûyî û hertiştê xwe wendakirî de, serî di ber de dimeşiya. Hêsirên wî hê zuha nebûbûn. Dilê xwe hîn jî li girî rehet nekiribû. Ne bayê li derve xema wî bû, ne jî sola wî ya ko di nav heriyê de mabû. Beyî hayê xwe, dabû nav heriyê û dimeşiya. Tew carinan, mîna ko ji xwe re bi tiştekî bilîze, lingê xwe li çiravê jî dixist. Ne li ser hişê xwe bû. Digiriya.

Êdî hertişt ji xweber zelal dibûn. Zaroktî, hevalbendî, evîndarî... Hertişt çûbûn. Di şûna wan de, êdî tu tişt nemabû. Bes keser... Bes kerb... Û ruyê hin hevalên berê. Selman, Hemdîn, Elî... Di ser gişan re jî rewşa Şêxo dê her di bîra wî de bimaya û tu carî jî ji ber çavên wî neçûya. Ma gava mirov hevalekî xwe yê bi vî rengî di rewşeka weha de bidîtaya, dikarîbû li çi bifikiriya gelo?...

Seqema mîna ko gwîzanekî tûj li ruyê mirov bixe, ruyê wî kiribû mîna qalibekî qeşayê. Bêvila wî sor bûbû. Diherikî. Wî hay ji xwe tune bû. Heta ko ew teqsiya ko hindik mabû li bin guhê wî bixe, bi frênekê li ser erda qeşagirtî çerixî û bi dijwarî li ber wî sekinî jî li xwe hay nebûbû. Şifêrê teqsiyê yê qilafetgirs û simbêlboq ko pir hêrs bûbû û ji heyecan û tirsa xwe sor bûbû, gava ko daket û ji bo ko derbeke mezin li nav çavên wî bixe ber bi wî ve çeng bû, Robîn serê xwe rakir û bi awirekî nerm lê niherî. Şifêrê ko ew nas kir, wê gavê veciniqî û li ber sekinî.

Devê wî bi zorê digeriya:

— Tu ketiyî çi halî! Ka were têkeve mekînê.

Ji nişka ve, ew hêrsa wî mîna avekê herikîbû û çûbû. Şifêrê ko bîstika


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

din, ji bo ko li wî bixe, bi hêrseke mezin ji mekîneya xwe daketibû, niha bi hezkirina ko bi tenê dayikek dikare nîşanî zaroka xwe bide, bi awirên ecêbmayî li wî diniherî.

Robîn dîsa serê xwe bera ber xwe da û berê xwe da alî. Meşiya û çû. Zilêm teqsiya xwe hişt û da dû wî. Di pey wî re ket kuçeyê. Hê digot ko ez ê xwe bigihînimê, di şûna xwe de sekinî û mat ma. Hema bi şûn de vegeriya û bi lez xwe veşart.

Du zilamên qilafetgirs û birîh, bi qirika Robîn girtibû û pişta wî dabû dîwêr. Yekî ji ber xwe devançeya xwe derxistibû û xistibû cênîka wî. Yê din jî bi lezandineke ecêb, carê serê xwe radikir, li dora xwe jî diniherî û li bêrîk mêrîkên wî digeriya. Gava dev ji wî karê xwe berda, bi situyê wî girt û da pêşiya xwe û ber bi teqsiya xwe ya ko li serê kuçeyê hatibû sekinandin ve çûn.

Robîn di ser milê xwe re zivirî û li aliyê zilamê ko xwe di paş dîwêr de veşartibû û serê xwe derxistibû niherî. Çavên wan carekê li hev ketin.

Du zilaman Robîn dibir. Mêrik ji wê neçariya xwe fedî kir. Serê xwe da dîwêr û ji hêrsan lêva xwe gez kir.

Herdu zilaman Robîn di nav xwe de da rûniştkirin û teqsiya wan bi rê ve ket. Zilamê esmer ko bîstika din devançeya xwe xistibû serê wî, ji bo ko Robîn li dora xwe nenere, hişk bi situyê wî girt, eciqand û serê wî daxist jêrê. Canê Robîn ji ber vê hereketa wî êşiya. Tiliyên wî yên şidiyayî, dikira situyê wî qul bikira. Robîn naliya.

— Xwe tev nelivîne, kuro!

Robîn sekinî. Ditirsiya. Lê rewş fahm kiribû. Ji xwe, gava ko li ber deriyê hefsê bû, ji ber ko baş bi rewşa vî bajarî dizanîbû, texmîn kiribû ko dê tiştekî weha were serê wî. Beyî ko bizanibe bê ka wî bi kû de dibin, serê wî li jêrê, di situyê wî de tiliyên zilamekî esmer î xurt î nenas, difikirî. Hertiştên ko pê dizanîbû, di ber çavên wî re bihurîn. Diyarbekir hê weke berê bû, nehatibû guhertin.

Mekîne piştî rêyeke dirêj û rast, da ser rêyeke şose. Carê, li kortik mortikan diket û diçû. Ji dengê motora teqsiyê pê ve, tu deng nedihat bihîstin. Xuya bû ko ji nava bajêr derketibûn. Zilamê din ko ew jî li kêleka wî rûniştibû, berçavka wî derxist û xist bêrîka xwe. Ji bêrîka xwe ya din paçikekî reş derxist û ji nişka ve da ber çavên Robîn û girê da.

Robîn got qey hin wî difetisînin. Zilamê ko çavên wî girê dabûn, herdu destên wî ji paşiyê ve kelepçe kirin. Wê gavê, tirsa Robîn zêdetir bû. Qurbanên li ber destê qesabekî ko di destê wî de satore û kêr hebûn hat

bîra wî. Ew beranê dest û lingên wî hişk zevtkirî û çavên wî girtî ko qesêb dê ji nişka ve kêr bidaya qirika wî, çi qasî hewil bidaya xwe jî dê ji sêrjêkirinê xelas nebûya.

Xwe eynî şiband wî beranê ko ji neçarî, dev ji hewildana xwe ya xelasbûnê berdaye û xwe daye benda mirinê. Dilê wî him bi wî beranî him jî bi wî şewitî. Hertişt li dû wî dima. Mirov di rewşeke weha de, tu carî nikare li xelasiyê bifikire. Hema dixwaze zû bi zû bimire. Wê gavê, li hertiştê xwe poşman dibe. Êdî, heke wî nekujin jî ew ê ji ber wê tirsê ji xweber bibe nîvzilam. Zilamekî ko têkeve vê rewşê, heke xelas bibe jî jiyan lê diherime. Piştî vê xelasiya ko têkçûyina herî mezin bû, dê tu mêrantî jî bi wî re nemaya.

Rojekê, yekî jê re behsa kuştina zilamekî kiribû û gotibû ko gelek kes bi vî awayî hatine kuştin. Hinan ew digirtin û dibirin. Tu xeber ji wan dernediket. Kesî nizanîbû bê çi hatiye serê wan; kê ew kuştine. Lê gişan dizanîbû ko ev zilam hemû, ji ber eynî tiştî têne kuştin.

Niha, ew jî yek ji wan kesan bû ko ber bi rêya mirinê ve diçûn. Gelo ew jî ketibûn vê rewşê? Çavên wan jî hatibûn girêdan? Destên wan jî ji paşiyê ve hatibûn kelepçekirin? Ew jî mîna wî li kesên berî xwe fikirîbûn? Gelo ew jî bi qasî wî weha tirsiyabûn?

Serpêhatiyên li ser kuştina wan kesan dihatin gotin, yek bi yek hatin bîra wî. Digel ko wî tu carî tiştekî weha nedîtibû û lê nefikirîbû jî mîna ko ew zilam li ber çavên wî hatibin kuştin, giş hatin bîra wî. Tirsiya. Pir tirsiya. Nedixwast bifikire, lê qedera wî û ya wan kesên ko bi vî rengî hatibûn kuştin, ber bi hev ve diçû. Wê çaxê, wech pê re nema. Êdî nema dikarîbû li tiştekî bifikiriya. Ji tirsan, bûbû sipiya firkandî.

Xwast ko bigirî. Xwezî aniha rabûya û bidîtaya ko ev tişt giş xewn in. Nedixwast bawer bike, lê ev tiştên ko bi serê wî de hatibûn, tev de rast bûn.

Leza teqsiyê hêdî hêdî kêm bû û sekinî. Zilamê ko ji paş situyê wî ve ew zevt kiribû, tiliyên xwe sist kirin û ew rakir. Robînê çavgirtî ko dixwast di bin reşahiya wî paçikî re ber xwe bibîne, lê ev hewildana wî jî bi kêrî dîtinê nedihat, bi dengê zilamê ko çavê wî girê dabûn li xwe zivirî.

— Tu çixarê dikşînî?

Zilêm pakêta xwe dirêjî wî kiribû. Robîn bi vêya dizanîbû. Lê belê, wî bersiv nedayê. Zilêm jî guh nedayê û dîsa pakêta xwe xist bêrîka xwe.

— Tu dizanî bê me ji bo çi tu aniyî, ne weha?

Robîn dîsa nepeyivî. Zilêm çixareya xwe pêxist û gulpek jê kişand.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Bêhna çixareya wî çû Robîn jî.

— Belê, Robîn. Heke tu ê weha bikî, em ê vî karî qet nekin û te li vira daxin jêrê.

Zilêm bi navê wî bangî wî kiribû. Heke weha be, bi hertiştên wî dizanîbû. Belkî bi rastî jî xewn be. Belkî yek ji wan kabûsên wî be jî. Lê, le ko ne weha be; le ko bi rastî jî aniha di nav du zilamên ko niha tu kesî nikarîbû bi qasî wan tirs bera dilê mirov bidaya û li benda mirinê rûniştibe.

Bêtir tirsiya. Êdî, wan ê ew bikuştaya. Hayê wan ji tirsa ko niha Robîn tê de bû hebû. Ji xwe, ew jî ji xwe re li yekî mîna Robîn digeriyan ko kêfa xwe pê bînin.

— Tu ê bipeyivî, ne weha, Robîn?

Dîsa eynî zilamî pirsîbû. Ji dengê wî xuya bû ko bi xwe bawer bû. Hertişt di dest wî de bû. Û ji awayê peyva wî jî mirov dikarîbû têbigihiştaya ko dikin xezebekê bînin serê wî. Lê mirov digot qey heke Robîn bi wan re bipeyive, belkî tiştekî bi wî nekin. Ji ber ko gava mirov di vê rewşê de be, mirov ewqasî qels dibe ko carinan ji ber vê qelsbûnê, dikare baweriyê bi dijminê xwe jî bîne. Ji ber ko tu hêviya mirov namîne... Ji ber ko ditirse...

Robîn jî ditirsiya. Pir ditirsiya. Ditirsiya ko ev zilamên ko kî dizane bê bûne qesasên çend kesên din jî wî daxin jêrê û wî bidin ber guleyan û meytê wî li vê çolê bihêlin. Li xwe fikirî. Di nav wê seqemê de, çavgirtî, dest ji paşiyê ve kelepçekirî û mirî… Dîsa fikirî. Ew ê bibûya termek. Çare tune bû. Li gora ko ji mezinan bihîstibû, nan û ava wî dê bi vî awayî ji vê dinyayê hilataya. Fikirên wî ew bêtir tirsand.

Tevzînokên cemidî bi pişta wî û cênîkên wî ketin.

Robîn nedipeyivî. Di ber xwe de dida.

— Baş e. Îja, yanî tu ji me re nabêjî bê ka tu ji bo çi hatiyî Diyarbekirê, ne weha?

Robîn dîsa tiştek negot. Mîna ko tiştek ji devê wî fahm nekiribe. Lê Robîn digot qey aniha, yek ji van zilaman dê bibêje peleq û derbekê li ser çavê wî bixe.

Dengê şeq şeqekê hatê. Veciniqî, lê xwe zû da ser hev. Yekî cercûr dixist devançeya xwe. Robîn ev deng pir baş nas dikir. Bes rojekê yekî jê re gotibû ko gava ev mirovan dibin, ji bo ko wan bitirsinîn çi li ser navê kuştinê hebe, dikin; lê wî nakujin. Ev peyveke xweş bû û dilê mirov rehet dikir. Lê dîsa jî baweriya mirov hercar bi peyvên weha nayê. Ji ber ko heta

niha, meytên gelek kesên ko bi vî awayî hatibûn kuştin, piştî çend rojan li ser riyên derveyî bajêr hatibûn dîtin.

Dengekî din hat wî ko ji yê bîstika din bêtir tirs xist dilê wî. Şerqîniyeke din hatê. Careke din jî veciniîqî. Yekî fîşek diajot ber devê devançeya xwe. Ew peyva bîstika din ko digot; mirovan ditirsînin, dîsa hat bîra wî; lê êdî mîna wî beranî, baş bawer kiribû ko ew ê bê kuştin. Laşê wî bi temamî diricifî.

Zilaman her rê diceribandin. Wan jî dizanîbû ko êdî Robîn tirsiyaye. Zilamê bîstika din, dîsa bi awayekî bixwebawer û mîna ko henekên xwe pê dike, pirsî:

— Tu ê bersivê bidî me, yan em te daxin, Robîn?

Yê din, yê esmer peyivî vê carê:

— Na lo, ev napeyive. Tu belasebeb serê xwe pê re diêşînî. Em wî daxin û bikujin. Ma ji bo çi em ewqasî li ber digerin? Xuya ye, ev pir qure ye. Em wî jî mîna yê din bikin.

Yê din?! Ev kî bû gelo?

Meraqek ket dilê wî. Ev çend roj bûn ko rojname jî nexwendibû. Heke xwendibûya, wî ê bizanîbûya bê ev derew e, an na. Lê îhtimaleke mezin hebû ko dîsa ji bo wî bitirsînin weha dipeyivîn. Dîsa jî guman ket dilê wî. Le ko bi rastî jî yekî din hebe? Tavilê Bişar hat bîra wî. Veciniqî.

Zilamê din got:

— Na na. Robîn ê bipeyive. Tu wê silehê deyne, hela. Hê wexta wê nehatiye.

Gava ko navê silehê ji devê wî derketibû, dengê xwe hebekî bilind kiribû. Dû re, li Robîn zivirî û dengê xwe dîsa guhert, bi awayê xwe yê bîstika din, got:

— Tu ê me mecbûrî kuştina xwe nekî, ne weha Robîn? Binere, tu dişibî kesekî xwende. Ez naxwazim tu ji ber tiştekî belasebeb bê kuştin. Tiştê ko em ji te dipirsin, ne tiştekî zor e. Bi tenê ji me re bibêje bê tu ji bo çi hatiye vira?

Ma gelo vî zilamî bi rastî jî başiya wî dixwast? Le zilamê din? Wî çima dixwast hema zû bi zû wî bikuje. Gelo bi rastî jî dixwast wî bitirsînin?

Li benda wî sekinîbûn. Lê, Robîn nedipeyivî. Serê wî di ber wî de bû.

Piştî ko hebekî din jî sekinîn, zilamê din dîsa bi gazind ji hevalê xwe re got:

— De dev jê berde, lo! Ka tu wî ji min re bihêle, hela.

Vê carê, deng ji yê din derneket. Deriyê aliyê rastê vebû û zilamê ko

sileha xwe xistibû destê xwe daket. Bi vekirina derî re, bayekî cemidî hat hundir. Robîn vê carê, ji hercar bêtir tirsiya. Zilamê ko daketibû, xwe dirêjî wî kir û ew ji nişka ve kişand derve. Serê wî li derî ket. Li ber derî ket erdê. Xwast ko destê xwe bigihîne serê xwe; lê, lê hay bû ko destê wî ji paşiyê de kelepçekirî ne. Cihê ko li derî ketibû, pir êşiyabû. Tiştekî germ ji eniya wî herikî ser çavên wî. Li erdê ma. Zilêm bi qirika wî girt û ew ji erdê rakir û di pey xwe re kişand, bir pêşiya teqsiyê.

Wexta mirinê hatibû. Ji niha de, dihat ber çavên wî. Zilêm ew da rûniştkirin û devançeya xwe xist paş situyê wî.

Mejiyê wî sekinîbû. Hew dikarîbû bifikiriya. Xwezî aniha, hin mirov di rê re derbas bibûna, yan jî hinan bihataya û ew xelas bikiraya.

Teqsî şixulî. Dengê motora wê di ber guhê Robîn de bû. Mekîne nedimeşiya, lê şifêr hey pê li xazê dikir. Dikira şanzûmana wê biteqiya û perçe perçe bibûya.

Zilêm dîsa bi situyê wî girt û devançe di paş situyê wî de eciqand.

Qêriya:

— Tu ê bipeyivî, an na? Ha? Tu ê bipeyivî?

Mirov ji dengê wî ditirsiya. Sileha xwe jî di canê wî de radikir.

Robîn bûbû mîna pepûkekî. Deng jê dernediket. Diricifî. Him ji tirsan, him jî ji ber bayê cemidî. Bûbû beranê li ber kêran. Çav girtî. Dest li paş kelepçekirî.

Zilam diqêriya:

— Tu ê bipeyivî, ûlen? Bibêje! Bibêjeeeeee...!

Şifêrê teqsiyê hey pê li xazê dikir. Zilam diqêriya. Bayê cemidî dihat. Canê wî pûç bûbû. Diricifî.

— Bipeyive, ûlen! Bipeyiveeeeee...!

Di nav wê tevliheviyê de, dengê teqînekê hat, li der û dorê olan da û tev li dengê bê bû.

Dilê Robîn dikira bisekiniya. Got qey gule bera serê wî daye.

Zilam dîsa qêriya:

— Heke tu nepeyivî, ez ê ya duyem bera serê te bidim! Bipeyive!

Dengê deriyê teqsiyê hat. Yek bi bazdan hat û bi zilamê din girt.

— Dev jê berde! Temam! Bes e, êdî!

— Min berde! Min berde, ez ê wî bikujim! Ez ê bikutim diya wî eynî!

Zilamê din ew dehf da.

— Bisekine, hela. Belkî lawik bipeyive.

Yê din hê sixêf dikir. Pir hêrs bûbû. Zilamê ko vê dawiyê hatibû, bi ser

Robîn de daqul bû.

Robîn digiriya. Diricifî. Paçikê li ber çavên wî, ji xwîna ko ji eniya wî diherikî û hêsiran şil bûbû.

Zilêm ew rakir û paçik vekir. Bi wî paçikî xwîna eniya wî paqij kir.

— Ka were hundirê mekîneyê. Tu cemidiyî.

Ew xist hundirê mekîneyê û li kêleka wî rûnişt. Yê din jî kete hundir û derî girt. Lê, berê xwe neda aliyê wan. Di pencereyê re li derve diniherî. Xwe da benda wan.

Robîn di umrê xwe de, tu carî ewqasî netirsiyabû. Belkî vê bûyera ha bikira ko dîn jî bibe. Li tiştekî weha nefikirîbû. Heke di serî de, bizanîbûya ko ew ê ewqasî bitirse, belkî wî ew qet neşitexilandana û bersiva pirsên wan bidaya jî.

Zilêm got:

— Min nedixwast tu têkevî vê rewşê, Robîn. Lê hevalê min wezîfa xwe dike.

Sekinî. Destê xwe li milê şifêr xist. Mekîne zivirî û da ser riya ko tê re hatibû.

Robîn dîsa tiştek negotibû. Piştî ko demeke dirêj giriya, bêhna wî hat ber. Serî di ber de, pirsî. Ji ber ko fedî dikir li ruyê zilêm biniheriya. Nedixwast kes bibîne ko digirî. Dijminê wî be jî...

— Hûn çi ji min dixwazin? Ma min çi kiriye?

Bêhna zilêm jî hatibû ber. Kêfa wî hatibû. Bi ser ketibûn. Robîn peyivîbû.

— Te tiştek nekiriye, Robîn. Em dixwazin hîn bibin bê ka tu ji bo çi hatiyî vira?

— Ma qey qedexe ye ko mirov vegere warê xwe?

Demekê kes nepeyivî ji wan. Robîn di ber xwe de diponijî. Belkî poşman bûbû ko hatibû vira, belkî jî ji ber ko li îhtîmala pêkhatina bûyerin weha nefikirîbû û biryara hatinê dabû, niha ewqasî li ber diket. Lê, tiştek bi tenê di ruyê wî de xuya dibû: Tirs... Tirseke weha bû ko mirov dikarîbû ji ber wê lal jî bibûya, velîstaya jî. Hema bimiraya, ji wî re çêtir bû.

Zilamê ko ew ji mirinê xelas kiribû, yan jî wî digot qey weha bû, destekî xwe da ser milê wî û mîna ko bi hevalekî xwe re bipeyive û bixwaze rêyeke baş bi ber wî bixe, şîreteke başiyê li wî bike, bi dengekî nerm ko mirov nikarîbû şikê ji samîmiyeta wî bike, got:

— Bala xwe bide min, Robîn. Heke em bihêlin tu li vira bimînî, nabe.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ev der ne li gora te ye. Baş bifikire.

Got:

— Ma mirov dikare li bajarekî mîna Diyarbekirê çi bike? Here Robîn, here. Ji te re du roj muhlet. Vegere, here Stenbolê. Kesekî te li vira nîne. Ez ji bo te dibêjim. Serê xwe nexe belayê û here.

Bi dû re jî got:

— Du roj bi şûn de, heke em te bibînin... vê carê ez nikarim ji bo te tiştekî bikim.

Ketin nava bajêr. Serê Robîn di ber wî de bû. Teqsî ket ser riya sûkê. Lê berî ko têkeve nav sûkê, sekinî. Deriyê aliyê rastê vebû û zilamê ko dixwast wî bikuje daket. Piştî ko Robîn daket, dîsa siwar bû û teqsiyê berê xwe da aliyê sûkê.

Robîn weke mirovê ko nû ji şikenceyê derketibe, situxwar, bê hal, westiyayî... Tiştê ko hatibû serê wî, ji xwe şikenceya herî mezin bû. Serê wî hingî diêşiya, dikira biteqiya. Ruyê wî zer bûbû. Biniya çavên wî reş bûbû. Eniya wî ya ko li deriyê teqsiyê ketibû şîn bûbû û diêşiya. Çongên wî sist bûbûn. Nikarîbû bimeşiya. Hema li kêleka riyê, li ser kevirekî rûnişt. Çavên xwe bi tirs li dora xwe gerandin. Digot qey hê jî hin li pey wî hene û dikin werin xwe biavêjin ser wî. Hê jî diricifî...

Nizanîbû bê çi qasî li wira rûnişt. Gava serê xwe rakir û bi awirên vala, li dora niherî, dinya tarî bûbû. Bayekî cemidî û xurt dihat. Mirov nikarîbû li ber wî bayî, xwe li ser lingan zevt bikira û bimeşiya. Mîna kêreke tûj bû. Mîna gwîzanekî... Sermayê hêsir ji çavên mirovan dianîn. Seqemeke dijwar, seqema berfê.

Li kolanan, ji çend kesên ji bo ko xwe bigihînin derinan bi lez dimeşiyan û otobus û minîbusên heta ber dev tije pê ve, tişt tune bû. Însan giş ber bi malan ve direviyan. Bîstikeke din, ew ê tu kes li derve nemaya. Ji ber ko tariya bêdeng li kolanan kone xwe vedigirt û der û dor dikir hêsîrê xwe. Cihê ko ew lê bûya, însan û deng û hêvî nedibû. Li Diyarbekirê, dîsa bûbû êvar.

Wî ê ev bûyer tu carî ji bîr nekiraya. Ma çend mirov dikare tiştekî weha bijî? Ki bîra ko mirov ji mirinê vegere. Ji kuştinê. Gava sileh di serê mirov de be, mirov dikare li çi bifikire? Û tew çavên mirov girtî bin… Le gava wê fîşeka ko berê xwe dabe mejiyê mirov, li dereke din biteqe? Gava dilê mirov ji tirsa wê gavê bisekine? Ma mirov dikare li çi bifikire? Dê û bav? Xwişk û bira? Hezkirî? Heval?

Di nav hestên tevlihev de, serî di ber de, dest di bêrîkê de, di êvara ko

mirov li xwekuştinê difikirand de, li kolaneke Diyarbekir ya vit î vala...

Aniha, ger yekî an jî yeka nas derketaya, aniha mirov li ruyekî nas rast bihata… Mirov beyî ko li piçûkketinê û fediya wê bifikire, xwe biavêtaya situyê wî kesê an jî kesa nas û têra xwe bigiriya. Aniha, Nûşîn ji serê kolanekê derketaya. Hemdîn derketaya. Şêxo derketaya... Seydo derketaya...

Der û dor reş û tarî bûbû. Kes li derve xuya nedibû. Lempeyên avahiyên doraliyê, tevde vêketibûn. Ji vê saetê û pê ve, êdî jiyan ketibû hundirê xaniyan. Li derve, hew tirs mabû û bayê kur.

Gava ko dimeşiya, dît ko ji dûranê ronahiya tiştekî xuya dibe. Beyî ko guh bidiyê di qoziya çavan re li wî aliyî niherî. Şewqek ber bi çavên wî ket. Sekinî. Zilamekî kal î rîhspî, di nav kincin ecêb de, gopalê wî di dest de, lê beyî alîkariya wî gopalî, ber bi wî ve hêdî hêdî dimeşiya. Gava hat nêzîka wî, sekinî. Robîn jî serê xwe rakir û li wî niherî. Xwe negirt. Giriya. Ji bo ko zilam bi giriyê wî nehise, pişta xwe da wî.

Zilamê kal bi gavên giran hat, fitilî û li hember wî sekinî. Destê xwe da ser milê wî. Robîn xwe avêt himbêza wî. Zilêm bi destê xwe ew bi ser sînga xwe ve eciqand û pişta wî mist da. Dîsa bi wî dengê xwe yê nerm ko dilê mirov mist dida û mirov digot qey terbiyeyeke baş stendibû, got:

— Bigirî, Robîn. Bigirî...

Robîn digiriya. Serê xwe danîbû ser milê zilamê kal û digiriya.

Gava ko yek bigirî, divê mirov bihêle, bila bigirî. Ji ber ko girî dilê mirov rehet dikir, hemû kerbên mirov û hêrsa wî vala dikir. Girî jî carinan hewce bû. Pêwîstiyek bû. Zilamê kal ev dizanîbû. Ji ber wê digot:

— Bigirî, Robîn. Bigirî. Dilê xwe rehet bike...

## 7. Piştî ewqas salan dîsa...

»û li vî bajarî dibûn du bask çavên te
bi wan re min xwe li ezmanên xeyalan dixist...«

Xeweke mirov naxwaze jê şiyar bibe. Xewneke şêrîn.

Bihar e, Newroz hatiye. Li Diyarbekira xopan rojeke xweş. Dengê def û zirnê tê. Dengê deh defan û deh zirneyan... Li meydaneke fireh, di nav qelebalixiyeke mezin de, agirekî gûr hatibû dadan ko mirov dikare tê de hemû heyecana dilê wan kesên li dora wî direqisin bibîne...

Dawiya qelebalixiyê nedihat dîtin. Hê jî ji der û dorê, ji kuçe û kolanan


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

mirov dihatin. Tu axê biavêjî li erdê nakeve. Dêyê weledê xwe avêtiye. Ger tu hevalekî xwe wenda bikî, tu ê hew bikaribî wî bibînî.

Meydan mişt însan. Yek ji wan naşibe yekî din. Esmer, gewr, zer, boz, kej; dirêj, kin, zeîf, qelew; bedew, nebedew; zarok, ciwan, navsere, kal û pîr; pîrek, zilam, keç, xort... Belkî her yek bi devokekî dipeyivî, lê hemû bi zimanekî. Belkî her yek ji deverekê hatibû, lê hemû bi hesretekê. Belkî di dilê her yekî de agirek hatibû dadan, lê agirê gişan ji wan re eynî tişt digot. Gişan bi hev re eynî tişt dikir. Gişan ji bo eynî tiştî xwe li wî agirî girtibû.

Mîna hev direqisîn, mîna hev distiran, mîna hev baz dida. Mîna hev xwê dida û kêf dikir. Bi wê bazdana li dora êgir, bi wan stranên ko hestên wan radikirin ser piyan, bi dengê def û zirneyan ko tevî dengê stranên wan dibû, giş ji ser hişê xwe ve çûbûn.

Xwe ji bîr dikir. Her yek dibû însanekî din. Giş dibûn însanek. Giş dibûn yek. Tu bibêjî şer, na; tu bibêjî dijminatî, ew jî na. Û bêhna dilxerabiyê jî nedihat ji wan awiran.

Roja cejnê bû. Newroz bû. Roja şahî û dîlanê bû. Roja biratî, hevaltî û evîndariyê bû. Roja azadiyê bû. Niha gişan ji eynî tiştî hez dikir, gişan eynî tişt dixwast.

Li dora wî agirê mezin, govendeke mezin dihat gerandin. Dest di dest de, mil bi mil, govendeke mezin, ne serî hebû û ne jî binî. Giş bi hev re. Serên xwe kil dikirin û direqisîn. Tu bibêjî westan, tu bibêjî rawestan. Na. Yek jî nedihat bîra wan. Bi dilê gişan bû.

Robîn jî di wê govêndê de bû. Serî jî dikişand tew. Kesî nikarîbû mîna wî bireqisiya. Tew gava ko Şêxo û Hemdîn û Selman jî di milê wî de bûna... Nûşîn di milê wî de bûya... Serxweş bûbû û çûbû. Xwêdanê di pişta wî re avêtibû. Çawa xwe kil dikir...

Robîn nizanîbû. Gelo ev xewn bû, an rastî bû?

Wî carinan weha xewn û rastî ji hev dernedixistin. Tew heke xewneke weha xweş be. Piştî ewqas salan… Piştî ewqas salan dîsa. Ew û Şêxo û Hemdîn û Selman. Çar heval. Çar bira. Çar destbirakê mirinê. Û Nûşîn. Hezkiriya delal, narîn û devliken...

Robîn piştî bîstikekê destmala destê xwe dabû Şêxo û derketibû ortê. Niha, li dora defê milên xwe kil dikirin û direqisî. Xwe bi dengê defê re radikir û li erdê dixist. Herkesî li wî diniherî. Piştî bîstikekê, Şêxo destmala xwe da Selman û ew jî derket hemberî wî.

Bi def û zirnê re li pey hevdu çûn û hatin. Milên xwe kil dikirin, destên

xwe radikirin, xwe xwar dikir û di ber hev re dibihurîn. Bi dû re, dîsa dihatin. Dîsa xwe kil dikir, destên xwe radikirin û ber bi hev ve dihatin. Bi lêdana defê re destên xwe li hev dixistin. Dîsa li hev dixistin û dîsa... Gişan ji wan re li çepikan dixist. Gişan li wan temaşe dikir.

Nedixwast bawer bike, lê wî jî texmîn dikir ko ev tiştên hemberî wî giş xewn bûn. Hişê wî tev li hev bûbû. Dizanîbû ko ew ê ev xewn di cihekî de biqede. Belkî ew bi tenê li vêya difikirî. Ji ber wê, hey li çavên hevalên xwe diniherî. Gava direqisî, li Nûşînê diniherî. Nûşîn dikeniya. Destê xwe jê re kil dikir. Nûşîn bi wî halî, ji her demê xweşiktir dibû...

Gava ew di xew de bû, rojeke nû dest pê kiribû. Bi paltoyê wî ser wî hatibû nixumandin. Qerisîbû. Gava bi xwe hisiya, nizanîbû bê ji kengî de di xew de bû. Çavên xwe vekirin û li dora xwe niherî. Berê, çav li agirê gûr ket ko li hember wî hatibû dadan. Got qey hê di xew de ye, lê ji xeynî êgir û dîwarên ko bi şewqa wî rohnî dibûn pê ve, tu tişt xuya nedibû.

Wê gavê, fahm kir ko ew govend û ew şahî giş xewn bûn. Lê dengê def û zirnê hê di guhê wî de bû. Ruyê hevalên wî û ruyê Nûşînê hê li ber çavên wî bû. Wî ê tu carî ev xewn jî ji bîr nekiraya. Tew gava ko piştî wê bûyera rojeke berê hatibû serê wî ev xewn dîtibû, dilê wî hebekî rehet bûbû. Baweriya wî bi wî hatibû. Çendekî ji tesîra wê bûyerê xelas bûbû. Kêfa wî hatibû, lê nîvcomayina wê xewnê hin kulên dilê wî jî tev rakiribûn. Ya herî girîng jî ew bû ko ji nû ve bêriya Nûşînê kiribû.

Dora xwe nas nekir. Ji bo ko hebekî germ bibe milên xwe mist dan. Nizanîbû bê li kû ye, bes ji dîwaran têgihiştibû ko di şikeftekê de ye. Kê ew anîbû vê dera? Çawa hatibû?

Bi tirs li dora xwe diniherî. Kes tune bû. Fikirî. Do bi şev anî bîra xwe. Qey zilamê kal ew anîbû vê derê. Ji xwe, ji wî pê ve li tu kesî din rast nehatibû. Û ji xweber jî nikarîbû bihata vê derê.

Hundir tarî bû, lê ji dawiya neqeba pêşiya wî şewqeke din xuya dibû. Xuya bû ko şewqa rojê bû. Rabû ser xwe, rahişt paltoyê xwe û ber bi wê ronahiyê ve meşiya. Derket derve.

Gava derket derve, hê nû dora xwe nas kir. Li ser bircan bû. Xweşiya der û dorê, şînahiya ezmên, rêyên ko ber bi nava bajêr ve diherin…

Belê, zilamê kal ew anîbû ser bircan. Xwe ewle his kir. Bêhna xwe kişand heta nava dilê xwe û sekinî. Dilê wî şa bû. Ji ber ko ev devera ha mala wî bû. Hêlîna wî ya zaroktiyê bû.

Ro dihate nîvro. Dinya sar bû, lê ne mîna şeva çû bû. Paltoyê xwe li xwe kir. Ber xwe girt. Di pêlikan re daket û ber bi qehwexaneya wî aliyê riyê

 E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

ve meşiya.

Berê xwe da kaniya hewşê. Kanî vekir bîstikekê lê temaşe kir. Aveke zelal, paqij, xweş... Bi wê ava weke qeşayê dest û ruyê xwe şuştin, destên xwe dan ber avê û hinek jê vexwar. Rehet bû, bi wê avê re bêhna wî fireh bû. Destmalek ji bêrîka xwe derxist û dest û ruyê xwe zuha kirin û derket. Ket riyê û beyî ko ew jî sedema wê bizanibe, ber bi sûkê ve meşiya.

Gava hat nêzîkî sûkê û çav li qelebalixiya kolanan ket, ji nişka ve bêdengî û valahiya wan a şeva çû hat bîrê. Nakokiya herî mezin ko jiyana kesên vî bajarî dikir du perçe jî ev bû ji xwe. Bi roj, mirov digot qey li dereke din dijîn, êvaran jî li dereke din. Şev û rojên vî bajarî ne dişibiyan hevdu. Êvar dibû gurek û bi ser bajêr de dihat. Lê gava ko ro derdiket, wî gurî xwe dida alî.

Gava ko dibû êvar, mirov digot qey dawî lê nayê. Hingî dirêj bû, derbas nedibû. Le roj? Roj kin bû. Mirov nizanîbû bê çawa derbas dibû. Bi êvarê re, ji bo ko mirov xwe ji xezeba gurî biparêzin, li starekê digeriyan. Û bi şev gurê har dîsa dadiket bajêr...

Erebeyeke dewaran hat û di ber wî re bihurî. Li aliyê din yê riyê çend pîrekên bikitan, li ser tebleya ko fêkî li ser bûn, bi zilamekî re bazar dikir. Li ber deriyê qahwexaneya ji wan hebekî bi wê de, digel ko dinya sar bû jî zilamekî ji xwe re kursiyek danîbû, pişta xwe dabû dîwêr û rûniştibû. Mînîbusên ko ji gundan dihatin, niha ji bo vegerê rêwiyên xwe didan ser hev.

Di ber postaxaneya mezin re bihurî. Gelek kes li hewşa wê, li ber qulubeyên telefonan sekinîbûn. Berê xwe da aliyê ko piraniya mekîneyan berê xwe dabûyê. Xuya bû ko esil jiyan li wira bû. Ji ber ko dengê stranan ji wî aliyî dihat. Hema mirov serê xwe rakira û li dora xwe biniheriya, bes bû. Ji her dikanekê, dengê dengbêjekî…

Beyî ko bala xwe bidiyê, ji ber lûnaparkê derbas bû. Ji piçûkaniya xwe de ji tişt miştên weha hez nedikir ji xwe. Carinan, gava qereçiyên Riha û Edenê dihat û konê fûarê vedigirt, bi tenê ji bo ko bi qûmarên piçûk bilîzin û li keçikan biniherin, ew û Şêxo diçûnê; lê tu carî kêfa wî ji lûnaparkan re nehatibû.

Gava di ber pirtûkfiroşekî re bihurî, gavekê sekinî û li pirtûkên wîtrînê niherî. Berê ji bilî du-sê heban, pirtûkfiroş tune bûn li vî bajarî, lê piştî ko rewşa welêt jî hebekî hatibû guhertin, hejmara pirtûkfiroşan jî zêde bûbû. Di vêya de qey rola xwendekarên zanîngehê jî hebû. Ji ber ko wan ji her kesî bêhtir dixwend û çi gava ko Robîn ew bidîtana bi misogerî

pirtûk di destên wan de hebû. Vêya dikir ko gelek kes jî ji wan fêrî xwendinê û pirtûkan bibin.

Gava li van tiştan difikirî, lê hay bû ko ji zû de bi rehetî rûneniştiye û tiştek nexwendiye. Berê, ji bo wî, roja ko bê xwendin derbas bibûya belasebeb hatibû jiyîn dihat hesibandin. Ji nişka ve bêriya xwendinê kir û bi wê re jî bêriya pirtûkxaneya xwe û mala xwe...

Kolanên Diyarbekirê, bi roj, dinya çawa be jî heta êvarî vala nedibûn. Ji ber ko ji êvar de xwe dida bende rojê. Yên ko karên wan tuna bûn jî hema derdiketin û ji xwe re li derve digeriyan.

Yên ko guh nedida seqemê û hêdî hêdî dimeşiyan û ji xwe re li dora xwe temaşe dikir. Yên ko li ser lingan sekinîbûn û bi hev re dipeyivîn, yên ko bi lez ber bi derinan ve diçûn, qelebalixiya zarokên ko ji dibistanan derdiketin, yên ko ji ser tebleyan tişt mişt dikirîn, yên ko ji dikanan derdiketin; dengên wan, dengê der û dorê, yên mekîneyan, yên çivîkan, yê bê... Dengê jînê... Mirov ancax di demên weha de dikarîbû ji vî bajarî hez bikiraya...

Dest di bêrîkê de, ji bo ko xwe ji sermê biparêze serî di ber de û dimeşiya. Di ber bireke mirov re bihurî. Wê gavê, ji nav wan mirovan, keçikek ji nişka ve veciniqî. Heta ko ew derbas bû jî di şûna xwe de mat ma û li wî niherî.

Esmer bû. Bejindirêj û çavreş bû. Şaş bûbû û di pey wî re diniherî. Gava hevalekî wê li rewşa wê hay bû, bi destê xwe ew hejand.

— Nûşîn! Nûşîn, te xêr e?

Nûşîn mîna ko ji ser hişê ve çûbû, bê deng mabû. Dengê wî nedibihîst. Ew mirovên din jî li wî aliyê ko wê lê diniherî, zivirîn. Lê wan tiştek nedît.

— Nûşîn! Nûşîn, çi bû?

Nûşîn ji nişka ve hat ser hişê xwe. Ruyê wê zer bûbû. Devê wê nedigeriya. Diricifî. Dîsa wan ew niqurçand.

— Çi bû, Nûşîn?

Nûşîn li hundirê çavên wan diniherî. Devê wê bi zorê digeriya.

— Ro... Robîn. Ew Robîn bû.

Gişan bi hev re got:

— Robîn?

Nûşînê berê xwe da aliyê ko Robîn diçûyê û meşiya. Hevalên wê jî da dû wê. Bi zorê xwe gihandê û ew zevt kir.

— Tu çi dibêjî, Nûşîn? Robînê çi?

Nûşînê xwe ji nav lepên wan xelas kir û dîsa meşiya. Mîna ko baz dida.



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Çavên wê hey li wî kesî bû ko di pêşiya wê de dimeşiya. Gava ko bi lez dimeşiya, li bin guhê çend kesan jî ketibû. Xwe gihand Robîn. Gavên xwe sist kirin.

Nizanîbû, dê çi bikiraya. Xwast ko bangî wî bike, lê fedî kir. Le ko ne ew bûya? Wê çaxê, ew ê têketaya ber fediyeke mezin. Ji ber ko çend carên din jî weha hin kes şibandibûn Robîn û dabû pey wan. Gava ew kes li wê dizivirîn û digot »çi bû, xwişka min«, û lê hay dibû ko ne Robîn e, ji fediya, serê xwe bera ber xwe dida û vedigeriya. Lê vê carê, ji hercar bêtir bawer kiribû ko ew bû.

— Robîn!

Ji zû de bû ko wê bi vî navî bangî kesî nekiribû. Ji ber vê yekê, ev nav hebekî fediyokî derketibû ji devê wê.

Dîsa bang kir:

— Robîn!

Robîn di serî de gotibû qey xelet bihîstiye, lê vê carê, wî ev deng nas kiribû. Di cih de sekinîbû û li dû xwe zivirîbû.

— Nûşîn!

Gava di nav qelebalixiya însanên ko di nav wan re diçûn û dihatin re ew dît, mîna ko ne bi wê re, lê bi kerbên xwe re rû be rû bûbe, bi heyecana dîtina wê re xemekê jî xwe li dilê wî girt.

— Nûşîn...

Ziq li çavên wê diniherî. Nûşîn jî sekinîbû. Xewn e, gelo? Na... Ne mimkun e ko xewn be. Dengê wê bihîstibû. Li hember wî sekinîbû û li wî diniherî.

Belê. Nûşîn bû, ev. Ne xewn bû. Dîsa li hember wî sekinîbû û li wî diniherî. Belê, ne bi qasî Nûşîna di xewnên wî de bedew bû û nedibişirî vê carê. Lê çima? Çima niha? Piştî ewqas salan, piştî ewqas neheqiyan. Çima? Ma qey nizanîbû ko niha ne Robînê berê ye? Ma qey nizanîbû ko bûye nîvzilam, terka hertiştî, terka jiyanê kiriye? Ma qey wê roja dawîn ko li hember hev rûniştibûn û Nûşînê bi awayekî ko dilê wê bi wî bişewite lê niherîbû, ji bîr kiribû? Mîna ko bi yekî biyanî re bipeyive, gotibû »bes e êdî, ez hew dikarim...«

Giş yek bi yek hatin ber çavên wî. Nûşîna wî bû, gula ber dilê wî bû. Wê gavê dikarîbû ji bo wê mêr jî bikuştana. Lê niha giş li dû mane û bûne dîmenên demsaleke kevin êdî.

Xwast ko bigirî dîsa. Ji xwe çavên wî li hemanan bûn. Ev keçika ko Robîn ewqas sal ew di xewn û xeyalên xwe de jiyandibû, ev keçika ko yek

ji wan sedemên ketina wî ya vî halî... Lê niha, li hember wî sekinîbû. Mîna ko li ber bigere, fediyokî, nizanîbû yê hember dê çi bike, lê diniherî. Çav melûl. Çav liberketî. Çav li hêviya işaretekê. Bûbûn mîna du çemên ko dike di ser re here.

Di nav wê çûyin û hatina însanan re, li orta riyê sekinîbûn û li hevdu diniherîn. Çend kesên ko li wan hay bûbûn, hebekî dûrî wan sekinîbûn û li wan temaşe dikir. Hevalên Nûşînê jî xwe gihandibûnê û gava dîtibû ko bi rastî jî ev ew Robînê ko wan bi tenê di wêneyan de ew nas dikir bû, ew jî mat mabûn û sekinîbûn.

Ruyê wî li gora wêneyên ko Nûşînê rê wan dabûn, hebekî hatibû guhertin, niherînên wî kûrtir bûbûn, rîha wî dirêj bûbû, porê wî bela wela bû û di eniya wî de jî dewsa derbeke ko xuya ye di demeke nêzîk de lê ketiye hebû. Lê dîsa jî dihat naskirin. Dilê wan bi wî şewitî.

Însan di nav wan re diçûn û dihatin. Nûşîn li benda wî bû. Lê, wî tiştekî ko dilê wê xweş bike, nekir. Wî jî nizanîbû çima, lê lêva xwe gez kir, serê xwe bi kerb kil kir, berê xwe jê guhert û meşiya. Ket nav wê qelebalixiyê û çû. Mîna ko ew wê nas nake. Mîna ko tu carî ew nas nekiribe. Lê mîna ko xencereke zingarî di dilê wî de cit bûbe, an jî sînga wî hatibe daxkirin.

Nûşîn li ser çongan xwarî erdê bû. Giriya. Hutikên xwe li erdê dixistin. Carê jî serê xwe radikir, bi çavên xwe yên sorbûyî ko hêsir ji wan dibariyan li wî diniherî û diqêriya:

— Robîîîîn...

Dengê wê digihişt heta guhê Robîn û dikir ko guhê wî biteqe. Dengê wê di guhê wî de olan dida. Lê carekê jî li dû xwe nezivirî û lê neniherî. Serê xwe bera ber xwe dabû. Her gava ko Nûşîn careke din diqêriya, hêsirekî din jî bi hemû germahiya xwe, ji çavên wî diherikî ser hinarikên wî û xwe bera xwarê dida.

Bi dû re wî ê ji xwe re bigotaya:

— Ez nizanim bê çima ez neçûm û min xwe neavêt situyê wê. Ma ne ez her li benda wê rojê bûm ko careke din jî ez bi van çavan wê bibînim. Ma ne min her bêriya wê kiribû û min xewnên wê didîtin.

Wî ê bigotaya:

— Lê gava ko min ew dît û ez çav li wê niherîna wê ya ko li ber min digeriya ketim, ew niherîna wê ya dawîn ko her gava dihat bîra min, min dixwast ko ez xwe bikujim jî hat bîra min. Ew ne ew bû. Te dît carinan, dilê mirov bi hinan dişewite û mirov dike ji bo wan tiştekî bike, ê min jî


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

weha… Wê gavê yê min jî dilê min bi wê şewitî. Lê min fahm kir ko îmana min jî ji wê diçe. Belkî ev yek ji ber hêrsa min ya li hember neheqiya ko wê li min kiriye be jî. Lê piştî wê rojê, ez her li ber tahba xwe ketim ko min ewqas sal her bi xeyala ruyê wê ber dilê xwe xweş kir, carinan jî êvaran ji kerba wê xew li min herimî û ez heta sibehê li ber ketim, giriyam, min xwe xwar. Wê gavê, min fahm kir bê di wan salan de, çi qasî tişt ji min çûye û ez belasebeb bi pey hin tiştan ketime...

## 8. Bes şopek an jî işaretek...

Kesî ew nedîtibû. Ev çar rojên wî bûn ko tu xeber ji wî derneketibû. Mîtanî, Bedirxan, Serdar bê serî lê digeriyan. Çi cihê ko Robîn dikarîbû biçûyayê, çûbûn saxt kiribû. Na. Û şopek jî tune bû. Robîn wenda bûbû.

Li malê, mîna ko yek miribe, mîna ko Robîn miribe, mîna ko şûna wî hatibe danîn, bêdengî hebû. Kesek ji endamên malê nedipeyivî.

Di serî de, gişan li wî dipirsî, bi hevdu re li wî digeriyan, li ser hin îhtîmalan difikirîn. Gişan dev jî karên xwe berdabû. Mîtanî û Mehabad hew diçûn kar. Serdar û Meryemê jî dev ji dibistanê berdabû.

Giş li malê diman. Êdî nema li wî digeriyan. Hemûyan hêviya xwe birîbû. Wan xeber neda qerekolê jî. Ji xwe, heke polîsan ew biribe û ewqas roj in ko xeber jê nehatibe, miheqek tiştekî nebaş hatibû serê wî. Dîsa jî bi saya hevalekî Mîtanî û Bedirxên ê ebûqat, li qereqolê lê hatibû pirsîn. Lê di lîsteya navan de, kesekî bi navê Robîn tune bû.

Wan ji neçarî baweriya xwe bi vê bersivê anîbû, lê dîsa jî di nav xwe de, herkesî di dilê xwe de digot qey hayê qereqolê ji wî heye. Ji ber ko gelek kes piştî ko ji aliyê polîsan ve hatibûn girtin, wenda bûbûn. Polîsan ji bo herkesî digot »ne li cem me ye«, lê malbata tu kesî baweriya xwe bi vê bersivê nedianî. Gişan digot; polîsan zarokên me birine. Gişan digot; dijminê me ne.

Hêvî nemabû. Her gava ko xebereke neyînî dihat malê, serê wan hebekî din diket ber wan. Situyê wan xwartir dibû.

Li mala xwe rûniştin û xwe da bende xeberekê. Xebereke xêrê. Hin meriv, nas û dost jî çi ji dest wan dihat dikir û li şopa Robîn digeriyan.

Gişan digot:

— Hema bi tenê şopek, an jî işaretek.

Lê ne tu şop û ne jî tu işaret xuya dibû. Hayê kesî jî ji wî tune bû.

Mîtanî debar nekiribû û di dawiyê de, rabûbû telefonî welêt kiribû. Çi

nasên ko li wira hebûna, çi dost, çi meriv, giş rakiribûn ser piyan. Giş bi pey şopa wî ketibûn. Gişan ji hev pirsîbû. Lê çi kesên ko ji wan dihat pirsîn, ew nedîtibû. Çend merivên wan ji niha de ji bo ko werin Stembûlê û li cem wan bin, ketibûn riyê jî.

Yên malê jî hew dikarîbû bi vê kerbê îdare bikiraya. Resûl Beg di nav nivînan de bû. Gava bihîstibû ko Robîn wenda bûye, eynî mîna ko di roja kuştina Seydo de li wî hatibû, pişta xwe dabû dîwêr, çavên xwe veşartibûn û bi dizî giriyabû. Dilê wî nema debar kiribû û krîzek hatibûyê. Ji wê rojê de ye ko nikarîbûya rabe ser xwe û her roj textor dianîn ser wî. Hişê xwe jî wenda kiribû. Kê li derî bixistaya, bi heyecan radibû û digiriya û digot:

— Lawo, derî vekin. Derî vekin, haho! Robînê min li ber derî nehêlin. Robînê bavê xwe li derve nehêlin. Niha qerisiye, nesax ketiye dîsa. Wî bînin. Wî bînin têxin himbêza min. Derî vekin, haho! Derî vekin. Derî negirin. Robînê min li ber derî nehêlin.

Kesî ji devê wî fahm nedikir, lê wî dîsa jî hey digot û digiriya û li sînga xwe dixist. Nexweşiya wî roj bi roj girantir dibû. Resûl Beg… Resûl Begê ko peyva wî li ba xelkê pere dikir. Resûl Begê ko li hemû taxên Diyarbekirê xelkê jê hez dikir. Resûl Begê ko zilamê ko mirov dikarîbû pişta xwe bidayê, li ba wî bisitiriya. Niha bûbû tune. Du lawên xwe wenda kiribûn. Du law. Du tayên rihanê...

Ne Resûl Beg bi tenê bû ko ketibû halekî xerab. Leyla Xanim jî êdî ne Leyla Xanima berê bû. Hew dikarîbû bipeyiviya. Ruyê xwe tev de dîsa mîna ko di şûna Seydo de kiribû, çirandibû û di nav xwînê de hiştibû. Her li ser paldanka biniya pencereyê rûdinişt û çavên wê li rê bûn. Her digot qey Robîn aniha dê ji serê neqebekê derkeve û were, were û xwe biavêje himbêza diya xwe.

Serê xwe li dîwaran dixist û digiriya. Li xwe dixist. Dinaliya. Di ber xwe de dilorand. Lawij digotin. Herkesê ko li wê guhdarî dikir, digiriya. Gava ko wê dest bi lawijan dikir, Mîtanî û Bedirxan ji fediyan radibûn derdiketin hêwanê. Serên xwe didan ber hev û ji neçarî digiriyan. Wek zilamên xurt, lê neçar, muxtac, digiriyan. Digiriyan û tişt ji destê wan nedihat.

Leyla Xanim tu carî ji ber pencereyê ranedibû. Hew nan jî dixwar û zewade jî bi devê xwe nedixist. Ji xwe, ji berê de dilê wê ne xurt bû, îja piştî jana herî mezin, kuştina Seydo û bi ser de jî wendabûna Robîn... Carê diket û ji ser hişê xwe ve diçû. Meryema ko ew di wî halî de didît, digot


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

qey diya wê dimire, li xwe dixist, diqêriya û digiriya.

Vê rewşa malê, tifaqa wan ya ko ji ber şerê wan î navxweyî xera bûbû jî ji nû ve kiribû weke berê. Mirov digot qey gişan wî şerê xwe ji bîr kiribû.

Binevş êdî mîna qîzeke malê tev digeriya û berî herkesî karên hundirê malê giş dikirin. Her gava ko Leyla Xanim diket erdê û ji ser hişê xwe ve diçû, berî gişan ew direviyayê û kolonya li ser û çavên wê dikir. Di ber re jî digiriya, li ber diket. Wan ew derdên xwe giş ji bîr kiribûn. Wendabûna Robîn ji nû ve tifaq xistibû malê...

Mîtanî û Serdar ne wek Leyla Xanim û Resûl Beg bûn, wan hêviya xwe nebirîbû. Robîn ji bo wan ne bi tenê weke birayekî bû. Mîtanî ji cerga ko bi nexweşiya Robîn hisiyabû, bi çavekî din li wî diniherî. Heft salên Robîn bûbûn ko tu kar nekiribû; lê Mîtanî carekê jî ji ber vêya minet li wî nekiribû. Ji ber ko birayê xwe baş nas dikir û wî jî mîna diya xwe ew dixist şûna Seydo, dilê wî pir bi ser wî de bû.

Serdar ne bi qasî Mîtanî xurt bû. Ew bi dizî digiriya. Belkî ji Robîn hînî vî awayî bûbû. Wî jî weke Robîn, tiştekî xwe eşkere nedikir êdî. Ma ne ewqas sal in ko herkesî bi rewşa Robîn dizanîbû, lê kesî ji wan nizanîbû bê derdê wî çi bû. Wî jî, hey digiriya û serê xwe bi dizî li dîwaran dixist.

Robîn mamosteyê wî bû. Wî ji xwe re weha digot û qebûl kiribû...

Berê lê hay nebûbû, gava di ber odeka wî re bihurî, carekê xwast ko li hundirê odekê binihere. Ji cerga ko Robîn wenda bûbû, ji ber ko ber xwe nedîtibû, neketibû odeka wî. Ne ew tenê; yên din jî neketibûn odeka wî. Hew carekê, ew jî gava Leyla Xanim bêhiş ketibû, ji bo ko kolonyayekê bibîne, Binevş bi şaşî ketibû odekê. Qey ji ber wê teşqeleyê bû, ko nehatibû bîra wan.

Vegeriya û deriyê odekê vekir. Li hundir niherî. Gava çav li nivînên wî ket, kelogirî bû. Berê xwe guhert, debar nekir. Lê dîsa jî vegeriya û ket hundir.

Di serî de, lê hay nebûbû, lê gava ko li erdê niherî, wêneyên jihevbelavbûyî dîtin. Daqul bû, rahişt çend wêneyan û li wan niherî. Di wêneyekî de, li ser bircan, Robîn û du hevalên xwe xuya dibûn. Yek ji wan dirêj û xurt bû; yê din qut î şidiyayî bû. Wî ew kesê dirêj nas dikir. Şêxo bû. Pişta xwe dabû dîwarekî û li devereke ko di wêne de xuya nedibû, diniherî. Lê yê din nas nedikir. Ew qet nedîtibû. Di destê wî de kêrek hebû, bi wê kêrê darikek tûj dikir û li objektîfê diniherî. Dibişirî.

Di wêneyê din de jî dîsa li ser bircan bûn. Lê vê carê, yê qut çûbû û keçikeke esmer hatibû, di nav Şêxo û Robîn de rûniştibû. Ji kincên li ser

wan têgihişt ko herdu wêne di eynî rojê de hatibûn kişandin. Qey wêneyê yekem ji aliyê keçikê ve û yê din jî ji aliyê wiyê qamkinik ve hatibû kişandin.

Wêneyê binî jî derxist, lê niherî. Disa li ser bircan bûn. Lê keçik bi tena serê xwe bû. Roj li paş kesê ko wêne dikişîne bû û dida ruyê keçikê. Siya kesê wêne dikişand jî xuya dibû. Keçikê çavên xwe ji ber şewqa rojê girtibûn û dikeniya. Hebe nebe, yê ko siya wî xuya dibe, Robîn e. Ji ber ko wêneyê çaremîn jî yê Robîn û vê keçikê bû û Robîn bi awayekî ko ev wêne bi zorê pê hatibe kişandin, fediyokî li objektîfê diniherî.

Robîn tu carî behsa vê keçikê nekiribû û Serdêr ev wêne qet nedîtibûn; lê qey ev keçik hezkiriya Robîn bû.

Serdêr ji rewşa odekê fahm kir ko Robîn berî ji malê derkeve, li van wêneyan niherîbû. Wêne giş ji erdê dane hev û ew danîn ser maseyê. Wê gavê, di nav deftereke li ser maseyê de, çav li tiştekî ket. Serê kaxizekê xuya dibû. Beyî ko giringiyekê bidiyê, ew kaxiz ji wira kişand û vekir.

Helbesteke piçûk tê de hebû. Serdêr ew bi lez xwend:

Evîn bi dawî bûn, hezkiriya Diyarbekirî
Temenê xwe temam kir jiyana bicîwarbûyî
Tu kes kedîkirî nîne êdî...

Bîstikekê sekinî û li ser helbestê fikirî. Ket bin tesîra wê. Wî tu carî helbesteke weha nexwendibû. Devê wî ji hev çûbû. Gava ko hebekî fikirî, lê hay bû ko kêfa wî pir ji zimanê kurdî re tê...

Lê belê, xwediyê vê helbestê kî bû? Gelo ev helbest ya Robîn bû?

Wî berê jî helbestên Robîn yên ko di kovar û rojnameyan de derdiketin dixwendin, lê helbesteke wî ya weha nedîtibû. Ji xwe, Robîn helbestên xwe bi kesî nedidan xwendin. Piştî ko dihatin weşandin wê çaxê dihatin xwendin.

Çawa dikarîbû îdare bikiraya, lawo! Heke Serdar bûya, qet nikarîbû xwe bigirtaya. Wî dê her helbesta xwe berî ko bidaya kovarekê an jî rojnameyekê, ji herkesî re bixwendaya û ber dilê xwe xweş bikiraya.

Ma çima ev hemû nivîskar giş weke hev in? Hema di kar û barên wan de esrarengîziyek heye. Mirov dibêje qey tu karî nakin, lê ji nişka ve berhemekê derdixin ko hişê mirov nagihêjê. Belkî ji ber wê, ew jî nebûbû nivîskarek.

Bi dû re, di dilê xwe de got:

— Na, lo! Ma çi pêywendiya nivîskariyê û van tiştan bi hevdu re heye.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Heke mirov di vî karî de, jîr û zane be, ji xelkê veşêre jî veneşêre jî ji xwe dîsa berhema wî derdikeve. Ma kes dikare riyê li ber vêya bigire? Dibe ko ew ji diziyê ditirsin û ji ber wê, heta ko xelas nebe, ji kesî re behsa berhemên xwe nakin.

Wî ji xwe re weha digot, lê wî tu carî bîr nedibir bê ji bo çi nivîskar giş ecêb bûn û nedişibiyan însanên normal. Jiyana wan, tevgerên wan, fikrên wan... Gelek kesan mîna ko ji bo Robîn jî carinan weha dihat gotin, ji bo nivîskaran digot ko ew dîn in. Lê ya rastî, kesî jî newêrîbû behsa vê yekê ji wan re bikiraya.

Gava li wan tiştan difikirî, rewşa Robîn a berî ko wenda bibe hat bîra wî. Wê gavê, heq da wan hemû kesên ko ji wan re digot ko ev dîn in. Lê dîsa jî xweziya xwe bi dilê wan kesên dîn anî.

Helbest di destê wî de, ji xwe re difikirî û di odekê de digeriya. Gava berê wî ket dîwêr, mîna li tiştekî ko heta niha nedîtibe rast hatibe, sekinî û bala xwe bi heyecan dayê. Li dîwêr wêneyekî çarçovekirî hebû. Di wêne de, pireya dehderî xuya dibû. Dicleya ko di bin wê re diherikî û diçû jî bi hemû bedewiya xwe li ber çavan bû. Jê hebekî bi wê de jî bircên keleha Diyarbekirê xuya dibûn.

Wî heta niha, ewqasî guh nedabû vî wêneyî. Lê wê gavê, mîna ko di biniya wî wêneyî de, ji wê dîmena pireya dehderî û Dîcleyê kûrtir tiştekî din hebe, lê diniherî. Her tiştên ko li odeka Robîn çav lê ketibû, di serê xwe de anîn ber hev. Fikirî.

Wêneyên ko li ser bircan hatibûn kişandin, helbesteke li ser hezkiriyeke kevin a Diyarbekirî, pireya dehderî, Dîcle û Robîn...

Çavên wî ji nişka ve fireh bûn. Veciniqî. Kaxizên destê xwe avêtin erdê û ber bi aliyê hêwanê ve baz da.

Derî bi carekê vekir û ket hundir. Gişan li wî diniherî. Mîtanî û Bedirxan bi ketina wî ya hundir re rabûbûn ser xwe. Herduyan jî gotibû qey tiştek bûye. Lê di ruyê Serdêr de, mahneyeke din hebû. Dikeniya. Diqêriya.

Bi wê re dengê telefonê hat. Giş mat mabûn. Deng ji Serdêr jî biliya.

## 9. Min ji vira bibe Gulcan, min bernede...

»li qiraxa Dîcleyê du evînên kêrkirî
du evînên ji êgir
û xwe digihînin lêvên min...«

Du roj derbas bûbûn ko ji wira derneketibû. Hew dikarîbû bi roj ji şikefta xwe derketaya êdî. Dizanîbû; heke dîsa bihataya girtin, vê carê kesî nikarîbû ew ji mirinê xelas bikiraya. Lê ji bo ko xwe veşêre, êdî sedemeke din jî hebû. Ji Nûşînê direviya. Ji xwe direviya.

Gava dinya tarî bûbû, nema dikarîbû bi xwe û derketibû. Lê dîsa jî newêrîbû biçûya nava bajêr. Ji lewre, daketibû biniya bircan û xwe ji wira bera qiraxa Dîcleyê dabû. Li dengê wê û bêdengiya şevê guhdarî kiribû. Heta ko xewa wî hatibû jî li wira mabû, li ava Dîcleyê ko stuxwar diherikî, niherîbû û giriyabû.

Kî bîra ko mirov di şikeftekê de xwe bi xwe mahkûm bibe! Êvaran jî bi tenê bikaribe were qiraxa çemekî mîna Dîcleyê ko bûye şahidê dîrokê. Mîna însanekî nefîkirî...

Roja din jî heta ko lê bûbû êvar, serê xwe ji şikeftê dernexistibû. Gava ko êdî birçî bûbû jî bi dizî daketibû jêrê û ji pîrekeke ko nan bi tenûrê ve dida, nanek stendibû û tisî xwaribû. Pîrek di serî de ji wî tirsiyabû, lê digel wê tirsa xwe, beyî ko tiştekî bipirse, nanekî germ jî dirêjî wî kiribû.

Mîna ko ev sed salên wî bûn ko di wira de bû... Nema dikarîbû bi devereke din jî biçûya. Êdî an ew ê li benda mirina xwe bimaya, an jî ew û şensa xwe... Belkî hin bihatana û ew ji wira xelas bikiraya.

Ro derbas nedibû. Sebra wî nemabû. Ji libendemayinê westiyabû û di xew re çûbû. Gava çavên xwe vekirin û li aliyê derve niherî, tarî ketibû erdê. Laşê xwe yê giranbûyî bi zorê ji erdê rakir û derket. Hingî li erda sar raketibû, her derê wî pûç bûbû. Lingên wî qerimîbûn. Ji pêlikan bi zorê daketibû.

Lingên wî ew dîsa bir goristanê. Dîsa berê, li ser mezelê Hemdîn sekinî, daqûl bû û serê xwe danî ser kevirê gora wî û giriya. Pêwîstiya wî bi hevalekî hebû ko serê xwe deyne ser milê wî û bigirî. Bi tenê bû, aciz bûbû, hemû hêviyên wî têk çûbûn...

Li ber serê Hemdîn têra xwe giriya. Bi dû re çû ser mezelê Seydo. Du kesên ko niha dixwast xwe biavêje himbêza wan... Du kesên ko dikarîbû himbêzên xwe ji wî re vekirana û ew aş bikiraya. Du mirî, du term, du bîranînên heta û heta...

Bi tenê bû. Nizanîbû bê divê çi bikiraya. Heta dereng, li goristanê mabû. Bi dû re, ji ber tirsa xwe, hew li wira debar kiribû, dîsa vegeriyabû ser bircan, şikefta xwe. Li wira jî têra xwe giriyabû û hingî westiyabû, serê xwe çawa danîbû, di xew re çûbû. Yekî ko beyî şer bike têk çûbe çawa bigirî û di xew re here, ew jî eynî weha...



E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Dîsa tê dernexist. Xewn bû an na? Ji xwe, ji bo wî, tu tişt ferq nedikir. Ha xewn, ha rastî. Herdu jî weke hev bûn. Mirov çawa di nav qelebalixiya bajarekî de, bi tena serê xwe be; çawa di jiyana ko mîna çemekî diherike de, mîna miriyekî be, eynî weha.

Ro dikira hilataya. Lê hê jî tarî bû, bes bêhna sibehê jî ne ewqasî dûr bû. Bayê kur dengê xwe birîbû, mirov digot qey li wî temaşe dike. Diyarbekir hê di xew de bû.

Robîn rabû meşiya û çû derket serê bilindahiyekê. Berê, li jêrê temaşe kir. Sekinî. Ev bajarê di xew de, ev bajarê ko him bûye warê evînên wî yên kevin him jî bûye bîreke kûr î bêbinî, bîra bitenêtiya wî... Her der bêdeng bû, her der di xew de. Li Diyarbekira ko xwe dabû qiraxa sibeheke nû, diniherî. Mîna ko mirov li wêneyekî xwe binere. Mîna ko mirov li çavên hezkiriyeke xwe ya kevin binere.

Bîstikeke din, hemû melayên Diyarbekirê dê dest bi azana sibeha nû bikiraya. Bistikeke din belkî hayê kesî jî jê çênebûya. Belkî ne xema kesî bûya jî.

Bîstikeke din Robîn ê bimiraya...

Hingî giriyabû mejiyê wî dewx bûbû. Hêsirên çavan di ser hev re diherikîn. Çavên wî êdî baş fêrî girî bûbûn. Nema tiştek didît.

Xwe amade kir ko biavêje jêrê. Gava li jêrê niherî, serî wî gêj bû û bi şûn ve kişiya. Ma mirov çawa dikarîbû bi rehetî xwe biavêtaya himbêza mirinê?

Dîsa gava xwe avêt û hat li qiraxê sekinî. Gava li jêrê niherî, sekinî. Li wira, xeyala agirekî bi ber çavên wî ket. Agirekî xweş, agirekî gûr. Agirekî ko pêtî di ezmanan re derdiket.

Du kes li dora êgir rûniştibûn. Du zilam. Herduyan jî serên xwe rakiribûn û li Robîn diniherî. Yek ji wan, bi qasî ko mirov bi saya şewqa êgir didît, xort bû. Destên xwe rakiribûn û jê re digot:

— Were Robîn, were ba me...

Dengên wan bi zorê dihatin wî. Robîn dengê wan kesan nas dikir. Piştî ko Robîn dengê wan nas kir, an jî wî digot qey weha bû, ruyên wan jî zelal bûn.

Herdu jî zeîf bûn, herdu jî dirêj. Yek ji wan, temberiya wî ji kêlekê de vebûbû, simbêlin wî yên xweşik hebûn ko bi ser lêva wî ya jêrê de dadiketin, ruyê wî yê gewr li ber şewqa êgir dibiriqand. Zilam dibişirî. Yê din, yê ko ji yê kêleka xwe ciwantir bû, wî jî destê xwe bilind kiribû. Porê wî mîna yê eskeran, kin bû. Ji niherînên wî xuya bû ko ji zû de çav li

Robîn neketibû.

— Were Robîn, were...

Robîn ji bo ko xwe biavêje cem wan, li cihekî geriya, lê belê birc pir bilind bû.

— Were Robîn, were...

Robîn dikira xwe biavêtaya jêrê, dît ko di şûna herdu kesan de, wan kesên ko bîstika din destên xwe jê re bilind kiribûn û gotibû »were,« du şûrên ko li ber êgir dibiriqandin hatibûn citkirin. Dora êgir, bi şûran ve mişt bûbû. Xwe bi zorê zevt kir. Heke xwe negirtaya, ew ê biketaya ser wan şûran.

Bêhna wî dikira biçikiya. Serê wî gêj bûbû. Ji bo ko nekeve xwarê, dîsa bi şûn ve kişiya. Bes vê carê, pişta wî li tiştekî din ket. Bi tirs li dû xwe zivirî.

Zilamê ko sê roj berê sileh xistibû serê wî û ew bi zorê ji destê wî filitîbû, niha awirên xwe tûj kiribûn û li hember wî sekinîbû. Di destê wî de dîsa sileh hebû. Robîn veciniqî. Xwast ko bireve, lê bi kû de? Li dû wî tu cih tune bû ko bireviyayê. Yan ew ê li bende bisekiniya ko zilam lingê devançeyê bikişîne û wî ji vî ezabî xelas bike, yan jî wî ê xwe biavêtaya jêrê û bikuştaya. Robîn dikira ji tirsan, bimiraya. Diricifî.

Zilêm sileha xwe rakir û da eniya wî. Dilê Robîn dikira bisekiniya. Li jêrê niherî; şûr hê li şûna xwe bûn. Dîsa li zilêm zivirî. Zilêm sileh bi eniya wî ve zeliqand.

— Xwe biavêje!

Nizanîbû bê dê çi bikiraya. Li herdu aliyan jî mirin hebû, li herdu aliyan jî mirin feqeke vedayî bû. Ma qey mirov dikarîbû ji nav mirinan, mirinek hilbijartaya ji xwe re? Ma mirov qet dikare? Ma qet weha dibe?..

Çavên xwe girtin û xwe da bende, serê xwe ber bi jorê ve bilind kir. Hey diricifî. Bi zorê li ser lingan disekinî. Hêsir ji çavên wî diherikîn ser hinarikên ruyê wî. Mirin li ber serê wî sekinîbû. Ne Ezraîlek bi tenê, lê ezraîlên bêhejmar dora wî girtibû. Êdî hertişt xelas dibû.

Malbata wî hat bîrê. Ji cerga ko ji malê derketibû, tu carî ewqasî nexwastibû ko li malê be. Lê aniha, çi dixwast ko li mala xwe rûniştî bûya! Belkî niha, hayê dê û bavê wî jî ji wî tune bû. Belkî kesek bi çûna wî jî nehisiyabû. Xwe pir bi tenê his kir.

Zilêm ling kişand û sekinî. Dengê şerqîniya lingî bi tenê hatê. Bi tenê dengê lingî. Wî dengî jî li der û dorê olan da û li wan vegeriya. Robîn xwe da bende ko bimire. Lê, nedimir. Gule nedihat. Gule nedigihişt eniya wî.


E-POSTE: INFO@NEFEL.COM MALPER: WWW.NEFEL.COM

Ji nişka ve, ji dûranê dengek hat bihîstin. Dengekî din. Ji xeynî yê vî zilamî. Ji xeynî yê vî zilamê ko ji bo kuştina wî hatibû. Dengekî xweş. Dengekî nerm. Dengekî nas. Dengê keçikekê...

— Robîn!

Deng bangî wî dikir. Lê ka xwediya vî dengî. Ew li kû bû? Çavên xwe vekirin. Zilêm hê sileha xwe dabû eniya wî û li wî diniherî. Zilêm hey ling dikişand, lê devançe nediteqiya. Robîn newêrîbû bersiva wî dengî bidaya. Wî dizanîbû, heke dengê xwe bikiraya, vê carê devançe dê biteqiya. Gule li hemanan bû.

Ew deng dîsa hatê.

— Robîn!

Robîn hew xwe zevt kir. Bi qasî ko ji wî hat, heta ko qirika xwe biqetîne, qêriya.

— Haaahoooooooo...

Qêrîna wî heta gihişt ezmanan jî. Hin malên der û dorê bi dengê wî re, lempeyên xwe pêxistin. Çend çivîk ji ser darekê bi firê ketin.

Ew jî bi dengê xwe, bi xwe hisiya. Hê diricifî. Çavên wî yên ko fireh bûbûn, li ezmanê ko dike rohnî bibe digeriyan. Digiriya. Bi hemû tirsa xwe, bi hemû hêrsa xwe.

Dîsa ew deng hatê.

— Robîn!

Ev dengê nerm. Ev dengê xweş. Ev deng... Dengê Gulcanê...

Bi heyecan li wî dengî zivirî. Peyv ji xweber ji devê wî derketin.

— Gulcan!

Gulcanê serê wî danîbû ser çonga xwe û ruyê wî mist dida. Hêsir ji çavên wê diherikî...

Robîn ecêbmayî mabû. Xwîna wî sekinîbû. Rîha wî hatibû, porê wî tev li hev bûbû, çavên wî nepixîpûn. Ji ber tirsa kabûsê bîska din jî ruyê wî zer bûbû. Hema xwe avêt sitûyê wê û giriya.

— Min ji vira bibe, Gulcan. Min bibe, min bernede...

Herduyan hevdu himbêz kiribû û digiriyan. Gulcanê ew bi ser sînga xwe de dieciqand û pişta wî mist dida. Mîtanî û Bedirxan li dû wan sekinîbûn. Serên xwe bera ber xwe dabûn. Mîtanî digiriya.

Ji wan bi wê de, du kesên din jî xuya dibûn: şifêrê ko gava du zilaman Robîn dibir ew dîtibû.

Û Elî. Eliyê Artîst. Serê xwe bera ber xwe dabû û li ber xwe diniherî.

Û Zilamekî kal. Xwe dabû ser gopalê xwe û li wan diniherî...